

"Miştaxa Çiya Ji Gotinên Pêşîya" yekemîn car di sala 1979-an da pirtûkeka ji gotinên pêşîya bi şirovekirin hatîye çapkirin. Herweha eve yekem car e ku bi latîni bêt çapkirin .

Ev pirtûk e, ne tenê berevokeka nimûneyên folklor (zargotina) kurdî ya rengîn e, lê herweha xezîneyek dewlemend ya peyv û deranîyên (idiom) kurdî ye. Ev jî bi saya pêşîyên neteweyên me ne, ku çi nemaye ji me ra negotin e! Hemû gotinên wan serhatî û nimûneyên jîyana wan bûne. Ev nimûne wekî kurtegotin û çîrok mane û di hemû kar û jîyana gelê me da bûne şîret. Ev şîret di warê welatperwerî, miletparêzî, civakî, aborî, ziman, çand, têkilî û helbijartinê, dîni û hekîmîyê ve jî derbaz dibe. Wek gotine:

"Ez çiya û to çiya kî ji golik ra herit gîya."

"Se be ji qewmê xwe be!"

"Bila şêr pişt a mirov bişkênit, ne rûvî devê mirov balîsit."

"Serê xwe her bide dîwarên kevin!"

"Bila mirov dîkê rojkê bit, ne mirîşka sê sala bit!"

"Dorê bide dornasa!"

"Şûrê qetlê li destê te, rehma Xudê li dilê te"

Seydayê mezin Mele Mehmûd Dêrşewî di vê pirtûka xwe da piranîya gotinan şirovekirine û gelek ji wan bi çîroktî û nimûne efrandine.

Yahê Seydayê Dêrşewî Yahê

Wergêr

NAVEROK

Pêşgotina wergerî	3
pêşgotina nivîkarî	8
Tîpa A	14
Tîpa B	20
Tîpa C	40
Tîpa Ç	41
Tîpa D	47
Tîpa E	67
Tîpa Ê	80
Tîpa F	83
Tîpa G	85
Tîpa H	91
Tîpa I	117
Tîpa J	118
Tîpa K	158
Tîpa L	174
Tîpa M	185
Tîpa N	199
Tîpa P	206
Tîpa Q	211
Tîpa R	214
Tîpa S	218
Tîpa Ş	228
Tîpa T	234
Tîpa V	249
Tîpa W	250
Tîpa X	252
Tîpa Y	260
Tîpa Z	262
Ferhegok	267

Mele Mehmûd Dêrşewî

MIŞTAXA ÇIYA
JI GOTINÊN PÊŞIYA

wergerandin ji tîpên erebî

Serbest Zaxoyî

Stockholm 1989

Çapa yekem (bi tîpên latînî)

Ji çapên wergerî

1-Şîn û Şadî - Dilistan (Dîwana 1 û 2) Sabrî Botani 1988

Navnîşan:

Rasheed. M. AB

BERGENGATAN 12. 2 TR.

164 35 Kista / Sweden

Tel: 08- 750 49 55

.....

Postgiro: 4210972-8

ISBN: 91-7970-535-9

PEŞGOTIN

Seydayê mezin Mela Mehmûd Findî Abdullah Dêrşewî, ji xelkê gundê Dêrşwê ye. Dêrşew, li aliyê Botan nêzîkî bajarê Şirnexê ye. Ew ji malbateka dîndar û welatparêz tê. Wek piraniya gundiyan Kurdistanê malbata wî jî, malbatekê hejar e.

Bi rastî ez ji nêzîk ve nivîskarê hêja M. mehmûd Dêrşewî nasdikim û hinek ji jîyana wî jî dizanim. Min xwest, tiştên ku ez dizanibûm binivîsîm, lê ji ber ku wî bi xwe di pêşgotina xwe da li xala (D) da weha dibêje:

"Bi rastî min xwest, ez bi kurtî jîna xwe bikim du berper li vê nivîsoka xwe da, belê min pê çênebî ji ber hindêk tişt!..." Vêca ez neçar bîm ku bi kurtî behs bikim.

Nivîskarê giranbuha ji ber zulma dewleta Tirkan çû Kurdistanê Îraqê, li hêla Behdînan cîwar bû û li wir karê welatparêziyê berdewam kir. Piştî Peymana 11 Adarê 1970-a dîrokî, ew çû medresa (dibistana) dîni li bajarê Amedîyê û di sala 73-74 - an da qedand û îcaza melatîyê wergirt. Û pişt ra hat bajarê Zaxo û li wir dest bi melatîya xwe kir. Ew û melayekî welatparêzê dî Mela Ahmedê Barzaneyî bi hev ra li mizgefta Mezin li Zaxo dixebitîn. Hîngê Mele Mehmûd tenê we`iz dida. Di hişyarkirin û têgehandina sîyasî da tesîreke baş li ser xelkê çêdikirin. Piştî ku Mele Ahmed Barzaneyî kal bû, Mele Mehmûd di şûna wî da li Mizgefta Mezin bû melayê resmî.

Di sal 1979-an da ji aliyê hukumetê ve hate girtin û ew birin zîndana Kerkûkê. Û li wê derê îzayek giran kişand, piştî çend meheka bi nîvmirovî hate berdan!

Wek ew di pêşgotina xwe da dibêjit, ku gelek zahmet dîtîye, heta karîye di nav gundiyan da û li civatan van gotinên pêşîya kom bike.

Nivîskar, çawa diaxive welê dinivîse. Çawa ku bala

xwendevan jî wê bikşîne, zimanê nivîskar devoka herêma Botan û Behdînan e. Wî, zêde giringatiya gramatikî werne-girtiye.

Pêwîst bû, ku pirtûk li gor qa`îdên gramatikî ji nû ve hatiba serrasikirin. Lê, ji ber ku destê min ji nivîskarê hêja Dêrşewî nedigirt, ku gelek tişta jê bixwazim, vêca ez neçar bûm ku wek wî wergerînim.

Herweha têkilî devoka nivîskar jî nebûm. Lê, ev pirtûk bi xwe ji 871 gotinan hatibû saz kirin. Lê bi tîpên latînî ji 867 gotin bi jimare hatîne rêz kirin. Ji wan çar gotin di nav tîpa (B), (Ç) û (G) da bi jimara (A) û (B) hatine nivîsîn. Ew jî ji ber hindê sedemên teknîkî bûn.

Eger rastî be, kurdîya nivîskarê giranbuha Mele Mehmûd Dêrşewî, kurdîyeka petî ye, weha nazik û zelal e, ji peyvên biyanîyan.

Ji ber hindê xwendevanan min ferhengokek ji hindê gotinan çêkir da ku ew baştir têbigihin.

Nivîskar di pêşgotina xwe da li ser hindê şeweyî nivîsîna kurdî bi tîpên erebî behs kiribû û wek şîret dida. Lê, min ew çend gotin jê derxistin. Çunkî şeweyî nivîsînê bi tîpên latînî û ya erebî nabe yek û ew daxwazên nivîskar di vê pirtûkê da, ji boy şeweyê latînî derbaz nabe.

Seydayê Mele Mahmûd, di pirtûka xwe da, gotinên pêşîya li gor rêza elfabaya erebî li dûv êk rêz kiribûn û yek jimar daye wan. Lê min ew li gor elfabaya latînî bi cih kirine û ji lewma jimara gotinan jî hatîye guhartin. Lê, ev guhartin ji aliyê teknîkî da ye, tesîrê li mebesta nuvîskar û gotinê nake.

Ez wê gelek şa û keyfxweş bibim, eger min di vî karê xwe da xizmetek ji bo ziman û çanda kurdî kiribe û vê pirtûkê pêşkêşî xwendevanan dikim û hêvîdar im, ku bi dilê wan be!

Serbest Zaxoyî



Mele Mehmûd Dêrşewî

SPAS

Ji bo wan dost û hevalên ku destê harîkarîyê ji "Miştaxa Çîya" ra dirêj kirin!

Herweha ji bo biraderê hêja Mecîdê Îbramîmê Xaniqînî Seydayê xwendegeha Navincîya Bedirxan li Zaxo, ew ê ku tibabek ji wextê xwe bi nivîsandina wê ve bûrandî.

Herweha divê ez qencîya lawên zîrek Mehemedê Hacî Yonis suxtê xwendegeha Navcî, Se`dullahê Berwarî suxtê xwendegeha Navcî û Mehemedê Osmanê Halo suxtê zanîngeha Mosilê ji bîr nekim û spasekê ji kûratîya dilê xwe pêşkêşî hevalê Şîn û Şadî ya me Sebrî Botanî dikim. Herwelê bo xudanê çapxana Şefîk ji ber xemxwarina wî bo vê pirtûkê...

Û dîsa herweha ji min û ji dilxwazan spasîyan ji nava dilê xwe pêşkêşî heval Serbest Zaxoyî dikim ku bi dilbêşî û evîndarî berê xwe da ye vê reşbelekê û wergerandîye tîpên latînî da ku zêdetir di nav miletê me da belaw bibe û biçîne!

1989

Mele Mehmûdê Dêrşewî

PÊŞGOTIN

Bê guman e, ku miletê Kurd êk ji wan miletan e ew ên xwey nav û deng, nexasim ji aliyê ezmanê (zimanê) xwe ve belê heyf û mixabin ev ezmanê he bi rengekî dilxwaz nehatîye nivîsandin; heta hemî zanîna vî miletî li ber çav bit ku hemî xwendevanên Kurd bikarbin kar jê bînin, tenha zanîna vî miletî û aqildarîya wî maye li nav çêrok û serhatî û gotinên pêşîyên wî da heta miorv dikarit bêjit [felekîyat] û [hekîmîya] wî jî veşartîye li nav kurte mesel û serhatî û pêgotinên wî da. her wekî gotinek wî heye dibêjin: [li 13 ê .Huzêranê xema teyrânê dibêjin: Berê me ket çilê zivistanê û li 13 kanûnê li teyra keyf û şahî ye. Dibêjin; berê me ket susin û beybûnê] eha holê mirov dibînit li 13 ê huzêranê roj kurt dibit û şev dirêj dibit. - Her li 13 ê meha kanûna êkê roj dirêj dibit û şev kurt dibit - Ji aliyê hekîmîyê ve Kurda wê gotin [seda bide û xwîna xwe bernede, belê heke te berda seda bide û berdanê bernede.] ji aliyê şîret karîyê ve wê gotin: [Serê xwe her bide dîwarên kevin] yanî pirsyar kerbe ji miorvên pîremêr û serhatî. Ji aliyê hîlbijartinê ve wê gotin: [Nankê bide nanpêja bila nanek zêdebit] yanî bila hostayê te zana û şehreza bit. Bila to heqek zêde li karê xwe bidî. Ji aliyê têkilî û miletperwerîyê ve wê gotin: [Bila şêr pišta mirov bişkênit, ne rûvî devê miorv bikujit. " " Sebe ji qewmê xwe be. "] Her welê ji aliyê mêranîyê ve wê gotin: [bila mirov dîkê rojekê bit, ne mirîşka sê sala bit.] Eha holê mirov berê xwe diditê hemî zanîna miletê me veşartîye li nav gotinên wî da de çi ji aliyê jîyanê ve yan ji aliyê rexê emborî ve ji kenarê miletperwerî ve. Heta mirov dikarit bêjit bîr û bawerîyên wî bi Xudayê wî ew jî dîyar dikit li nav gotinên pêşîyên wî da wekî çaxê dibêjin: [Bila Xudê yarbit, dinya hemî bila neyarbit] li gotinek dî da dibêjin: [Şûrê qetlê li destê te, rehma Xudê li dilê te] bi kurtî hemî rêkên jîyana vî miletî nepenî ye li nav gotinên pêşîyên wî da, nexasim zarê

kurmancî. Çenda ku hindek hozanvan û edîba agahdarkirine bi vê êş û elema mezin û mereq jê xwarne to çend nivîsandinek wê binvîse wek seydayê bi nav û deng xemxwarê milletê xwe [E'hmedê Xanê] çaxê dibêjit:

*Îna me nizam û intîzamê...
Kêşa me cefa ji bo wê amê
Yanî ne ji qabil û xebîrî
Belkî bi te esb û eşîrî
Da xelik ne bêjtîn ku Ekrad
Bê marîfet in bê esl û binyad
Enwaê millet xudan kitêb in
Kurmanc tinê di bê hisêbin...*

Piştî wî dilovanê milletê xwe Celadetê bedirxan Begê. û piştî wan hate meydanê Cigerxwînê milletê xwe, bi rastî Cigerxwîn pêngavek mezin û hêja li vî babetî avêt geh bi şî rînî wekî çaxê dibêjit:

*Nifînekê ji yezdan dikim to bêje amîn
Şêx û melayên Kurda belengaz û geda bin
Lewra yekê ji wana qanûn bizarê kurdî
Ji bo me çenekir qet ji ber vê em nezanîn
Xwe pîr dikin di wez`ê hem serf û neho û mentiq
Bê zar û xet û xwendin li nav xelkê dewarîn
Dibên eger bi kurdî îlm ku pête xwendin
Em dê bibin qizilbaş Kurd û bixar û maçîn
Payîz û hem zivistan her sê mihên biharê
Her dikin mitala daxwaz ji wan ra havîn
Her dem dibên em in yê ku warisê Nebî ne
Lê dev û çarx û guvend wan kirne ayîna dîn
Feqî bi xwe nezane seyda dinêrî qamos
Her yek bi dil dibêjin em miftûyên zamanîn
Eger kurdî bixwînî bi renc û bi geranî
Bê qeyd û şerh û haşî cahîl bi xwe dizanin
Dîne me têne zanîn bi her zeman û her xet
Bi kurdî yan frinkî ya xud bi xetê latîn*

*Willah bûm cigerxwîn ji derdê şêx û seyda
Qelem di gel ziman im her dem bi ax û nalîn.*

Bi rastî Cigerxwîn ka çawa bi şî rînî xebat û kefteleft kir her welê bi çêrokê jî teqşîr nekir, wek çîroka Reşowê Darî û gotinên pêşîya, belê heyf û mixabin pêngava wî û hevalên wî - Reşîd Kurd xweyê Rêzimana Zimanê kurdî Ūsman Sebrî û Nuredîn Zaza û ji bilî wan ev pêngava wan li demek berteng dabî ji ber vê êkê nivîsandinên wa li nav millet da belav nebîn û hemî destekên millet kar jê nanîn çunkî:

1- Ev nivîsandinên he bi kurdîya latînî bîn û xwendewarên Kurda ji deha êkê latînî nedizani.

2- Her gava ev nivîsandinên he dihatin çapkirin biyanîya bi leztirîn çax ji nav millet ra dikirin nedihîştin kes bibînit. Li dûmahîka seyda Ezîz Ekrehî qamosek kurdî çêdikir, belê ez tiştêkê jê nizamim, çunkî heta vê gavê jî min ne dîtîye.

Bi rastî ev nivîsandinên he hem jî kêr in heger em berê xwe bidin milletê xwe ji aliyê ezmanê wî ve lewma hemî gava kul û meraq û keser û keder bî li ser dilê min ku ez pişkdarîyê li vî ezmanî da bikim bi çî rengê heybit baş e. Çunkî wekî dibêjin "hindik ji neyîne çêtir e" û min hizrên xwe kirin ka ez çî xizmetê ji vî ezmanî ra bikim? Piştî wekî dibêjin "Mam hemdan me çêl û gul li derdan mane em û ev xeberdan." Piştî min tibabekê hizrên xwe kirin min berê xwe dayê tiştêk wekî gotinên pêşîya hêja nîne çunkî:

1- her gotinek pêşîya teji li binda zanîn û tê gihandin e.

2- Tiştêk wek gotinên pêşîya li ser rêka windabînê nîne, çunkî heta vê gavê jî hemî gotinên pêşîya ne hatine nivîsandin - nexwasim bi zarê kurmancî - belkî piranîya van gotinan mane li gel pîremêr û pîrejnan kurd. Ū her gava êk dimrit millet bi tebabekê xusaret dibit.

3- Bê guman e min xwe didît mereqa min ji her tiştî pêtir li ser gotinên pêşîya hebî û heye, ji ber van tiştê ez rabîm ev çend gotin min kom kirin li sala 1964 ê û daxwaza min ew bî ku ez li ser her gotinekê birekê baxivim, li gur karîna xwe ka daxwaz ji vê gotinê çî ye? Ū çî aqildarî têda heye? Bi rastî min xwe gelek kêmtir dît û xwe kêmtir dibînim, bi-

rabîna karek holê, çunkî ez baş dizanim ev ne çepera mirovên çek nexweş e û ev meydana he ne ya siwarê hespê kulek e. Nexasim mirovên tirsûnek. Belê ji ber pêve mana hindek hevalên giranbiha li ba min, li pêşîya wan hevalên dilbêj û dilovan mela Mehmod Gezney û nama wan bi min ve çunkî wan hizrek mezin ji min dikirin, ji dilpakîya xwe - ne ku ez li wê rêzî bîm - û ji ber nexwestina min ez hizrên wan beyhude nekim, nexasim piştî wan zanîn min gotin kom kirne belê min dirust ne kirine û dil firjandina min li ser vî ezmanî - nexasim zarê kurmancî - ez xizmetekê jê ra bikim û îşk dana wan bo min, min xwe bivê-nevê dît. Ez cilên sist û xavîyê ji ber xwe bikim. Û min zend û bendê xwe hildan û hêz û quwet ji Xudayê mezin û bê heval xwest û ew çend gotinên min kom kirin min dirust kirin li ser tîpên "hicaî" e li ser her gotina ez bikarim birekê ez axivtim û pêşkêşîyê xwendewarê Kurd dikim. Hîvîdar im ji Xudayê bê heval ku karek hêja û berketî jê bibînim!

Vêca hîvîya min ji xwendewarê Kurd ew ku bila bi dilekê evîndarî vê reşbelekê bixwînin û heke kêmatîyek tê da dibînin bila li min bibûrin, êunkî eve cara yekem e, ku ez xwe bidin vî karî û wekî dibêjin: "Pehlewan bi carekê naçit li ser şelîtê", eve ji alekê ve ji alek dî ve min arîkarî nînim li vî çaxê ez dest binivîsandina vê reşbelekê dikim. ji bilî ax û keser û kovanên li ser vî ezmanî. her welê hîvîya min ji xwendewarên Kurd ew e, hişyarîyê li nav xalên xarê bikin.

A- Hîvîdar im, ku cirvekêşî ne êt kirin, bo çî bi zarê filan cihê ye ne bi zarê filan cihî ye? Çunkî bi rastî daxwaza min ew e, tenha bi zarê kurmancî bit eve ji rexeke ve û ji rexeke dî ve pîranîya van gotinan min ji awayê Botanî wergirtine ew jî ji ber du tiştan:

1- Ez li awayê Botanî da melevantir im.

2- Ez li ser rêka celadetê bedirxan Begê çû me, çaxê dibêjit: Heçî kurmancîyek ji peyvên bîyanya bivêt bila biçit li nav sera çîyayê Bota li gel pîremêr û pîrejinên wan baxivî, nexasim desteka şivan û gavana.

3- Çend tîp hene hindek ji Kurda wan tîpa bikartînin, û

hindek bikartînin, min ew tîp bikaranîne, çunkî piranîya van gotina min ji bo wan kom kirne, şêwên wan tîpa bikartînin, wek tîpa:

4- Tîpa "e" Çaxê dibêjin; "Elo Elo were milê babê xwe." Yan `êl, me`ne, `ewil.. hwd..Me gelek cara ev () bi kar ne anîye.

Eve jî min kir çunkî ez ne çar bîm saxlemîtiya li wan gotina de bikim ka min çawa sehkirne, ez welê binvîsim.

B- Hîvîdar im, ji xwendewarên Kurd ku xwe gelek tengav nekin gava li vê reşbeleka min da hindek peyv dîtîn ku li ezmanê bîyanîya da jî ew peyv bikartên, bêjin bo çî peyvên bîyanî dane bikaranîn? Çunkî daxwaza min ewe gava ev reşbeleka min bêt xwendin li nav desteka şivan û gavana da ewên ne xwendewar bi xwe tê bigehin ne hewcey çî seyda bin, wek Cigerxwîn dibêjit:

*" Eger kurdî bixwînî bi renc û bigiranî
Bê qeyd û şerh û haşî cahil bi xwe dizanin"*

Eve ji layekê ve û ji layek dî ve ez dibêjim wan hevalên xwendewar ewên hinde xwe tengav dikin li ser peyveka hevpişkî li nav hezar peyvên xumalî da, gelî hevala tengavîya hewe wek wê gotina pêşîya çaxê dibêjin:

"Aş çûwe to pisyara çeççeçokê dikî!" Piştî vê jî ka qanîyên hewe hûn ji me ra dîyar bikin. Ev peyvên hevpişkî li navbera Kurda û hevtuxûyên wan da ne kurdî ne!

Ji wan peyvan wekî peyva "heq", "helal", "heram", "zehmet", "tenwîr" û ji bilî van jî çunkî em dibînin ka çawa ne xwendewarê hev behrê Kurda tê digehê welê ne xwendewarê Kurda jî tê digehin zêdetir ji vî qasî jî heta eger li danîna xwe ya yekem ne kurdî bin jî madem ne xwendewarên Kurda tê digehin em ê bêjin:

Ev peyvên he herdo millet bikar tînin bê ku em girêbidin bi êkê ji her duwa ve; çunkî em dibînin heta milletên jêk dût jî hindek millet hene herdu millet bikar tînin. Wek peyva "nû" li kurdî da û li îngilîzî da her êk mane ye. Aya bila êk ji her du mileta bihêlit, çunkî miletek dî jî wê peyvê bikar tînit!Ez

welê hizir dikim aqilvanek wenabêjit

Hîvîdar im, ji xwendewarên Kurd xwe tengav nekin gava hindek gotinên pêşîya li ser destekeka taybetî hat wek çaxê dibêjin:

"Mela gû tê eşa zû tê" yan wekî dibêjin:

"Mela her gotîye ehf û bê" yan jî wekî dibêjin

;

"ne dostê file û ne hespê qule." Yan çaxê dibêjin:

"Ji sed fila êk sere ew jî ker e." Û ji bilî van jî çunkî - wek min bûrandî - saxlemîtî li gotina da min çawa seh kirne ez welê binvîsim.

Hîvîya min ji xwendewarê Kurd ewe li ser min hesab nekit nezanîn, ku li gelek delîva da minê girêdayê bi çaxê bûrî ve çunkî girêdanek li navbeyna wan da heye...

C- her welê hîvî dikim ji xwendewarên Kurd gazinda nekin heke bibînin hindek ji wan kurte çêroka li cihek dî hatibîn çapkirin, çunkî bi rastî ev çêrok û serhatîyên min li ser gotinê dirêjkirî hemî ew in. Min ji devê ne xwendewara wergirtin...

D- Bi rastî min xwest ez bi kurtî jîna xwe bikim du berper li vê nivîsoka xwe da, belê min pê çênebî ji ber hindek tişta...

Dîmahîk ez hîvîdar im ji xwendewarên mezin û meherban ku arîkariya me teva bit û başî û çakî û her ewe piştevanê temam tişta bivê dikarit bikit û navê reşbeleka xwe min danî:

"Miştaxa Çîya ji Gotinên Pêşîya." Hîvîdar im, ku her xwendewarek barê dewara xwe bi dilê xwe dagirt!

13.01.1977

Du gêsni: 15.02.1978

Tov reşin: 16.04.1979

Zaxo

1979/5/3

Mele Mehmûd Dêrşewî

A

(1) Aş çuwe to pirsyara çeççeçokê dikî!

Ev gotina he tê gotin gava li malê da, yan li gundî da xemxwarinek mezin û zêde ji tiştên kêr û bê xêr bê kirin, û tiştên hêja û berketî li ber linga biçin û pirsyar lê neyêt kirin, wê bê gotin: "Aş çuwe to pirsyara çeççeçoyê dikî!" Dibêjin: Carek êkê li Mekehê pirsyara mala qazî kir. Xweyê xêrekê mala wî nîşê kir, çaxê çû li ba qazî; qazî pirsyar jê kir: Te xêr e? Got: Qazî xweş bit, ez li Ahrama da û li Mekehê da min mêşek reş kuştîye ka cezayê min çî ye? Belê qazî hind ecîb mayî ma got: Baş e cenabê te xelkê kûdê ye?! Got: Ez Îraqî me, qazî got: Ji kî rexê Îraqê? Got: Ji xara Îraqê, qazî got: Nekû xelkê Kerbelayî? Got: Belê, qazî got: De rabe derkeve hêj min devê xwe li te nevekirî, pirsyara xwîna mêşa reş dikî?! Belê pirsyara xwîna neviyê pêxemberê Xudê nakî!! De rabe derkeve hêj zû, hey ne ez ê wê li te bikim tu hêdî rê bidergehî nebî.

(2) Agirî girte mala derewîna kesê bawer ne kir.

Bê guman e derew tişteke gelek pîs û zerarak mezin jê peyda dibit û her cihê derew lê peyda bibit bi piranî ew cih wê wêran bibit; çunkî bîr û bawer li nav parçên wê komkê da namînit, ji bilî wî qasî mirovê virker derewîn biha û rûmet jê ra namînit.

Dibêjin: Carekê mirovekê kolê xwe bir sûkê bifroşit bi bihayekê kêr. Pirsyar jê hat kirin: Çima vî kolê hinde hêja tu bi erzanî difroşî? Got: Çunkî derewîn e, êkê got koley "ma tu çend virkerî malwêrano?! Koley got: Ez salê vir û nîv dikim. Mirovekê got: Min to qebûl kirî bi vir û nîva te ve. Rabî bir malê û guhê wî ma li ser ka wê kengî vir û nîva

xwe bikit? Belê koley çî vir nekirin, heta meznê wî jê pişt rast bî bi temamî bawerî pê hat û kole bi xwe jî xweş xizmetçî bî. Heta carekê meznê wî çend girgire xwestin firavîne li nav baxekê da, gote kolê xwe "here xwarinê, ji me ra bine vêdê . Kole rabî çû mal, belê çawa giha malê kire qîr û hawar, şîn û girî, serê xwe da ber tep û mista : Wey baboo ez kovandarê meznê xwe me, xwezî ez mirbîma û min ev kes nedîtîya he ne dîtîbîya! Xatona wî lê derket: Te çî ye kuro? Kole got: Min çî ye?! Mezinê, min li ber siha dîwarê filan kesê rûniştîbî xarê, diwar bi serda hat perçiqand, mejî li guhê wî ra derket. Gava we got dinya li çavê xatonê tarî bî, ser û sîngê xwe da ber tep û mista pora xwe veçirand, xwelî li malê da çû bi zêrekê, bi xwe û zarokên xwe ve qesta wî dîwarî kirin. Kole bi şûnda zivirî bi bez û şîn û girî ve qesta meznê xwe kir wê dîkit hawar û fixan: Wey bavooo vê kes ne dîtîye?! Mezin hatin pêşîyê, kuro te xêr e? Kole got: Min çî xêr e? Xêr maye? Ulya te helweşîya xatona te bi zarokên xwe ve mane li binda. Gava we got meznî ji binê lînga kir qîrîn: Wey babooo ev çî ecêb bî?! Ser rot û pêxwas û bihin bizday qesta mal kir. Ewê dîkit qîrîn: Ez rebenê zarokên xwe me. Zarok wê dibêjin: Wey babo em kovandarê te ne. Kole dîkit hawar: Ez kovandarê hewe cûna me heta nîva rê gihan êk meznî got: Babo elhemdolillah maden hon sax in bila mal hemî gorî hewe bibit. Ewa got: Wey babo vê carê jî to paristî gihay me û me to bi saxîtî dîsa dîtî?! Heta pêk hatin der, berê xwe danê tîqtîqa koley wê dikenit, her wekî tiştêk ne qewmî; meznî got: Kuro ev çî bî te ho kir mal bab wêrano?! Got: Ezbenî ev nîv derewa min bî.

Aha mirov holê berê xwe diditê derew bela û nexweşîya bi ser mal û mirova da tînit ji lewma hatîye gotin "Agirî girte mala derewînî kesê bawer nekir." Çunkî baweriya kesê pê nayêt...

(3) Aqlê sivik barê giran.

Ez welê hizir dikim ev gotina he ji wî qasî rûhintire axivtin li ser bêt kirin.

(4) Ava xurta serervaz jî diçit.

(5) Ahên vî destî namînin li vî destî.

(6) Aqlê kurî bi teyra ra firî.

Bê guman e mirovê xurt ne wek mirovê pîremêr û serhatîye, ku kûr binêrit û dûr binêrit, çunkî xwîna wî germ e ageh ji dinê nîne ji bilî wê gava têda, li ba wî dinya hemî li bin sima hespa wî daye û mirov hemî li gustîlka wî danîn, hêdî nikarî hizrên xwe kûr bikit, vêca wê hindek pêngava bavêjit ku ser û ser li tehtekê bikevit ji lewma hatîye gotin:

(7) Aqlê kurî se tê birî.

Û ne ji xweda hatîye gotin: "Serê xwe her bide dîwarên kevn" yanî pirsyarker be ji mirovên pîremêr û serhatî.

(8) Aqil tacek zêrîne belê li serê hemî kesê nîn e.

(9) Agrî girte mala êkê şewitî yê dî digot: To xudê ne vemirîne da kewên xwe bibrêjim!

Ev gotina he tê gotin li çaxê mirovek bikevit tengavîyek mezin da yan xusaretek qebe da û êk dî bêt li ser halê wî ra û li ser xusareta wî ra bêjit: Ka bo min filan karî bike- karek kê m û bê xêr- wê jê ra bêjit: "Eve ye li agirî girte mala êkê şewitî," yê dî got: To Xudê ne vemirîne da kewên xwe bibrêjim.

(10) Agrî girte mala êkê şewitî, got: Ne her ew tîr ji kêçana ra nema!

(11) Aşvanê aşê mîra bi xulame!

Yanî mirovên xurt û mezin heta bi dest û pê n wa jî bi çavên meznahîyê xelik berê xwe didinê.

(12) Asin qotê bê heqe.

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek îzayek û tengavîyek mezin bidit ber xwe û bê tiştek li ser bêjînga wî bikevit, wê bê gotin:" Asin gotê bê heq e." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin "pale pûş e."

(13) Astenga mezin li derê mala mirovî ye

Bê guman e, ku mala mirov yan gundê mirov pêtivêtir e bo xizmeta mirovî, çunkî mirov piranîya jî û jîyana xwe li nav wan da dibûrînit ji ber vê êkê mirov bivê-nevê ye li gel wan toşî, nexweşîyê û bela û têkvedanê bibit,. Vêca eger mirov ne jîr û jêhatî bit, ne zana û tê pir bit bê guman e dûmahîka mirov li gel wan dûmahîyek reş û xirabe û bi çi awa mirov nikarî xwe jê qurtal bikî. Çunkî kes nikarî bi tenêti bijît. Nexwe gelek rast e çaxê dibêjin: "Astenga mezin li derê mala mirovî ye.."

(14) Av li dora kêr û gunên wî jî geraye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ber çav nerm û tenabit piştî hingê hin kiryar û pîlan ji bin derkevin, mirov qet hizir nakit ew kiryar û pîlanên wî ne, nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Te got mirî tira nakin?!"

(15) Av li gola da bimînit wê genî bibit.

Bê guman e av bista jîyanê ye bo her tiştî çunkî wekî zîtirê piştê ye bo jîyanê. Belê çî gava av li cihê xwe da ma kar pê nehat kirin û nû nehat li ser wê genî dibit. Hêdî kêr tiştekê

nayêt. Vêca ev gotina he tê gotin gava li malê da yan li gundî da axiftin û behis û xeberên ne şêrîn binve binve bèn kirin û kes pirsyarê lê nekit wî çaxî wê bibit sebebê peqndinê her wekî gotinek heye dibêjin: Dîzik pir bit û agir xweş bit, wê biforit." Vêca gerek mezin û malxê malê nehêlin muşkule (problem) li nav malê da bimînin heyne paşê wê sergêjî çêbit ka çawa "eger av li gola da bimînit wê genî bit."

(16) Av ji Nêrwanê û feyde li Taqyanê!

Nêrwan û Taqyan du gund in. Li nav ruwa Silopîya li Kurdistanana Tirkîya û her du gund tuxûbên êk in. Avek boş li nav tuxûbê Nêrwanê derdikevit bo Taqyanê diçit gava te berê xwe dabîya Taqyanê te gund didît, ji ber dar û barê bax û bûstana û Nêrwan bi xwe jî laklaka wê ye ji têhna. Vêca ev gotin tê gotin. çaxê mirovek yan malek yan gundek nexweşî û kêferatî bibînin û berê zehmeta wa bo hindek dî biçit her wekî gelek cara çêbîye, wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Rezê Melkê nav yê min e û ber yê xelkê..."

(17) Agir bigrit rêlê ter û hişk wê pêkve bişewitin...

Bê guman e gava li malê da, yan li gundî da, yan li êlê da, destekek rabin bi îş û karên xirab û ne baş û pîs û vêca nexweşî û bela bo teva bêt, wê bêt gotin: "Agir bigrit rêlê ter û hişk wê pêkve bişewitin." Her wekî Xudê - pak û paqijbit - ferman dikit: "واتقوا فتنه لاتصبن الذين ظلموا منكم خاصة..."

Ji ber vê êkê karbistên wî - men`a pîs û xerab bikin ji pîsîtiya wan, da nexweşî û tengavî li ser hemya da ne yêt..

(18) Agrî bi darên hûr hilke...

Bê guman li her dem û gava desteka lawa û xurta li pêşîya îş û karanin, heta hawarçî jî gava hawar dikit dibêjit : "He

law..." Vêca eger mirovekî xwest bi karekê rabit divîya pişta xwe bi pîra girênedît, çunkî pîr davdoz in belê xurt xwîn germ in, wek kela nîskê ne zû difûrin xweyê wê seeta têdane, tişta ji wan ra bê gotin zû bi serê wan dikevit sernermin, vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek bixwazit bi karek mezin rabit wê jêra bê gotin: "Agrî bi darên hûr û hilke" çunkî darên hûr pejink "tîrrk" agir zû pê dikevit. Belê ev agirê he heke darê stûr li ser nebit xwe nagirit ji lewma hatîye gotin:

(19) Agir li qurma dimînit..

Ew agirê gurm li ser nebit xwe negirit wê zû bivemirit; ji ber vê êkê hatîye gotin: "Gêre bi golika nabit" belkî - bi kêmahî- bingêre divêt gayê pîr bit heta golik xwe pê bigrit..

(20) Axa kendala dibit taze hîya mala..

Bê guman ax êk ji wan tiştên pir û mişe ye çunkî to bi kûve biçî tê li ser axê bi rêve biçî! Vêca ev axa hinde gelek û zehif li ber linga diçit gava xem jê xwarin û hat ket li malê, bêgumane wê bibit rewş û taze hîya malê çunkî xem jê hat xwarin, pa vêca eger tiştên berketî û hêja xem jê bê xwarin wê çend bi nav û deng bit!..

(21) Aşê nezana Xudê digerînit...

(22) Asteng bê derece nabin.

Ev gotina he tê gotin gava li ser mirovekê da yan malekê da yan gundekê da tengavîyek mezin bê, welê bèn ku hêdî ne ber hîvîyê firehîyê bin jê qurtal bibin bê hîvî bibin wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Ervazî bê nişûvî nînin."

B

(23) Bê himhim çênabit!

Binyata vê gotinê, dibêjin carekê mirovekê got: "Rêncberîyek heye dibêjinê nan û zik - yanî karê û zik êkê bikit li ser nanê zikê xwe- çima ez naçim rêncberîyê ji Xudê ra nakim hema bila ew jî nanê zikê min bidit min! Tiştek dî min jê navêt, rabî çû paşîya şikeftê da û dûr avahî û tarî û dest bi nivêja kir. Rojekê duwa ma tiştek jê ra nehat, birsî bi zik ma bi piştê ve, gav lê sist bîn, çav lê tarî bîn, li nîva rojê stêr lê bîn xelek, ket hizir û mitala ka ez çi bikim? Ez ji nêza (birsî) mirim! Li wa hizra da dengê karwanekê li deryê şikeftê sehkir, hema xwe li paşîya çikeftê mitkir. Karwanî hatin li deryê şikeftê danîn. Firavîna xwe xwarin, ji bermayê xwe lêk dan, êkê got: " De jê bigere em gihan mal, belê serkarwançî got: "Ne. Nanê xwe ne hêlin, zad xweş hevale."

Rêncberê me yê bi nan û zik li paşîya şikeftê berê xwe daye wê xwarina xwe bibin. Li dilê wxe da got: Pa bi Xudê ew biçin û ez holê bimînim, ez ê ji nêza bimrin! Rabî li paşîya şikeftê pêjin ji xwe anî û got: "Ihim ihm!" Ekê ji karwanîya got : Kuro ew kî ye li paşîya vê şikeftê û to çi dikî li wêdê?! Ewî got: Ezbenî ez feqîrek im. Karwanî got: De bila bi xêra hewe bit wê çend xwarinê bidnê. Zadê xwe xwar û da xwe û rabî û ji xwe ra got: "Bê him him çênabit." çunkî "nanê nekara nîne." Wê hêj axivtin li vê babetê bêt kirin li tîpa "H."

(24) Berê havînê bavêje kulînê

Bê guman hizirkirina paşrojê tiştek bivê-nevê ye nesaxim ji alîyê embûriyê ve, çunkî ew mirovê bê hizir bit ew bê kêre û rojek wê bi ser da bêt ,ew xwe bi her du dest û linga qurtal nekit. Divîya mirov ne wek wê gotina pêşîya bit çaxê dibêjin:"Hingî heye şilk û milk dema xilasbî keser û kulik" belkî divêt mirov wek wê gotina kevin çaxê tê gotin: "Dira-

vê spî bo roja reş baş e."

(25) Birayek dîn û êk hişyar dan mûyekê neqe tandin!

Binêre li gotina (210)

(26) Bi fîta Hesnê Hewêrî

Hewêrî babkekin ji Ezîdîya, binciha wan li quntara çîyayê Spî li Zaxoka Behdîna, meznê wan li çaxekê Hesin bî, dibêjin: Hesin mirovekî dinyayî bî û bi têbîr bî binyata vê gotinê dibêjin carekê Hesnê Hewêrî li koçka xwe da rûnişti bî, birek miorvên wî li dorê rûniştine û şevbûrka xwe dikin. Dinya zivistan e. Ba û bahoz e, mû ji mara vedikit. Li ber tifika-koçka - agirî lertzînok girgirank mirova digirin û bernadin, Hesin ji tinaze ve -tirane- got: Çi kesê îşev ji der ve bisekinî heta ez sê fîta bidim ez ê keça xwe lê mehir bikim. Êkê ji wan xurtên mejî - eqil û sivik xilxilok û bê hîvî ji jinanîne got: Ez ê bisekinim. Rabî çû ji der ve li ber wê sir û seqemê. Birekê ma ji der ve Hesin got: "Fît" fitek veda. Xurto got eve êk, demek dî pê ve ne çû dîsa Hesin got: "Fît." Xurto got: Eve dudu û ma... Koçk feşkilî her kes çû mala xwe; bî çaxê xewê Hesin jî rabî da biçit li ser cihê xwe, xurto got: Hesno pa te fîta sisê neda? Hesin law fîta mine û ez bi keyfa xwe me nihû ez didim yan Deh sal dî yan qet û qet ez nadin! Vêca ev bî pê gotin çî gava êk sozekê yan gotinekê bi êkê ra bidit û ber hîvî bikit û paşê piştta xwe biditê, ne bê hîvî bikit û ne pêk binit, wê bê gotin: "Bî fîta Hesnê Hewêrî" wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(27) Bî dîzka Behlûl.

Binyata vê gotinê dibêjin mirovekê got êkê: Heke to îşev li vê gola avê da bimînî heta siharê ez ê keça xwe bidim te; belê bi şertê to neçî li ber çî agira û çî agira jî ne înfî ber xwe.

Mêrik li gola avê da ma. Ji nîva şevê pêda av lê bî qeşa û qerisî. Roja paşî heta nêzîkî nîvro bi kotekî jê derket; piştî hat der got babê keçê: "De vêca keça xwe li min mehir bike." Babê keçê got: Baş e, belê tê sond bixûy to şevê dî ne çûyî li ber çi agira û yan çi agir te ne anîne li ba xwe? Mêrikê li golê da sond xwar ez şevê dî ji gola avê da derneketime û min çi agir jî nanîne li ba xwe û te bi xwe dît çawa ew av li min bibî qeşa heta nêzîkî nîvro. Min ne karî ez jê derkevim! Bavê keçê got: De sond bixwe te şevê dî agir bi çavê xwe ne dîtûye? Mêrik sond xwar min şevê dî agir bi çavê xwe ne dîtûye, ji bilî agrê şivana li quntara çîyayî bi qonaxekê ji min dût. Babê keçê got: Ez qebûlnakim to bi wî agirî germ dibî. Mêrik got: Em ê rabin li ba Behlul şerî et, çaxê çûn doza xwe gotin; Behlul got: Ez ê firavînê ji hewe ra çêkim, firavîna xwe bixwim paşî ez ê doza hewe safî bikim. Behlul rabî dîzik danî li ser devê rojnê -rojin ew kuna li ser banî ye li semta tifika agirî, çunkî berê sope pirêmez nebîn agir li tifkê da xweş kir, rûniştin xwarê - paşê çendekê babê keçikê got: Li me dereng e, em ê rabin. Behlul got: Bila firavîn çêbit paşî. Û dîsa xwe kerrkirin. Bî nêzîkî nîvro bavê keçikê got: Em ê rabin çaxê me nema! Behlul got: Heta hon firavînê nexwin hon ranabin. Bavê keçikê got: Pa ne em nîşanê firavînê nabînin? Behlul got: Belêê.. wa dîzik li ser devê rojnê ye û eve ez ê agirî xweş dikim, heta firavîn çêbît. Babê keçikê got : De mal ava xelik dibêjin behlul dîne, em dibêjin herê çima hon we dibêjin! Deka to bi Xuda dînatî ji vê mezintir heye? Dîzik li ser devê rojnê û agir li tifikê da wê ji me ra firavînê çêkit! Behlul got: Çima ma agir nexweş e? Babê keçê got: Tiredîno dîzik dût e agir têhnê lê nakit. Behlul got: Baş e, pa ya wijdan madem to dizanî agir têhnê li dîzika li ser banî nakit û hemî dîzik deh pîya ji agir ne dût e, pa şawa agirê şivana bi şevê têhîn daye mirovê li gola avê û qonaxekê jê dût? De rabe here keça xwe bidê heyne ez ê senî menîya bi serê te bînim.

(28) Barê hêceta kes nikarit rast bikit.

Teşe bike li gotina (252) ê!

(29) Bî mesela xal û xuharzî.

Mesela xal û huarzî; dibêjin carekê xal çû aşê xuharzîyê xwe, dema çavên wan bi êk ketin, xalê li dil, xwe da got: Eve aşê xuharzîyê min e û ew aşvanê wê arvanê min bê miz bihêrit. Xuharzî li dilê xwe da got: Eve xalê min hat aşî wê mizek zêde bidit min û em ê têr kurora ji arvanê wî bixûn.

Vêca ev gotin tê gotin li çaxê du mirov her êk ber hîvî bit ji yê dî bixût wê bê gotin: "Bî mesela xal û xuharzî."

(30) Bî nivîştîya melê.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê kurê pîrejinekê her şev bi xwe ve dimîst. Pîrejin çû li ba melê got: Seyda li bextê te to nivîştîyekê ji kurê min ra çêke ka bela mîzê wî ji min venabit. Bila bi xêra te bit; melê got: Li ser çava, şeva paşî piştî melê nivîştî çêkirî kurkî rît bi xwe ve.

Vêca ev bî pê gotin çî gava êk çara kêmahîyekê bikit piştî wê çarekirinê xirabtir bibit wê bê gotin: "Bî nivîştîya melê."

(31) Berû ya ji ber qelpuçka xwe dere!

Bê guman e gelek cara hindêk reng mirov hene gava rû ji wan ra çêbî wê zû ji ser xwe çûn û binyata xwe ji bîr kirin bi xwe hêdî babê xwe nasnakin. Nexasim heke babê wî piçek belengaz bit, yan binyata wî ne hinde li pêş bit li çaxê xwe da.

Carekê li va nêzîka, yanî li dora 1925 ê mirovek jina wî bi zarokê mir û zarok ma sax. Babê belengaz ji wê jinê pê ve kesê xwe nebî. Tifal ma li desta da û xweyî kir, belê bi çî halî xweyî kir? Bi halê sa! Hingê êkê didît ew kur wê li ber singa ye li derê wê malê û mala dî heta çîrek şîr bi desta diket bo kurê wî, bi vî awayî heta kur fêhma bî rêkir dibistanê - medresê- û kurê senewî xilaskir; bab, wî got: Kurê min

here xwe binivîse serbaz- esker- kur çû eskerîyê, babê nehîşt derkevê, kur ma têda heta bî (Nayîp zabit) li vî demî hemîyê babê rencberî dikir û pare ji kurê xwe ra rêdikir. Bab pîr bî hêdî ne karî kargerîyê bikir; kurê jî pare jê ra rê ne dikir, gelek şepirze bî. Rabî qesta kurê xwe kir - kurê wî li Mosil bî û ez dizanim ka li kîjan "fewcê" bî û karê wî çi bî? - heta çû li ber deryê (mueskerî) inzîbat pirsyar jê kirin: Te çî ye mam? Got: Min divêt ez filan kesê bibînim. Behsa kurê xwe rabîn birin, çaxê kurê bab dît bi regekê ne mirovatîli gel babê xwe axivt; zabit pirsyar jê kirin: Ev çîyê te ye? Got ev xulamê babê min e - li xwe negirt bêjît ev babê min e Çunkî bab jar û belengaz bî. Babê çawa gotina wî sehkir, dinya li çavê wî tarî bî. Bûrîyên wî hemî hat li ber çava ka bi çi halî xweyî kirye û çawa jî û jîyana xwe hemî danî li ser jîyana wî! Ev hemî li bîst xebera da hat li ber çavên wî, ho li kurê xwe zivirî û got: Kuro pêtote ez xulamê babê te me? Kurê got: E, babê devê xwe tijî tiv kir û avêt ser û çavên wî û li xwe zivirî berê xwe da Amir Fewcî û gotê: Bawer bike kurê min e û jîyana xwe hemî ji Amir Fewcî ra gêra û riya xwe girt û çû qesta kolkê xwe bi wî ser û dilî ve. Ez welê hizir dikim gelek piştî hingê nema çû li ber rehma Xudê ef û azad bikir. Tola wî li bin dinyayê jî ji kurê wî bistînit her wekî li ser dinyayê jê standî, çunkî wekî min sehkirî Amir Fewc gelek bi gotina wî êşîha - heta girî - û dumahîk gazî kurê kir û (meclis Eskerî) li ser girêda û (terd) kir.

Vêca ev gotina he tê gotin gava êk wek vî (xweş xurtê me) ne xwazit kurê babê xwe bit û li xwe ne girît ji binyata xwe bit wê bê gotin. "Berû ya ji ber qelpûçka xwe dere.."

(32) Bi desta bide û bi linga pê bikeve!

Ev gotina he tê gotin gava êk qencîyek bi êkê ra bikir bi deynekê yan qerekê û paşî ew derkevit nexweş mirov û piştî xwe bidit xweyê qencîyê, wê bê gotin: Eve ye; " bi desta bide û bi linga pê bikeve!"

(33) Bi golkînî hatîye tirsandin.

Binyata vê gotinê dibêjin êk ji mêrikên Kurda adetê wî bî her sal li çaxê biharê rojek xas kiri bî bo şere ga. Dinya bî bihar ew roj hat hingî gayên li bajêr da heyîn komkirin û du du berdan êk ,belê gayekê karî hemîya û zora teva bir û revandin. Mîr got kuro ev çi ga neman vî gayê he birevînin? Tevan gotin: Ne xêr ga neman. Mirovekê got: Mîrim min gayek lahor û lawaz maye û gelek pîr û bê çare ye. Mîr got: De herin wî jî bînin. Gava çûn lahor anîn û lahor hat meydanê û çavên wî bi wî gayê boxe ket, hema ji cih kûr vekirê û rahêlayê wî gayê boxe bazda û lahor ket li ser piştê da, heta ji wara rateqand! Mîr got: Ev çi ecêb e, çawa ev gayê boxe ji ber vî lahorê lawaz direvit? Pa ne heke li xwe ziviribûya û li gel yek boç lêdabîya wê li cih da kuştibîya! Xweyê lahorî got: Mîrê min lahorê min ew " bi golkînî tirsandî ye." Vêca ev bî pê got gava êk bidit li ser êkê û bê çare bikit û ewê dî li xwe nezivirit û bersiva wî bidit, ew li ber çav ji yê dî xurtire wê bê gotin; " bi golkînî hatîye tirsandin."

(34) Bo çî ne heqe xwe li ser kefa destê xwe dibînit?!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovekê deynek ji êkê kir û pišta xwe dayê hindî xweyî çû xwest wî hêcet girtin. Dûmahîkê xweyê deyn got: Eve çî ye? An bêje deynê te nadim, yan jî taze bide da ez bes bêm biçim tena bibim. Deyndarî got: Çawa ez nadim? Te qencî li gel min kirîye, ez qencîya te çi cara ji bîr nakim. Belê bêhna xwe fireh bike; vê gavê dinya zivistane bila bibit bihar, pezê koçera biçit zozana wê qelew bibit hirya wî /wê dirêj bibit, demê pahîzê koçer ji jûr da hatin xarê li deştê pezê herit li nav xirnîfa bigerit hirya wî/ wê bimînit bi xirnîfa ve jinka min wê biçit wê hirye ji xirnîfa vekit û bişût û birêsit, bikit berr û mehfûr, ez

ê wan berr û mehfûra bifroşim û paşê to neqelqe heta to qurşê paşî wergirî. Çaxê we got xweyê deynî ji tengavîya xwe kir tîq tîq kenî dilê xwe xirab kir. Deyndarî got: "Bo çî nekenit heqê xwe li ser kefa destê xwe dibînit! Vêca ev bî pê gotin gava êk êkê dilxweş bikit bi xeyala û nefelê jê ra bînit li çokê û çar bost berf li erdê ne, ew ê dî pê bikenit: Xweyê xweşkirinê tinazê xwe pê bikit wê bêjit: "Bo çî ne heqê xwe li ser kefa destê xwe dibînit!"

(35) Behir bi devê sey nalewitit.

Ev gotina he tê gotin gava li malê da yan li gundekê da mirovek baş, zîrek, kêrhatî û zana hebit belê hindex xirab û pîs û bêtûne bela xwe jê ve nekin û behsê wî bi xirabî û ne başî bikin. Wê bê gotin: "Behir bi devê sey nalewitit." Yanî mirovên baş û hêja bi avêtina pîsa nepak nabin.

(36) Behra şîne û av tê nîn e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek zirtker bit û bi xwe jî êk car ne tiştek bit; wê bê gotin: "Behra şîne û av tê nîn e." Yanî wekî leylana li binê beruyê ji dûrve mirov dibêjit qey ave gava mirov nêzîk bî tiştekê li wê dê nabînit, ev mirovê holê heçî nasnekit wê bêjit ka çî şêrgele! Belê gava naskir wê bizanît ku ji axivtinê pê ve tiştek dî nîne.

(37) Bi rojê ronahîye li ber min ne êx e.

Bê guman e, ku gund û êl û millet hene da arîkarî êk bikin û li xêra hevda bin. Gava êk kete li tengavîyekê da yên dî tev arîkarîya wî bikin. Vêca ev gotina he tê gotin li demê mirovek li tengavîya xwe li mirovên xwe ne yê pês û xwe ji wan dûr bigrit, belê gava li wan bî firehî vêca ji nû wê çû ezman hilîfî û dev nermî ji wan ra kirin: Ez hazirim...û ew bi xwe êdî ne hewceyê wî ne; wê bê gotin: "Bi rojê ronahîye li ber min ne êx e."

(38) Bostek bê xemî gezek xusaret e.

Bê guman her mirovekê çend salên bi jimare li jîyê xwe da hene; û li hemî jîyê xwe da ka carekê yan du cara firset jê ra tê yan ne; bivê-nevê ye, ku venandî bit li ber firseta xwe da dema firseta wî hat ew sistahîyê nekit, çunkî ew ne karê mirova ne ku xemsarîyê li firseta xwe da bikit, heta ji desta derkevit. Her wekî Meleyê Cizîrî dibêjît:

*Tal`î ku bête firset muhlet li nik herame
Min umrê Nohî nîne saqî were bilez xweş
Her welê Cigerxwîn jî dibêjît:
Eger dem dî ji bo min yek du firset
ku firset bê herame jêra muhlet
Ne raste em hemî bimrin bizillet
şev û roja seraser ev sîtem tê
Nebî bawer bikî ku nahesim pê.*

Vêca ew gotina he tê gotin gava mirovek firset jê ra hilkeft, belê xemsarîyê bikit heta ew firset ji desta derkevit vêca ji nûka qurta li gewrîya xwe bidit!

Wê jê ra bê gotin: "Bostek bê xemî gezek xusaret e."

(39) Bertîl bera nerim dikit.

(40) Bê ziravo û emir dirêjo.

(41) Biçit li ser kanîyê wê zuwa bibit.

(42) Birayê ne ji makê nabit pîsê mêlakê.

(43) Bira bira ye bazar cuda ye.

(44) Bî mêvanîya quling û rûvî.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê quling û rûvî bîn dostên êk. Rojekê rûvî got qulingî: Mal ava em hevqas dostên êkin êkê ji me her duka carekê dostê xwe ne bir li ba xwe bi mêvanî! Vêca sibehê me firavînek xweş heye divîya to keremkî mala me firavînê. Quling got: Li ser çava. Roja paşî quling çû li ba rûvî. Nîvro firavîn anî. Belê firavîn çî firavîne! Hewdelek rûhin bi kotekî xwe li firaxa -amana- kûr da digrit! Rûvî ew hewdel vala kir li ser berekê hulî û serjêr û gote qulingî: Keremke dostê hêja firavîna xwe bixwe, du car niklê xwe li wê tehta hişik û hola da mejî lê reş bî, serî lê arha, xwe da paş. Rûvî got: De ka bixwe, te nexwar? Quling got: Ma ez ê şerm bikim? Min têr xwar û min gelek xwar. Rûvî her carekê wê ezmanê xwe li bin bidit wê mirçênî ji devê xwe bînit û wê bêjit: Heh pa ev hewdela he xweş e û ji xwe da diçit xwarê! Bi vî awayî heta hewdela xwe xilaskir, dev û lêvên xwe jî alistin. Quling got: Firavkna sibe li ba me ye. Rûvî got: Li ser çava. Roja paştir rûvî çû li ser firavînê. Quling firavîn anî, belê pa çawa anî? Kulmek-mistek- noka wê berdane li binê meqewrk-kulindokê avê- gewrî dirêj da û danî li navbeyna xwe û rûvî da û gotê: Keremke mam rûvî. Rûvî hindî hat û çû devê wî negiha binê meqewr livek noka jê derînit û tam bikit. Quling her car wê niklê xwe binê meqewr bidit wê livek nok jê derxit û bêjit;" pa çawan e tama wan noka pa ne gelek xweş in?" Rûvî her neqil wê milê xwe bihejînit.

Vêca ev gotina he tê gotin gava du mirov bi serve serve dostên êk bin, belê her êk li ber ya xwe bit û agah ji dostê xwe nebit wê bê gotin dostahîya wan " bi mêvanîya quling û rûvî."

(45) Bî kulîlka li derê kanîyê!

Binyata vê gotinê dibêjin mirovekê du keç hebîn, gote keça xwe ya mezin; "here cerek av bîne." Keç rabî çû li ser kehnîyê berê xwe daye kulîlkek wa li ser devê kehnîyê hişîn biye, hema rûnişt û ket hizir, mitale û got: Babê min wê min

bidit şû ez ê kurekê bînim, kurê min dê mezin bibit; wê bê li ser kanîyê û çavên wî bi vê kulîlkê bikevit wê bi vê biçit da ji xwe ra bînit. Belê wê bikevit li kehnîyê da wê bixeniqit: Wey babooo ez rebena kurê xwe me û danî ser û singê xwe, bi tep û bista û pora xwe vegizgizand û veçirand!! Bab hingê ma...keç nehat. Got keça xwe ya dî: Ka rabe bi xuha xwe ve here eve nehat! Rabî çû çaxê giha li ser avê berê xwe dayê xuha wê wa li ser û singê xwe didit û axa bi serê xwe da dikit! Gotê; te xêr e? Çi li te qewimîye to ho dikî xuşka min? Xuşkê çîroka xwe û ya kurê xwe yê hizra jê ra got. Hema wê jî wek xuha xwe ser û singê xwe da ber tep û kulma: Ez rebena xuharziyê xwe me de bila xaleta te mirbiya, kor bibîya ho li te nehatibîya!! Bab ma..Ekê her du keça dîyar nebî. Rabî ew bi xwe çû çawa çû giha wêdê berê xwe dayê hema her du keçên wê pora xwe vediçirin! Pirsyar ji wan kir: Hewe çî ye babo? Keça çîroka xwe jê ra gotin. Babê rahişt berçîtekê û ket li ber laşê wan heta birin malê.

Vêca ev gotin tê gotin çaxê mirovek xem û mereqa ji xwe ra çêkit bi hizir û mitala wê bê gotin: "Bî kulîlka derê kehnîyê!" Wekî vê gotinê ye - belê li dil xweşiyê da - çaxê dibêjin: "Elo Elo were milê babê xwe!" Binyata vê gotinê jî dibêjin carekê belengazek hebî, xwarna wî ji kîs çaka bî rojekê êkê hêkek dayê, wî jî hêka xwe bir û bi rê veket hizrên xweş, ji xwe ra got: Ez vê hêkê naxwim, ez ê bibim bêxim li bin mirîşka cîranê xwe da wa bîye qup - kurk - hêka min wê bibit mamirk û wê paşî hêka bikit û ez hêkên wê naxwim heta ew jî bibit qup, ez ê hêkên wê bêxim li bin da wê hemîya derînit wê bibin gelek, ez ê dîka bifrûşim û mirîşka bihêlim, paşî ew mirîşk jî wê hêka bikin û bibin qup. Ez ê her dîka bifrûşim mirîşka xweyî bikim heta min pare hebin ez ê pezî bikrim û ew pez wê bizêt. Ez ê berx û rûn û hirya wî bifrûşim. Ez ê zengîn bibim. Ez ê ji xwe ra erdê bikrim, ulya çêkim, wê axa û maqûl û girgire qesta koşka min bikin. Wê hîvîya ji min bikin, heta ez bibim zavayê wan, belê ez ê keça filan axayî ji xwe ra bînim,. Wê kurkê ji min ra bînit, gava li ber mil bî ez ê bêjim: "Elo Elo were milê babê xwe!"

Bi wê gotinê ra her du destên xwe vekirin û dirêjkirin - hêka wî ji desta ket û şikest - Vêca gelek mirov jîyana xwe ne avêjit li ser hizir û xiyala ewê jîyana xwe bavêjit li ser hizir û mitala û xeyal û xwezîya bêgumane wê bişepit, çunkî wekî dibêjin: "Tovê xwezîyê çandin lahewle wela li şûnê hişîn bî."(2)

(46) Belayê newe newe, dema to hatî li ser sera û li ser her du çava.

Ev gotina he tê gotin li çaxê mirovek ji ber bela û teşqela birevit û xwe biparêzit, belê hingî bikit û nekit ji bela û belakira qurtal nebit, wê bêjit: Eve ye "belayê newe newe dema to hatî li ser sera û li ser her du çava." Yanî min bela navêt, belê heke bela ji min venebit ez jî xweyê wê me.

(47) Berê giran li cihê xwe da "giran e" gava qe liqî ne bi du pera ne.

Yanî çî mal bit, yan gund bit yan êl bit hingê biha û giranî jê ra heye hingî li cihê xwe da bit û li ser şûn û warê xwe bit belê gava mişext bî û bi kolana ket û bî jarê li berê gundê xelkê bihayê wî namînit.

(48) Bexê nêr her bo kêrê ye!

(49) Berf fi`la xwe nahêlit.

Yanî mirovê tebiêtê wî bi awakê bit, ew wî tebiêtê nahêlit, ka çawa berf sarîtîya xwe nahêlit! Li hemî çaxê salê da her wekî gotinek heye dibêjin: "Qûna elimî tira û devê elimî vira çênabit heta kure kura" û axivtin li vê babetê wê bê kirin li tîpa (D) heke Xudê hez bikit.

(50) Bi xatrê xatira xelk diçin li ser dînê kafira!

(51) Ber ji besta xilas nabin.

Yanî binemala bi xwendan û rêber, wê kurên hêja û zana jê derkevin, wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin "şêr ji bîşîya xilas nabin."

(52) Bêş hat li ser maldara avêtin li ser feqîr û jara.

(53) Ber li serî yan ser li berî her serî wê bişkêt.

(54) Bilûla li ber ga ye!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek zana li ber êkê da rûnit xarê her şîreta lê bikit, belê ew ê dî pûtê pê nekit û her kar ji wa şîreta nebînit, wê bê gotin: "Bilûla li ber gaye!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Çira li ber kora ye."

(55) Ba çawa tê benderê welê bide bayê..

Yanî gava karek te kete li ber te çawa keysê te jê tê bi wê awayî rahêlê, çunkî hemî gava keysê mirova ji karê wan neyên.

(56) Berek dirav yan barek derew!

Ev gotina he bi mirova didit zanîn heta mirov bikaribit li nav wê komka ku li nav da dijît taze bibûrînit, divîya mirovî malek pir hebit da deh çakîya bi deha ra bikit, yan jî ezmanek xweş û şîrîn hebit xelkê ji xwe ne direvînit û kûvî nekit, wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Yan nanê te genim, yan zarê te genim."

(57) Belê çavên reş û belek min ji te ra kildane!

Ev gotina he tê gotin li gava mirovek tişteke xas (taybetî) ji xwe ra bikit, êk dî biçit xwe lê bînit pêş, ew ê dî wê bêjît: "Belê çavên reş û belek min ji te ra kildane!"

(58) Bar naçit li ber kerî ker diçit li ber barî!

Ev gotina he tê gava karek asê bibit ji alekê ve û ji alek dî ve sanahî bit wê bê gotin: "Bar naçit li ber kerî, ker diçit li ber barî!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Çîya naçit derwêş diçit." Eve jî dibêjin carekê babederwêşek çû gundekê, dinya zivistan e, bostek erd reş dîyar nakit ji ber berfê, gundî bi xwe jî wê li pişt çîyakê da bi rojê hemîyê seetek tav lê nadit. Derwêş got gundîya: Çima hon vî çîyayî ji ber singê gundê xwe ranakin û nakin deşt? De hema hêşku hon tê rojê bibînin! Gundîyan gotin: Mal bab wêrano em ê çawa bikaribin vî çîyayê hinde mezin rakin?! Derwêş got: Tişteke ji rakirna vî çîyayî sanahîtir nîne, heke hewe bivêt! Vê zivistanê min xweyî bikin heta biharê dinya germ û nerm bibit, rê û rêbar vebin, ez ê bo hewe vî çîyayî ji vêdê rakim û li ber singê gundî bikim deşt. Gundîyên nezan û belengaz bawer kirin û derwêşê xwe wê zivistanê li ser dilê xwe xweyî kirin bi parîyên xweş...cihê germ û nerm heta zivistan bi dawayî hat. Gundîyan got: De rabe derwêşê delal eve çaxê te hat ku to bela vî çîyayî ji me vekî. Derwêş got: Li ser serê xwe, ha eha niho ez ê rakim û rabî li ser xwe û gundî tev ketin li dûf, ka derwêş wê çawa çîyayî rakit! Derwêş çû li ber çîyayî sekinî û gotê çîyawo here ji vêrê... Belê çîya ji cih nelivî hindî gote here çîya neqeliqî. Gundîyan got: Xilxiloko tê holê û bi vê gotinê vî zire çîyayî ji vêdê rakî? Derwêş got "çîya naçit derwêş diçit!"

(59) Bila mirov dîkê rojekê bit ne mirişka sê sala bit!

Bê guman ku bindestî û koletî pir nexwş e û qet tiştek nîne ku bivêt bi dîlî bijît. Çunkî mirovê jêrdest wekî mirîşka hêkere ji hindekara. Vêca bivê nevê ye mirov daxwaza mêranîyê bikit da ji bindestîyê derkevit û qurtal bibit heta eger wekî dîka bêt serjêkirin. çunkî serjêkirina bi dîkatî xweşiktir û tazetir e ji mana bi mirîşkatî..

(60) Bîye xûya hemî girara.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek mayê xwe li hemî kara bidit, wê bê gotin: "Bîye xûya hemî girara."

(61) Bi dizê sola - pêlava - xwe..

(62) Beqal wê difroşit tişta li ba hey...

(63) Bi xeberdana nerm mar ji kunê tê der.

(64) Bihar bi kulîlkê çênabit.

Ev gotina he tê gotin gava êk karek mezin û giran bidit dîyarkirin bi sanahî. Çunkî kore rîyek li ber çava dikevit, wek leylana li binê berûyê, yan stêra li nav ewrên şevên çille da ku gelek namînit dîsa ewr bi serda digrin û winda dikin. Vêca ew bi wê kore rêkê rabbit li ser hêl û pepana û nefelê bînit li çokê. Wê jê ra bê gotin: "Bihar bi kulîlkê çênabit."

(65) Bizin bizin e, mexelê xwe yê seetekê dest û pîyê xwe xweş dikit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xemsariyê û tembelîyê bikit û ji karê mala xwe birevit û ne kêr xwe û ne kêr kesê bêt wê jê ra bê gotin: "Bizin bizin e, mexelê xwe yê seetekê bi dest û pîyê xwe xweş dikit."

(66) Bi min xurto û li min xurto!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek mêranîya xwe û pehlewaniya xwe li ser wan bidit diyarkirin, ewên mêranîya wî her bi wa bit. Wê jêra bê gotin: "Bi min xurto û li min xurto."

(67) Borîya xurta zor bore lê bidî wê te bibit, lê nedî to mayî!

(68) Bî mala li malxweyê hermandinî.

(69) Biçit Bidlîs wê bê lîs.

(70) Bila çê bit, bila keça sê bit!

Bê guman e, ku mêr û jin ji her parçên millet nêzîktirî êkin, raçandina wan li gel êk wec û karên wan bi êk ra pêtîre ji ya hemî kesên dî. Vêca eger jin baş bit, xemxwe ra mal û mêrê xwe bit, ji gotina mêrê xwe dernekevit, parazkera şeref û namosa wî bit ewî çî jê ye ku keça kê ye? Rast e, hatiye gotin: "Dêhlên tirek jê çênabin seyên bejek." Belê ev gotina he li ser jinê bi xwe ye, ewa ji nijandê - unsurê - xwe pîs bit. Çunkî her wekî hatiye gotin: "Jina ne bijêre esil xêr e." Çenda hatiye gotin: "Jina bine ji mala da xuharzî bidin bi xala." Belê pa eger jinê binyata xwe hêla û xwe pêtûte kir - nexasim piştî ji mala babê xwe derket û çû - bab nikarit rast bikit, çunkî babê li mala xwe û ewa li mala mêrê xwe. Ka çawa eger jin xwe baş bikit bo mala xwe heskê bila bab çawa bit xirabîya wî zererê lê nakit, çunkî her êk wê li mala xwe, vêca eger jin (çê) bit heskî bila keça (sê) bit merî çî jê ye. Axiftin li ser jinê maye dê hêj axiftin li ser êt kirin bi arîkarîya Xudê li tîpa (J) da...

(71) Biyanî bidê goştîyê ranî wê li ser te da bêt pûşpanî..

Ez welê hizir dikim ev gotina he ji wî qasî rûntir e ku axaftin li ser bê kirin, belê pa em ê her piçekê li ser baxivîn, here berê xwe bide gotina ku dibêjin: "Xwelî li wî bit ew ê mirovê xwe bit bi yê bîyanî."

(72) Bizna bi şonda bimînit behra gure.

Bê guman e hey male, yan gunde, serketin û pêşketina wan li yekîti û hevgirtinî da ye li bin tevgîra rêberek zana û dilbêş û dilsojê xwe da bin. Ka çawa pez li binçav dêrîya şivanê xwe da tê û diçit. Vêca ev gotin tê gotin gava êk xwe ji kes û karên xwe varî bikit û serbixwe bijît, wê bê gotin: "Bizna bi şonda binînit behra gur e."

(73) Bê mêrekê neçe dîwana mîrekê.

Bê guman e tenêti buhayê mirov gelek kêr dicit. Çunkî ne rast e mirovek bikaribit bi tenêti bijît heta eger kar û barê jîyanê ji êkê ra pêk bên jî welê jî wê nekarbit bijît.

Eve wê baş bo me dîyar bibit gava em berê xwe bidin wê gotina kevin çaxê dibêjin: "Destê tenê naçit li ser xwarinê" çunkî mirovê bi tenê bê rûmet e, keskî bila şêr gel bit nikarit çî kiryara bikit, her wekî hatîye gotin: "Destê tenê deng jê nayêt." û heçî gava qesta cihekê bikit wê bi êkê bêt hesab kirin, belê heke bin dudu li wê gavê wê bi yazdeha bên hesab kirin, neku wê bi du yeka bin. Ka çawa gava to jimare (1) danî li ser kaxezê êke, belê heka te du yek danîn li ber tenîştê êk bi vî miqamî (11) wê bibin yazdeh neku du yekin. aha mirov jî wê welê bên hijmartin - û ji berê da hatîye gotin : "Teyr bi çenga difrin mêr bi mêra dixurin." Çunkî wekî dibêjin : "Hespê bi tenê tozê nakit."

(74) Bi minê minê dernakevit ji ber hukmê jinê.

Bê guman e, ku mirovê daxwaza tiştekan hêja û berketî bikit divêt xwe mêrxwaz û çeleng û jîr û jêhatî bikit, ne tirsînûk bê zirav bit, çunkî bi bê ziravî kes naghêt doza xwe. Her wekî Cigerxwîn li parçe şîrek xwe da dibêjit:

*"Xurto eger to rabî
Wek başûka herî çok
Ne wek şêr û gura bî
To nastînî jî min mok
Ne xurt şehreza bî
Bûkê didî bi totok
Ku bê tac û sera bî
Dê çawa min bikî bûk."*

Belkî divêt xwe pêk bînit bo gorî kirina doza xwe bi mêranî hey ne kes "bi min ê minê dernakevit ji ber hukmê dinê" heta bighêt hindek dî vêca..

(75) Bila şêr pišta mirov bişkênit ne rûvî devê
mirov balîsit!

Gelek mirov li rêka jiyana xwe da rîyek taze ji xwe ra bigrit, çenda ku nexweşî û tengavî bêne li pêşîya mirovî. Her welê hevalîya mirovên baş û jêhatî û merdemêr û mêrxas bikit, bila nequlî û ne rehetî bit. Neku hevalîya pîs pêtûta û bê kêra bikit êk car mirov jî bi wan ve pîs bibit û kûtî û merdal bibit. Yanî bila mirov jîyanek berz bijît li rêza piling û şêra û li gel wan bi ceng û şer bit, bila pišta mirov bişkênit neku mirov li jîyanek pîs û bindest da bit hevalê rûvîya û rûvî devê mirov balîsit, çunkî wekî hatîye gotin: "Tovî li jîna dibindesta merge qarun û haman bit."

Dibêjin carekê baz û qijak gihan êk qijakî gote bazî: Erê to çend sala jî -emîr- dikî? Bazî got: Bawerke kêma baz deh sala jî bikit, çunkî hingî to dibînî wê bi serê kêzim kelema ve ne li dûv nêçîra xwe ve. Qijakê got: mal ava ma ne heyfe to ev teyrê hinde ciwan û mêrxas, to xwe bidî kuştin, hêj dinya ne

dîtî bi ser parîyê zîkê xwe? De were bibe hevalê min ji xwe ra tena bibe da to bi rehetî bijî, ne bîst sala belkî bi kêmahî sed sala. Bazî got: De bi keyfa te ye. Qijakê got: De rabe da biçin taştê bixûn. Her du rabîn çûn li perê gundekê kerek mirrarbiyî û sa kavola wî dirandibî, qijakê got bazî: Keremke taştê bixwe. Bazî got: Ez vê gavê ne birsîme. Qijakê serê xwe xiste li ûr gûşê kerê da heta têr xwar derket û xwe dawêşand, gote bazî: Te çima tašta xwe ne xwar? Bazî got: Ez nikarim bixûm. Her du ketin li dûv êk û çûn. Bêhnek pêve çû bazî qebqeba kewa sehkir gote qijakê: Li vir be ez ê taştê ji xwe ra bînim û nihû bê, rabî çû berê xwe dayê refek kewa wê girtin pesarekê û wê diçêrin. Nêrekewek wê çûwe li ser berekê li bin hervistekê da û qebqeba wî ye. Bazî ji kerb û kîn xwe dadayê, kewî fişêna çengê kewî sehkir xwe avêt li bin hervistê da, bazî ser û ser xwe li nav guhê hervistê da singê wî li serê kêzmekê ket, serê kêzim li pişta wî ra da der û ma pêve. Qijak hat li ber sekinî û got: Mal wêran hewqa min gote te vî karî bihêle, ji xwe ra tena bibe, te guhê xwe ne da min, de ka bî çî? Û te çî ji xwe kir? Bazî got: "Destebira bila mirina li rêka taze da bit, ne jîyana li nav ûrê kuşê kerê mirrar da bit."

(76) Bila xudê yar bit, dinya hemî bila neyarbit!

(77) Bizna kol hîbi danîyên şor..

Ev gotin he tê gotin gava mirovek fêrî cihekê bî û hîyê xwe dayê û tam ji wê dê sehkir, hêdî bela xwe ji wê dê venekit û ber hîvî hêj bit wê bê gotin: " Bizna kol hîbî danîyên şor." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; "Hî kera hî nekin, paşî hûn ji xwe venakin!"

(78) Bûk li ser pişta hespê ye hej kes nizanit ka qismetê kîye!

(79) Bûk bi dilê zavê ye.

Ev gotina he tê gotin li çaxê mirovek ji xwe ra rêkekê yan bazarekê, yan hizrekê hilbijêrit, hindek dî bixwazin wî ji wan biguhurin ew ê bêjît: "Bûk bi dilê zavê ye û ya hewe çî ye?"

(80) Bi çav givaştinê....teng nabit.

Eger mirovekê xemsarî û bê xemî kir heta hevсарê wî ji destê wî derket, çû û bî rû reşê gundî û cîranê xwe û qebahata wî hind lê hat ku êdî vegirtina şikestekên wî nebit, ji nû pêve pare nakit xwe tengav bikit û xwe xemxwer bikit wekî wê keça paristina şerefa xwe nekit heta şerefa wê ji desta derkevit ji nû pêve çavên-ranên- xwe bigvêşit da quz lê teng bibit, pa " bi çav givaştinê teng nabit."

(81) Bi hêçeta kurkê dixut virkê!

(82) Bî çêleka Silowê mitirb..

Binyata vê gotinê dibêjin mirovek navê wî Silo bî, û Silo bi xwe begzade - Mitirbî - . Carekê êkê çêlek da Silo. Berê xwe da çêlê wa ji ûzra birhaye, ne cihê zan û şîr tê maye û ne cihê guşt tê maye. Silo rabî çêla xwe bir bajêr da bifroşit. Êkê hat pêşîya Silo: Mamê Silo ew çî çêlek e? Silo got: Ya firotinê ye. Got mamê Silo; Jîyê wê çend e? Got: Bawerke ez nizamim, eve to û eve çêl, ji xwe ra berê xwe bide devê wê. Mêrkê bikir berê xwe da devê çêlê got: Hooo mamê Silo çêleka te ji ûzra birhaye! Ew çû êk dî hat, bi wî awayî heta bî nîvro bîsta devê çêlê jêk vekir. Dûmahîkê çêl welê hî bî hingî êk hatibîya li ba Silo axiftbîya - Heskî bila behsê çî bîya. Hema çêlê devê xwe jêk vedikir, li nik wê ewe behsa wê ye ka jîyê wê çend e!

(83) Bî xesasiya sa.

Dibêjin carekê êkê xwe kir xesasê sa, yanî se dixesandin. Rabî bi gunda ket û se dixesandin û her seyek bi du çerxiya, belê du çerxî didan bi sabûn çerxiyek dida êkê li destê wî av dikir, yanî heta ji xesandina her seyekê xilas dibî sê çerxî li xwe didan. Wî bi xwe jî du çerxî distandin! Vêca ev bî pê gotin li ser her mirovê ku karekê bikit çûn ji hatinê pêtir bit û ji bilî ne paqijîya wî karî. Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Palê poş e."

(A) Bi bêhna fireh bê sûre dibit doşav

Bê guman divê mirov xemgîr bit û bêhn fireh bit li îş û karê xwe da, çunkî wekî dibêjin: "Xweyê sebrê dibit milkê Misrê." Vêca divîya mirov li ser doza xwe û daxwaza xwe bêhn fireh bit û nebêhn teng bit, belkî divêt wekî dibêjin: "pîr bike û ji bîr bike!"

C

(84) Car heye rew ji desthılanînê çêtir bit...

Bê guman e, ku hemî çaxê mirova ne yê mêrxasîyê ne, çunkî wekî dibêjin: "Te derbek danî û êk mezintir hılanî te kar nanî." Vêca gelek mirov berê xwe bidit jêhatina xwe, çunkî ne ji xwe da hatîye gotin : "Heye bêjî yarê dîya xwe yabo." Ne hemî çaxa mirov xweyê çûvê stûr bit belkî " cara heye rev ji dest hılanînê çêtir bit." Çunkî ji berê da hatîye gotin : "Destê nekarî gez bidî tê maçî bikî!"

(85) Cotyaro ewe çîye to diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî!

Ev gitina he tê gotin gava mirovek xeberdanekê bikit ji berî çaxê wê - De vêca gev bit yan zirt bit, yan pesn bit - û li beramberî wî jê qebûl nekit wê bêjit: Mal ava got; " Cotyaro ewe çî ye to diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî!"

(86) Cwan mişene, belê xwîn şîrîn kit kite ne...

(87) Cer bi riya avê ve dişkêt..

(88) Cuhî da te bibim bihiştê! Got: Ne îro şenbîye kêr nayê..

Ç

(A) Çavên zil li bin kayê da dîtin.

(B) Çolek bela vegêre.

(89) Çavê kêr neyê tilya xwe li bin bide û derîne..

Bê gumane, ku Xudê - pak û paqij bit- gelek hekîme ku her tiştek daniye li cihê wî da û bo wê dê çêkirye! Êk ji wan tiştan mirov e. Ev mirovê he daye dinyayê da di harîkarîya êk da û pêkve bijîn bi jîyanek serbilind û serfirazî bê bindest kirin û zordarî. Her welê her mirovek dest û guh û aqil dayîne da bikarbit feydê li xwe û hevalên xwe bikit, vêca heçî gava mirov welê hat ku ji xirabîya pêve kêr tiştek dî ne yê bivê-nevê ye mirovên dî nehêlin ew li nav mirova da bijît. Da agirê xirabîya wî neçit wan jî ka çawa mirovek eger xweşiyê ji parçek laşê xwe nebînit, ji bilî zererê pêve wê parçê jêkit da jehra wê neçit parçên dî jî, vêca ev gotin tê gotin gava mirovek nexêrxwaz û ji xirabîyê pêve jê çênebit li nav malê da yan li nav gund da wê bê gotin: " Çavê kêr neyê tilya xwe li bin bide û derîne." Dibêjin carekê mirovek ne misilman pirsyar ji zanayekê yê misilmana kir: Ere ev çi qanûne hewe hey! Ew destê xwîna wî (25) deve bin li bihayê (5) derhema bêt kirîn! Û hêj hon dibêjin ev qanûna he adile!" Zanaî bersiva wî da: " Dest giran bihabî, hingî emîn û dilbêş bî, çaxê xîyanet kir sivik biha bî. "

«اليد ثمانية مدامت امينة فاذا خانت هانت»

(90) Çêlekek rîxo garanekê dilewitînit...

Ev gotina he tê gotin gava li malê da, yan li gundî da miro-

vek xirab û pîs û bê kêr hebît, vêca xirabîya wî û ne başîya wî bighêt kes û karên û bi wan ve bigerhit wê bê gotin : " Çêlekek rîxo garanekê dilewitînit." Dîbêjin carekê li koçka mezinkê da êkê got: Guyê hişk namînit bi mirovî ve, xweyê koçkê got: Belê mam benî nexweş mirovek wekî te wê bêxit li devê xwe da û bicû heta rûhn bibit, paşî wê piç bikit mirova, wê bimînit bi wan ve. Vêca bivê-nevê ye li ser zana û rêberên mileta nehêlin pîsek û xirab serê xwe hildin û pîsatîyê bikin, heyne paşê ew jî wê bi guyê wî ve bilewitin, çunkî wekî tê gotin " çêlekek rîxo garanekê dilewitînit."

(91) Çav li derîya xwelî li serîya !

Ev mirovê hind bê xêr û bê kêr bit heta her û her çavên wî li destê xelkê bin ka wê kengî êk çakîyekê vêra bikit? Xwelî li serê wî bit bila bimrit hezar cara jê ra çêtir e! Her wekî hatîye gotin: " Serê li ber mineta bila biçit li nav zîyareta."

(92) Çîya naçit derwêş diçit!

(93) Çaroxa ji sara çêkin wê çaroxên xwe bixûn.

Çarox - yanî kalka ji çermê xav - vêca ev gotina he tê gotin gava tişteke bikevit bi destê êkê da û ew bi xwe ne bi serve bit, her wekî êk doşekên hiriyê ji kera ra danit, yan (xirpo) bibit rêberê gund! Pa ne ker wê birît li ser wê doşekê û xirpo wê wî gundî wêran bikit. Li vê menayê gotinek ya pêxemberê Xudê- selat û silavên li ser bit- heye çaxê ferman dikit

«إذا وسد الامر الى غير اهله فانظر الساعة»

yanî gava rêberî ket li destê yê ne bi serve li ber hîvîyê din- ya wêran bîne be.

(94) Çavek kor bibit mirov destê xwe didit li ber yê dî!

Ev gotina he tê gotin gava li ser malekê da yan li ser gundekê da belayek bêt û bixwazin û lê bigerin belayê mezintir bikin wê bê gotin : " Çavek kor bibit mirov destê xwe didit li ber yê dî! "

(96) Çira li ber kora ye!

(97) Çêl û dotin kezwan û kelotin ne vêk ketîye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek dest bavêjit du kara pêkve bikit kî ji her du kara bikit karê dî pê çênabit! Vêca geh dest bavêjit vî karî û geh yê dî û êkê ji herduka jî pêk neyînit wê bê gotin: "Çêl û dotin kezwan û kelotin ne vêk ketîye."

(98) Çi bikî kuwarê ew ê bêt xwarê.

Here temşa bike li gotina (777)

(99) Çaxê nêçêr tê guhê tajî tê!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek kovendarê tişteke bit û xwe li ber venit heta firset jê ra hilkevit, carê gava firset hat xemsariyê û xavîtiyê bikit heta ew firset ji desta derkevit, wê jê ra bê gotin: "Çaxê nêçêr tê guhê tajî tê:" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(100) Çaxê maza bivo raza!

Vêca gelek mirov xwe xemsar nekit li ser firseta xwe here li gotina (650,651,652,653) ê binêre, em tibabekê li ser axiftine.

(101) Çima rihê kurnakî? Got:Dilê min bi qûnê

ne xweş e...

Ev gotina he tê gotin gava mirovek mala xwe yan gundê xwe bihêlit û jê bigerit ji ber aloziya, vêca êk pirsyarê jê bikit "bo çi to ho dikî?" Ew ê bêjit: "De mal ava êkê got êkê " çima to rihê kurnakî?; got dilê min bi qûnê ne xweş e."

(102) Çiwîka li pizîyê çêtire ji beranê berûyî..

Ev gotina he tê gotin gava mirovek tiştek misoger ji destê xwe berdit bi tiştek ehit û behit û ne misoger, wê bê gotin: "Çiwîka li pizîyê çêtir e, ji beranê li berûyê." Vêca gelek her mirovek hizirker bit li roja têda da ne şepilit.

(103) Çîya li çîya nakevin, belê çav li çava dike vin..

(104) Çîyayên bilind bê mij nabin û niwalên kûr bê av nabin.

(105) Çîya ji ber çîya bilind bîne!

(106) Çûçik çûçik e niklê xwe li avê didit, li ser xwe ra li Xudêdinêrit!

Ev gotin he tê gotin gava mirov ji ber pêvehatina xwe ji ser xwe biçit û zîrekîyê û zordariyê li mirova bikit wê jê ra bê gotin: "Çûçik çûçike niklê xwe li avê didit li ser xwe ra li Xudê dinêrit." Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Şûrê qetlê li destê te, rehma Xudê li dilê te." Yanî to çend xurt û pêve hafî bî, belê divîya to rehma Xudê ji dilê xwe ne avêjî, çunkî eger to çend xurtî, bizane Xudê ji te xurtir e.

(107) Çawa dirîsit welê ba bide..

(108) Çirhaye û dirhaye ma kî wê çi jê bikit!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mêrkek û jina xwe bîn her şev dimîstin bi xwe ve, mêrkî gote jinkê: Malbab wêranê holê çênabit her şev em bimîzin bi xwe ve, me cilkên xwe rizandin! Jinkê got: Ma ez çi bikim, ma çi ji min tê? Mêrkî got: Divê em her şev nobetê li xwe bigrîn, ez ê razim to hişyar be çi gava te dît kîrê min livlivî bizanibe mîzê min tê, hişyar bike û paşî ez ê hişyar bim to binve. Mêrik nivist û jinik ma hişyar çaxekê berê xwe dayê kîrê mêrik livlivî hema ne merdî nekir bi nîqra wî ra girt û dengê xwe li mêrê xwe kir û hişyar kir: "Rabe here bimîze." Mêrik rabî çû mîst û hat li ser cihê xwe. Jinik vêca nivist û ew ma hişyar li çaxekê hind pê hesha lehî da der, destê xwe danî li ser laşê jinkê belê bê pare! Çunkî li nav tilyên wî ra xwe ne girt; jinik bi ser xwe ve hat û got: "Ev çi bî?" Mêrik got: "Kezuya te kurt bit çi bî?! Çirha ye û dirha ye, ma kî wê çi jê bikit! " Vêca ew gotina he tê gotin gava karek li destê mirovekê da bifiştiqit û bi çi awa nekaribit bi ser êk ve bînit.

(109) Çavê kor rondikek jî jê bêt baş e!

(110) Çûv stûr e tuxûb zor e, çûv zirav e tuxûb av e..

(111) Çûvê stûr ji behîştê hatiye..

(112) Çêlekê rîtiye bi destîyê bivir ve..

Binyatan vê gotinê dibêjin mirovek çû li ba melayekê got: Seyda ez û filan kes wê bêne ba te şerîetê, heke to bo min bêxî min bivrek gelek taze heye ez ê bidim te. Melê got: Baş e. Yê dî çû li dev melê got: Seyda heke to şerîetê bo min bêxî ez ê çêlekê bidim te. Melê got wî jî : Baş e. Roja paşî

her du çûn li ba melê û her êk ber hîvîye li dilê xwe da yê bi serketî ewe. Mela jî rawesta û ne axift, xweyî bîvir got: Ya allah seyda şerîetê bîbre ka çawa bîvir dara dibirî? Melê got: Rast e belê "çêlekê rîtîye bi destûyê bîvir ve."

D

(113) Devê wî ji girarê dişwîtit pif dîkî kefçîk

Ev gotina he tê gotin gava êk tengavîyek yan nexweşîyek bi ser da bêt, ji rexeke ve ew rabî pîrsyar û xemxwarîne ji rexeke dîve bixût, wê jê ra bêt gotin: "Devê wî ji girarê dişwîtit pif dîkî kefçîk!" Wekî vê gotîne ye deq û deq çaxê dibêjin: "Kojîyê têre dirha, destîyê pûş êxîst li qûna kerê da."

(114) Darkê têxî qûna wî gulkê didî li ber bêhna wî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe li dostaniya êke bînit pêş û li dil da jî neyarek durîst bit heta piçek feyde lê bikî zerereka (16) cara temet wî feydeyê lê bikî. Ewên welê ne jê ra tê gotin: "Darkê têxî qûna wî, gulkê didî li ber bêhna wî!" Wekî vê gotîne ye çaxê dibêjin:

(115) Dujminê xwe bi esîde kuşt.

Binyata vê gotîne jî dibêjin êk neyarê êke bî bi çî renga nekarî derbekê li neyarê xwe bidî, bê ku nexweşîyek mezîtir bibînit. Rabî çû xwe kir dostê wî û xwest bo şîvê, çaxa bire malê rabî esîdek- esîde danhêrke li ber rûn û şîranîyê tê çêkirin. Şîrîn û têr rûn jê ra çêkir û her dayê.. Hîngî bes dikî xweyê malê digot: Bi seb xatrê min vê çendê jî. Heta welê hat hêdî nekarî bilepîtî û şeva wî ne bûrî û mir. Vêca bî pê gotin: "Dujminê xwe bi esîde kuşt!"

(116) Dîkana Beko di qalîb sabûn!

(117) Dema siêd hat serî, bila bizirit wekî kerî
xelkê bêjit aferî..

(118) Dilê nazik nagehit çi mirada!

(119) Devê pîvazê nexût bihên jê nayêt.

Ew gotina he tê gotin gava ku mirovek hindek gotin û hizir û miqam jê bên kirin, ew li ber çav jê berî bit, belê binve binve wî jî tilî û penç li nav da hebin, wê bê gotin: "Devê pîvazê nexût bihên jê nayêt." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Wî jî tam li tîşikê heye!" Nîzikî van gotina ye çaxê dibêjin: "Filan kes nermikê li bin kayê da ye!"

(120) Dinê bi dinê ve Mendo bi qûna jinê ve...

Ev gotina he tê gotin gava tengavîyek mezin yan belayek giran bi ser malekê da yan gundekê da bêt, rê û rêbar li wan winda bibin, dinya li wan bighêt êk wey tarê bêjingê kunmişk li wan bibin sûk û qeyserî, nezanbin û ne karibin xwe bi çi awa qurtal bikin, vêca li wan tengavîya da bê xêrên wan bi tiştê kê m û bê xêr ve mijûl bikin, her yek car man tengavîya ne înin bîra xwe - wey Hecîyê Mekehê me bûrandî li gotina (1) ê da- wê jê ra bê gotin: "Dinê bi dinê ve Mendo bi qûna jinê ve." Yanî dinya hemî maye pêkve û ser û bin bîye, Mendo ji qûna jina xwe pêve ageh ji tiştêkê nîne! Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(121) Deh bi duwa ne Hirmiz xudanê gulolan e.

Yanî her deh mirova du jê namînin Hirmiz ji çalê û şalê û kirinê pêve ageh ji tiştêkê nîne! Bi dirustî wekî van her du gotinan e, çaxê dibêjin: "Mêra mêr dikuştin Cibo ûr dişûştin!"

(122) Dowsên kerê ne filên perê ne!

Li vê gotinê binêre"xeta xwehin ji bin gayê pîr e."

(123) Destê li ser gozekê ye!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê zelamek û jinek pêkve li rêkê diçûn. Piştî demekê çûn, rûniştin da bêhna xwe vekin. Dilê mêrik pîs bî, belê ne wêra yekser daxwaza xwe ji jinkê bikit. Rabî destê xwe danîn li ser tilyên lingê wê û got:"Ev tilyên te çawan in? Hindek kurtin û hindek sitûr in û hindek zirav in!! Jinkê got:"Ma tilyên hemî jina ne welê ne? Mêrik got: "Bawerke ez nizamim çunkî min hinde berê xwe ne daye tilyên çî jina! Birekê ma welê destên xwe evraztir bir gihand guzeka wê û got:" Bawerke guzekên te seyr in! Çî her du li semta êkin!" Demek dî ma, destê xwe bilintir bir danî li ser teşka wê û got:"Babo teşkên te gelek tazen e, hinde sor û spî ne! Min teşkên ho ciwan ne dîtine!" Çendek dî ma destê xwe gihand li ser çoka wê û piç piç bir heta gihand ranê wê. Bi wan fêlbazîya heta karî daxwaza xwe ya pîs bi cih bînit. Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek daxwazek nepenî hebit û nexwzit daxwaza xwe yekser bidit dîyar kirin çunkî jê ra naserifit rabit piç piç bi daxwaza xwe rabit bi rengêkê veşarû û fêlbazî, heta bigehêt armanca xwe. Belê heke mirovên zana û şehreza û zîrek hebin wê bizanin ev teşqelene her ewil wê bêjin:" Mesela vî mirovî destê li ser guzikê ye!" Ageh ji xwe hebin.

(124) Dîzik tejî bit û agir xweş bit wê bifûrit!

Temaşa gotina (15) ê bike.

(125) Dîzkê got;ez tejî zêrim,heskûwê got; min to hemî sehkirî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek zirt û pesnê xwe bidit û newe (nerast), hebin wî baş nasbikin ka çi male! Dê jê ra bê gotin: "Dîzkê got ez teji zêrim, heskuwê got; min to hemî sehkirî!"

(126) Destê li bin derî daye, bikêşî wê bimeritit,
nekêşî wê biherişit.

(127) Dest tavêjt kevçik û niza mala dawetê li
kûdê ye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe bêxit li nav karekê da bê ku bizanî ka ew kar çî ye û yan çawan e û eger êk pirsyar jê bikî "tê çi bikî?" we bimînit sekinî tiştê jê nizanî. Ewê welê ye wê jê ra bê gotin: "Ezîzo to dest tavêjt kevçik û nizanî mala dawetê li kûdê ye!"

(128) Dîwaro min ji te ra got pişt dîwaro to guhê
xwe bidê...

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek çû malekê bi mêvanî, piştî şîva xwe xwrin mêvanî got malxwê malê: "Da biçin şevbûrka xwe li koçka paşayî bikin. Malxwê got: "Mêvanê delal wekî dibêjin kolkê pîrê xweştir e ji burca Mîrê Cizîrê." Bila ji bîra te neçit wekî dibêjin ;" borîyê xurta zor bore to lê bidî wê te li ber xwe bibit û to lê nedî na serifit." Da li malka xwe rûnin ji me ra çêtir e. Mêvanî got; bawerke tebata min bê koçk û dîwan nayêt, her divêt em bêhnekê biçin koçkê. Malxwê got: "Baş e em ê biçin, belê bi şert heke em çûn koçkê çihê to ewil rûniştî ji wêdê nelivî û tiştê ji te neyê xwestin to xwe lê neynî der te heye. Rabûn çûn hêj zû, hêj kes nehatî koçkê her du rûniştin li serê dîwanê piştî hingê xelkê dîwanê kit kite hatin. Heçî hat mêvanî çihê xwe dayê, li çaxekê xwe li nav çihê pêlava da dît! Xelkê dîwanê tev rûniştine, gundorek bo paşayî hat, li

dil da ne divîya wî gundorî bişkênit, belê got: "Kê kêr heye?" Kesî deynekir mêvanî got: "Min kêr heye û kêra xwe deranî û raberî paşeyî kir. Gava paşayî kêr dît bi destê mêvanî girt û got: "Ev kêra he ji xezna min hatîye dizîn li gel hinde zêra!" Ha iha wan zêra to bînî. Hingî mêvanî xwe vequta belê pare nekir, ji destê paşê qurtal nebî. Paşê gazî kir êlçîya û got: "Werin vî dizî bigrin." Malxwê neçar bî got: "Babo eve mêvanê min e, îşev berdin heta seharê sozbit ez dîsa bînim. Paşayî got: "Em bernadin çunkî tê rêka axiftinê nîşê bikî; malxwê soz da çî rêka nîşê nekit, rabîn her du pêkve çûn malê, her yek li rexe yê dîwarî rûniştin. Malxwê got: "Dîwaro ez ji te ra dibêjim, piştîwaro to guhê xwe bide min. Dîwaro heke to sibehê çuyî dîwana paşayî û paşayî got te ka zêra bîne; to bêje; " ezbenî ev kêra he min li ser termê babê xwe dîtîye, yani babê min bi vê kêrê hatîye kuştin. Vêca ez li doza babê xwe digirim. Minê ev kêr ya kê ye; wî babê min kuştîye." Dîwaro min ji te ra got pişt dîwaro to guhê xwe bide min." Vêca ev gotin tê gotin gava êk bixwazit şîretekê bi nepenî li êkê bikit, ji ber newêrana xwe wê bêjit: "Dîwaro min ji te ra got pişt dîwaro guhê xwe bidê..."

(129) Dilê êkê diçû goştê kerê digot: Guhê wî wek yê kêvroşka ne!

Ev gotin tê he gotin gava mirovek karek bê xêr û ne baş bikit, bi hêcetek bê xêrtir; wê jê ra bê gotin: "Dilê êkê diçû goştê kerê digot; guhê wî wek yê kêvroşka ne!"

(130) Dinya bi tira bîya hemî wê behra kera bîya!

Bê guman e, ku derew tişteke gelek pîs û xerabe, nexasim li nav miletê Kurd da heta Kurda derewker hesab kirne bikirê tîrker. Vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe bi vir û derewa bînit li pêş bêjit: "Ez ho bîm û min ho dikir û hemî jî derew bin wê jê ra bê gotin: "Dinya bi tira bîya hemî wê behra kera bîya!"

(131) Dujminê babê nabit dostê kurî..

Bê guman e, ku neyaretî û dubendî hingî kevintir bibit, êş û nexweşîya wê dê zêdetir bibit. Çunkî wekî dibêjin, "xwîn nabit av." Yanî ew ê xwîna wî û ya mirovî têkil êk bî de çî bi mirovatîyê yan bi neyartîyê, hêdî nayê ji bîr kirin û bê biha nabit ji ber vê êkê hinde xem xwarin ji dostanîya kevin hatîye xwarin heta Kurda wê gotin:

(132) Dostanîya dostê xwe berde belê dostanîya
dostê babê xwe bernede.

Çunkî hingî dostê babê, bi xwe dostê kurî ye, belê heye dostê kurê ji dostanîya wî bikevit. Ka çawa dujminê babê nabit dostê kurî? Eve ji layekê ve ji layek dî ve jî dostê babê cerbandîye û pê gotîye:

(133) Dewê cerbandî çêtir e ji mastê ne cerbandî.

Yanî eger dewê cerbandî çêtir bit ji mastê ne cerbandî? Pa bê gumane ku mastê cerbandî çêtir e , ji mast û dewê ne cerbandî!

(134) Dûpişk to zivistanê nedîyarî! got pane
havîne min gelek rû li ba hewe heye..

(135) Divêt mirov ne bêjit Ereba merheba heyne
wê birîn li ser kurk û eba..

(136) Dil şûşe ye heke şikest nacebirit..

Binyata vê gotinê dibêjin carekê şivanekê pezê xwe bir çolê bo çêrandinê, rojekê li semta darek mezin û sîbera wê

xweş hat pezi jî wê têr xwarî hema qesta sîbera darê kir û mexel hat. Şivanî jî dest avêt bilûla xwe û pif kirê. "Seyê reş li pişt gîşiyê konê" berê xwe dayê marekê serê xwe wê li bin berekê ra deranî û guhdarî wî dikit. Şivên jî çavê xwe li pelên darekê gerand da tê werkit. Belê çawa wî bilûl danî marî got gişt û çû dibin berî da demek kêma ma û serê xwe deranî û zêrek avêt li ber şivan. Şivan û mar ji wê rojê bîn dostên êk herû şivanê biçit bêhnekê li bilûlê bidit û mar wê zêrekê bidite ewê pezê xwe bînit û bêt. Rojekê berê şivan ket li rêbarekê, bakir kurê xwe û qewîtîyên marî lê kirin û got: "Lawê min emanet bila timahî te ne girit, çunkî wekî dibêjin; temahî fenahî ye; roja paşî bab çû rêbera xwe û kur jî pezê xwe bir wêdê û dest avêt bilûla xwe û pif kirê. Marî serê xwe derxist pirsyar jê kir: "Ka babê te? Got, "babê min çû rêbarê." Marî got; "ferq nîne to yan babê te." Kurik pif kir bilûlê û marî guhê xwe dayê, heta got "bes e" û xwe berda di kunêda da zêrekê bînit. Belê ji berî bizivrit kurî li dilê xwe da got: "Bavê min nezan e bo çi ez marî nakujim û ka çi zêr hene hemîya bi êk carî nainim û xwe tena nakim!" Çavê xwe li pelendarekê gerand û hazir kir, çaxê mar derket û zêr avêt li ber û zivirî, kurî ew pelendar tê werkir. Temet çar tilya ji serê tilya wî qutkir. Mar jî hema lê zivirî û gotê. "Hey bê tûyte ma tu nizanî "temahî fenahî ye!" Û ji cih kur vekirê bi gozekê veda li cih da tamam kir, ne hişt ji cih biliv-it. Bab hingî ma û ma kur nehat. Dilê babê bi xişxiş ket û li ba wî misoger bi ku tişteke wê bi serê wî hatî. Ji xwe ra got: "Hebit-nebit kurê min ji timahiyê karê kuştina marî kirye û wî jî wê pêve daye, hey babooo. Aklê kurî se tê birî, nezanî ku çawa lê bî sihar yekser qesta cihê marî kir, berê xwe dayê cendekê kurê wî li wê erdê ye, hinde werimî ye! Serê xwê hejand û got: "Lao min to ji vî qasî tirsandî, belê te guhê xwe neda min, çunkî pê gotîye:" Aqlê kurî bi teyr ra firî" paşî çû li ser devê kuna marî bakirê: "Destebira... de rabe were em dostaniya xwe nûjen bikin. Marî lê zivirand û Got: "Destebira bawerke cihê dostaniyê nema ye, li navbey-na me da! Babê got: "Bo çi? Marî got: "Çunkî hingî to li dora xwe binêrî to kurê xwe ne bîni û ez ber xwe binêrim.

Serê dûvê xwe ne bînim, kerb û kîna me ji dilê êk derna-kevit çunkî pê gotîye: "Dil şûşe ye, heke şikest hêdî nacerib-it! Vêca to bi xêr û ez bi selamet... Vêca ev bî pê gotin, çî gava li navbeyna du mirovan da yan du mala da yan du gunda da neyarî û dilreşî û kerb û kîn zêde bibit heta bighit wî qasî hestî li navbeynaa wan da bişkêt û hindek bixwazin li navbeyna wan da xweş bikin, belê bê pare. Wê bê go-tin; "Dil şûşe ye heke şikest hêdî naceribit!"

(137) Dil dila dihebînit...

(138) Dil dilekê dihebînit...

(139) Deve- hêştir- hat bi pûlekê pûl nebî.

(140) Duhnê li eyarî sa de ye!

Ev gotina he tê gotin gava başmirovek û hêja li nav mi-rovên xwe yên xirab û pîs da bit, ji pîsîya wan başîya wî jî pûç û wînda dibit- wê bê gotin: "duhnê li eyarê sa de ye!"

(141) Dayê ew to dibêjî min li der daye!

Binyata wê gotinê dibêjin carekê pîrejinek û keça xwe bîn. Keç mezin bî, dayê gote: Keça min bi tenê şev negerhe tolaz û xurt hene, newek te bê ser û ber bikin? Keçê got: "Dayê ewa to dibêjî min li der daye?" vêca bî pêgotin çî gava miro-vek şîreta li êkê bikit û ji tiştê bitirsînit û bêjtê xwe ji filan tiştî biparêze û bi xwe jî ew tişt bi ser hatibit wê bê go-tin: "Dayê ewa to dibêjî min li der daye!"

(142) Da kes dî wekî wê bi şev li kerê xwe ne gerhit!

Binyata vê gotinê êkê bi şev gote keça xwe: "Rabe here li

kerê xwe bigerhe da to bibînî neku tiştekan bi ser bê!" Keç rabî çû da li kerê xwe bigerhit belê ji dervey gund êk li semta wê hat û xirab kir. Rabî hat malê dilnexweş û serî şor babê pirsyar jê kir: "Te çî ye keça min, te kerê xwe nedît? Keçê got: " Min çî ye? Da kes dî wek wê bi şev li kerê xwe negerhit!" Vêca bi pê gotin çî gava mirovek xwe li tiştekan kêmxwer bikit belê belayekê mezintir bi ser da bê wê jê ra bê gotin : " Da kes dî wek wê bi şev li kerê xwe negerhêt!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : "Li xwîna babê xwe gerha qûna xwe jî li ser danî!"

(143) Destê tinê neçit li ser xwarinê..

(144) Destê tinê deng jê nayê..

Temaşe bike li gotina (73) ê tê bizanbî ka mana van gotina çî ye!

(145) Destê rehet li ser zikê birçî ye..

Temaşe bike li gotina (305,306,307,308) an em birekê wê li ser biaxivîn.

(146) Destê ne karî gez bikî tê maçî bikî.

Temaşe bike li gotina (84) ê bizanî ka mana vê gotinê çî ye!

(147) Deve li kûdkê nayê avdan.

(148) Du hesp li ser afirekê naçêrin.

Temaşe li gotina (210) ê bike!

(149) Dûvê sey sê sala bêxin li bilûlê da sala çarê

derxin her xwehre!

Bê guman e, mirovê firşikê wî ji xirabî û pîseyê bit feyde nakit li gel wî zanîn û aqil, çunkî wê zanîna xwe li gor vîna dilê xwe bi rêve bibit "tebiet"ê wî wê ser ji zanîna wî bistûnit. Wekî dibêjin, carekê paşayekê got aqildarê xwe : Tebiet xurtir e, yan fêrkin? Aqildarî got: Tebîet. Paşayî got: Ne. Fêrkin xurtir e. Ma to nabînî vê kiika me çawa çaxê xwarin tê ew dest tavêjît momê û li ber xwe disekinit heta em xwarina xwe dixûn. Ma ev hemî ne derbên fêrkinê ne! Dîyar bî to ne gelek bi aqil î. Belê aqildar xwest bidit dîyarkirin ku ew rast e û paşa xelet e. Rabî çû malê got berdestiyê xwe: Ka mişkekê ji min ra bigre û sax bîne. Aqildarî rabî - piştî berdestkî jê ra mişk anî - davek ta - dezi - avêt lingê wî mişkî û serê tayê bi singê xwe ve girêda û mişk berda li çengê ebayê xwe da, webit kes ne bînit Û çû dîwanê ma heta xwarin hat kiikê dîsa wey adetê xwe rahişt moma xwe û li ser dûvê xwe sekînî. Paşayî û desteka xwe rahiştin xwarna xwe, aqildarî ji nişka ve tayê lingê mişkî qetand, mişkî kir kişt û xwe avêt li ber geşa xwarinê da, çavê kitkê hu bi mişkî ket, hema got, "nir" û xwe li nav guhê mişkî werkir! Bergeş ser û bin kir lalîlk-sinîk- têkil êk bîn. Paşayî hu ber xwe da aqildarê xwe û got : Hey nezan ev çi bî te ho kir? Aqildarî got : Te dît ka çawa tebiêt serî ji fêrkinê stand! Da to bizanî "Tebîetê şîrî li siwarê tê hêlan" yanî eger êkê tebietek girt heta mirinê ew tebiêt vêra dimînit, zanîn û fêrkin hêdî wî ji wî tebiêtî navegerînin. Wekî dibêjin carekê mirovekê ne pak hebî bela xwe ji jina ne vedikir. Yanî jinkên gund ji tirsên wî da kit kite ne diwêran ji gund derkevin. Wî ne pakî got: Babo ez ê rabim herim heçî û hemî gerdana min azad bikin û ket li ser rîya hecê û çû li wî çend çaxî da jinik pişt rast hatin û çûn piştî mêrik zivirî ji hecê jinik tev civîn ji êk dura gotin : Em çi bikin? Aya em wekî berê xwe biparêzin? yan jî xwe bi xema heca wî ve bihêlîn? Jinkek li nav wan da hebî jîr û şehreza, gote wan: Hûn li vêdê bin ez ê rabim biçim berê xwe bidim heçî, ez ê tişteki jê bizanim; rabî çû mala hecî û

xêrhatin pê kir bêhnekê ma li wê dê û zivirî. Jinik tev lê bîne kom: Te çi kir, çi jê zanî? Jinikê got: Da ji hewe ra bêjim bext ne ji hewe ra bit xwe biparêzin, wekî berê û hêj pêtir bi Xudê çav û birhên wî yê berê ne bes şaşka xwe zer kirye. Vêca paşayê min baş bizane tebiet xurtir e ji fêrkirinê, ew kesê ji zikmakî dilpîs û xirab bê guman e, zanîn û fêrkirin wî naguhûrin

Wekî dibêjin carekê êkê têşkek gurga girt hêj şîrê maka xwe ne xwarî rabî anî malê bi şerê bizna xwe firşik kir û xweyî kir heta mezin bî, rojekê hajê ma zikê biznê berda erdê û bizin kuşt û ket. Li ser kuştinê wê û xwar, mêrik hat li ser serê wî sekinî got hey nan heram, min to ji çolê anî hêj te çavê xwe ne vekirî û to bi şîrê maka xwe firşik ne bîyî! Min to li ber çîçkê wê belengazê xweyî kirî heta to mezin bîyî! Vêca te zikê wê dirand û to guştê wê dixûy! Hey dûvê sey.

Vêca ev gotina em li ser taxivîn tê gotin gava mirovek xwe gelek bi êkê ve biêşînet li zanîn û fêrakirina wî da. Belê pare nekit, wê bê gotin: "Rast e dûvê sey sê sala êxisntin li bilûlê da sala çarê derxistin her xwehre!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin "mêr heft sala çû seferê zivirî her kerê berê!"

(150) Devî-teraş- jî dibin dar.

(151) Dêrdûwî pîrbêj dibin, evîndar dengbêj di bin..

(152) Dilê xweş her lê bihar e.

(153) Duhnê ji axê girtîye.

(154) Dinxe gana dikit sûlaqe dibêjit him him

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe nav bidit bi kirya- ra êk dî wê jê ra bê gotin: "Dinxê gana dikit sûlaqe dibêjit

him him.." Wekî vê gotinê ye hindek mirov ji Kurd da xwe dighînin Ereba - bi gihandinek dûr û bê binyat - vêca gava Ereba kiryarek kirin ew xwe pê nav didin vêca mirovên li dora wan kirne pê gotin:"Ereb li binê tîra berûyê talana vedgêrîn filan kes- behsên wan ewên xwe pê nav didin-dibêjin: Leh...leh"

(155) Devê rûvî ne digiha tirî got, ev tiryê he tirs
e!

(156) Deyîndara deyîndar xwrina...

Binyata vê gotinê dibêjin carekê rûvîyek ket li çalekê da, hingî hat ne karî derkevit. Got: Xuda heke to min ji vê çalê derêxê ez ê 20 elbên noka bi xêra te bidin belengaza. Carekê hêza xwe hemî kir yek û xwe givaşt derê çalê bi çî kul û halê heyî derket. Piştî derket derê û ji çalê xwe dûr girt, got: Xuda ez ne elafim û ne cotyarim û ne ji wan zengîna me bikirim pa ez ê 20 elbên noka ji kûdê bînim! Bi Xwedê min nîne û ez nadim dûvê xwe hejand û çû. Ew çend roj e, tişteket ne xwarî dilê wî ji birsa têşê, qesta binê guhûjekê kir, çû têr guhûj xwarin heta mest bî. Xewê xwe avêt dilê wî û nivist. Ewê li xewda hure bayek rabî û berek ji nav guhûjê verest û jûr da li kurtka binê çengê wî ket. Bostekê hilceniqî li dûra xwe nêrî kes ne dît! Zanî ev ber jûr da hatîye, jêlîl nêrî û got:"Deyîndara deyîndar xwarine." Vêca ev gotina he tê gotin gava êk sozekê bi mirovekê ra bidit û piştî hingê li soza xwe vebit, belê ewê soz bo hatî dayîn bela xwe jê ve nekit û tengav bikit û ne hêlit bilivit, xweyê sozî bêjit : "Deyîndara xwarine!"

(157) Dinya rêle ji her tiştî tê da heye..

(158) Dinya dihejit belê xirab nabit!

(159) Du berû barê kerî!

Ev gotina he tê gotin gava tengavîyek mezin bi ser malekê da yan gundekê da yan êlekê da bêt rê û rêbar li wan bibin qûna gurî dinya li wan bêt êk wey tarê bêjingê, vêca hindêk ji wana her xwe pê gulê nekin wê tengavîyê her pûte û hisab nekin! Wî çaxî wê bê gotin:" Babo.. filan kes du berû barê kerî.."

(160) Dîya kurabe, lê ne bindara kurabe.

(161) Dar nîne ba lê nedit!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek baş û kêrhatî bit bo mal û mirovên xwe hindêk mirovên wî yên ne baş û pîs behsên wî bi xirabî û ne pakî bikin. Vêca dilê wî sar bibit hêdî ne karibit xizmetên hêja bo kes û karên xwe bikit. Wê jê ra bê gotin:"Te çî ye to hinde dilsar û dilteng bîyî? Ma to nizanî dar nîne ba lê ne dit." Malxirab wekî dibêjin:

(162) Devê xelkê qûna mirovîye gava mirov
xwest bidit êk!

(163) Dar dikevit berê wê bi kûve!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek gef û zirta li êkê bikit bitirsînit û wan gef û zirta girê bidit bi çaxekê ve ewê dî wê jê ra bêjit: "De malava heta hingê jî dar dikevit berê wê bi kûve!"

Wekî vê gotinê ye, çaxê dibêjin "hosta necar were binve wek her car, şev yeke dergeh hezar." Binyata vê gotinê dibêjin carekê paşayek zordar hebî carekê li nava bajarê xwe digerha çavê wî bi jinekê ket, ji dilkê heyne ji hezar dila dilê wî ketê zivirî çû mal got aqildarê xwe: Jinek li filan taxê min dîtîye divê to ji min ra bînî. Aqildar çû sehkir û hat got;

paşayê min ew jinik bi mêr e! Û mêrê wê necar e. Paşayî got: Ez nizanim çawa bit divê to wê ji min ra bînî. aqildarê wî neçar bî rêkir li dûv mêrê jinkê ve anî dîwanê û gotê: Bi fermana paşê ji îşev heta siharê tobarek arê dara bînî heynê wê paşa serê te lê bikit. Mêrik got: Hema bila niha paşa serê min lê bidit, eve ez nikarim barek arê dara bînim! Paşê got: Ez zordarîyê nakim, muhlet ji te ra heta siharê. Necar zivirî malê dilkul, sernixûm, pûm kirî. Jinka wî gotê; te xêre, dilê te nexwş e? Serê xwe lê bada. Çine jinikê bela xwe jêve nekir her gotê: Te çî ye? Ka bêje to çima pûm kirî? Merik got: Min çî ye? Dilê paşê wê ketî te divêt min bikujit da te ji xwe ra bînit. Çi hêcet nîn in, ji bilî wî qasî yan ez ê jê ra barek arê dara çêkim; yan jî wê serê min jêkit. Pa ez malwêranê Xudê barek arê dara ji kûve çêkim, heta siharê! Ax babooo! Rast e çaxê dibêjin:

*"Xezala min delala min konê babê te li baye
Xezala min delala min li ser ra koçk û sara ye
Xezala min delala min jina spehî bela ye."*

Çî gava mirov jinek spehî yan ûlyek spehî yan zevîyek spehî hebit, mirovên xurt û zordar çavên wan pê ranabin heta ji mirov nestînin; çavê wî li te ketîye dilê wî ketîye te dixwazin min bikujit te ji xwe ra bibit, ji vê pêve tiştek dî nîn e. Karê mirovên zordar eve ye! Vêca ya ji hemîyê temaşatir ewe ku digot: "Ez zordarîyê nakim" her wekê zordarî bi stru we. Jinikê got: Hosta necar we binve wekî "her car şev yeke dergeh hezar" were binve soz û peyman bit li ser canê min, ez hevaltîya te nahêlim hema piştrast be! Were binve Bela xwe ji xwe jêve ne kir heta bire li ser cihê wî û her du ka xwe pêkve nûsandin. Çaxekê necar hişyar bî li ser dengê dergehê xwe bezî çû dergeh vekir dil bi tirs û dengê şikestî got: Ma haware babo babo de bila dinya runahî bibit paşî min bibin! Belê wan lê vegerand û gotin: Zûbe tabûtekê ji paşê ra çêke paşa mir!

- (164) Derwêş dizanit çi li hebana derwêş da
heye!
- (165) Daweta mitirba bit û mitirb lê bidin!
- (166) Dîtina deyindarî ne xeştire ji pêvedana
kore marî.
- (167) Duhin li çirê ke û seyra melê ke..
- (178) Dayê to çima min dihejînî? got êk dayê jî
dihejînit!
- (169) Du tişt mirov didin ezabê, jinbab û dengê
dolabê.
- (170) Dixûn nan û avê min mineta kesê navê.
- (171) Diz xwe li male dergeh girtin betale.
- (172) Diz xweyê malê girt û du tir jî jê berdan!
- (173) Deh siwar çûn pêşîya rûtekê bi silamet ji
nav lepê wan derket!
- (174) Dermanê her tiştî xuyê ye, belê heke xuyê
bi xwe xirab bî derman nîn e.
- (175) Diza ji diza dizîn erd û esman lerizîn.

- (176) Dergehê xwe bigre cîranê xwe diz neke!
- (177) Dilo bixwaze te boq yan te pîvaz!
- (178) Dewara ne kire li nîsanê û jina ne bijêre li dîlanê.
- (179) Derpê jinê sor e mêrî kor e!
- (180) Dew li mitirba nayê.
- (181) Destê vala ne ehlen û ne sehlen.
- (182) Durrê bide durmasa!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê suxtekê melakê çû germavê xwe germavê bikî, piştî serê xwe şûşt derket germavçî got: Ka heqê min? Suxte destê xwe bire berûka xwe belê pare li gel nebîn. Gote germavçî ", pere li gel min nîn in, ez ê nihû biçim mizgeftê pare ji te ra bînim." Germavçî got: To ji vêdê nalivî yan pare yan şaşka te gerewe heta to parê min bînî. Suxte got: Heke to şaşka min ji serê min nekî ez ê te bikim şîrkê xwendina xwe li ser 4 / 1 germavçî qebûl nekî, suxte got: To li ser 1 / 2 ê wê Germavçî qebûl nekî. Suxte got: 2 / 3 ya bo te bes, to bihêlî ez biçim mizgeftê nihû ez ê parê te bînim. Germavçî qebûl nekî. Suxte got: Babo hingî ez bixwînim xêra xwendina min bo te, bes to şaşka min ji serê min nekî ku ez şermîzar bibim, hevalên min henekên xwe bi min bikin. Germavçî got: Ez van çîroka nîzanim to ji vêdê nalivî yan şaşka te! Û dest avêt şaşka wî ji serî kir û got: Eve gerewa heqê min. Suxte bê şaşik çû mizgeftê parên germavçî jê ra bir û çû şaşka xwe anî û dest

bi firotina kitêbên xwe kir. Hevalên wî gotinê: Te xêr bit to kitêbên xwe difroşî? Got: Ez hew dixwînim. Êk çu got seydayî suxte filan kes kitêbên xwe hemî firotin û hêdî naxwînit. Seyda bilez hat mizgeftê pirsyar jê kir: Çî ye? Suxte got: Seyda ez hêdî naxwînim. Seyda got: Baş e nexwîne bes bêje egera te çî ye? Suxte got seyda: Ew xwendina bi polekê neyînit ez jîyê xwe pê xilas nakim! Û serhatîya xwe û germavçî ji seydayê xwe ra gêra seyda destê xwe bir berûka xwe tiştekan jê deranî û da suxte û gotê: Here bibe li ba hêsinger-hedad- biha bike û paşî bibe li ba etarî û paşî bibe li ba durrfiroşî bizane ka her êk wê çî pê bidit? Belê nefroşe bine û were. Suxte rabî tiştê xwe bir û çû li ba hesinger gotê: To vî tiştî nakirî? Hesenger got: Ne. - piştî berê xwe dayê- heke to bidî min pênc pera min navêt, çunkî kêr min nayêt ez ê çî jê bikim? Ji wêdê rabî çû li ba etarî, wî jî berê xwe dayê got: Tiştekan taze ye heke to bidî min ez ê deh pera bidim te. Suxte got: Ez nadim û çû qesta durfroşî kir û nîşa wî da û got: To vê nakirî? Durrfroşî berê xwe dayê- hêj li desta - got : Bi sed zêra, got : Ez nadim, durfroşî got: Mam benî bihayê wê 110 zêrin, belê 10 zêr kara min e. Suxte zivirî hat mizgeftê seydayê wî pirsyar jê kir: Te çawa dît? Suxte got: Hesingerî 5 pare jî pê ne da û etarî 10 pare pê dan û durrfroş 100 zêr pê dan. Seydayî got: Lawê min durre bide durmasa, pa to durê bidî hêsinger û etarî wê çî bihayê durê bizanin; germavçî wê çî bihayê îlmî û zanîne bizanin, taze runê xarê û xwendina xwe xilas bike wekî berê bila dilê te sar ne bit xwendina te vêca ev bî pê gotin, çî gava tiştekan giranbiha bikevit bi destê êkê da û ew pûte pê nekit çunkî bihayê wê nizanin. Wê bê gotin: "Durrê bide durmasa" zêrî bibe li ba zêringera.

(183) Dîyarî qesp e şon dîyarî hesp e..

(184) Diz û malxwê bîn êk ga di bixêlîyê ra derêxistin!

(185) Dîzka kevanî bişkênit bê deng e..

(186) dinya ma bi du pîra wan jî pêk nekir.

Bi rastî çaxê min ewil car ev gotin ji berî 25 sala ji hingê heta van pêla ez mabîm di hizra da çî gava ev gotin dihat bîra min, min hizrê xwe dikir, çawa dinya hemî bimînit ji da pîra ra ew jî li hev nekin! Heta min bi çavê du dît û min bi guhê xwe seh kir, hey hoo pa bi Xudê rast e, berê xwe bidin vê zire stêra dinyayê ji du dewleta pêve nîn in Rusya Sor û Emerika Polperist ew jî hingî to dibînî wê dinyayê vediceqceqînin! Vêca min baş zanî çaxê dibêjin:" Gotinên mezina neqşên beran e."

(187) Dê bî jinbab bab ji xwe bî zirbab!

(188) Dest li ser desta heta esmanê hefta.

(189) Dengê duvê ji dur ve xweş tê!

(190) dinya war e, ne mal e.

(191) Darê stûr nabit gupal.

(192) Da to bizanî dew birayê mastî ye.

(193) Dermanê xwestinê dane.

(194) Dihlên tirek jê çênabin seyên bezek.

(195) Dermanê her tiştî zêr e, belê ji zêr xurtir zor e.

- (196) Darê li ser xwera ne bire!
- (197) Dayê bibîne dotê bistîne.
- (198) dinya tejî kîr bit bostekê ji mirov dur bit
ma mirov çî jê heye.
- (199) Dayka du dota li xwe didim du lota ne li
here li Cizîra Bota.
- (200) Deng ji hevdu vedidin.
- (201) Dibêjin belê napêjin.
- (202) Dîya diza du tira dikit êkê ji keyfa û êkê ji
tirsê.
- (203) Daweta mîra û gir li feqîra!
- (204) Devê te ne yê zirna zerk e!

Binyata vê gotinê dibêjin kurê mitirbekê got: Ez ê biçim li ber feqîtiyê bixwînim. Babê wî got: Law min nehêle bê dihol li qut, daweta li pêşîya me heye. Belê kurî guhê xwe ne dayê her got: Ez ê biçim. Babê got: Kuro law heke to neçî ez ê zirna xwe ya zerk bidim te, belê her kur qani nebîbabê got de here... "Devê te neyê zirna zerk e. To yê wî qasî bibî feqe? Mişk guhê te li mizgefta bixwûn. Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek li ber êkê bidit rêkek taze nîşê bikit, belê ew guhê xwe neditê! Ew ji fikra xwe ne yê xwarê wê bê gotin: "Devê te ne yê zirna zerk e."

(205) Dest desta nasdikit.

(206) Dinya hemî neyarê kewî ye kew jî neyarê
xwe ye!

(207) Du zebeş- şiftî- bi destekê nayên girtin!

(208) Dara xwezîyê kes li ber siha wê ne
rûniştîye xarê..

(209) Dara sihê li binê xwe nekit biha jêra nîn e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bibînit êk kêr mala xwe û kes û karê n xwe nayê û diçit xizmetê bo malek dî dikit û mala wî bi xwe pêtivê karkeran e. Bê gumane ew ê welê bê bihayê wekî wê dara sihê li binê xwe nekit. Ji yê welê va tê gotin: "To benkê sor û zer bîyayî? Te bi derê hebana xwe ve bîyayî." here li gotina (152) ê binêre em tîbakê li vî axiftine.

E

(210) Ez çîya û to çîya kî ji golik ra herit giya.

Ev gotina he tê gotin çaxê li malê da yan li gundî da yan li êlê da du pêkve daxwaza serokatîyê û meznahîyê bikin û êk bo êkê kêmahîyê nekit, bê guman e li wê gavê nexweşî û dubendî û lêdan wê li nav da peyda bibit û dûmahîk li şûna avakirinê wê bibit xirabkirin û wêrankirin. Ka çawa golik bê gîya wê bimînit welê ew şonwar wê bê semyan bimînit! Deqû deq wekî vê gotinê ye çaxê Kurd dibêjin: "Serê du berana li dîzekê nayên kelandin." Yanî du malxwê li malekê da nabin. Bi dirustî eve mena gotina Xudê ye - pak û paqij bit- çaxê ferman dicit:

« لو كان ضيها آلهة اد الله لمسرت » yanî heke li erd û esmana ji bilî Xudê yek dî jî hebya erd û esman da bûç bin. Vêca bivê-nevê ye li ser hemî destekên millet û zanyên wî vê baş bizanin û hemî bibin wek wê gotina kurdî kevin çaxê dibêjin: "Birayek dîn û êk hişyar dan mûyekê neqedandin." Çunkî gava yê dîn dikêşa yê hişyar sist dikir û gava yê dîn sist dikir yê hişyar dikêşa. Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Du hesp li ser afirkê naçêrin."

(211) Ez dizanim av li ser çira diçit belê nabêjim.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovekê ji kurê xwe pirsî: "Erê lawê min te çend dost hene?" Kurî got: Bi Xedê babo min gelek hene. Babê got: Yanî çend in? Kurî Got : Bê jimar in. Babê got: Kurê min ez welê hizir dikim dostên te yên berûkê ne, yanî hingî berûka te teji be dostên te pir in, belê gava berûka te vala bî to bê dostî, Çunkî babê te li hemî jîyê xwe da dost û niv ji xwe ra girtine, pa te çawa karîye hinde dosta bigrî? De ka rabe îşev çend dostên te hene bicerbîne û paşê emê nivdostê min bicerbînin. Kurî got: Li ser

çavên min hecî dostê ez bêjme ka canê xwe bide min nabêjît ne. ma min hindik qencî û çakî bi wan ra kirîye!? Babê got: Lawê min dostên te yên xwarinê ne û pê gotîye " hevalê parî naçit arî." De rabe îşev yek û yek here li derê mala wan dosta bêje :Paşa wê ji min kerb girtî bîye wê min bixeniqînit, hema bes îşev min bihewîne. Ka bersiva wan wê bi-bit çî?

Kur rabî çû dostên xwe kit kit sehkirin heçîya çû li derê malê gotê; "ez revîyê paşê me wê min bixeniqînit bes îşev min bihewîne." Bersiva teva bi yek gotin "ev barek girane, ez nikarim. Paşê ji xwe kîno wî bikim." Kur zivirî hat mal babê got: Ha dostên te bîn çî? Kurî got; Bi Xudê hemî jî wek gotina te derketin, bes hevalên berûkêne. Babê got: De rabe em ê vêca nîvdostê min bicerbînin. Rabîn beranek anîn ser jêkirin û sax sor kirin û li nav darbestê da pêçan. Babê got kurê: De rabe here mala filan kesê- nîvdostê babê- bêje " babê min gotîye bila bighêt mala me piçek karê min bi wî heye. Kurî rabî wê niv şevê çû dergehê nîvdostê babê xwe quta. Mêrik ji xew rabî hat li ber derî berê xwe dayê eve kurê dostê wî ye. Jê pirsî: Te xêr bit? Kurî got: Mam babê min gotîye bila bighêt mala me karek wî heye. Dostî got: Li ser çava, nelive nihû ez ê bêm. Çû cilên xwe guhurîn û bi lez qesta mala babê kurkî kirin, heta gihan wêdê mêrik pirsyar ji babê kurkî kir: " Te xêr bit vê niv şevê? Babê got:"Xêr e! Ev darbestîya he ya kurê paşê ye, kurê min wê kuştîye. Ka em çi jê bikin? Piştî tibabekê hizrên xwe kirin dostî got:" Min rêk dît aşê gund sekinîye, em ê rabin herin cowa aşî bikolin termê xwe tê da veşêrin û dîsa wek berê lê bikin. Sibehî aşvan wê avê berdit ser aşî, kî dizanit ku tiştek li bin cowa aşî da heye? Rabîn çûn wê niv şevê co kolan darbestîya xwe tê da bin ax kirin û co wekî berê lê kirin û her yek zivirî mala xwe. Babê roja paşî got kurê xwe: "De rabe here dikana nîvdostê min yê şevê dî bêje babê min gotîye, "bila topek qimaşê taze û giranbiha ji min ra rêkit." Kur çû topek qimaşê wek babê wî gotî anî. Bab rabî ew toba qimaşî zîvar kir xiste li çiwalekê da gote kurê xwe; de rabe vî çewalî bibe li ber derê dikana wî vale bike birek

dujûn û kêsxwerî bike û berê xwe bidê ka wê çî bêjit! Kur rabî wek babê gotî kir. Nîvdost berê xwe dayê û serê xwe hejand û got : Dê here mam benî , ez dizanim av li ser çî ra diçit, belê ez nabêjim. Kur zivirî hate malê, babê got: Ha.. te çawa nîvdostê min dît û çî li te vegerand? Kurî got: Li min vegeran û got; "ez dizanim av li ser çî ra diçit, belê ez nabêjim. " Babê got "kurê min te zanî yanî çî? Kurî got: Ne! Babê got: Yanî got ez dizanim av li ser termê kurê paşê ra diçit, belê ez nabêjim. De rabe, here bêje babê min gotîye bila bêt mala me. Got li ser çawa, piştî çûn babê got: Em biçin wî termî derxin. Gava term anîn mal berê xwe dayê eve ne term e belkî beranek sor kirye. Dostî pirsyar ji bavê kurkî kir: Ev çî bî? Te çima ho kir? Babê got: Min xwest ez dostaniyê nîşa kurê xwe bikim. Ka dostanî çawa ne! Ne hema heçî got mirov merhebe ew doste, yanî jî melaqî ji mirov ra bikit - çunkî daxwazek ya wî li ba mirov heye.- Firavîna xwe xwarin û rabî çû mala xwe. Babê got kurî: Te nîvdostê babê xwe dît? dostahî holê ye, kurê min.

Vêca gerek li navbeyna dosta da holê bit. Ne xasim dostê babê mirovî çunkî hatîye gotin : "Dostahîya dostê xwe berde belê dostahîya dostê babê xwe bernede." Îha holê heçî gava milet hemî pêkve bibin dost û heval bê guman e wê xweşî û şahî ji teva ra bit, heke ne hinek wê pê bimrin û hinê jê ra bimrin.

(212) Ewê deva - hêştira - bigrit divê serdera xaniyê xwe bilind bikit

Ev gotina he tê gotin li çaxê mirovek xwe li kiryarek giran û mezin bikit û ew kar li nav desta da asê bibit û bialiqit, çunkî wî li pêşiyê pêkhatina xwe nekir bî wê jê ra bê gotin : "Ewê deva bigrit divê serdera xaniyê xwe bilind bikit.." Vêca bivê-nevê ye li ser her mirovên bi karên giran û mezin radibin ji berî her tiştî pêkhatina xwe taze bikit, da deva wî nemînit ji derve, wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Heman bi tir û fisa germ nabit, belkî divêt ewê bi karê mezin û berketî rabit hizir û hesabê xwe baş bikit, çunkî wekî dibêjin:"Heçî dîtina tawis bivêt divê germa hindê qebûl bikit." yanî karê baş û taze bi sanahî û xemsarî pêk nayêt.

Ji lewma hatîye gotin, "xew kew her du nagihên êk." Çunkî kewgir yan wê têşte xewa bikit kewgirtin wê ji desta der-kevit yan jî li berê sibî wê biçit li ber kewa xew çû. Wekî van gotina ye çaxê dibêjin ; "deve li kûdkê nayê avdan."

(213) Ev ne cihê dewara êk sim e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek qesta cihek ji xwe bilintir bikit, yan destê xwe bavêjit karek ji xwe mezintir û bi desta ve ne yêt, çunkî ew ne li wê rêzê ye wê jê ra bê gotin . "Ev ne cihê dewara êk simê." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin "lingê xwe li gur berka xwe bavêje;" çunkî bê guman e wekî dibêjin: " Heçî nezanit quweta xwe ew dûre ji dewleta xwe vêca bivê-nevê ye her kes xwe nas bikit ka li kî rêzê ye?"

(214) Ez Tirnînî ji te ra dibêjim, to Yarhezokê li min vedgêrî!

Tirnînî û Yarhezok du çîrokên dîlanê ne, belê her êk awayê wê başqe ye. Vêca gava li malê da yan li gundekî da yan li êlê da mezin yan şîrekar xizmetekê yan şirketekê li êkê bikit ew rabit awayek di bersiva wî bidit, wê jê ra bê gotin:" Ez Tirnînî ji te ra dibêjim, to Yarhezokê li min vedgêrî!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:" Me çî got û tembûra me çî got!"

(215) Ez dibêjim nêr e, to dibêjî bidoşe!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek daxwazekê ji êkê bikit yê dî hingî "uzrê" xwe vexwazit nîşe bidit, ku ev xizmet min pê çênabit belê yê dî jê ve nebit ka ji min ra bike; wê jê ra bê gotin: "Malava ez dibêjim nêr e to dibêjî bidoşe."

(216) Eger axiftin zîv bit ne axiftin zêr e!

Bê guman pîrbêjî û ezman ji bela û nexweşîya pê ve bi ser xweyê xwe da nayînit, vêca çî gava belayek bêt serê mirovekê ji ber esman dirêjîya wî û bi xwe jî ne hewcey wê axiftinê bî, tenha eger ne ji pîrbêjîya wî bîya ji lewma hatîye gotin: "Esmanê dirêj bela serê xweyê xwe ye." Vêca bivê-nevê ye ku her kes xwe biparêzit ji pîrbêjîyê; çunkî wek dibêjin:

"Ezmano kurto sero vehesao."

Dibêjin Îmamê Elî-Xudê jê razî bit- gotîye: "Xwezî stuyê min wek yê devê bîya da çaxê gotina min hatibîya, min hizrên xwe tê da kirbîya eger baş e min gotibîya û eger ne başe min vegeranda."

(217) Ev lêlê ye hêj lolo maye!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê du mirovên teşqelçî û fêlbaze bîn hevalên êk li rêbarekê, belê êk ji yê dî fêlbaztir bî got hevalê xwe: Yan ez ê te bikim pişta xwe û tê bo min bistirî, yan tê min bikî pişta xwe ez ê ji te ra strana bêjim. Hevalê wî got: Ka to ewil were pişta min. Rabî çû pişta wî û dest bi stranê kir, her got "were lêlê..." Ne carekê û ne du-duwa û ne deha û ne bîsta... her got "were lêlê.." Hevalê wî got "baş e malbab wêrano ma were lêlê xilas nabit!" Wî got: "ka xilas bîn? Ev lêlê ye hêj lolo maye!"

Vêca ev bî pê gotin gava mirovek bikevit li belakê da û li ser dirêj bibit, hevalê wî bizanit ku hêj bela maye û ya mayî mezintir e, wê jê ra bêjit : "Ev lêlê ye, lolo hêj maye." Yanî eve ji nû destpêkirin e, ya tîr û giran hêj maye.

(218) Ev ne gûyê henekan e..

Binyata vê gotinê dibêjin carekê rûvîyek li nav rêlekê da bî berê xwe dayê hirçek wa ji wêve tê, ageh ji xwe nîn e, wî hirç dît û hirçê ew nedît. Rabî xwe li nav devîkê da- teraşekê da- veşart, heta hirç hat li semta wî, li hirçî kire pixk hirç nîv

gazê ji axê bilind bî û bî çirçira qûna wê û bazda heta jî wêdê dûrket, piştî hingê hizrên xwe kirin û got: " Niho ev ne dengê wî pêzevengê rûvîya bit? Rabî li dewsa xwe zivirî, berê xwe dayê rûvî li wêdê ji kêfê pêve nakit, hema hirçê ji cih kûr vekirê, rûvî hind dît lepên hirçê ketin li ser patka wî û gotê ha... Ew te we kir? Rûvî got : Mala te min henek kirin, te ho xwe bizdand! Hirçê bi patka wî girt û bir difna wî danî li ser gûye xwe û got : " Ev ne gûyê heneka ye."

Vêca ev bî pê gotin çî gava êk bi hêceta yarîya û tirana derbên boke û qelew danit neyarê xwe û eger êkê gazindek kir ew bêjit: " Min henek dikim," wê lê bêt vegerandin "ev ne gûyê henekan e."

(219) Ew sal e belê ne ew bihar e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek carekê li cihekê xweşiyekê bibînit, vêca dîsa qesta wî cihî bikit, belê ew xweşî li wêdê ne mabit wê bê gotin : "Ew sale belê ne ew bihar e." Wekî vê gotinê ye çaxê mirovekê yan şonekê bibînit bi Kok û rewş û taze piştî hingê mirov bibînit bê ser û ber wê bê gotin:

(220) Ew hewş e, belê ne ew rewş e..

Yanî şon ew şone belê lêkdan û kokîti ne ya berê ye.

(221) Ez ho dikim dê dimrit ez ho dikim bab dimrit!

Ev gotina he tê gotin li demê mirovek bikevit li navbeyna du tengavîyên mezin, kîjan ji her du wa bi serda bêt wê derbek giran lê bikevit li wî çaxî wê bê gotin." Ez ho dikim dê dimrit, ez ho dikim bab dimrit."

Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; " destê li bin derî da ye bikêşî wê bimeritit û ne kêşî wê biherişit!" Axiftin wê hêj li

vî babetî bê kirin li tîpa (q) ê.

(222) Ez dibêjim bira, to dibêjî kirîv!

Gava mirovek bi dilbêşî û saxlemîtî biçit êkê ew vêra ne welê bit, wê bê gotin : "Ez dibêjim bira to dibêjî kirîv!"

(223) Ez dibêjim ve hirç to dibêjî ve dewş!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi binyata tişteke bi-kevit bi dirustî êk dî bêt şûp û nîşana nîşe bikit, higê wê bê gotin : "Ez dibêjim ve hirç to dibêjî ve dewş!"

(224) Ew malxirab bibit ewa jin tê da bibit
malxwê..

Bê guman mêr û jin hev nîrên êkin li avakirina malê da û barê li ser milê jinê ne kêmtir e ji barê li ser milê mêrî - eger ne mezintir bit - belê her êk barê wî ji babetêkê ye li gor lêkdana laşê wa û nîjadê - ûnsirê - wan, barê jinê eve bîna zaroka û xweykirina wan zaroka bi dirostî û sexbêrî çunkî mêr nikarî wî barê giran hilgirit û pê rabit, ne li bînê da û ne li xwey kirnê da bi awayî jin wa xwey dikit, çunkî ew dil nermî û dil firjandina li ba jinê heyî li ba mêrî kêmtir e; bi gelekê, ji ber vê êkê mêr nikarî kur binêrit û dûr binêrit. Eve ji rexeke ve, ji rexeke dî ve heçî gava jinê karê xwe yê jinîti hişt û çû bi karê mêrî rabî meina wê ewe zarokên xwe ser beredayîkirin, aya xweyîkirina wan zaroka bê dê wê çawa bit û dûmahîkê wa zaroka wê bibit çî? Bê guman e li wî çaxî dûmahîka wê malê wêran bîn û herifandine û herifandina malê helweşandina millet tev e. Çunkî mal kelpûçê ewile ji danîna mileta ra. Eger em hizrên xwe li gotina pêxemberê Xudê da - selewat û Xudê li ser bit - bikin, em ê bizanin ka gotina wî çend taze ye û cwan e, çaxê ferman dikit; «كَيْفَ يَضَاحُ قَوْمًا لَوْ أَمْرَهُمْ لِمَرْأَةٍ» yanî wê

çawa biserkevit miletek jinek kirin rêberê xwe...

(225) Ew ê dîzkê çêkit dizanit çembil jî pêva bi
kit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek ji xwe pişt rast bit, bi karekê ku pê rabit dirust bikit bes tiştêk kê m û bê xêr bimînit êk dî bê bêt bêt : " Pa filan tişt?" Wê bersiva wî bidit û bêt : " Ewê dîzkê çêkit dizanit çembil jî pêva bikit:" Wekî vê gotine ye çaxê dibêjin:

(226) Ew ê tilya xwe bêxit guhê xwe dizanit ka
wê çî bêt!

Yanî ewê hosta û şehreza bit gava dest avêt karekê dizanit ka wê çawa dest bavêjtê wê çawa pêk bînit.

(227) Erzan kiro heban diro!

Bê guman e, mirovên geda û belengaz nikarin tiştên taze û mukum bikirin, çunkî hemî gava destê wa vala ye, ji lewma hingî mirov wa dibînit cilên wan qerpel in, pêlavên dirya ne, çunkî her tiştên bêxêr û erzan dikirin û pê gotîye : "Erzan kiro, heban diro.."

(228) Ez ne kewên davên te me.

Ev gotina he tê gotin gava êk mirovekê vexwerînit heta xapekê lê bikit, belê ewê dî mirovek hişyar bit, dav-doz bit ji nav lepên wî qurtal bibit, wê jê ra bêt: "Ez ne kewên davên te me." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Heta to çûyî hîla ez ji wêve hatim."

(229) Ew mirî nakevit li ber wî girî..

Ev gotina he tê gotin gava xem xwarinek mezin û zêde ji tiştên kêr û bê xêr bê xwarin wê bê gotin. " Ew mirî nakavit li ber wî girî.."

(230) Ev eve te divêt li ber be û te divêt ji ber be!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirov bê pakî û bê minetî li gel mirovekê kêr û ne çar baxivit..

(231) Ez ê biçim hey got kî ye? Ez im, hey nedît ji xwe dizim..

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi serve xwe bi dilbêşî û bistehî bînit pêş, belê gava keysê wî jê hat wek marê li tûr da wê jehra xwe berda, evên hone dev dostin û bi dil dijminin, wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Gotinên wî yên misilmana ne û kirinên wî yên zaliman e." Û gotinek heye dibêjin: "Serve Allah Allah û binve neûzu billah." Bê guman e dujminahîya van tuxman pîstir e ji dujminahîya dijminê êşkere..

(232) Eger ez bîm keç-kiç- ez dizanim ka ez ê doxîna xwe çend cara girê bidim!

Ev gotina he tê gotin li demê mirovek sistahî û xavîtî û xemsariyê û bê pûtehîyê li karê xwe da bikit - Ew kar mezin bit - heta ew kar ji desta derkevit û pûç bibit û êdî nekaribit vegêrit, ji nû poşman bibit û bidit bîra xwe. Heylo çend nezani û xemsarî û xeletî min kir! Ew mirov wek wê keça nezan û aqil sivik ewa tê xapandin bi gotina wan guryên li kevlên mirova da, radi bit namûsa xwe bi dest wan ve berdit heta jê têr dibin û hemî pişta xwe bidine û ew dimînit bi tenê, ne şîrîn û serşor li nav mala xwe û kes û karên xwe

da, bê biha, rûsar kes berê xwe naditê û çar para pê nadit; dibit merarê li ber devê hemî tole û tajîya. Ji nûka wê hat bîra wê ku wê bi destê xwe ev anî serê xwe ax û ûxînek hilkêşan xwezî xwarin, bi kovan û kul wê got: "Eger ez bîm keç ez dizanim ez ê doxîna xwe çend cara girê bidim." Belê pa piştî çî? Wekî dibêjin "piştî tirê nûka kezî kurê." Çû burî ji desta derket, ji ber vê êkê bivê.nevê ye ku mirov agahdar bit li xwe hêj çaxê mirov ne bûrî, da paşî ax û kovanên mirov nebin wek "gaziya li dûv gurî."

(233) Ew jî elimî tirên bin çenga...

Yanî ev mirov ewil baş bî, tenabî belê dûmahikê wî jî xwe fêrî tevdanê kir.

(234) Ervazî bê nişûvî nînin.

Deq û deq wekî van her du gotinan e, gotina xelîfê misilmana Umerê kurê Xetab - Xudê jê razî bit - çaxê dibêjit: «اذا ضاقت بك الدنيا تفكر في الم نشرح فمسر بين يسرين اذا فكرته تفرح»

"yanî gava dinya li te tengav bî to hizrên xwe li soretê da bike gava te hizrên xwe tê da kirin tê kefxweş û tena bî, çunkî her tengavîyek li navbeyna du firehîya da ye, çend taze ne ev her du malkên xarê ji şîra şairêk Ereb çaxê dibêjit:

«اذا ما أتاك الدهر يوماً بنكبة فافرغ لها صبراً واوسع لها صدراً»

«فان تصاريف الزمان عجيبة فيوماً ترى يسراً ويوماً ترى عسراً»

Yanî eger li çaxê te da rojek tengav hat bi ser te da to singê xwe jê ra pehin bike û bihna xwe fireh bike; çunkî kar û barê zemanî gelek temaşa ne to berê xwe didiyê rojek berfireh û rojek tengavîyê - vêca mirov xwe li ber her du roja bigrit. Roja firehîyê ji ser xwe neçit û roja tengavîyê bê hîvî nebit; çunkî wekî dibêjin: "Dinya dihejit belê xirab nabit." Her welê hatiye gotin; "xweyê sebrê dibit melekê Misrê."

(235) Ez goşt naxûm belê ez ê nanê xwe bi ackê

bixûm.

(236) Ez çotkê dixrînim da lezetek holê bibînîm!

Binyata vê gotinê dibêjin; carekê mirovek çû bajêr, wê li nav sûkê digêrhit berê xwe dayê mirovek çû li ber dikanekê, got : " Ka kêlok pîvazên tûj bide min, ew jî çû got xweyê dikanê ; " ka kêlok pîvazên tûj bide min." Pîvazên xwe birin û çû berê xwe dayê êkê got dikandarekê " ka kêlok hîçharên - filfilên - tûj bide min." Ew jî çû got xweyê dikanê " ka kêlok hîçhar bide min." Pîvaz û hîçharên xwe birin û çû li ber dîwarekî rûnişt, nanê xwe deranî, pîvaz û hîçharên xwe danîn li ser, dest avêt pîvaza xwe kulmek - mistek - li difna wê da perçiqand hîçhara xwe kir du -sê qet û dest avêt nanê xwe û qetek ji wê pîvaza tûj êxist li nav da û avêt devê xwe û qetek ji wê hîçhara wek agirî li dûv wê pîvaza tûj da rêkir, çawa du car devê xwe li êk da dev lê peritî hêstra - rondika - da çava û bi hinarkên rûyê da hatin xarê, hêstir û çilm û gilêz bîn şirik bi jûr da bi erzinkê da hatin xarê. Camêrek li bera bûrî gotê: Malbab wêrano ma Xudê ji te standîye ! Nanê xwe ziwa bixwe çêtire ji wî halî. Wî lê vegerand û got: De here here.... "ez cotkê dixrînim da lezetek holê bibînîm.."

(237) Ew ê bilind bifrit wê nizam bikevit..

(238) Ew ê ditirsit ew dipirsit..

(239) Ew ê dixwazit rûyek reş e, ewê nedit her du rû reş in.

(240) Ew ê ney hinava nayêt pêş çava.

(241) Ez li esmana li te digirim to li erdê dest
min ketî!

(242) Ew xem bila bo wî demî bit..

Ev gotina he tê gotin gava êk zirt û gefa li êkê bikit, ez ê ho li te bikim, yan bêjit wê holê çêbit û bibit ber yana rê û rêbarî lê teng bikit û ewê dî hingî bêtê xwe jê xilas nekit, wê bêjit : " Malava ew xem bila bo wî demî bit!"

(243) Elo Elo were milê babê xwe.

Temaşe bike li gotina (45) ê!

(244) Ecelê biznê tê diçit nanê şivên dixût.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek nekaribit êkê û rabit biçit bela xwe lê bidit û jê venebit, wê jê ra bêjin: "Ecelê biznê diçit nanê şivên dixût." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : Keleka xwe bê tû jê xilas nakit nexasim çar liv tû jî bêxit têda " Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: " Mêrûyê ecel tê, çend û per tê."

(245) Eslê jinê jin e..

Temaşa bike li gotina (427,428,429) ê.

(246) Esmanê dirêj bela serê xweyê xwe ye.

(247) Esmano birîyo sero vehesawo.

Li gotina (216) ê temaşe bike.

(248) Ereb... çav bi gulîlê ketîye!

Ev gotina he tê gotin gava êk hema ser û ser xwe li nav guhê tiştê bidit bê ku bizanît ka ew çî ye û dûmahîka wê bit çî!

(249) Esil ne çeltê neqşîn e esil firavîn e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe li ber çav bidit keşxekirin û fort û pesin û zirtên xwe bidit, wê jê ra bê gotin " esil ne çeltê neqşîn e, esil firavîn e."

(250) Erebê qûna te reş e, got malê min ev e.

Ê

(251) Êşa tilyê êşa laşî hemîyê ye.

Daxwaz ji vê gotinê ev e, yanî mirov hemî wekî laşekêne çî gava belak yan nexweşiyek bi ser êkê da hat tev arîkarîya wî bikin heta wî jî ji wê tengavîyê qurtal bikin û derkevit, ka çawa gava tilya mirovekê tarhêt laşê wî giş ji ber nesax e û ne tena ye. Û bê guman e çî gava millet pêkve holê zanîn û bîn xweyê vê êkê wê xweşî û şahî li nav da belav bibit ne wek wê pêgotîya dibêjit; " biharê li gunda zarok diçin pîvoka çaxê ji gund derketin neçare êkê bibit serkêş, dema gihan cihê pîvoka ewê serkêş wê ho berê xwe dayê wê got eve min pîvokek. Ewa he jî ya min e û ez dîya wî bigem heçî biçit wê ya ... he jî,"

(252) Êkê danî jina xwe, got to çima salek dî naçî kerenga.

Bê guman e, divîya jîyan çî li navbeyna dosta da yan mirovên malekê da, yan gundekê da bi şîranî û dilxweşî bit, bi dîlfirêhî û camêrî bit ji her du lave; ne li ber êk du sekinî bin bi hêceta, çunkî gava têkilî ket li ser hêceta " barê hêceta kes nikarî rast bikit." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; " gurg û mîh li ser kelekê dilê wî çû guştê wê got: To çima dikî toz? Baş e, ew çî toz e li nîva avê? Belê pa hêcet in wekî dibêjin: Gurg û berx li semta êk hatin gurî xwest berxê bixût got: Kuro te çima par av li ser min şêlo dikir? Berxê got mam jîyê min hemî sê meh in, par ez ji kûve hebîm? Gurg got: Belê an to bî an bira yê tê bî yan pismamê te bî yan êk ji binemala hewe bî. Deq û deq wekî vê ye dibêjin carekê du Romî li semta Kurdekê hatin pirsyar jê kirin. Kuro to ji kû yî? Got ez xelkê filan gundî me. Gotin tê biçî kû? Got ez ê

biçim filan gundî. Barê te çî ye? Got filan tişt e. tişteq ne qaçax e. Te eskerî kirîye? Got: Belê. Ka nifosa te? Eve nifosa min - nifosa xwe da dest. - Yê Romî got: Te eskerî li kû kirîye û li kî salê te teskere wergitîye û navên zabitên te çî bîn? Bersiva hemî piryarên wan da. Romî ma sekinî hêcetek nedît pê bihingêvit, dûmahîkê destê xwe bire paş û got zirr li binê guhê mêrkî da: " Kerê kurê kerê te çima barê kerê giran kirîye?" Vêca divîya jîyana mirov li gel êk ne bi hêceta bit û li dûv êk bigerhit bi hêceta, heta eger êk çakîyê jî bikit lê bibit xirabî, wek gotinek kevin heye dibêjin: Li jina xwe hêcete dibêjit. To çima qûna xwe li ber bêjingê ra dihejinî. Carekê li nav êlekê da bî dubendî, qûpe silhek kirin belê pa hêj dilê wan pêk xweş ne bibî taze zelamek ji her du benda çû mizgeftê nivêjê bikit dema rûnişt li tehîyatê - ezmê wî tew tewî bî - dest bi Tehîyatê kir her got: "Ett.....t..t..yat" li wê gavê da zelamek ji benda dî hat mizgeftê, çaxê berê xwe dayê ewê ji benda dî hinde tehîyatê dişidînit û du se car dikit, wî welê hizir kir ku ji kerbê wî da wedikit, hema êk derb rûnişt xarê û got: " Kuro sebab el zire eltehîyat." Çunkî li êk bi hêcet bîn, vêca divîya mirov li gel êk ne bi hêcet bin da taze bijîn..

(253) Êk toto bit êk boto bit halê me dê ho bit.

Ev gotina he tê gotin, gava li malê da yan li gundî da meznahî bikevit destê yên ne bi ser ve, bê guman e mala malxwêyê bê xêr û kêrhatî bit wê mal li ber linga biçit çunkî wekî dibêjin: "Malxwêyê malê bî belo xwarina eyalî bî sor çilo. Dibêjin carekê jinekê şû kir, piştî çend sala mirovek ji mala babê wê çû wêdê jinkê pirsyara mala babê xwe kir. Kî saxe, kî mirîye.. Mêvanî got: Mizgînîya min li te birayê te "Xirpo" bî meznê gund. Jinkê hema ser û singê xwe da ber tep û mista mêrkê got: Xuşka min ez dibêjim birayê te "Xirpo" bîye meznê gund to şîne datîni? Jinkê got: Ne ez dizanim kes ji mala babê min ne maye ji lewma "Xirpo" bîye meznê gund, ne bes mala babê min, belkî gund wêran

bîye, heta "Xirpo" bibe malxwê! Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin. "Xwelî li axê çû bişkul bi malxwê."

(254) Êkê şalê xwe da êkê gotê; belê pêve neçî li ser gû.

(255) Êkê bi seda, sed bi êkê.

(256) Êkê digot; mala min e, yê dî got; warê min e..

(257) Êlê xwe li pîrê girt, pîrê xwe li êlê ne girt.

Ev gotin he tê gotin li çaxê mezin û behra boş hizir û hisabê ji yê biçûk û hindek ra bikin, biçûk û behra hindik hizir û hisaba ji wan nekin, dê bê gotin "eve ye got, êlê xwe li pîrê girt, pîrê xwe li êlê ne girt."

F

(258) Fatromê agir berda zomê û çû rûnişt li serê komê!

Ev gotina he tê gotin li demê mirovek têkvedanê û dilnexweşiyê li navbeyna hindeka da peyda bikit û ew bi xwe jî xwe jê dur bigrit û ew bimînin pêkve ew tena runit xarê, wê jê ra bê gotin : " Fatromê agir berda zomê û çû rûnişt li ser komê."

(259) Fît mane bi xema yê bê lêv.

Ev gotin he tê gotin gava li malê da yan li gundî da xizmet û şol û kar bimînin bi xema yê bê xêrê hernya wê bê gotin; " fît mane bi xema yê bê lêv."

(260) Feqîr û jar wekî par û pêrar.

(261) Fira mişkê kadîn e.

(262) Feqîr li şovê çû dar totin li qûnê çû!

(263) Feyda gavana siwarbîna kera ye.

(264) Feqîro te ji kûbî ked xudao pîroz bit.

(265) Feqîr ji lewma jar e çunkî hizretê wî av û
dar e.

(266) Fermana deva hat rûvî bazda.

G

(A) Gurgê li kevlê mihê da ye.

Temaşa bike li gotina (717) ê!

(267) Ga dimrit çerm dimînit, mêr dimrit nav dimînit.

(268) Girêka xwe bi destê xwe venekî kes ji te ra venakit.

Û bê guman e wekî me bûrandî ku dilê kesê wek yê te ne bi te ve ye belkî divêt to bi xwe zîrek û çeleng bî, çunkî wek dibêjin: "Ker dikevit bivih bi xweyî dikevit!"

(269) Got kitkê guyê te derman e dema rît ax da ser!

Ev gotina he tê gotin çaxê pesnê êkê bêt dan ji ber çakîyek ya wî vêca ew ji ser xwe biçit û wê çakîyê bikit xirabî bilewitînit û berze bikit, wê bê gotin: "Got kitkê guyê te derman e dema rît ax da ser!"

(270) Gêre bi gulka nabit.

Temaşa bike li gotina (18) û(19) -an

(271) Girara pir kevanî yan şor e nayê xwarin yan kelî ye - bê xwê ye - nayê xwarin..

(272) Gîyayê hewşê tehl e!

(273) Gêsnê li çavê xwe da nabînit, belê derzîya hûr li çavê hevalê xwe da dibînit!

Ev gotina he tê gotin gava êk hemî gava kêmahîyên hevalê xwe bînit ber çava û yên wî bi xwe pitir û mezintir bin, wê bê gotin: "Gêsnê li çavê xwe da nabînit, belê derzîya hûr li çavê hevalê xwe da dibînit!"

(274) Gula corî wê`de torî!

(275) Gurgî pût e, ji baranê hebîya, wê kom tîlkek ji xwe ra çêkirbîya!

Ev gotina he tê gotin gava mirovekê bitirsînit bi gevekê yan tiştekê û ewî pakî ji wê gevê yan ji wî tiştî ne bit wê lê vegerînit : "Gurgî pût e, ji baranê hebîya, wê kom tîlkek ji xwe ra çêkirbîya!"

(276) Gîskê par hevûrî ye!

Hevûrî nêrîyêk salî ye. Ev gotina he tê gotin çaxê êk li bûrîyê xwe da baş û çak bit, belê hingî roja paşîyê xirabtir û nezantir û ne baştir bibit, wê bê gotin: "Gîskê par hevûrî ye!"

(277) Gund bê sergûf nîn e!

Ev gotina he tê gotin gava ji malekê yan ji gundekê mirovek pûç û ne baş bit û mirov kêmahîya wî bidin kes û karê wî, wê bê gotin: "Gund bê sergûf nîn e."

(278) Girya bi desta ve bit hewcey didana neke!

Temaşa bike li gotina (718) ê.

(279) Girara ruhin ji kê m danî ye.

(280) Gir be da to giravî bî.

(281) Gurgê betal çû ma bi kerê şuxul ve!

(282) Gurî pir dibit, dibit pêlêhvokê sa!

(283) guhê wî hêj li ser çingêna şûjinê ye!

(284) Gû bi fisa na mehilit!

(285) Garan hat zevîyê jina gavan ji nû bezî
teşîyê!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe li ser êş û karê xwe hîn mîn bikit û wî karê xwe bihêlit li cih da heta ew kar bibûrit, yan karek bivê-nevê tir bikevit berahîya wî ji nûka xwe bi lez bikit û qesta wî karê berê bikit! Li wî çaxî wê bê gotin: " Garan hat zevîyê, jina gavan ji nû bezî teşîyê!

(286) Gîya li ser repnê xwe hişîn dibit.

(287) Gotina siba û êvara nabit êk..

Ev gotina he tê gotin li ser wî mirovê ne xwe girbit û ne

xweyê gotina xwe bit, her gav tiştekekê bêjit, ewê holê jê ra tê gotin: "Gotina siba û êvara nabit êk."

(288) Gurgî xwarî pûrt jî bimînit baş e.

(289) Garis gul bî tevîk baran jî lê hat yekcar bî şil û mil.

Ev gotina he tê gotin gava tiştekek bi xwe bê xêr û bê ser û ber bit, vêca hema hêcetokek bê xêr lê peyda bibit yekcar bi-bit şil û mil û têk biçit.

(290) Gurî bi du parîya namirit!

(291) Giv giv ji pêvedanê nexweştir e.

(292) Gurg û mih li ser kelekê dilê wî çû guştê wê got to çima dikî toz?

temaşa bike li gotina (252) ê.

(293) Gan li Gewro û curm li Îso!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek ne başîyekê bikit û bela û nexweşî û tengî ji hindek dî ra biçin, wê bê gotin: "Gan li gewro û curm li Îshaq!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : "Hin hingivî bixûn û mêş bi hindeka ve bidin!"

(294) Gana bi kêrê xelkê bê pare ye.

Ev gotina he ji wî qasî ruhintire axiftin li ser bêt kirin.

(295) Gazîya li dûv girî ye .

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xurt û çeleng û zîrek kiryarekê bi êk ji xwe kêmtir ra bikit û yê dî por porê û gazinda bikin wê jê ra bê gotin : "Gazîya li dûv gurî ye. Por porê neke."

(296) Gotinên mezina neqşên li beran e.

Temaşê bike li gotina (334) ê.

(297) Guzên pûç li ser serê wî dişkên.

(298) Got xuşkê to bi Xudê kî, ka ji xwe derxe, bixe di min da!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek bi xwe neçar bit bo tişteke û êk dî bêt pêstûriyê lê bikit û jê bixwazit û bela xwe jê venekit, wê bê gotin got: " Xuşkê to bi Xudêkî ka ji xwe derxe û bêxe di min da."

(299) Gêre ji navê kurê çêkir vêca dora navê babê ye.

Binyata vê gotinê mirovek ezman (fis) bî pirsyar ji êkê kir: Navê te Çî ye? Got: Navê min Ezîz e. Got: De baş e. Fizîzê min pa navê babê te çî ye? Got te gêre ji navê kurê çêkir. Vêca dora navê babê ye. Vêca bî pê gotin çaxê mirovek xwe li karek sivik bidit û çî jê çênekit rabit xwe li karek mezintir û girantir bidit, wê bê gotin :Gêre ji navê kurê çêkir. Vêca dora navê babê ye." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; "me şem kirine mane şembelûk."

(300) Got ez ê sihkê çêkim bî ereq.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek çû bajarekî de heke li malekê yan li gundekê sihkê li gel xwarinê danîn li ber wî jî xwar belê tama sihkê lê xweş hat. Pirsyar kir: Eve çî ye û çawa çêdikin? Gotin: Eve sihke û holê çêdikin. Rêka çêkirina wî nîşe kirin. Ew jî rabî hat malê got: Ez ê sihke çêkim. Wî jî sihka xwe êxist di bin erdê da û çend roja xwe lê girt belê çaxê wî bi serve bûrî, deranî xurt û lawên gund lê kom bîn. Filan kesê sihkê çêkirîye, werin vexwûn, heçî perdaxek vexwar serxweş bî wek kera lê hat. Pirsyar hat kirin eve çî ye? hinde zarok serxweş dibin, paşî zanîn wa bîye ereq ne sihke. Gazind ji xweyî hat kirin. Malwêran te ereq çêkirîye ev çî ye? Te ho kir. Got ez ê sihkê çêkim bî ereq. Vêca ev bî pê gotin çî gava êk xwe li karekê baş bidit û paşî ew kar bibit nebaşî wê bêjit wek wî li min hat ewê gotî min, got " ez ê sihkê çêkim, bî ereq."

(301) Gayê cot ne dikir, mirîbayê minê minê di kir

(302) Kes naçit di gora kesê da.

H

(303) heçî ne li guvendê xweş dawetî ye.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek karekê bikit belê ew kar li desta de aloz bibit, çunkî ew kar asê ye. Vêca êk dî bêjit: Ka rabe rabe... da ez ji te ra çêkim, belê gava wî xwe pê kir êk car li nav lepa da bişextit û ne karbit lot bidit wê bê gotin: "Mam benî heçî ne li guvendê xweş dawetî ye."

(304) heçî dizanit ji xwe dizanit heçî nezanit dibêjit baqa nîskan e.

Gotina (788) ê bixwîne!

(305) Heçî nebînit zehmet, naxût neimet.

Bê guman e, ku mirov divê li rêka xwe da xemxwer û dilbêş û bi kiryar bit, ne mirovek tembel û tiral bit; çunkî wekê dibêjin:

(306) heta kefa destê reş nebit tama devî xweş nabit.

Û her li ser vê menayê ye gotina Xudê - pak û paqij bit-çaxê ferman bikit «وان ليس للانسان الا ماسعى» yanî mirov bes xweyê xebata xwe ye. Tiştek dî jê ra nîn e. Nexwe bivê-nevê ye ku mirov zend û bendên xwe hildit û zehmet bikêşit da Xudê ji harîkarîya mirov bikit. Çunkî wekî dibêjin: "Bê him him çênabit." Wekî me bûrandî her welê gotinek heye, tê gotin "nanê ne kera nîn e û rûvî gêrûk çêtir e, ji şêrê wek.

Yanî rizqê bê xebat û tevger nîn e. Çend taze ye ew gotina kevin çaxê bibêjin, "destê rehet li ser zikê birçî ye." Ew mirovê tembel û tiral bê guman e hemî gava wê parsek û çav li deriyê xelkê bit, ka wê kengê êk çakîyekê li gel bikit û bê guman e, ku çav li derî ser şorî û kêmasî ye û li ber minet e û pê gotîye "çav li derya xwellî li serîya û serê li ber mineta bila biçit li nav zîyareta, " belê eger mirovek xebaker û rencberê mala xwe bit, wî çaxî wê deh qencîya bi xelkê ra bikit. Ji lewma hatîye gotin: "Rencberê mala xwe be, xweştîvîyê gundî û cîranê xwe be, çunkî mirovê neker û bê kar bit, ew bê zaxe û hemî gava dilkeser e. Wekî hatî gotin; " ne kero" dilkesero û hemî gava wê li rêza paşî bit her wekî gotinek Kurda kevin heye dibêjin:

(307) Holî got, golî heke em milên xwe nedin li ber şolî kulkê me nabit ûlî.

Vêca li ser mirova bivê-nevê ye hingî hêz li gel wan maye bo kes û karên xwe karbikin. Çunkî wekî dibêjin:

(308) Heta mirênê kirine..

Yanî divîya mirov bikit heta mirov bibit yê mirênê. Çend taze ye ew gotina erebî çaxê dibêjin:

«اعمل لدنياك كأنك تعيش أبداً واعمل لآخرتك كأنك تموت غداً»
yanî kar bike her wek to bêjî ez ê her û her sax bim û kar bike bo bindinya xwe her wekî to bêjî ez ê sibehê bimrim.

(309) Heta li ser testa negerî qedrê linga nizanî.

Ev gotina he tê gotin gava malxweyê malekê yan rêberê gundekê pûtê bi mirovê xwe nekit, heta bi tenê bimînit û hemî hizmetên wî hûr û gir bi xema wî ve bimînin serê wî bikevit çaxên giran av bidit li bin, ji nûka bi xwe bihesit û bizanit ku gelek xelat û nezan bi ku hinde mirovên xwe hinde bê pûte dikirin. Belê çû ji dest derket ling lê hat birîn

û ket li ser kefa destê xwe nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(310) Heçî qedrê tula negirit wê bi destê xwe li
pura bigirit.

Çunkî bê guman e ku her mirovek parçeyek ji wê komka ku li nav da dijît û her yek dikarit xizmetekê bikit. Bo wê komka xwe li gor karîna xwe ji bilî tiral û tembela û ew komik pê tivîyê xizmeta tevaye. Vêca bivê-nevê ye ku meznê komkê çî mal yan ji malê mezintir xizmeta mirova bê pûte nekit. Çend ew xizmet kê m û hindik bit madem tiştê jê hatî dexesîyê tê da nakit, çunkî wekî dibêjin ; "ya rûvî kevlê ya eve ji layekê ve û ji layak dî ve jî heye ew xizmeta kê mmezînin bixwe nekaribit, bikit." Vêca ev gotin tê gotin gava mezinê malê yan rêberê gundî bê dest û pê yanî xizmetkerên kê m bimînit ji ber bê pûtê kirina wî vêca ew bi xwe bi wan xizmeta rabit wê jê ra bê gotin; "heçî qedrê tula negrit wê bê bi destê xwe li pura bigrit."

(311) Heçî ne got û kir ew şêr e yê got û kir ew
mêr e, yê got û ne kir ew kere mêr e.

Bê guman e ku mirov ji bin wan her sê desteka dernakevin:

1- Ewê xweyê kirinê bê ku pê biaxivit hind mirova ageh jê bî kiryara xwe kir. Ew mirov şêre mirov e.

2- Ew ê xweyê gotina xwe bit û ji gotina xwe demekevit, bê guman e, ewe zelamê mirov xwe pê bigrin.

3- Ew ê gotina xwe ber dibit bê ku xwe lê bikit xweyê ew wekî bizna ye. Çaxê dibêjin filan kesê ber avêt, yanî gotina xwe got û bi cih nanî. Bê guman e, ew ê welê bela ye li stiwê mirova da û çî cara kes feydê jê nabînit. Ji zeraêrê pêve.

(312) Heçî dergehê êkê biqutit dergehê wî jî wê

bê qutan.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek û jina xwe bîn, karê wî zêrînerî bî ew di dikana xwe bî û jinik li mala xwe bî - belê jinik wekî wê hêja û taze û berketî û ji xwe şerm û ji Xudê tirs gelek kê mîn - avkêşek wan hebî ew 30 sal bîn li malê da axiftina wî li gel jinkê xûşka min û dîya min, carekê bi tenê jî wî bi çavek ne başî berê xwe nedabî wê jinê, bibî wekî kurê malê. Rojekê jinik wa li devê derî da seknîye berê xwe dayê avkêş ava xwe anî û bilez bir vala kir û li jinkê zivirî û dest avêt zendê wê rût kir û gemirand û givaşt çû! Jinik ma. Hizrên xwe kir. Baş e, vî teres babî carekê tenê jî min ev hizir jê ne kirine, evî çî bî? Û ket hizir û mitala, ji kul û xem û meraqa da hêdî ne xwar, ne vexwar. Heta lê bî êvar mêrê wê hat berê xwe dayê jinik bê mirûte û dil nexweş e û tengav e. Pirsyar jê kir: "Te xêr bit kiça qenc? Jinkê got: "Carê rûne xarê em ê paşê li gel êk du gotina baxivîn. Mêrik rûnişt xarê bihên bizday çav û dev û guhên wî mane li jinkê, ka wê çî bêjit! Jinik hat li beramberî wî rûnişt bi nermî gotê: "Lawê baş ez ê pirsyarna ji te bikim, belê bi rastî bersiva min bide!". Mêrik got: "Belê ez na axivim ji bilî rastîyê." Jinkê gotê: "Rast bo min bêje ka te îro çî bê namûsî kirye? Bi Xudê to rast ji min ra ne bêjî ez hêdî nabim malkîyê te û em pêkve narûnîn xarê; vêca ka bêje te çî kirîye?"

Mêrik berê xwe dayê çare nîne her divêt bêjit, rabî got: "Keça qenc ez çî ji te veşêrim, to dizanî ez zêrîngerim û karên min çekên jina ne - bazin, guhar, hicol û gustîl - îro keçek hat dikana min got, ji min ra bazinekê çêke, belê keç çî keç bî! Agirê Helebê li mala babê wê bikevit, bejna wê wey tîrka esmênê bî dêm wekî heyva li çardehê ji berî roj derketinê bi seetekê li ser çîyayên Kuristanê li meha Îlonê mirov dikarit xwe li ber rûyê wê pêk bînit û kok bikit, du çavên reş û belek li ser ra du birhên kevanî gava tîr jê vedresin li çî erda nasekinin heta ne gihên perê dil, hinarkên rûya! Ma ez çî bêjim keça hêja? Esmânê min sist bî didanê min re-sisîn, devê min qerisî ez nizanim ez çî bêjim? Heta bêje

wekî lîlozê. Oooh keça qenc to bi Xudê kî dilê xwe nehêle ez nizamî min bê tam kir; belê te got rastî bêje; wê keçê qeysa zendê xwe da min û li beramberî min rûnişt xarê heta min baznê wê çêkir. Min bazin dayê gava zendê xwe rût kir, zend çî zend bîn! Te digot qey berfa çîyayê Melezgirê ye û xwîna pêda rijandîye! Hewqa sor û spî ye, bazinê xwe kire zendê xwe, gava zendê xwe li bazinê xwe da liv livand got: Bazinê min teng e, belê pa min zanî vira dikit. Min dest avêt bazinê wê li zendê wê da bir û anî, bazin dirust e, muyekê ne teng e û êkê ne firehe. Bi Xudê min jî dest avêt zendê wê gemirand û givaşt, ew jî kenî û çû."

Gava mêrik we got, jinkê got: "Da ji te ra bêjim bi Xudê wê gava destê te bi destê wê keçê ve, te destê wê digemirand digivaşt, destê êkê bi destê jina te ve bîn digemirand û digivaşt, çunkî wekî dibêjin : "Ahên vî destî namînin li vî destî." Vêca to bi keyfa xweyî? Yan tê tobe bikî hêdî van xirabîya nekî, yan jî bi Xudê ez hêdî heval behrîya te li vê malê nakim."

Mêrik got: "Keça qenc min tobeye, hêdî ez van xirabîya nekim."

Roja paşî avkêş çû xwe avêt li ber lingê jinkê: "Xûşka min, dîya min destê wî li piştta sey ket, ez li bextê te û li bextê Xudê, to li min bibûrî! Jinkê got : "Rabe braw soç ne yên te ne, soç yên mêrê wê jinê ne. Vêca ev bî pê gotin çî gava êk xirabîyekê bikit, xirabîyek wek ya wî bêt serê wî, wê jê ra bê gotin ; "heçîya dergehê êkê biqutit dergehê wî jî wê bê qutan." Çend taze ye ew gotina tê gotin:

(313) Heçî bimîzit bi dergehê êkê ve, êk wê
bimîzit bi dergehê wî ve.

Binyata vê gotinê jî dibêjin şevkê nijdekê bi ser gundekê da girtin û li gund da bî qir û hawar, êkê got babê xwe : "Babo ka rabe gund talankirin! Bi Xudê nihû êkê bêt kirt û pertalkên me jî wê bibit." Babê got: "Kurê min xema nexwe kes bi ser me ve nayê." Kurî got: "Bo çî? Ma to hindeka ji

wan nasdikî?" Babê got: " Ne. Ez kesê ji wan nasnakim, belê babê te li jîyê xwe da derzîyek ya êkê nebirîye, ma ew ê bo çî bên tiştên me bibin." Babê we got û serê xwe danî li ser balîfkê xwe û lihêfa xwe kişand li ser serê xwe û ket xewa xwe. Belê tebata kurî nehat çû li pişt dergehê xwe rawesta, hingî babê got : "Were lawê min pişt rast be, belê kur nezivirî. Demekê babê gule bî ku kurê wî wê bêjit wey la seyê min di jina babê te gayî û ber ra tîqtîqa wî ye wê dikenit! babê got . "Ew çî ye kurê min?" Kurî got : "Êkê mîst bi dergehê me ve!" Babê got: " Him... ev tola filan kesê ye, bavê te jî carekê bi dergehê wî ve mîstibî."

(314) Heta te dêrek avakir te mizgeftek xirabkir.

Ev gotin tê gotin gava mirovek çakîyekê bikit, belê li beramberî çakîya xwe xirabîyek mezintir bikit wekî vê gotinê ye deq û deq, ev gotina kevin çaxê dibêjin:

(315) Heta te malek avakir te şarek wêrankir!

(316) Heçî ne li malkê niza hewalkê.

(317) Heta min xwe naskir min emrê xwe xilas kir.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek lawînîya xwe hemîyê ne li cihê wê da bibûrînit, heta çaxek bi serda bêt paşî bi xwe bihesit ku jîyê xwe beyhode burand. Belê ji desta derket wê jê ra bê gotin: " Heta min xwe naskir, min emrê xwe xilaskir," Vêca divê mirov hişyarîyê li jîyê xwe bikit, hêj pêşîmayî bi ser mirov da nehaî.

(318) Heçî nezanit qiweta xwe ew dûr e ji dew leta xwe..

(319) Heçî li ser sê singa bileyizit êkê herit têda

Ev gotina he tê gotin bo wî mirovê du -sê rû bit û li gel her destekekê bi renekê baxivit û bêjît ez rast û rast hevalê hewe me, ew mirovê welê her carekê serşor û şermazar bit çunkî wê her dîyar bibit ka ew mirovek nerast e û hemî jî wê wî hesab bikin dijminê xwe ewê welê ye dibêjin: "Wey liba nîskê ye, ne bere û ne pişt e."

(320) Hîlevan çî cara têr naxût.

Bê guman e ew mirovê xapînok û fêlbaz ne dostê kesê ye û ji kesê ra na bit mal, ji ber vê êkê hemî gava ne şîrîn e li nav komka ew têda dijît, çunkî hemî kes nasdikin karê wî tev teşqele û hîle ne. Vêca hemî gava her kes xwe jê dîr digirin û gizê xwe jê dikin, heta ewê nasnekin jî gelek pêve naçit wê li ba wî jî eşkere bibit ji lewma hatîye gotin: "Lawê derewîn dixût carek firavîn."

(321) Heta to çûyî hîla ez ji wê ve hatim.

Ev gotina he tê gotin li ser wan kesên dev nerm û ez-manxweş û ne rast. Belkî devnermîya wan ji ber wê êkê ye da xafekê li mirovan bikin, neku hind xweş mirov in û xêrxwaz û camêr in. Vêca heke li beramberî wan hişyar û ageh ji xwe heye wê li wan vejerit: "Mam benî heta to çûyî ez ji wê ve hatim." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(322) Heta te tirş kir, min ji keva pêvedanî.

Yanî heta te xwest to wê teşqela xwe li min bikî min kir hêj te destpê nekirîye.

(323) Hemam bi tir û fisa germ nabit.

(324) Heçî dîtina Tawis bivêt divê germa Hîndê qebûl bikit.

Temaşe bike li gotina (212) ê, em li ser van her du gotinên he axiftin her welê nîzîkî van gotina ye çaxê dibêjin:

(325) Heçî herit masîya qûna wî / wê şil bibit.

(326) Heke mar xwe rastnekit naçit di kunê da.

Bê guman e, ku rastî û êk rûyî bingehê kom û miletan e û her komka xwehrî û çep û çûr li nav parçên wî da peyda bibit, dûmahîka wê komkê şikestin û herifandine, her wekî hafîye gotin "rasto dirusto xwehra şikesto." Vêca bivê-nevê ye, ku her mirovek li gel mala xwe û kes û karên xwe rabit û rûnit da bikarin pêkve bijîn çunkî wekî dibêjin. "Heta mar xwe rastnekit naçit di kunê da." Vêca rastî bo mirova hêj feriztir e.

(327) Heta stûr zirav bibit ziravê biqethit!

(328) Heçî şeqî eve şihîn û weqî!

(329) Heçî bivêt mala xwe bi destê xwe xirabik it, bila du jina bînit

(330) Heçî ne li nav hesêba ew tebayê ecêba.

(331) Heta mirov li ber pîyê xwe nebînit, gelek gava xwe ne avêjit!

Ev gotina he tê gotin li ser wî mirovê hizir û tevgera xwe

li karekê mezin bidit û li dûmahîka wî karê wî li nav lepa da bişepilit û bişepilit, hêdî bi her du dest û linga wê ne karbit xwe jê qurtal bikit, ew mirovê bê hizir bit wê hemî gava şepilî û bê ser û berbit. Bivê-nevê ye li ser her kesê dixwazit xwe li bazeberên giran bavêjit, hûr û dûr binêrit heyne wê ser û ser li tehtekê bikevit. Ne ji xwe da hatîye gotin; " wekî me bûrandî - heçî nezan bit qiweta xwe ew dûr e ji dewleta xwe." Çunkî mirovê xemsar bit wê bi xemsarî herit. Vêca bivê-nevê ye, ku her mirovek; "heta li ber pîyê xwe nebînit gelek gava xwe ne avêjit!"

(232) Heqî mabîya Emer Bendê mehir nedi kir!

Binyata vê gotinê dibêjin du mirov birayên êk bîn navê êkê Emer bî, navê yê dî Heqî bî . Heqî, xweyî jin bî û navê jina wî Bendê bî û Emer bê jin bî. Demekê Heqî mir, Emer rabî jinbira xwe mehir kir. Vêca bî pê gotin çî gava li civatekê bibit pê axiftin û behis û xeberdan li ser heqîyê " ev ne heqî ye ka heqî , ma heqî holê ye? Êkê li wan vegerand: Heqî mabîya Emer Bendê mehir ne dikir? Ka heqî? Heqî mir û çû .. oooo!"

(333) hesabê cerî min hêj nekiryê!

(334) heçî nekit bi xeberê mezina wê pêva bên du şaxên bizina..

Ev gotina he tê gotin gava mirovek zana û têbir şîretên xêrxwazîyê li mirovekê bikit, belê ew guhê xwe neditê heta ser û ser li tehtekê bikevit. Wê jê ra bêt gotin . " Heçî nekit bi xeberê mezina wê pêva bên du şaxên bizina." Çunkî wekî dibêjin : "Gotinên mezi-

na neqşên li beran e." Ji lewma hatîye gotin; "serê xwe bide dîwarên kevin."

(335) Heçî bi kotekî herit mazî nanêrit ervazî.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi kotekî û zorî karekê yan hizrekê bi êkê bidit kirin; bê guman e, li wî çaxî ew mirov wî karî bi dilxwşî û dirustî nakit. heta heke bikit jî wê ne bî dilbêşî û dilovanî bikit. Ka çawa mirovê bi xurtî biçit maziya serê xwe serervaz nakit! Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; "tajî bi kotekî nêçîrê nakit."

(336) halê me ne besî me ye, yê te serbar e.

Ev gotina he tê gotin gava mirov li tengavîyek mezin da bit, hingî bêtê nekeribit karê xwe bi ser êk ve bînit û maye şepilî rê û rêbar bi dest nakevit, dinya lê biye kona gurî. Ew bi xwe hewcey arîkaran e. Vêca li wê tengavîyê da êk dî bêt bêjin: "To bi serê xwekî ka hema li ber karê xwe ra filan xizmetekê bike; ew vêca lê vegêrit: "Halê me nebesî me ye, yê te serbarê jûr da li ser e." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Xemên me ne besî me ne, yên te tireka yarê serbar in jûr da li ser in!"

(337) Heta Kuror talan ne kirin ne revîn!

Kuror gundekê li Kurdistana Turkîyê ye. Talanker hatin da talan bikin, vêca gundî ji cih nelivîn heta talan kirin! Piştî talan kirin ji nûka gundî revîn. Vêca ev bî pê gotin çî gava li ser malekê da, yan gundekê da belayek yan tirsek bêt xwe li ber bigrin heta ew bela yan ew tirsî bibûrit û biçit, ji nûka li xwe biciqicqin karê revê bikin, yan karê desthilanîne bikin; wê bê gotin, "heta Kuror talan nekirin ne revin!"

(338) Heta struyên kerî neyên ma her ceşîk e?

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi karên kê m û bê xêrîyê rabi bi hêceta nezanîne û zarokîyê û ew bi xwe jî ne heqê wî ye welê çêbit wê bê gotin; " heta struyên kerî neyên ma her her ceşik e?"

(339) Hemî heywan goşt dixûn belê navê gurî bi ecêbî belav bîye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek navê wî lî gundekê da bi xirabî û ne başî belav bikit, wekî wî û jî wî xirabtir hebin û kes behsa wan nekit wê bê gotin: "Hemî heywan goşt dixûn, belê navê navê gurî bi ecêbî belav bîye!

(340) Heçîya to bêjî li bêjna heyrên tê!

(341) Hesabê li malê û yê bajêr nabin êk.

Ev gotina he tê gotin gava malxwê malê, yan rêberê gundî li rêka jina xwe da ne çeleng û jêhatî bit. Li hizra xwe da û li xîyala xwe da rêkekê jî xwe ra danit li ba wî ew ê bi wê rêkê qurtal bibit jî tengavîyên xwe û paşî welê dernekevit. Wê jê ra bê gotin: "Hesabê li malê û li bajêr nabit êk!"

(342) henek dibin genek.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi ne başîyekê rabi û hindek mirov gazinda jê bikin: " Çima to van kêmahîyan dikî?" Ew bersiva wan bidit: "Ez heneka dikin." Wê jê ra bê gotin : "Henek dibin genek." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : "Yarî bê micdahî nabin."

(343) Heftîyaro li ber çava dîyaro!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek furt û pesin û zirtên xwe bidit, bêjit: Ez berê ho bîm.. û min filan tişt hebî. Min ho dikir, wek penda strana kurdî çaxê tê gotin: Ez li çaxê xwe da lawkê madenî bîm, xweyê rêz û peza bîm." Wê jê ra bê gotin "heftîyaro li ber çava dîyaro." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin; "Şam dûr e ma mişar jî dûr e?" Binyata vê gotinê jî dibêjin; mirovek çûbîya Kûdê wê zirtên xwe û kerê xwe dabîya: Kerê min li Şamê xwe li ser 7 mişara diavêjit! - kerê wî kerek guhşor û bêxêr - êkê got: De malava, Şam dur e, ma mişar jî dûr e? Eve mişar" Vêca gelek mirov xwe nasbîkit li wê roja mirov têda.

Dibêjin carekê mirovek li ervazîyekê diçû - dinya havîn bî tehra rojê û roj li qunca wî xuhdanê sing û pişt û her du tenişt girtin. Bizîtirê biştê da bî çî paşîya wî sist bî û şil - terbî tîrek kir, ji xwe tîrsa neku hindek li dûv bîn - ji berî li xwe bizivirî - got: Ax pîrîtyê! to çî ji kurê babê dikî? Demê ez xurt, ez li van jêlîya diçûm her min nedizani jî xwe eve ervazîne!" Paşî li xwe zivirî berê xwe dayê kes li dora xwe nedît, got "ne bi Xudê to li xurtaniya xwe da jî ev se bî.

Vêca gelek mirov ne zirtkerbit, çunkî mirovên zirtek bê rû ne..

(344) Her kezî zerek simbêlsorek li ber.

Binyata vê gotinê dibêjin Mîrê Hekarê eskerê xwe girt û hat li ser Mîrê Bota da dagîrbikit. Piştî çend roja bî şer, eskerê Mîrê Hekarê şikest û Bota ketin li dûv. Êk Botî giha tolazekî Hekarî şurê xwe lê bir paş da danit serê wî. Tolazê Hekarî got: Ay dayê... yê botî got: "Heylê qedav li te ketî to şerm nakî dibêjî ay dayê kuro! Belê dîyar e te babê xwe ne dîtîye!" Tolazê Hekarî got: "Bi Xudê mam ez kurê bîjinê me. Gotina dîya min hat li bîra min, heke ne ji ber peşkek xwîne ku min ji tîrsa got. Belkî min bîya dîya xwe nekir min ji bîra xwe bir. Ew gotina Kurda ya kevin çaxê dibêjin: "Heçî nekit bi xeberê mezina wê bi serê wî ve bîn du şaxên wekî bizina." Min guhê xwe ne da dîya xwe. Min guhê xwe da tolazên wekî xwe û min pûte bi wê gotina Kurda nekir,

çaxê dibêjin:

(345) Here li ba wî yê te bigrînit neçe li ba wî yê te bikenînit.

Yê Botî got: Ma dîya te çi got kuro? Got: Dîya min gote min - piştî min gotê dayê ez ê herim kezîzerek Bota ji xwe ra bînim - neçe dayê gorî. Min gotê: Ez ê bi eskerê Mîrê Hekarî ra biçim û kezîzerek Botanî ji xwe ra bînim û bêm. Got: "Dayê gorî her kezîzerek simbêlzerek li ber e." Belê min guhê xwe neda yê, çunkî wekî dibêjin: "Aqlê kurî se tê birî" û ez hatim û halê me jî bî ev yê to dibînî! Yê Botî got: Here min to dayê bi xatrê dîya te, çunkî jinek hêja ye. Dizanit hizrên xwe li dinyayê da bikit, bikêşit û bipîvit.

Vêca ev gotina he tê gotin gava êk bi hizir û xîyala xweşiyê ji xwe ra bêjit bê ku hizrên nexweşiyê bikit, seda sed ne xweşî ne ji xweşiyê kêmtir e.

Dibêjin carekê Bedirxan Begê Botî bivê-nevê bî berambariyê li gel Turka bikit. Pirsyar ji aqîdarê xwe kir: Hizra te li vî şerê me da çi ye? Got: Mîrê min ez wekî xwe bêjim yan wekî te bêjim? Got: De ka ewil wekî min bêje. Aqîdarê wî got: Mîrê min ev Romîn e xweyê pantorên qûn teng in. Her mêrek Kurda wê zora sed Romîya bibit! Bi salekê to Romîyekê li cihê Kurda da nahêlî. Bedirxan begê got: Bi Xudê te xweş got. ka vêca wekî xwe bêje.

Aqîdarê wî got: Mîro, Rom dewlet e! Kom e û dom e. Ev Kurdên wekî nanê garis in. Ne hevgirin her parîyek ji xwe ra diçit! Fûrandina wan wek kela nîskê ye! Zû difûrin û zû dadimrin! Bi Xudê wê ji mala te beramberiyê bi te ra bikin û wê li te rabin wekî nivîsvan dibêjit:

(Heçî gava ji wan ra bête fîtek... ew ê her tiştî bidine bi yek dînarî). Vêca piştî xwe bi wan girênedê û serê xwe ne êxe xaxên giran. Bedirxan Begê got û serê xwe hejand: "Bi ehnîya xwe kin to rast dibêjî, belê pa ez ne çarim ez ê her rabim wê ew bit ya Xudê hezkirî.

Vêca gerek gava mirov bi karekê rabit kar û xusaretê

xweşî û nexweşîyê, serketin û binketinê hemîya beramberî
êk bikit paşî dest bavêjit wî karî da mirov têda ne şepilit!

(346) Hemî fele ne Îşo ne!

(347) Her kes berê tefşo didit xwe.

Temaşê bike li gotina (496) ê!

(348) Hemî teyîr nêçîrê nakin.

(349) Heke qûn bi qûnê bit, bila qûn li cihê xwe
bit!

(350) Heye terrk nîne berrk.

(351) Hirç û govend, rûvî û seyran!

Here temaşê bike li gotina (A li piştî gotina 560) ê!

(352) Heye bêjî yarê dîya xwe babo.

Here temaşê bike li gotina (84) ê!

(353) Hin hingivî dixûn û mêş bi hindeka ve di
din!

Temaşê bike li gotina (603) ê!

(354) Hevalê parî naçit arî!

(355) Here nav mileta bigre edeta.

(356) Her kes dîna nasdikî bê cil, esil ew e dîn
bên naskirin bi cila ve!

Bê guman e, gava tişt ronahî bî û dîyar bî, her kes dikarî
bizanî ka baş e yan xîrab e! belê mirovê şehreza ew e bi-
zanî ji berî ruhî bibit.

(357) Hingî kêrvoşk bimelisî gavek zêde wê lê
bikevî!

Here li gotina (477) ê binêre!

(358) Her şerekê betleşêrek heye!

(359) Her dînsîzkê îmansîzek jê ra divêt!

(360) Heke te girt bernede, heke te berda
pênekeve!

Temaşa bike li gotina (795) ê!

(361) Her kes dike li ser govê xwe ye!

(362) Her serîkî aqlek têda heye.

(363) Heyî be kurrê seyî be.

(364) Hingî ez singekê diqutim to çeltekê pêve
dikî!

Temaşe bike li gotina (466) ê!

(365) Hespê (çê) alîka xwe zêde dikit.

(366) Hestîyê sto we ne li xêran e, ne li şerran e.

Li gotina (714) ê binêre!

(367) Hêlûna teyrê kor jî Xudê çêdikit.

(368) Hey beq ne wêrit wê bipeqît!

Ev gotina tê gotin gava mirovek axavtinên xwe daqûrit, heta êdî tebata wî neyê û hew bikaribit debar bikit? Vêca hema gotinên xwe bi êk carê bidit der! Hindek jê ra dibêjin: Kuro ev çi axivtinin malwêran? Xwe kerrke ma te divêt to stwê xwe li kêrê bidî? Ew bêjit malava ne wekî dibêjin : "Heke beq ne wêrit wê bipeqît!"

(369) Hemî kon ne yên wê êkê ne mirov tilya
xwe bêxit têda!

(370) Hindek bide li ber dasê da to ne mînî asê.

Temaşe bike li gotina (666) ê!

(371) Hingî min kir û got çemê sa ma firot
Ûsman û Qemrî min ne kir çot.

(372) Heke avê da bi ser te ra bostek û çar tilî
ferq nîn in.

Temaşe bike li gotina (659) ê!

(373) Hey deşt e hey zozan e esil Xudan e.

(374) Hey teqdîrbarî feyde nakit hişyarî

(375) Hey deşta Moşê û hey darê dergûşê.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê zilamek û jina xwe bîn, Xudê kurek da wan. Jinkê dergûşa - landika - xwe êxist li navbeyna xwe û mêrê xwe da. Mêrkî keser kêşa û got: Hey xerîbîyê hey xerîbîyê! Jinkê got: Mal bab ne wêrano hemî dergûş e li navbeyna min û te da!! Mêrkê got: Keça qenc hey deşta Moşê û hey darê dergûşê.

(376) Her teyrekê li gel refa xwe.

(377) Heke êkê got: Ez xulamê tema tê misasê bêxî li desta da.

(378) Hingî li pîrê bêt nedit li ser pira Cizîrê!

(379) Hemî kera bi wişkê ne ajo!

(380) Heke nedît hakimê Hey, xwelî li serê Ha timê Tey.

Binyata vê gotinê dibêjin du bira bîn, êk zengîn bî û êk hejar bî, kes û karên wan her gazind ji birayê zengîn kirin: To destê birayê xwe nagirî, to qenciya vêra nakî. Wijdan qebûl nakit çawa bit her birayê te ye! Ew ê arîkarîya birayê xwe nekit, gelo wê arîkarîya kê bikit? Ew ê arîkarîya birayê xwe nekit û ya kes û karên xwe nekit ew ne mirov e. Ew ê destê çakîyê nedît birayê xwe û mirov û xizmên xwe êl û binemala xwe, bila bimrit hêj caw û erzan! Ew pûlperest e, ne

hêja ye, wî qasî ew li nav mirova da bijît bila biçit bi gurk û hirça ra bijît - li vî babetî da Cigerxwîn jî dibêjit:

*Ey dewlemendê bê şeref çidkî ji van koma pera
Sedhezar milyonê zêra têxe kurtanê kera.*

-Yanî eger pare ne ji qencîya li gel xweyî û kes û kar û êl û millet ra bit, bihayê pera çî ye? Biha jê ra nîn e. Ji van tuxmê gazinda serê birayê zengîn hêr û gêj kirin. Birayê zengîn got: Gelî mirova hewe gelek da ser min û ez gelek pê xweş im, bi gazindên hewe, çunkî ew zengîne malê xwe di rîya mirov û milletê xwe ra nedit, gûyê kerî li ser wî malî bit. Çunkî bi rastî mal ji wî qasî ra baş e. Mirov rumet û serbilindî û serfirazyê pê bikrit, belê çî gava welê hat, mirov rûmeta xwe û mirovatîya xwe bifroşit da malî pê peyda bikit û bikirit, hingê mirov ji rêza mirovên camêr û aza derdikevit û dibit kolê malî û kolê wî cihê mal jê tê. Belê baş bawer bikin ez ne ji wî tuxmî me birayê min ne ew biray e. Belkî birayê min wekî dibêjin; "heke nedit Hakimê Hey, xwelî li serê Hatimê Tey!" Mirovên wî gotin ev çî gotine û çîroka wê çî ye? Birayê zengîn got: Dibêjin carekê Hatimê Tey li derê mala xwe sekinîbî, berê xwe dayê mirovek jar û belengaz ji wê ve hat. Hatim berê xwe dayê û hizrên xwe kirin ji xwe ra got: De bi Xudê ne ji wijdanê ye, Hatim hero nan û goşt bixût û ev hejarê he nan bi dest nekevit bidit zarokên xwe, rabî bakir hejarê xwe: Hejaro...ka were. Hejarê xwe bire malê û gazî kolê xwe kir: Here qazekê serjêbike û zikê wê bidrîne û deh zêra bêxe têda û dîsa bidirû û sax bikelîne û deh nana jî vêra bîne, min wec pê heye. Kole çû gotina Hatim bi cih anî. Hatim got hejarî: Rabe vê qazê bibe mal to û zarokên xwe bixûn. Hejar rabî qaza xwe bir û çû, ji berî bighêt malê mirovek li semtê hat, got: Ew çî ye? Hejar got: Qazek e, Hatim dayî min ez ji zarokên xwe ra bibim. Got: Hejar min mêvan hene û kevanîya min ne li mal e û ez gelek ji mêvanên xwe şerm dikim. To wê qazê nadî min, ez ji wan ra bibim. Ez ê 10 mecîdîya bidim te? Hejarî ji xwe ra got: Hema min ev qaz nexwarîye jî wê bibit çî? Deh mecîdî wê

deh kona bigrin, bi Xudê deh mecîdî ji min ra çêtir in qaz hemî danek e! Got ezbenî ev e, ji te ra , ka deh mecîdiyê min bide min. Deh mecîdiyên wî danê û qaza xwe bir. Piştî çend roja çavê Hatim bi hejarê wî ket, berê xwe dayê her zelumê berê ye! Hatim ji xwe ra got: Belkî wan çend zêra têrê nekir bit! Belkî deyindar bit. Rabî dîsa bakir kolê xwe got: Here qazek dî jî serjêbike wek ya berê deh zêra bêxe di zikê wê da û sax bikelîne û deh nana vêra bîne were vêrê. Kole çû qazek anî û hat, hatim ew qaz jî da hejarî û got here bibe ji zarokên xwe ra. Hejarî bir û çû, dîsa ew zelum li semtê hat berê xwe dayê qazek wê desta da - pane tomik jê xwaribî - dîsa gotê: To vê qazê nadî min ez deh mecîdiyê bidime te. Hejar hema bê rawestan got, "belê" û qaz dayê. Wî jî deh mecîdî danê. Piştî çend roja Hatim berê xwe dayê hejarê wî her zelumê berê ye! Bakir kolê xwe: Kuro here qazek dî jî serjêbike, belê zikê wê baş dagire ji zêra. Kole çû qazek pêk anî. Hatim ew jî da hejarê xwe. Belê ew qaz jî bi rîya her dukên dî ve çû, çunkî ew zelumê dî hî bibî hejarê xwe. Hatim berê xwe dayê hejarê wî hema her xurtê berê ye! Rabî gazî kirê: Ka were malbabwêran, ew her sê qazên min dayîne te, te çi jêkir? Hejarî got: Ezbenî bi Xudê her sê jî camêrek li semta min dihat bi xêra xwe ji min dikrî, her êk bi deh medîcîya. Hatim got: Kurro ew kî ye? Got: Filan kes bî. Hatim rêkir li dûv ra anî û gotê: "Lawoo ew tiştê li nav zikê qaza da bîne û to dizanî çend in û ez jî dizanim çend in?" Hatim gote hejarê xwe here tûrekê bîne û were. Hejar çû çiwalek anî û hat. Hatim got xeznedarê xwe li gel hejarî here hingî bivêt bila ji xwe ra zêra bêxit li tûrkê xwe da. Her du çûn. Xeznedarî derê zêra vekir û gotê: Here ji xwe ra dagire, çaxê to xilas bibî bake min ez ê bêm bibim pišta te û derî jî bigrim. Hejar çû jor ve berê xwe da koma zêra! Ji xwe ra got: Hero ji min ra ne îde da ez çiwale xwe taze dagirim. Paşî xeznadar bila bêt derî bigrit! Çiwale xwe da ber koma zêr û dagirt wekî wî bivêt. Kar kir da bidit pišta xwe belê ne karî! Rabî çokdan erdê û çival qulipand ser pišta xwe! Belê çival giran bî ne karî rakit. Çival ket li ser serê wî û ma li binda derneket, heta welê fetisî!

Xeznedar hingî ma... Hejar dîyar nebî! Çû berê xwe dayê wê bi wî awayî! Rabî çû bakir Hatim: Were berê xwe bide wî ew ê te xwestî to wî zengîn bikî? Hatim çû berê xwe dayê serê xwe hejand û got: "Heke nedît Hakimê Hey xwelî li serê Hatimê Tey!"

Vêca gelî mirova bi Xudê birayê min jî wekî wî hejarê Hatim e, heke hûn ji min bawer nekin rabin da bicerbînîn! Rabîn tibabek zêr kirin li nav patekê da û birin danîn li ser derê rîyekê gazî birayê wî kirin, "were here filan derê." - Ew rîya zêr danîn li ser - Bira çû û çavê teva ma lê, heta ji patê zêra bûrî û xwe ne tewandê! Ew rabîn çûn zêrên xwe anîn û hatin. Bira zivirî gişa - hemya - pirsyar jê kirin: To li filan semtê çawa çuyî - cihê zêr tê? Got: Bi Xudê min ji xwe ra got :Erê pa kor çawa bi rêve diçin? Pa hema min girtû ez korim! Û min çavê xwe niqandin û ez çûm. Birayê zengîn got yanî hind çavê xwe neqand heta ji zêra borî da zêra nebînit! Vêca da hûn bizanin ne ku ez li gel ne başim, belkî wekî dibêjin: "Heke nedit Hakimê hey xwelî li serê Hatimê Tey!"

(381) Hûr binêre û kûr binêre û dûr binêre.

(382) Heke teyrükê tergê - quta rezê min bila liv bîn temet serê min!

(383) Hespê bi tenê tozê nakit.

Temaşe bike li gotina (73) ê, em li vî babetî birekê axiv-tine.

(384) Hundir qurbana ji der ve bibit!

(385) Himeta pêjanî çêtir e ji hukmê Xudanî.

(386) Havîna Mîr şeref e!

(387) Hemî ewir baran jê nayê.

(388) Hêstirê navê babê te çî ye? Got navê diya min mehîn e.

Temaşae bike li gotina (447) ê!

(389) Hey lê hat bazirgan e û hey lê nehat xweyî nayî - gayî - wêran e.

(390) Hosta necar were binve wekî her car şev yeke û dergeh hezar

Temaşe bike li gotina (163) ê!

(391) Heke xîyar e ji tûtik ve dîyar e.

(392) Hêceta ne nivêjkerî pêxas bîne.

(393) Hemî çûka hêjîr bixwarana, liv ji şax û heblerîya ra namana!

(394) Hirç hat ve rez, diz hat ve ez..

(395) Heke êkê got mala min ya te ye ma tê agirî berdîyê!

(396) Hingî gû bê tevdan bêhnê jê bêt!

(397) Hervoşka ji min ra bi avê çêneke!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek ji êkê ra birek tekîfên rişî bikit, gotinên bê kiryar bêjît, wê ji ra bê gotin: De ka bi xêra xwe "hervoşka ji min ra bi avê çêneke."

(398) Hingî heye şilk û milk çaxê nebit keser û kulik.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek ne destgir bit ji malê xwe ra û jê nexût û pûte pê nekit heta pûç û belav bikit û dest lê bimînit vala û çavên wî bimînit li destê xelkê! Ji nûka bibit xweyê axên û kovana penc para, belê bê pare. Divîya bî wî destê xwe li ber girtîbîya ji berî rût bibit. Li vî babetî Xudê - pak û paqij - ferman dikit:

«ولا تجعل يدك مغلولة الى عنقك ولا تبسطها كل البسط فتقعد ملوماً محسوراً»

Yanî to destê xwe ne êxe gewrîya xwe ku carekê çakîyek ji te çê ne bit - wek em bi kurdî dibêjin filan kes garis ji desta nakevit - û ne welê jî bit ku bi rengêkî welê to destê xwe bi êkcarî vekî ka tişteke xwe lê negirit. Belkî divîya mirov navîncî bit da karê mirov rast bi rêva biçit.

(399) Her tişteki belayek heye, paşê existinê gelek bela hene.

(400) Hevalê qirê nikil bi gû ye.

Bê guman e, mirovek bi rêka jîna xwe da destekê heval û hogir hildibêrît wekî xwe, ka ew çawan e û çi male ew jî wekî wî ne? Heke baş e wê başa hildibêrît. Û heke ne baş e wê ne başa hildibêrît. Vêca ew mirovê hevaltîya bê xêra bikit bê guman û misoger e, ew jî wê xirab bibit. Çunkî wekî wê malka şîira erebî dibêjît:

«عن المرء لا تسأل وسل عن قرينه فكل قرين بالمقابل يقتدي»

Yanî pirsyara mirovekê ji wî bi xwe neke ka baş e, yan ne! Belkî to pirsyara hevalên wî bike ka ew çî mal in! Çunkî her mirovek li dûv yên wekî xwe diçit. Wekî me bûrandî; " her teyrekê li gel refa xwe." Her li vî babetî pêxemberê Xudê jî - selat û silavên Xudê li ser bit - ferman dikit:

«مثل الجليس الصالح والجليس السوء كمثل ناقل الكير وحامل المسك ... الحديث»

Yanî hevalê baş û hevalê xirab wekî mesela kûrevanî û xweyê miskê ye! Kûrevanî gava to çûyî li dev rûniştî yan dê cilên te bişewtînit yan dê pîs bikit yan tê bêhna xweş jê sehbikî. Xweyê miskê yan tê jê bikrî yan dê belaş bidit te, yan tê behna xweş sehbikî!

Vêca nexwe gelek rast e: "Hevalê qirê nikil bi gû ye!"

(401) Hemî kul diçin, kulê Bersêl Begê bi tinê naçin!

Binyata vê gotinê dibêjin, carekê zelamek navê wî Ahmed Beg bî li semta destpêçekek - biçûkê hêj çav ne bişkivî - hat, dilê wî ma pêve! Rabî peyabî û destpêça xwe hilgirt û bire malê û qewîti li kevanîya xwe kir: To vî kurkî wekî kurê xwe xweyî bike. Zelum bi xwe jî begê cihê xwe bî jêve hati bî. Kurik xweyî kirin. Perweste bî yanî li ber mil bî. xelkê got: Baş e beg navê vî kurkî çî ye? Got; çî gava mezin bibit ew bi xwe wê navê xwe danit li xwe. Kurik mezin bî, bî şeş-heft salî heçî karê avêtin li ber, got: Ez nikarim bikim! Dûmahîkê gotinê, " babo nanê nekera nîne!" Ma to nikarî li ber sêlê agirî ji jinkara bikî da nanî bipêjin? Got : Ezbenî hema Xudê ji wî qasî ra ez dame! karê kurkî bî rûniştina li ber sêlê û agirî xweş bikit û jinik nanî bipêjin, hema gotinê Bersêl Begê- bo tiran e - û navê wî bî Bersêl Beg!

Bersêl Beg mezin bî, bî zelum. Ahmed Beg wî hesab dikit wekî kurê xwe. Rojekê ferman ji xunkarî hat ji Ahmed Begê ra to bi 500 siwarên xwe ve li ba min hazir bibin me şer e bi kafira ra! Ahmed Beg rabî 500 siwarên hêja li ba

xwe komkirin, êvarê xelkê êlê tev li ba xwe civandin û gote wan: Ev ez ê biçim qewîtîya min li hewe ew e hûn bê dilya Bersêl Begî nekin. Ez bêm û Bersêl Beg gazinda ji êkê bikit ez ê hestiyê pišta wî bişkênim! Ahmed Beg he çû Bersêl Beg bû ternalê êlê bi kûve biçit û çî bikit kes nabêjit ev çî ye? Seb xatrê Ahmed begê! Bersêl Beg rabî destekek to-lazên wekî xwe ji xwe ra komkirin û kirin zelumê xwe. Tevgera xwe li nav xwe da kirin gigirên êlê hemî koştin û Bersêl Beg bî beg û li şona Ahmed Begê û her sê jinên Ahmed Begê anîn li xwe mehir kirin û rûnişte xwarê. Ahmed Beg çû heft sala ne zivirî! Bersêl Begê hinde zordariyê li ser êlê dikin, êk nikarî çavê xwe vekit! Begzadeyek yê Ahmed begê hebî ji xwe ra got: De bi Xudê min gelek nanê Ahmed Begê xwarîye. Ev e ez nikarim çî qencîya li Ahmed begê bikim, ji bilî wî qasî ez rabim hawarê bighînimê, belkî bikarbit çarekê ji xwe ra bikit! Begzade rabî li qorre bergêrê xwe siwar bî û qesta Ahmed begê kir. Şev kire roj û roj kire şev ne sekinî heta giha Ahmed begê! Çaxê çavê Ahmed Begê lê ket her wekî birayê xwe dîtû! "Wey to gelek bi xêr hatî begzadê delal. Babo bawer bike to ji hemî êl û eşîra min bi soztir derketî de ka bêja halê êlê çî ye? Û Bersêl Beg çawa ye? Ev e, ji mêj e ez gelek xewnên nexweş dibînim! Begzadê min to bi serê min kî rast bêje ka çî heye û hûn hemî çawan in? Begzade got: Bawerke Ahmed Beg heke te ne gotibîya to bi serê min kî ka rastî bêje, min ne digot, çunkî serê te gelek li ba min şirîn û delal e! Ma ez çî bêjim! To pirsyara êl û eşîrê dikî, êl û eşîr gelek baş in(!) Bersêl Beg bi dirustî bîye begê êlê û her sê jinên Ahmed Begê li xwe mehir kirne û ev e, biskên her sê xatûna ji te ra diyarî û ez tiştêk dî ji nizanîm. Gava Ahmed Begê welê zanî hiş û hedam li serê wî da nema, hema bê hemdê xwe kire hawar û qîrîn: Wey babo hemî kul diçin, kulê Bersêl Begê bi tenê naçin." Rabî destur ji xunkarî xwest û siwarên xwe dan li dûv xwe û êkser qesta cihê xwe kir. Nesekinî heta giha mal. Berê xwe dayê mal çî mal e! Her sê xatûn her êk wa bi stûnekê ve girêdaye bi tayê kezîya wê û Bersêl Beg wê bi şivkên hinara dikevit ser laşê wan: Bila Ahmed Beg yê hewe ji destê min qurtal bikit!

Çi gava bê ez ji yek gonerumê pêve lê nadim. Çaxê çavê Ahmed begê bi wî halî ket û dengê wî bihîst çav li serî sor bîn muyê serê wî gijbîn! Gazî kirê: Teres lawê teresa ev e, ez hatim. Eve ye li şona qencîya min û van jinka li gel te! Belê rast e, çaxê dibêjin : Qencîya ne li cihê xwe da bela ye! "Ew şûr ji kezeb şewitî veweşand serê Bersêl Begê, serî lê pil kir, avêt wê derê! Belê dilê wî tena nebî, hingî rabîya û rûništa wê gotibîya: "Hemî kul diçin, kulê Bersêl Begê bi tenê naçin!"

Vêca ev bi pê gotin çî gava mirovek çakîyê û qencîyê li êkê bikit, ji ber hejarî û belengazîya wî, ew rabbit hindek kiryarên ji xwe mezintir li gel bikit, wê bê gotin rast e, wekî dibêjin: " Hemî kul diçin, kulê Bersêl Begê bi tenê naçin."

(402) Hingî dîk mîr bit û tajî gizîr bit mêvana li derê mala xwe nabînin!

Binyata vê gotinê wek Osman Sebrî li Elîf Bêtkî Kurdî da dibêjit: Carekê rûvîyek li ber xirabe gundekê ra borî, berê xwe dayê dîkek wê li ser kavlekê sekinî! Rûvî xwest wî dîkî bi xapa daxit jêr û bixût. Rabî gazî kirê: Roja te xweş paşa to mêvana nahewînî? Dîk daxwaza rûvî zanî, gotê: Ya te xweştir, keremke here li nav mala. Gizîrê gund li xizmeta te da rawestayê! Rûvî welê hizir kir ku gizîrê gund jî dîkek wekî wî ye wê her duka bixût: Ji xwe ra got: Ev e, taştê û firavîn her duk pêk hatin! Rûvî qesta nav xirbeyî kir, belê gava dîwar li xwe bada çî bibînit! Berê xwe dayê tajîyek evên fêris, devbeş, zik birsî, newq zirav, ling dirêj lê peyda bî! Rûvî bazda û tajî ket ser piştê da! Firtê feltê rûvî ji lepên tajî qurtal bî. Piştî hingî bi çend roja dîsa rîya rûvî bi wî xirbe gundî ket. Çavê dîk pê ket û bakire: Ho apê - mamê - rûvî... Rûvî du sê gavên mezin avêtin û li xwe zivirî û gotê: Te çî ye? Dîk gotê: Hey mala te Xudê avakirî! Ma dostayî û hevaltî holê ye?! To li ser me ra û li ber me ra têtî û diçî, ne silav û ne kilam... De keremke were nav mala şevêkê bi mêvanî bibûrine û paşî to bi xêr biçî. Rûvî got: Da ji te ra

bêjim, bi Xudê; "hingî to mîr bî û tajî gizîr bit hûn mêvana li
ber derê mala xwe nabînin!"

I

(I-A) Irk min li kûda û babê li kûda!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovekê kurê xwe bi jin kir. Piştî zava çû li ser cihê xwe - we dîyar e hind nezan bî - bi navka bûkê mijûl bî, belê tiştek bi ser bêjînga wî neket. Çû got babê xwe : Eve çî jina mismide hewe ji min ra anîye? Û ez ê çî jê bikim? Heke ne kune! Bavê kurê xwe nasdikir, çunkî wekî dibêjin; "xweyê xanî ji hemî kesê pêtir dizanî ka çî di xanîyê wî da heye! Pirsyar ji kurê xwe kir: To bi kûdê mijûl dibî? Kurê destê xwe danî li ser navka xwe got: Li vêdê. Babê hind tengav bî bakir dîya wî : ka were çaxê day hat babê day danî erdê û got kurê xwe: Hey kurê birayê makerê ha iha li vêdê bide. Dema kurê dît babê li kûdê got: Irk min li kûda û babê li kûda!

Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek karekê yan xizmetekê bihêlit bi xewa êkê ve û ew çî jê çênekî û çî jê nezanibit.

J

(403) Ji dūrve di keça mîr ve.

(404) Ji welîya dibin xwelî û ji xwelîya dibin
welî.

(405) Ji dêrê bî û ne giha mizgeftê.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê filek misilman bî û gelek nema mir. Dîya wî rabî pê got: Wey dawo rebeno ji dêrê bî û ne giha mizgeftê. Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(406) Ji têşta rûbarîya bî û ne giha kelehîya

Ev her du gotin tèn gotin çaxê mirovek karek ji destê xwe bikit bo xatrê karek dî û dûmahîk êk ji her du kara bi desta nekevit, wê bê gotin: Ji dêrê bî û ne giha mizgeftê!

(407) Ji tazîtî çûwe di Kuwarî da dibêjit kirasê min ne dîlan dîlan bit min navêt!

Binyata vê gotinê dibêjin mirovek hebî tiştek xwe nebî bikit li ber xwe ji tazîtî çûbî di kuwarê da - kuwara dexlî - camêrekê ji qencîya xwe çar gaz çabon - cang- danê ku jinkê ji cîrana jêra bidûrit. Jinkê dest avêtê da jêra bikit kirasê dirêj. Çunkî kiras û derpê tê ne bin. Ewî li binê kuwarê da gazî dikir: Heke kirasê min ne dîlan dîlan bit ez navergirim! Jinkê lê vegerand û got: De malava ji tazîtî çûwe di

kuwarê da dibêjît kirasê min ne dîlan dîlan bit min navêt. Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek tişteq hindik bi desta bikevit bêjît min navêt û daxwaza tişteq mezintir bikit. Nîzîkî vê gotinê dibêjin: Pîrê bawer nekir şû bikit dema şû kir dawa mehir û heşteka kir.

(408) Ji betalî kêrê babê xwe da li ber dasa.

Ev gotina he her ji wî qasî rohintire ku mirov li ser baxiv-it.

(409) Ji qelsemêra ewe laşê egît û pehlewana na êşit!

(410) Ji ber sa bimînit hestîyên kewa!

(411) Ji gû ne şû û bidî ber dû.

(412) Ji nanê genim ra zikê pûlayî divêt.

Bê gumane ku zengînî barek giran e. Hemî kes nikarît xwe li ber bigrit her wekî Xudê-pak û paqij bit-ferman dikit «كلا ان الانسان ليطغى ان رآه استغنى» yanî bê guman e çî gava mirov têr bî wê ji ser xwe biçit. Ji lewma hatîye gotin: "Mêrkê Kurmanc gava têr xwar wê mêrekê bikujît, yan dê jinekê birevînit!" Vêca ev gotin tê gotin gava mirovekê têr xwar û xwe li ber negirt û ji ser xwe çû wê jêra bêt gotin: "Ji nanê genim ra zikê pûlayî divêt."

(413) Ji kerê weye maker horî ye.

(414) Ji keyfa mehûja dil çû guhûja.

(415) Jijo jî destê xwe bi ser têjkên xwe da tînit dibêjit çî nerm e!

(416) Ji garanê hemî yê li gor makera xwe zivirî.

Ev gotina he tê gotin bo kesî ewê pê çênabit kiryara bi kesê ra bikit ji bilî mirovên xwe pêve. Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin ; "teyrek heye hemî teyr wî didin li ber linga, ew jî têjkên xwe didit li ber nikla."

(417) Ji sed fila êk sere ew jî ker e.

(418) Ji tehma mirov xwe diavêjit behra.

(419) Ji lew befir tê da dest û pê bitezin.

(420) Jin drêsit belê nizanit hember êk bikit.

(421) Ji Mêmê weye sala pare!

(422) Ji devê werbîye hêjî hop hop e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek kêmbikevit û bê rû bibit, belê hêj necirhit xwe û li ser neh û dehên xwe bit, wê jêra bê gotin; "ji devê werbîye hêj hop hop e!"

(423) Ji hindik heta bighêt gundik.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bixwazit daxwazên xwe hemya bi carekê bi cih bînit, belê nekarbit û paşî sist û xav û sar bibit, dûmahîkê jê bigerhit. Wê jêra bê gotin "ji

hindik heta bighêt gunduk." Çunkî wekî dibêjin "pehlewani bi carekê naçit li ser şelîtê."

(424) Ji hêlûnê çû kulînê.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ba xwe, xwe biparêzît ji bela û tengavîya, belê ew parastina wî kêmbû û ne tamam bit, wê bê gotin; "ji hêlûnê çû kulînê."

(425) Ji ava pêl pêlo netirse ji ava sekinî bitirse.

(426) Ji ber şirkê çû li ber mezirbê.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bizafîn û kefteleftê bikît heta xwe ji tengavîyekê qurtal bikît, belê bi wê bizafînê bikevit li tengavîyek mezintir da, wê jêra bê gotin: "Ji ber şirkê çû ber mezirbê."

(427) Jin jî hene jinkok jî hene!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê li zivistanê qirek reş çû ber derê hêlûna kevokê gazî kirê: To min îşev nahewînî? Dilê kevokê pê şewitî derê helûnê lê vekir, qir çû di mal da. Şevêk bûrî û roj bi serda hat, ne kevokê got here û ne qirê got ezê biçim. Man li gel êk heta dinya li wan bî bihar. Her duka êk û duwa xwe kirin xwe li êk û du aliqandin. Kevoka gewir dest bi hêka kir û bî qop - qurt - çêlkên xwe deranî. Qirê got: Ez babim û çêlik çêlikên min in, ezê li gel xwe bibim. Kevokê got ne çêlikên min in û min îzayê xwe pêve bûrandîye û ji nav hinavên min derketine. To bi tenê hatî û bi zigurdî tê welê biçî jî. Her du pêk nehatin. Rabîn çûn li ba mîrê teyra da wan jî êk safî bikît. Qirê got: Mîrê min ev kevoka he hevala min e û me jîna xwe pêkve bûrandîye, heta îro jî, vê gavê dixwazît min bihêlit û biçît û zarokên min jî bi xwe ra bibit. Ez hîvî dikim to zarokên min jê bistîni. Çunkî

tuxmê jina bê tûte ne û guhê xwe bide vê ser pê gotiyê da to ji xwe ra hunerê jina bibînî û çî cara bawerîya te bi wan neyêt. Mîr got: Ka ew çî serpehatiye? Qirê got mîrê min carekê dotmam û pismamê êk bîn hez êk kirin û bi êk kirin; hezkirina wan webî tebata wan bê êk û du nedihat. Rojekê pismamê gotê dotmamê : Gelo heke ez bimrim tê piştî min çî bikî? yan tê şû bikî? Dotmamê xwe giryand û lorand; "çawa to behasa şû dikî? Bila ez piştî te - nê ne bi Xudê ji berî mirina te - bila ez bimrim, nemînim. Nexweşiyek bi ser te da bêt. Her du mane li gel êk çend demekê piştî hingê dotmam mir. Pismam rabî gora wê bi tenê çêkir û rûnişt li ber gorê. Ne xwarin ne vexwarin bî komek hestî. Mirovek çakê Xudê li ber ra bûrî berê xwe dayê dilê wî pê şewitî pirsyar jê kir: Te çî ye û ev gora kî ye? Got: Qurban gora jina min e, dotmama min e. Got : baş e. Te pê xweş e ew sax bibit li ser nivê jiyê te? Mêrik got: Qurban bila sax bibit li ser du behra. Çakî daxwaz ji Xudê kir ku jinik sax bibit, mêrik li wan hizra û texmîna da hind dît gor qelişî û jinik ji nav derket û rabî rûnişt. Pismamê wê xwe avêt stuwê wê. "Wey dotmam ev xewne yan bi rast to sax bîyî? Pa ne pismam du behrê jiyê wî yê mayî gihan jinkê, her yekser bî kalemêr, serê wî poş bî. jinkê ho berê xwe dayê difna xwe lê bada serê xwe lê hejand, rûyê xwe jê zivirand û got : Dê here pîremêrê dev bi tot ji xwe hema ez ev nazik û nazdara he babetê dev û lêvên te me! Li wan axiftina da karwanek li wêdê ra burî hema jinik ket li nav karwanî da û çû. Ew pis mamê evîndar û dil bi kul hişt li wan kovanan da. Vêca Mîrê min bawerîya te bi bextê jina neyê. Her bi dirustî wekî vê pê gotinê ye, dîsa jin û mêrê êk bîn soz û bext dane êk ku kes piştî hevalê xwe şû nekit, carekê mêr çû rêbarekê dûr û çend demekê ma zivirî hat nîzîkî malê hindeka gotê : Serê te xweş bit jinka te mir. Gava mêrik ev gotin sehkîr ket hizir û texmîna, soza wî hat bîrê aya ez çibikim? Ez bimînim holê ez ditirsim ez soza xwe bişkênim! Nexêr baştir ewe ez kîr û gunê xwe jê bikim da ez bê hîvî bimînim ji jin anînî; hema rabî xwe varî kir û çeçoka xwe deranî û avêt kîr û gunê xwe li binî ra jê kirin û xwe kewand û hat li nav hevalê xwe da, dil bi kul birîndar,

çûn gihan malê berê xwe dayê jina wî wa li devê derî rawestayê. Çavên xwe kildayê, biskên xwe badane, xwe kirîye şorba nexweşa, bezî pêşîyê. Wey to bi xêr hatî , to çawanî? Mêrik got ez başim, belê to çawanî? Panê êkê mala xwe xirab kir behsa te kir got: Mirîye! Ev çi ye? Raste dilê min xirab bî û ez bê hiş bîm, belê ez dîsa sax bîm! Her du çûne jorê, bî çaxê xewê merik karê xwe kir, jinkê hingî nev da merik got ez nexweşim û roja paştir jinkê bela xwe jêve nekir; merik zanî ji xwe ye, wekî dibêjin: "Rim di tirê da nayê veşartin." Rabî li ser xwe û got jinkê: " Keça qenc soza te tê bîra te ku ez piştî te çi jina neyînim û to piştî min çi mêra nekî!" Jinkê got: "Belê li bîra minê ew soz. " Mêrik got: "Baş e, hêj to li ser wê sozêyî?" Jinkê got: "Belê, ew soza mine û ez xweyî wê gotinê me heta li ser singê min bê xirêna tevir û bêra." Mêrik hema derpêyê xwe êxist! Jinkê ho... berê berê xwe dayê! Got: "Kuro ev çi ye?" Mêrik got: "Ev cewaba mirna te ye hatî min. Min kîr û gunê xwe jêkirin. da piştî te ez çi jina neyînim..."

Mîrê min deh roj pêva neçûn jinkê serê xwe hilda, pozê - kepûyê - xwe bilind kir. Bî por pora wê: "Ev çi hale? Ma nanê min li mala babê min ne bû? Ma xune ez berdestika malê me. Ez hew ho dimînim." Dûmahîkê rû bi rû gote mêrê xwe: "Ez êdî holê namînim, yan tê min berdî, yan ezê te fihêtkar bikim. Mêrik hingî soza wê da bîrê, belê pare nekir. Mêrik hizrek rakir û deh danîn, ez çi bikim? Ez berdim xelik bêjin çima jina xwe berda? Dîyare pîsatî lê dît! Ez bikujim kembaxtir e! Ez xwe kerr bikim xopantir e." Dûmahîkê ew û jin gihan biryarekê, ku li mal da berdit kes pê nezaniyê û li koleyek yê mehir kir, şev bo koleyî bit û bi roj li ser navê wî bit ev bî karê wê her şev li ber çavê merik wê gotibîya koley: Rabe da biçin li ser cihê xwe.

Vêca ez hîvî dikim mîrê min to guhê xwe nedî vê kevokê, çunkî fêl û fenan jina qencên Xudê dîn dîkin! Mîrê teyra got: "Wekî çi?" Qirê got: "Mîrê min carekê zelamekê û jina xwe bîn, mêrik ji qencên Xudê bî. Hingî destê xwe raberî Xudê fikir jê dixwest ku Xudê wî biparêzît ji nexweşîyên gorê û dogeh. Carekê jinkê got; "erê zelamo ez nabînim to

xwe diparêzî ji xap û telhên jina! To ji nezanîna xwe neparêzî yan jî ji bê pakî?" Mêrik got : "Jin çîne xwelî li serê wan û tepik û xapên wan? " Jinkê got: "De xem nakit. Jinik rabî çû ba masîgirekê çend masîyek anîn û ji dizîve birin li ser cotê mêrê xwe li nav rêza cotê wî da li pêşîya gêsne wî veşartin. Roja paşî mêrik çû li ser cotê xwe dewarên xwe girêdan, çar gava neçû berê xwe dayê masîyek ji ber serê gêsne wî ser ax bî! Mêrik mendehoş ma... Ev çi kes ne dîtîye û ne bihîstîye?! Xelkê tiştên holê dîtine yan bihîstine?! Berê xwe diditê masîye! Hizrê xwe dikit baş e, masî û li bin erdê da?! Dûmahîkê masîyê xwe rakir û dest avêthevcarê xwe, dîsa çar gava ne çû berê xwe dayê masîyek dî jî ji ber serê gêsne wî ser ax bî, heta çû serê xeta xwe ew masîyên jinê vaşartin hemî dîtî û hilgirtî, heta nivro jina wî taştê jê ra anî, Xudê qewetê lê da û rûnişte xarê, mêrik got: "Ka keça qenc to zanî min îro ecêbbîyek dîtîye?" Jinkê got: "Xêr bit camêro?" Got: "Bi Xudê min hindêk masî ji bin erdê da derêxistine!" Jinkê xwe xeşîm kir: "Weyla kezî kurê masî û li bin erdê da?" Mêrik got: "Keça qenc bi Xudê ez bi xwe jî mendehoş mame, belê ez li ber çavên xwe dibînim!" Jinkê got: "Camêro hemî ji Xudê tê!" Mêrik got: "Gelek rast e. Çawa bit şîva me îşev masîne, şîva me xweş e. Here taze biqelîne û here bêje birayê xwe û babê min û pismamê te û dostê min filan kes, bila ew jî bên li gel me bixûn." Jinik rabî hat mal, belê masî çenekirin. Maşîk çêkirin û got wan mirova û xwestin li ser şîvê, êvarî mêrik hat got: "Te şîv çêkirîye?" Jinkê got: "Belê." Got: "Te ew mirov xwestine? Got: "Belê." Bî çaxê şîvê hemî rûniştin, jinkê şîv anî. Merik berê xwe dayê şîv maşe, ne goştê masîye! Got: "Keçê ka masî?" Jinkê got: "Weyla ser bi reşê, bê lome, masîyê çî, ma to çûbî masîya?" Mêrik got: "Ew masîên min li ber cot girtin û dayî te, ewên min ji bin erdê da derxistin?" Jinkê got: "Weyla kezî kurê xelkê masî li bin erdê da sehkirine? To dîn bîyî malwêran?! Mîrik da gopalê xwe dadnit jinkê, mirov ketin li navbeynê da : Te çî ye malxopano? Mêrik got: Ezbenî hindêk masî min ji bin erdê da derxistin min gotê here bike şîv, ewa tiranê xwe li min

dikit. Soz bit ez wê bê kepû û lêv bikim. Jinkê kir hawar li bextê hewe mêrê min bigrin dîn biye wê min bikujit. Gundî û cîran hemî kombîn mêrik bi stûnê ve girêdan hişk û hişk nekarî xwe bilivînit. Jinkê ji dizî ve masîyek nîşê mêrik kir wî ji binê linga kir hawar bi Xudê vê he masîye. Mirovan gotin: Çavên wî girê bidin, çavên wî jî girêdan. Mêrik ma li wî awayî heta nîva şevê. her kes vetevizî ji nûka jinik çû li ber sekinî û got: To çawanî ez qurban bi xwe û fêl û fenên jina xwe ve? Mêrik got: Li min tobe bit ji îro pê ve ez ewil xwe ji fen û xapên jina biparêzim. Vêca mîrê min ez hîvî dikim to çêlikên min bidî min guhê xwe nedî vê kevoka fêlbaz û fenker.

Kevokê got: Mîrê min, ez hîvî ji te dikim to guhê xwe nedî vî qirê reş, evî gelek ezman dirêjî li civata te kir hemî jin bi rêzekê ajotin ka bêhnekî guhê xwe bide xadima xwe jî da ji xwe ra jina bibînî!

Dibêjin carekê paşeyek hebî li ser rûyê erdê kurek hebî kurê wî mezin bî û bî ye jina, babê gotê, lawê min to gihayî jina min divê ez te bi jin bikim hêj ez ne mirim. Vêca ka çavê xwe bigerîne li bajêr da ka te kî divêt da ji te ra bînim. Kurkî got: Babo, min hêj kes bi dilê xwe ji xwe ra ne dîtîye. Rojekê kurê paşê wê li ser banê Ûlya xwe ye, berê xwe dayê keçek belengaz kodka wê li destê wê da ye wa ji xwe ra parsê dikit. Livek sêva xelatî wa li destê kurê paşê da, hema nemerdî nekir, ew sêv veweşand bin çengê keçkê, dev û dev li erdê da. Keçik rabî li ser xwe dilkul, çav bi girî bi ser mal da çû. Dîya wê pirsyar jê kir: Te xêr bit keça min? Got: Dayê malwêrankê berek li bin çengê min da perasûyên min şikênand û kodka min rijand. Keçkê destê xwe bir bin keşxa xwe û got: Eve hêj berê wî li pizya - paxila - min da ye. Dayê destê xwe bir berî da derînit berê xwe dayê eve ne ber e sêv e. Got: Keça min xema nexwe eve Xudê nesîbê te anî, dilê êk mezin ketîye te, divêt te bixwazit. Ka van roja neçe parsê heta ka Xudê wê çawa çêkit? Keçik ma li mal. Kurê paşê hat xarê piştî zanî ka mala babê keçkê li kûdêyê? Got dîya xwe herin keça filan belengazî ji min ra bixwazin. Dayê got: Kurê min ava çavê te rijyaye!? To kurê paşayî em

ê çawa xwe bikin hevalê belengaza. Eve hemî keçên mal meznane, ka te kî divêt da rabin ji te ra bixwazin? Kurkî got: Dayê çêroka ji min ra nebêje, soz û peyman bit li ser min ne ew keçik bit min serê xwe nedanî li ser palenîşkê çi jina! Dayê neçar bî. Piştî bab jî pê agehdar kirî rabîn çûn mala babê keçkê bi xwazgînî. Babê keçê qelenê xwe bi paşakî xwest û stand. Keçik piştî çend roja veguhastin. Mane li ser keyf û xweşîyên xwe. Piştî çendekê dê û babê kurkî mirin û kurk li şona babê xwe bî paşa. Adetê wî bajarî ew bî her çend sala carekê diçûn karwan û karwanîya wan dirêj bî. Paşayî nû rabî wî jî xwe lêk da ew jî bi nav karwên ket jina xwe hişt bi tenê, bê kes û bê kus, çunkî dê û babê wê jî mirbîn. Kesek li ber destê nema ji bilî xadima wê bê xercî man li jor ve, qûtek kê. Jinkê por pora halê xwe ji mêrê xwe ra kir belê bê par e. Paşa her çû û jinik ma li jor ve, li çaxekê destê xwe kir li binê berûka xwe da du mecîdî wê li binê berûka wê dane. Her du mecîdî derxistin da xadima xwe û gotê here sûkê bi mecîdikê hervişme bi reng û taw û dezî bikre û mecîdikê jî bide bi xwarin. Xadim çû gotina wê bi cih anî û hat, keçik ket li ber wê şevê desmalek çêkir. Mirov dil nahêlit lê binêrit û got xadima xwe rabe bibe sûkê bifroşe belê hişyar bî nedî mirovên kose. Xadim rabî bir li bazara ewil çar mecîdî pê hatin heta serê sûkê bîr 15 mecîdî êk kose gazî xadimê kir : Li ser min bi 20 mecîdîya da xadimê da yê kose. Kose heqê wê dayê û dest avêt gustîlkek zêr jî dayê got: Vê gustîlkê bide xweyê vê desmalkê. Xadim hat 20 mecîdî dan xatûnê belê gustîlk nîşe nekir, xatûn rabî 10 mecîdî dan xadimê û got bibe bide bi hevrişmê bi reng û 10 mecîdîya jî bide navmalî. Xadim çû gotina xatûnê bi cê anî tiştên gotî hemî kirin û anîn. Xatûn wê şevê ne nivist heta seharê perdek çêkir. Mirov her divêt berê xwe biditê, rabî pêça û danî li ser milê xadimê û got: Bibe bifroşe, belê hişyar be nedî kosa. Xadimê perde bir li bazara ewil 50 mecîdî pê hatin heta giha yê kose bîn 100 mecîdî. Kose got: Li ser min bi 200 mecîdîya, perê xadimê danê û dest avêt cotek guhara got van jî bide xweyê vê perdê û silavên min jî lê bike. Xadimê pare anîn û dan xatûnê, belê guhar nîşe ne-

kir. Xatûnê rabî wê şevê yek dî çêkir mezintir û ciwantir. Seharê da xadimê û got bibe bifroşe ageh ji xwe û kosa hebe nedîyê. Xadimê bir heta giha koseyî bihayê wê bî 500 mecîdî. Kose got li ser min bi 600 mecîdîya, parê wê danê û got: Evî cotê bazina ji xatûna xwe ra bibe. Xadimê pare anîn, belê bazin jî nîşê wê nekir. Şeva paşî xatûnê yek dî çêkir, ji dilê xwe ra û seharê da xadimê û gotê: Evê bibe û kêmi hezar mecîdîya nede. Xadimê bir heta giha koseyî bi bihayê wê bi hezar mecîdî. Kose got li ser min bi 1200 mecîdîya. Parê xadimê dayê û dest avêt kemberek zêrîn û got : Vê jî bide xatûna xwe, xadimê pare anîn dan xatûnê wekî her car kember danî li ba wa tiştên dî. Xatûnê got: Xadimê..... Xadimê got: Belê. Got Min îşev bêhin vekirine, here dergehê xwe baş asê bike û here li û da xwe bin ve da ez jî îşev binvim, çunkî ez gelek westame. Xadim çû nivîst. Xatûnê jî serê xwe danî û ket xewa şîrîn. Çaxê bi xwe heşha textê wê hat û çû bi ser xwe ve hat çavên xwe gemirandin, berê xwe da li dora xwe kes nedît. Dîsa serê xwe danî xewê dilê wê girt berê xwe dayê dîsa textê wê hat û çû! Ho bi ser xwe ve hat, berê xwe dayê kose hat nîva malê! Kose got: Çima xatûna min çaxê min gustûlk û bazin û guhar û kember rê dikir te ne got ev çî ne? Çîrok pê nevên to bibî teyir to ji destê min qurtal nabî. Heke to bawer nakî gazî xadima xwe bike. Xatûn gazî xadimê kir û hat, got: Rast e, kose ev tiştên he dane te? Got: Belê. Got: Baş e, pa çima te nîşanî min ne dikir? Got: Min nediwêrî. Xatûnê got kose: Vêca to çî dixwazî? Kose got: Bi dilê te ye, to dixwazî emê mala te bibîn li ser ya min û te divêt emê ya min bînîn li ser ya te? Xatûnê got: Emê her duka sehkin, kîjîk siviktire emê wê bîn li ser ya dî? Belê pa to li kûra hatî mala min û dergeh girtî? Kose got: Min lexmek ji xanîyê xwe lêdaye yekser bo ûda te. Xatûnê got: Pa ber min bikeve da biçin ewil mala te sehbikîn. Kose ket li berahîyê û xatûn ket li pey û xadim ket li pey xatûnê û jor da xwe berdan li lexmê da carekê berê xwe danê li hewşa kose ra derketin. Kose dest avêt klîlkên xwe der anîn û derên ûdên xwe êk êk vekir û xatûnê berê xwe dayê, her ûdek pire ji texlîtek malî, ûdak pire ji zêr û

êk ji zîv û êk ji qumaş û êk ji dirr û yaqota. Carekê berê xwe dayê xencerek kalan zêr wa li ser wêdê ye ji dizî ve êxist li pizya xwe da, got kose: Da biçîn vêca ya min seh bikîn. Kose dîsa ket berahîyê û xatûn ket li pey û xadim li dûv xatûnê. Xatûnê zanîn nêzîkî mala wê bîn, ew xencer deranî û hingî hêz û quwet hebî jorda danî qolinca kose. Serê xencerê li berê dilê kose ra derket û got: Teres lawê teresa ma keçên baba welê hawante ne, ku to qesta cihê wan bikî!/? Berê xwe da xadima xwe û got: Keçê xwe datewîne bide pišta xwe da bibîn veşêrîn. Xadimê xwe tewand da laşê wî rakit xatûnê ew xencer jorda veweşand rayê qolinca wê jî: Hey çi min bi serê wî li nav teşka te dayî roja ewil min gote te desmalên min nefroşe kosa; heke dîya te jî ho ne kirbîya te jî ho ne dikir! Hey çi min difna te û kose li derqûna kurê paşê dayî heke ew jî ne bênamusek wekî te û kose bîya, wî ez bi tenê bê kes û kûs ne dihiştin! Her du term hinc hinc kirin û bîn ax kirin û çû malê destek cilên mêra kirin li ber xwe û çend hemal anîn malê kose hemî kişand li ser mala xwe û koçk û dîwana xwe vekir û xwe bi danê û qencîyê anî pêş, heta dûmahîkê nehişt kes xwarnê jî li mala xwe bixût, divîya hemî li ba wî bixûn û vexûn - û kes nizanit jin e - dûmahîkê xelkê bajêr hemî bîne êk û ew kirin paşa. Û gotin: Paşayê me yê berê kêr nayê eve baştir e! Man bi wî miqamî heta karwanî hatin ji karwanê xwe, bersiv gehiştê bajêr eve karwanî hatin li teniştê bajêr, zarokên bajêr her kes bezî li pêşîya mirovên xwe, kurê paşê jî dest avêt hindêk şekrok û şîranî raberî zaroka kir, belê kesê ji desta newergirt û teva gotin: Xwelî li te bit ma em li ber minetê te ne? Ji dewlet serê paşayê me tiştêk ji me kêm nîn e, çunkî nahêlit li ber destê me kêm bit. Tiştên me pêtivê bit li ber me hazir e. Kurê paşê got: Em navê paşayê xwe nizanin, belê tîlya wî bine mala te tînit, were here lê bibe mêvan da to ji xwe ra merdemêra bibînî? Kurê paşê ne got pa ne ez xweyî koçk û dîwan bîm, hema yekser got: Pa êk min bibin wêdê, hindêk ketin li berahîyê heta birin dîwanê, ew jî li wêdê rûnişt heta hemîya şîva xwe xwarin û qehwa xwe vexwarin, şevbûrka xwe bûrandin. Her kes rabî da biçit mala xwe. Paşê got -

jinkê - gote kurê paşê (mêrê xwe): To neçe li vir be... Dîwan vale bî, nema ji bilî paşê û kurê paşê - Pa ne kurê paşê, paşayî nasnakit ku jina wî ye - paşê got: Lawê qenc rabe da biçîn cihê nivistinê vêdê nexweş e. Kurê paşê got: Ez kolê te me vêdê ji min û babê min zêde ye, belê bela xwe jê venekir, heta bire jor. Jinkê ji mala kosey lalîkek zêr mirîşkek zêr çûçekek hemî zêr anîbî danîbî li pencera xwe da; çaxê çavê kurê paşê ho... bi mirîşkê ket mendehoş bî. Ageh ji xwe nema, çavê wî êdî ji lalîkê û mirîşkê venebî. Hingî paşa li gel axift: To ji kûyî û hûn bi kûve çûn, hewe gelek îza kêşa? Ew nikarî du peyva li gel paşê baxivî, çavên wî ji lalîkê venabin. Paşê got: Lao her wekî dilê te gelek ketî vê lalîkê û mirîşkê? Kurê paşê got: Belê ezbenî çunkî kesê tiştên holê ne dîtîye! Paşê got: Heke to bihêlî ez destekê bême li ser te ez ê çûçekê bidim te? Kurê paşê bawer nekîr. Paşê wegot hema derpê xwe êxist nav teşkên xwe û got: Keremke... Gava wekir jînkê tiv kirê û got: Kurê dihlê bawerke te gelek car dî derpê xwe ji gelek dî ra êxistîye? Heke ne bi xatrê dîya xwe û babê xwe bîya minê îşev to zîvar zîvar kirbîyay, ey bê bûte ez jina te me! Te dît çawa te ez bê kes û bê kûs hiştim û to çûyî têra çar roja xwarin te ji min ra nehişt û paşê çêroka xwe hemî jê ra got: Vêca mîrê min "jin jî hene û jînkok jî hene." Ne ji vê kêmtir e çêroka Elaedîne dirfiroş mîrê min.. Mîrê teyra got: Ew çawa bî?

Kevokê got: Mîrê min dibêjin carekê paşayek û her du aqildarên xwe derketin da seh û sûya xelkên bajarê xwe bikin - piştî xwe guherîn bi rengekê derwêşa - berê xwe danê carekê siwarek ji wê ve tê, belê siwarek kok û lêkdayî, mirov dil nahêlî li bejin bala wî binêrit. Tekbera wî çavên mirov jê tejjî dibit. Her sêka ji xwe ra gotin ev siwarê he gelek koke, belê em nizanin ka merdemêra wî çawa ne? Bawerkin emê vî siwarî bicerbînî ka ji merdîya xwe ve çawan e? Siwar hat li semta wan silav kire wan, her sêka pêkve gotin: Ellah dost û keşola xwe li ber vegirin; sûr li lihafa hespê xwe û sekinî û got: Bawer bikin gelî babderwêşa hewe li cihek xirab li min hilêxist, belê hûn û şansê xwe, destê xwe

bire berûka xwe û derêxist raberî yê nivê kir û got: Eve şansê te ye. Ka şansê hevalên te çawan e? Û dê bibit çî? Destê xwe kire berûka xwe deanî raberî yê milê çepê kir û paşî raberî yê li milê rastê kir û rîya xwe girt û çû. Her sêka berê xwe dane keşkola xwe nêrîn her êk durrek li keşkola wî daye şansê aqildarê milê rastê durra wî ji ya her sêka biçûktir bî! Paşê got: Dana vî mirovî mîr û paşa nadin belê pa şansê aqildarê milê rastê durra wî biçûktir hat! Ev mirov her wekî em naskirin, bêhnekê henek - tirane - bi aqildarê milê rastê kirin û kar kirin da biçin, belê kerba aqildarê milê rastê jêve bî, rast: Çawa em nasnekirin? Pa min nasnakit ku ez yarê jina wî me û her şev ez li berê jina wî da dinivim! Gava we got çavên paşayî sor bîn got: Kuro binêre to çi dibêjî? Got: Bi serê paşayî we ye her wekî ez dibêjim, paşê got: Bi tac û textê xwe kim to dîyar nekî ezê serê te lê bidim! Got: Li ser çava bes muhletê bide min, paşê got: Muhlet ji te ra heta çil roj dî û vegeşîyan hatin malê, aqildarê milê rastê çû mal dil bi kul û dil bi tirs, zarokên wî pirsyar jê kirin: To çima dil nexweş î? Aqildarî çêroka xwe ji wan ra got û paşê gote wan ez nizamim ew mirov ji kûye û navê wî çî ye? Û hekê ez dîyar nekim wê paşa serê min lê bit. Keça wî got: Babo xema nexwe ev sanahiye! Min dapîrek sihirbendek heye garsî bi sê rêzî bi stûnê ve dibit! Bi xwe ew siwar di binê heft behran da bit dê wî derxit. Rêkirin li dûv pîrê ra anîn. Aqildarî çîroka xwe ji pîrê ra got: Pîrê kenî û got: Pîrê heyran ev sanahiye, to wekî dibêjin: "Rohin li çîrê û seyra melekê aqildarî got: Ka pencek zêra bidin pîrê! Pîrê zêrên xwe birin û rabî çû - piştî saloqdanê siwarî ji aqildarî wergirtin - zanî ka ew kî ye? Zanî ji Elaedîn pêve kes dî wê merdemêrîyê nakit. Pîrê rabî destek cilên ehlê Xudê kirin ber xwe û yekser qesta mala Elaedînê dirrîroş kir; çû nîzîkê mala wî nobedara lê heytand: De here pîra pitot her muyek yê te ewanek wê li bin da ye! Belê pîrê xwe ne veda heta Elaedîn hat; pîrê bezî pêşîyê. Elaedîn got: Te xêr bit pîrê? Pîrê got: Pîrê qurban pîra te hecî ye û bi şon hecîya ve maye, divêt van çend roja li ba hewe bit heta heval jê ra peyda bibin. Elaedîn ji dilpakîya xwe got: Keremke pîrê,

pîrê ket pêşîyê û Elaedîn ket dûv. Çaxê çûn malê, jina wî gotê: Elaedîn ez hîvî dikim to vê pîrê neyînî mala me, pîrên holê "dixapanda dused ders dane Îblîs." Elaedîn gotê: Hey mala te çawa to we dibêjî! Pîrên holê tiberkin, bi dest kesê nakevin! Xudê ji me ra rêkirîye! "Here pîrê here jor Xudê me bidit xatrê te!" Pîrê çû jorê. Zend û baskên xwe hildan, her wekî ne pîra 70 salî, belkî wekî keça 14 salî... Ho bi lez û bez firaxên - aman - xwe şuştin cih rast kirin, şîv danî ber wan; her wekî ew kevanîya malê! Pîrê xwe xweş xizmet kir, heta wan jî hîyê xwe dayê, pîrê biste bî, mal û navmal nas kirin... Çend rojeka ma pîrê got jina Elaedîn; pîrê heyran serê min gelek rêvîn bîye! Heke me balav kirbîya gelek baş bî? Jina Elaedîn got: De here balava xwe bike pîrê, eve ji te ra cil û tekbera balvê here serê xwe bişû. Pîrê got: Keça min ez dixwazim to jî bi min ra bêy da pê vî destê pîroz ev destê min danîye li ser berê reş li mala Xudê, pê vî destî serê te bişûm, bela xwe jê ve nekir heta ew jî li ber sersuştinê ra kir. Pîrê serê wê şuşt. Nîşan û saloqdanên wê bi dirostî hilanîn, hindek ji mûyê wê jî hilgirtin bê ku ew pê bihesit. Piştî pîrê daxwaza xwe bi cih anî; du roja piştî hingê got: Eve heval ji min ra çêbîn, em ê pêkve biçîn hecê. Vêca ez hîvî dikim hûn gerdana min aza bikin û da bêm serê hewe. Çû serê her duka. Gote jina Elaedîn: Ez gelek hez dikim heke to destek cilên xwe bidî min, ez bibim ji nevîka xwe ra û her û her to li ber çavên min bî û ez te ji bîr nekim û dua ji te ra bikim. Jina Elaedîn rabî destek cilên xwe danê. Pîrê cilên xwe pêçan û dan li bin kefşê xwe û derket û çû yekser bo mala aqildarî û cilik danîn li ber û pora jina Elaedîn jî dayê û nîşan û saloqdanên wê jî bo gotin. Êk ji wan saloqdana xalek reş wa li navbeyna her du memkên wê da "kesê ne dîtîye ji bilî min û mêrê wê." Wê rojê qewlê aqildarî û paşa ye. Rabî çû dîwana paşê û ew tişt bi xwe ra birin, paşayî got: Eve çi ne? Aqildarî got: Ev nîşanên yara min in, jina merdemerê te xweyî durra paşê got: Navê wî çi ye? Got navê wî Elaedînê durrfiroş e. Li ba te misoger bit wî ew mal bi jina xwe kom kirîye! Paşê got: Gelî êlçîya herin Elaedînê durrfiroş kelemçe bikin û pêş û paş li kerê bikin û bo min

bînin. Êlçî çûn Elaedîn anîn dîwana paşê. Çaxê silav kire paşê, paşê tif kirê. Elaedîn got: Paşa xweş bit, serê min bibre û min kirêt neke, ez ne zelamê kirêtkirinê me. Baş bizane te xelet li ser min sehkirîye! Paşê got: Teres lawê teresa çawa min xelet li ser te sehkirîye û zanîye! Her şev êk dikevit li berê jina te da û to çorê xwe pehn dikî mîna beraza! Aqildarê milê rastê got: Weye paşa xweş bit, heke hûn bawer nakin eve saloqên jina wî ne û dest avêt cilên jina Elaedîn danîn li ber paşê û destê xwe bire li berûka xwe pirça wê deranî û got: Eve jî dîyarî ya wê ye ji min ra rêkirî û ji bilî van hemîya jî nîşana reş wa li navbeyna her du memkên wê da. Gava we got, xuhdanek sar xwe avêt Elaedîn, rengê wî zer bî, ezmanê wî şikest axiftin jê nehat, paşê got: Celad serê Elaedîn bibre. Celadî Elaedîn bir li ser sînîya xwîne da serê wî bi şonda bizivrin li mala Elaedîn; Elaedîn çaxê her sê durrdayîn derwêşa û zivirî li malê gotibî jina xwe îro sê derwêş hatin pêşîya min û her êkê min durrek dayê belê ez welê hizir dikim ew ne derwêş bîn, belkî paşa û her du aqildarên wî bîn, bes tiştê mayî li dilê min da - ew jî bê hemdê min - durra aqildarê milê rastê biçûktir hat ji ya aqildarê milê çepê gelek durra nivê ji eqildarê milê rastê ra bîya, belê pa welê çêbî. Vêca gava Elaedîn welê bê serû ber anîn dîwana paşê! Hejarek hebî jîyana wî li ser mala Elaedîn bî, gava hejarî Elaedîn dît welê bê ser û ber anîn dîwana paşê ew kete li dûv heta zanî dûmahîka wî bî çî? Ji wêdê zivirî û bi bez qesta mala Elaedîn kir bi şîn û girî, bi qîr û hawar! Jina Elaedîn lê derket, pirsyar jê kir: Te çî ye hejarê min? Got Elaedîn birin celadxanê wê serê wî bibrin! Jinik hema rabî, serqot û bi kitek şimik qesta dîwana paşê kir, giha derê dîwanê, guhê xwe dayê celadê dikit gazî: Hêêê paşa wê bi Elaedînê durrfiroş bi kerb û kîn ketî kî heye mehdera wî bikit? Heye ezê serê wî bibrim, paşî kes gazinda ji min nekin! Jinik giha celadî: Celad bisekîne heta ez bigehim dîwana paşê, ez du gotina bêjmê. Celad sekinî. Jinik çû jor berê xwe dayê paşa rûniştîye, dîwana wî girtîye û her du aqildar her êk wê li cihê xwe da ye. Aqildarê milê rastê bi keyf û dil xweş e. Çunkî wê Elaedîn bikujin û aqildarê milê çepê bi xem e ji

ber kuştina wî, çaxê jinkê ser da jorê çavên teva ma lê, ka ev çî jînik e û hatîye çî wê çî bikit! Berê hemîya ma lê, hema wê jî ji nîşka ve kita şimka xwe êxist ji lingê xwe û ji cih kur vekir aqildarê milê rastê û serê wî da ber şimka. Aqildarê milê rastê bi ser xwe ve hat: Te xêr bit xuşka min, keça min to çî dixwazî? Belê jinkê muhlet nedayê, bi dev û dest: Kûçik lawê kûçika to her şev têy li berê min da vêca şevê dî kita şimka min te dizî? Ha iha vê gavê kita şimka min yan ez ê kita şimka xwe ji devê te û wî paşayî û aqildarê wî çêkim. Bi şev hîz û dizî û bi roj aqildarê paşayî? Û li bera şimka wê ji ser serê wî rabbit. Aqildarî got: Xuşka min, dîya min bi Xudê min di saxîya xwe da nedîtîyî ev çî bê bextî ye? Jinkê got: Teres lawê teresa şevê dî jî to li berê min da bî heta vê siharê, vê gavê to bîyî çûçka behîştê. De bîne şimka min yan ez ê te bikim şimik. Paşê got: Aqildarê bê namus min welê hizir dikir to mirovekê pakî, belê dîyar bî, to selatî û bê tûte yî! Dê şimka wê bidê yan bi serê te, kûçik lawê kûçka. Aqildarî got: Paşa xweş bit bi tac û textê te kim ez vê jinkê nasnakim û min li jîyê xwe da nedîtîye û ev sor û sor bê bextî ye ev jinka he li min dikit. Û ez jî paşê dixwazim van dêhlên holê ji nav millet rakit da şerma kurên baba nebin. Paşê berê xwe da jinkê; jinkê got: Paşa xweş bit, bi tac û textê te kim şimka min neînit ezê wî bikim şimik û to jî li gel wî! Paşê berê xwe da aqildarî, aqildar got: Bi serê paşayî kim ez vê jinkê nasnakim-û min nedîtîye, ev jinka he ji bê bextîya pê ve li min nakit! Jinkê çaxê baş zanî, paşê û xelkên dîwana wî hemîya zanîn aqildar vê jinkê nasnakit; ji nûka berê xwe da aqildarê milê rastê û got: Pa baş e, hey teres lawê teresa madem to min nasnakî - û weye to min nasnakî - pa ev çî gûxwarine to li cifta kurên camêra dibêjî ez yara jina Elaedîn im? Heta to namusa kurê baba rûsar bikî û serê wî lê bidî! Hey kûçik lawê kûçka, pa ez jina Elaedîn im. Ka li jîyê xwe da te ez dîtîme? Gava paşê dengê jinkê sehkir got: Kuro bibezin celadî nehêlin serê Elaedîn bibrin! Çûn Elaedîn anîn. Ji nûka aqildarî biryar li ser xwe da û çêroka xwe û pîra sihirbend ji paşê ra gêra. Paşê got: Bibezin pîrê jî bînin. Çûn pîr jî anîn. Pîr û aqildar her du

hinc kirin û bi şûr û xenceran. Elaedîn û jina xwe jî çûn mala xwe.

Vêca bi rastî " jin jî hene û jinkok jî hene." Çunkî wekî dibêjin: " Eslê jinê jin e." Çunkî bê guman e, ku jin êk ji her du êsîlên mirovatîyê ne, ka çawa mêrên çak û xirab hene, welê jin jî - mirov dikarit bêjit - sê destên her weku hatiye gotin : "Hin jin in û hin jan in û hin xelîmê kulûran in." Yanî eger guhdarê meznê xwe ye û xem xwe ra mala xwe ye û parazkera şerefa xwe ye, bê guman e ew jina wê malê ye, ewa ew tê da. Û eger ne guhdar û bê şerm û rû reşa mala xwe bit bê guman e, ew jana wê malê ye, ewa ew tê da. Dibêjin: Carekê mirovek li rêbarekê çû, lê bi êvar li semta melekê hat, wî jî qesta wê malê kir û çû jorê silav kir. Malxwê malê pêşve hat cihê wî çêkir û xêr hatin lê da û kevanî ji cih nelivî! Mêvanî berê xwe da malxwê malê kalemêrekê ser û rih poş bîne! Piştî şîva xwe xwarin, malxwê got kevanîyê: Erê to zezewatekê ji me ra nayînî, em xwe pê mijûl bikin? Kevanîyê lê vegerand û got: Ezê qurederê ji te ra bînim; te çî kerafî li xopana xwe de heye? Her şev mêvan û mêvan.... Ez bi van ve beicim! Xudê wêran kirî. Malxwê xwe kerr kir. Piştî xuhdanek sar xwe avêt ehnîya wî. Mêvanî got: Erê mam jîyê - emrê - te çend sal e? Malxwê got 40 sal e. Mêvanî got: Baş e, pa bo çî hinde poş bî û pišta te qos bîye û hinde bê çare yî? Malxwê got: Heke to subehê çûyî filan derê birayê min yê nivê, mala wî li wêdê ye tê bizanî ka ez çima pîr bîme!

Roja paşî mêvan çû heta giha mala birayê nivê, qesta mala wî kir û çû jor ve, berê xwe dayê malxwê malê mirovek qerte mêr e. Serê wî niv niv bîye, şîva xwe xwarin. Malxwê got kevanîyê: De ka rabe tişteke ji me ra bîne, em xwe pê mijûl bikin? Kevanîyê got: De ka emê rabin Xudê wêrankirî, to nahêlî miorv cihê xwe germ bikit? Ka ho bike û ka ho bike!... Welê got û rabî çû pêjîngek kûz û legenek hêjîr û êk hinar anîn! Yanî malxwê çî gotibîya heta por por nekirbîya ranedibî! Piştî şîva xwe xwarin, şevbûrka xwe bûrandin mêvanî got: Erê jîyê te çend e? Malxwê got: Jîyê min 50 sal e. Mêvan got: Eve çî ye birayê te 10 sala ji te

biçûktir e û to li ber çava 20 sal ji wî biçûktirî? Malxwê got: Heke to sibehî bi xêr ji vêrê çûyî gihayî filan derê mala birayê min yê mezin li wêdê ye, tê hingê bizanî ka ev çî ye? Poja paşî mêvan evarî giha mala birayê mezin berê xwe dayê zelamek tamam e hêj deh mûyên spî nebîne ser û rihên wî, mêvan rûnişte xarê belê tebata wî nehat, çunkî berê xwe dayê birayê mezin hêj xurtir e! Rabî pirsyar jêkir: Erê jiyê te çend e? malxwê got: Jiyê min 60 sal e. Mêvanî got: Erê to ji min ra dîyarnakî eve çî ye to ji her du birayên xwe mezintir i û li ber çav to ji her duka xurtir î? Û birayê te yê biçûk li ber çav ew bi gelekê ji te mezintir e! Malxwê got: De rûne û bêhna xwe fireh bike tê bizanî, li wan gotina da kevanî hat xêrhatinê li mêvanî kir û keyf xweşî lê da her weku ew ji mêje êk û du nasdikin û paşî gote malxwê: Ez xadim ka hûnê çî bixûn û dilê hewe diçit çî? Malxwê got: Keça qenc ma me çî heye em jar û feqîrin hema çî hebit bine? Kevanî got: To bi Xudê wene bêje ma min to nînî? Madem min to heyî ez ne belengaz im. Ez hemî malê dinyayê dikim gorî nenyoka te! Paşî şîva xwe xwarin, malxwê got: Erê keça qenc to ji me ra fêqîyekê nayînî em xwe pê mijûl bikin? Kevanîyê got: Li ser serê xwe ezê ji te ra bînim. Ka dilê hewe çî dixwazit da ji hewe ra bînim? Malxwê got: Zebeşekê ji me ra bîne, kevanî çû zebeşek anî. Malxwê pila xwe lê da got: Bawerke zebeşê me kal e - sor nebîye - kevanîyê got: Ez xadim da wî bibim, yek dî bînim. Ew bir çû yek dî anî. Malxwê pila xwe li wî jî da got: Eve jî kal e! Ev hema to zebeşên kal tînî! kevanîyê got: Ez xadim bawerke ez zebeşên sor nasnakim, hema min yê ji komê rakirî û anî. Ka ez wî bibim yek dî bînim. Rabî ew bir û çû yek dî anî. Malxwê pila xwe li wî jî da û got : Bawerke zebeşê me ev jî ne gelek sor e, belê pa to westayî hema bila ev bit. Kevanîyê got: De ka ez bibim yek dî bînim, belkî ew sortir bit. Malxwê got: Ne ev baş e, to westayî, hema bila ev bit. Piştî bî çaxê nivistinê malxwê got: Keça qenc heke cihnivîn me kêmbin here mala cîrana destekê ji me ra bîne? Kevanîyê got: Camêro to ji min ra sax bî tişteki ji me kêmbîne, eve destek bo mêvanî û êk bo min û te. To bi xwe dizanî ez çar til-

ya ji te dūr bim tebata min nayê! Piştî şeva xwe derbas kirin, malxwê got: Mêvanê delal te zanî ka çima ez her du birayên xwe xurtir im? Mêvanî got : Belê jina te ye û jina birayê biçûk jana wî ye! Malxwê got: Belê, rast e. Jina min jîna min e, çunkî serbilindîya min hemî bi wê ye, ew zebeşê dî te dîtî ku sê cara birî û guhartî li ba te dîyar bit me ji wî zebeşî pêve nebî û ew jî kevin bî!

Iha holê mîrê min em berê xwe didin peyva jinê kurt kirîyê ji peyva jînê ye heke baş bit û xem xwera mala xwe bit û li gotina meznê xwe da bit yan jî kurt kirîyê ji peyva jînê ye, heke ne baş û ne guhdar û ezman dirêj û cir nexweş bit. Rast e, wa hatîye gotin.

(428) Jin bîne ji mala da xuharzî bidin bi xala.

Belê pa hatiye gotin.

(429) Jina ne bijêre esil xêr e.

Yanî eslê jinê jin e. Bi rastî xeberê kovekê ye "eslê jinê jin e" û ne ji xwe da pêxemberê Xudê - selat û selavên Xudê li ser bin - ferman kirîye:

«تنكح المرأة لاربعة لحسنها ونسبها ومالها ودينها فاطفر بذات الدين تربت يداك»

Yanî jin tê mehir kirin bo çar tiştên bo tazehiya wê yan binemalîya wê yan jî bo malê wê yan jî bo dîne wê. Vêca xwe bi ya xweyê dîn ra bighîne hey destê te bi taxê ketîyo - vêca mîrê min ne ewe hemî jin xirab in û hemî mêr baş in; belkî baş û xirab ji her du cûna heye.

Dibêjin carekê paşeyek û aqildarekê xwe derketin piştî cilên xwe guherîn li nav bajarê xwe bigeherin ka çî heye û çî nîn e. Miletê wan tenaye yan li îza da ye! Çunkî herê herê dest û piyên paşa û beglera rastîya milletê wan ji wan ra bînit û ber vê êkê xwe guherîn û ew bi xwe derketin da bi çavên xwe milletê xwe bibînin. Li çaxekê berê xwe danê kelekelek wa li ber lêva avê ye hema her du nemerdi ne kirin li keleka xwe siwarbîn bi avê da çûn, heta li çaxekê dîtin li semta bur-

cekê hatin li nîva avê da! Paşê got aqildarê xwe: Ev çî burc e û ya kê ye? Aqildarî got. Paşa xweş bit, bawerke ez jî nizanim! Çûn li ber pencera burcê berê xwe danê jin û mêrek wê jor ve ne, mirov dibêjit we dîyar e liva sêvê kêrkirine û her yek kerîya wê sêvê ye! Her du bi stoyê êk da hatin heta ji kar ketin. Ronîştin xarê mêrik got : We heye carekê to li min biqulipî û min bihêlî yan piştî min şû bikî! Jinkê got: Ez hemî mirovê dinyayê gorî neynoka te dikim û bab û birayên min jî bi wan ra, mêrik got jinkê: Ka ranê xwe ji min ra dane ez serê xwe danim li ser û jêlîl temaşeyî çavên te yên reş û belek, demê te yê sorgulî, biskên te yên xelek, ehîna te ya keverî, birhên te yên kevanî, kepuyê te - difna - te ya elmasî, gerdena te ya zer bikim. Heta ez welê bi xew va biçim, belkî agrê li dilê min da - ewê ji derdê evîna te - biçekê daxumt çunkî dilê min hema bi tirs e, ez dibêjim, ez ê bimrim hêj pirinkê - piloxê agirî - li dilê min da ne vemirîye! Jinkê got: Bila rewş û rûşa min, xemil û xêza min, çav û laşê min hemî bibin gorî kitek simbêla te ya sor soşinî. We got û ranê xwe danî û mêrik serê xwe danî li ser û jêlîl berê xwe da sing û berê wê û ev benda strana kurdî hat li ser devê wî " Sînem delalê çaxê min û te li çemê mîra seyran kir. Minê serê xwe danî bû li ser çoka jêlîl temaşeyî xalan û biska kir. Demê çavê min li sing û berê Sînema min diketin Misir û Beyrût û Şamê têra xuya kir."

Çaxê wî benda xwe xilas kir. Mîrê min jinkê jor da devê xwe danî li ser devê wî simbêl û zulva bi hevra kirin ceng û şer her çar lêva êk û du mêhtin heta mêrik welê bi xwe ve çû. Paşa ho li aqildarê xwe zivirî û got: Heye ev jinik li soza xwe bigûrit û bextê xwe li gel vî mêrî bişkênit! Aqildarî got: Paşa xweş bit bextê jina heye! Bextê jina "wey liva nîskê ye ne ber e û ne pişt e." Bi serê paşê ez dikarim we çêkim, ev jinka he vî mêrkî îşev bikujit! Paşê got: Malbab wêran to kengî dikarî dilê van her duka ji hev reş bikî vêca heta dor bêt bighêt kuştinê? Aqildarî got: Weye her wekî ez dibêjim, to xwe li paşîya gemîyê da - kelekê - veşêre û kerrke û guhê xwe bide min û wê! Da to ji xwe ra hunerê jina bibînî û bextê wan bibînî! Paşê xwe kerr kir, aqildarî pila xwe li

pencerê da, jinik lê zivirî, ewî îşaret dayê: Ka were, jinkê serê mêrik danî li ser balîfkê û hat li ber pencerê, aqildarî got: Kezikurê to çi dikî li vêdê wek dînê li dêra da? Jinkê got: Ev burca min e û ewê he mêrê min e; ji xatrê min ev burca he ava kirye da hema ez û ew bi tenê li vêdê bin kes me nebînit û em kesê nebînîn. Pa to ji kûve hatî vêrê? Aqildarî got: Malbab wêranê, ez fetisim hewqa ez li te digirim! Jinkê got: Pa to kî yî ne ez te nasnakim? Û te ez ne dîme, pa çawa to li dûv min digerî? Got: rast e, to min nasnakî û min jî to ne dîtî, belê malbab wêranê paşê carekê li ber derê mala babê te ra bûribî, to li pencerê da çavê wî bi te ketibî, ew roj êk û îro du dilê wî ji mal û ji jinên wî reş bîye û ji hingê ketiye li pey saloqdanên te heta îro bi te hesba, rêkirîye li dûv min ez hatime ba wî çîroka xwe ji min ra gotiye û eve ez rêkirme li ba te ka xweya çî û tê çî bêjî? Jinkê got: Ez jina mêr im, ma paşa li xew da bî hinde sala heta ji berî deh roja min şû kir ji nûka li dûv min dikevit? Aqildarî got: Eve meheke paşê to dîtî heta îro zanî cihê to li kûye. Jinkê got: Ê min şû kir ma paşê wê ji nû çî ji min bikit? Aqildarî got: Te deh kur hebin, ji deh mêra û paşê deh jin hebin wê hemîya bikit gorî awra çavên te, to çi dibêjî mala te?.. Jinkê got: Pa mêrê min? Aqildarî got: Xwe jê xilas bike, heke to bi gumanî ku ez ne rast dibêjim, eve nîşana ji te ra û dest avêt gustilka paşê nîşa wê kir. Çaxê jinkê çav bi gustîlkê ket dilê wê mizmizî û got: Nexwe rast e, paşa hinde evîndarê min e! Aqildarî got: Agir bi dilê wî ketiye ne bi şev ne bi roj tebatî lê nakevit. Weye her wekî nivîsvan li şîra xwe da dibêjit ;" *Sondê dixûm bi zulfên xelek... Sê car bi wan çavên belek çar car bi dêmê sorgulî... Her dem li ber fikrê min î.*" Jinkê got: Pa ez bi çi awa ji vî mêrî xilasnabim ji bilî ez wî bikujim. Aqildarî got: Bila. Ma heke to gihay paşê, kî heye berê xwe bidit te? Jinkê got: Baş e, û pencere girt û çû... Paşê got aqildarî: Malbab wêran te çi kir? Bighê bi Xudê kuşt! Her duka bilez xwe ji gemîyê avêtin û qesta derî kirin, heta çûn li jor ve jinik ji wê ve hat; berê xwe dayê du ne! Got: Hevalê te kî ye? Aqildarî got: Hevalê min paşa ye. Jinkê got: Ez gorî min ew kir qurbana simêla te. Paşê got: Dêhla keça

dêhla tê min jî bikî qurbana simêla êk dî! Pa ne te nihû dinya hemî û li gel bab û birayên xwe kir gorî kitek simbêla mêrê xwe û dest avêt şûrê xwe jinik li ber devê şûr hinc hinc kir û got aqildarê xwe da bizivîrîn mal. Gihan malê û wê nîv şevê ferman li jina rakir, hingî to bêjî ev tuxmê jina ye ji êk rojî û heta sed salî yek ne hişt hemî komkirin û li xanîyekê civandin, got: Ev tuxmê pîs bila ne mînit li nav mirovan da.

Mirov mane bi tenê zelam li rexekê û jin li rexekê, her du cûn jî gelek bê ser û ber bîn, mane bi wî awayî bi demekî dirêj, ne kes diwêrit wî behsî bikit û ne xwe bi ser ve lê bidit. Mirovek kalemêr hebî li çaxê xwe da aqildarê bapîrê paşê bî. Çend girgira xwe gihandin kalemêrî: Ka to çarekê nakî qedrê te li ba paşê gelek heye, mirov qelhan, nebîye û nabit ku mêr bê jin bijîn, yan jin bê mêr bijîn; çunkî Xudê - pak û paqij bit - jîyana mirovatîyê li navbeyna her du cûna da çêkirîye, kalemêrî got: Baş e, hûn nizanin ka ji çî paşê ew pêngav avêtîye? Gotin: Wer dîyar e, pûçatîyek ji jinkek dîtîye. Aqildarê paşê got: Mam çîroka min û paşê eve bî, û çîroka xwe hemî ji kalemêrî ra got. Kalemerî got: Baş e, bila paşî kurê min bi şev min bibit li dîwana paşayî û hûn hemî jî li wêdê bin. Êvarî hemî cûn dîwanê kalemêrî got kurê xwe: Ka rabe min bigihîne dîwana paşê kurî got: Babo tê xwe li belakê bidî rûne xarê bela xwe ji xwe vêke! Babê got: Lawê min babê te ji sed sala pêtir jîyan bûrandîye, çi cara ji çakîyê û ji qencîyê û başîyê li gel kes û karên xwe û mirov û miletê xwe sistahî nekirîye û piştî hingê eger mirov ji gundîyê xwe û miletê xwe ra karên hêja û berketî nekit nexasim li tengavîya wan da gelo ma mirovatîya miorv bo çî ye? Û çî cudahî li navbeyna mirov û dewara da heye? Vê gavê bajarê me wê ketî tengîyê bivê nevê ye li ser her miorvekî merdêmêr xîretê bikêşit li gor karîna xwe vî bajarî ji vê tengiyê qurtal bikit. Piştî vê jî eger paşa min bikujit jî xelkê bajarê min wê bizanin ku min canê xwe kire gorî xweşîya wan û belkî ez bibim rêber bo hindek dî li dûv rîya min bên heta xwe qurtal bikin, çunkî ne weye ew qas mirov holê her û her bimînin li vê tengîyê da û kes pirsyar lê nekit - bi rastî gotina kalemêrî li cihê xwe da ye, wekî wî Cigerxwîn jî

dibêjit:

*Eger dem dî ji bo min yek du firset
Ku firset bê heram e jê ra muhlet
Ne rast e em hemî bimirîn bi zillet..*

Hilo law min bibe dîwana paşê ka Xudê wê çawa çêkit?
Kurê bab hilgirt bire dîwanê çaxê gihan dîwanê kurê got:
Babo eve dîwana paşê ye û eve paşa bi xwe jî rûniştîye, ka-
lemêrî li piştta kurê xwe silav kire li ser paşê û xelkê dîwanê.
Paşê got: Kuro ew kî ye? Kalemêrî got: Paşayê min ez filan
kes im. Aqildarê bapîrê te me! Paşa ji ber ve rabî û got ka
bîne li ba min; kurê bab bir danî li nik paşê, xelkê dîwanê
teva xêrhatinî lê da, paşê got: Mam te xêr bit te ev îza kêşa
heta to hatî vêdê; xizmetek ya te heye em ji te ra biqedînin?
Kalemêrî got: Xizmet û daxwaza min ewe paşa kêfxweş û
tena bit, dil bê kul û meraq bit. Min daxwazek dî nîn e ji bilî
wî qasî ku ez jî bêhnekî li civata paşayî rûnim; çunkî ji mêj
ve min kuç û dîwan nedîtine. Paşê got: To gelek bi xêr
hatî, bes agahdar bî behsa wî tuxmê pîs nekî! Kalemêr got:
Tuxmê pîs kîjke? Paşê got: madem te tiştek sehnekirîye dilê
wê ye! Dîwan kerr bî û bê pêjin û deng man. Paşê got: Ma
we dîyar e xelkê dîwanê ji ber te kerr bîn, de ka bêhnekê ji
me ra bipeyîve. Kalemêrî got: Paşayê min te çî axivtin divêt
ji bihîstîyên xwe yan ji serpehatîyên xwe ji te ra baxivim?
Paşê got: Mam dîtin ne wek bihîstinê ye, ne dîtin bit derdê
dîtinê derman nakit! Kalemêrî got: Weye her wekî paşê fer-
man kirî, de guh bide min da bo te serhatîyek ya xwe bêjin
ku ez bi xwe li nav da bîm heta dûmahîkê. Paşê got: De ke-
remke mam ez hemî guhim ji te ra. Kalemêrî got: Paşayê
min ez di lawîniya xwe da tuzek geveze bîm û ne rawestayî
bîm; ji berî ez bibim aqildarê bapîrê te. Karê min dizî û
şelandin bî, min pûte bi nêra ne dikir, ez we bîm her wekî
dibêjin: "Te hêj gunek reş li ser xwe ra ne dîtine." Min ne
dîtîbî êkê piştta min li axê dayî. Şevêkê wek adetê xwe ez
derketim ka şelandinekê nakim! Ez çûm li gelîyek tarî raw-
estam li ser devê sêrîyanekê heta êk li semta min bêt.

Çaxekê derengê şev min dît tep repa siwarekê têt min xwe li ber çêkir heta hat nêzîkî min, min dengê xwe lê kir: Kuro raweste bê bêbextî to ne bêjî min ageh ji xwe nebî. Belê siwar hat li ber min ra borî min berê xwe dayê siwarek li hespek reş tekbara wî hemî reş wekî şeva reş hat li ber min ra borî, her pûte bi min nekir û nezanî ka ez mirov im ya çûk im! Çaxê ji min raborî kerb û kîna min vebîn ez lê xurîm: Kera di jin û makê te gaw! ma to hizra zelama ji min nakî? Yan dê û babên te nifrîn li te kirne? Ha ji xwe ra vî derbî wergire û min ew gurz lê veweşand, belê min ageh ji xwe nema, min hind dît gurzê min wekî piringekê sor e li erdê û riya xwe girt û çû. Ez mam mendehoş. Tibabekê paşî min rahişte şûrê xwe û min ji cih kur vekirê! "Hey min gora babê te şewitandîyo ma tê bi kuve qurtal bibî ji destê min." Û min ew şûr lê veweşand, belê min berê xwe dayê şûrê min bî du ker e û siwar çû û ez mam şermezar, min hizrên xwe kirin, dilê min ji min sar bî, zelamîya min êdî nehat ber çavê min. Min rahişte kurterima xwe û min ji cih kur vekirê ez nêzîk bîm min ew kurterim ji kerkî ve lê werkir; belê min berê xwe dayê rima min du ker e û siwar li min zivirî û got: Hey çûçka bê çeng û per ez naxwazim şûrê xwe bi te pîs bikim, we got û min hew dît destê xwe avêt min her wekû gurgê heft salî dev bavêjit berxekî heft rojî ez rakirim li bin qelbûçka zîne xwe danîm û ranê xwe jor da danî li ser kef û kinc bi ser devê min ket, çavên min zil bîn, min ageh ji xwe nema heta carekê ranê xwe sist kir, tim û ez jor da bi axê ketim. Çing û ew jî peya bî, ez ji xwe bê hîvî bim! Got min: Lawo min gotê belê lixaba hespê min bigre û li ber derê vê ûlîyê raweste ez herim jor heta seetekê xwe bigre heke ez hatim ji xwe hatim û heke ez nehatim hema li hespê min siwar bibe û here mala xwe li te fiêl bit - li gerdana te aza wekî şîrê maka te. Hefsarê hespê ma li destê min da û ew çû jor ve û ez mam li ber derî. Min guhê xwe dayê - çaxek dirêj pêve neçû - min sehkir li jor ve bî qelebalix min zanî dengê şerî ye, ez li wan hizra da min berê xwe dayê termek ket li ber min û dengê şerî ne vemirî. Pêvetir neçû min berê xwe dayê termek dî jî ket li ber min û hêj şer e. Bîst xeberek

man li qewlê siwarê min, min hind dît termek dî jî hat xarê û dûv da siwarê min jî li ber singê min rawesta û got: Hêj to li vêrê yî? Min got belê pa ne ji nû qewlê me bi duwayî hat. Paşayê min siwarê min siwar bî û dîsa dest avêt min û ez rakirim wek berx vimîyekê û ez êxistim li bin qelpûça zînê xwe da û ranê xwe danî ser û bi rê ket û çû, min li ba xwe hizir kir ku eve dûmahîka jîna min e! Ez man li wî halî da. Li çaxekê ranê xwe sist kir û min got tim û ez li erdê ketim min çavê xwe vekir eve goristan e! Li ba min misoger bî wê min bikujit û li nav wê goristanê veşêrit. Ew jî çing û peya bî dest avêt xurcezîna xwe tevir û bêrek deranî gote min: "Li ber teniştê vê gorê tîrbekê bikole." Min tîrb kola û dirost kir, gote min: "Xwe têda dirêj bike! Turb li qeyda min e, got: Derkeve ez derketim wî jî xwe tê da dirêj kir. Got dirust e. Destê xwe avêt şûrê xwe da min: Were min bikuje, li vê gurê da veşêre, li ber teniştê vê tîrbê; min got: Bawerke to min parçe parçe bikî ez destê xwe dirêj nakim te heta ez serpêhatîya te nezanim? Ne heyîf û mixabin to ev şenge siwarê he ez te bikujim? Dest avêt serpûşa xwe ji serê xwe rakir, ez berê xwe didimê eve jin e ne mêr e! Min xwe avêt ber lingê wê çîroka xwe ji min ra bêje, ka ev çi bî? Got: Ez ji te ra bêjim da to jî ji mirova ra bêjî heta bizanin jin hemî ne jin in, belkî wekî dibêjin: Jin jî hene û jinkok jî hene." Min got: Soz bit ez jî wekî dibêjin:

*"Li ser her kavî rûnim qîrîn heta her kes
Ji temara xewê rabin, bibin hozan û hişyar e."*

Got: Eve tirba mêrê min e û pismamê min e. Ew her sêkên te dîtî min kuştin li wê ûlya da wan hez ji min dikir û min ne divîya ez mêrê xwe pê bihesînim. Her sê carekê pêkve diçin li berahîya wî li xew da dikuji û ciwabê ji min ra rêdikin: Eve me mêrê te kuşt ez rabîm min veşart û eve min tola wî bi destê xwe vekir û piştî wî jî jîyan li min heram bit. Min hew dît: Mîrê min serê şûrê xwe danî li ser perê dilê xwe û binî danî li ser erdê û xwe bi ser da berda heta min xwe avêtê serê şûr li zînê yê piştê ra derket, min ho

destê xwe dayê wa sar bîye! Ez rabîm min ew jî li wê tirbê da li ber teniştâ mêrê wê veşart - piştî min şûrê xwe jî danî li ber kêleka wê da kes dî piştî wê dest ne avêt şûrê wê! - Min hespê wê anî û ez hatim mal û min soz da ku ez hêdî şelandinê nekim. Piştî wê jinê ez hinde bê ser û ber kirim! Eger paşa hez bikit ez ê gora wê nîşa wî bidim! Paşê got: Ev serhatîya te gelek xweş bî û ez gelek pesindarim ji te ra ku to ev kalemêrê he, te xwe kire qurban ji kes û karên xwe ra bê ku karek li te bibit ev nîşanên mirovatîya te ne ku to mirovî, çunkî min soz dabî ewê behsa jina bi qencî bikit ez ê serê wî lê bidim. Belê min to dayî bi xatrê başî û mirovatîya te û min. Jin jî dane xatrê wê jinê û dîyar bî li ba min ku "jin jî hene û jinkok jî hene."

Vêca mîrê min rast e "jin jî hene û jinkok jî hene." Heke te destûra xadima xwe dabîya ev çîroka he ji te ra gotibîya, te yê bihayê keçen baba zanî bîya! Mîrê teyra got: Ew çi çîrok e, kevoka delal? Kevokê got: Mîrê min dibêjin carekê paşayek hebî sê kurên wî hebîn, paşa nexweş bî nêzîkî xirêna mirnê bî, gazî her sê kurên xwe kir; her sê li ba xwe danî got: Lawê min qewîtîya min li hewe bit, gava ez mirim, her êkî ji hewe şevê nobetê li min bigrin, li gorê da û çi kara bê aqildarê babê xwe nekin çunkî mirovek dilbêş û evîndar e û ji berê da hatîye gotin: " Serê xwe her bide dîwarên kevin" û birayê hewe yê mezin li şona babê hewe ye û emanet ew û birayên xwe gelek pêve neçû paşa gorî hazra bî serê hewe xweş paşa mir. Birayê mezin bî paşa. Êvarê birayê biçûk got birayê mezin: Kî ji me her sê ka wê îşev bibit nobedarê babê xwe? Birayê mezin got: Kî ji me wê herit bibit nobedar li torba? Ma piştî mirina wî jî em ji wî tena nabin? Ne to behsa wî li nik min bikî! Birayê biçûk çû nik birayê nivê wî jî wek birayê mezin got û lêvegerand, rabî çû mala aqildarê babê xwe pirsyar pê kir: Mam babê me ev qewîtî li me kirbî her sê şevên ewil nobetê lê bigrin û her du birayên min xwe li bera nekirin, ka to çi dibêjî? Aqildarî got: To here belê siharê were vêdê paşî here mal. Birayê biçûk rabî êvarê çû nêzîkî tirba babê xwe cihê xwe çêkir û xwe tê da veşart û ma hişyar heta piştî nivê şevê

berê xwe dayê siwarek sor siwarê tekbera wî hemî sor e, mirov dibêjit qey parçek xwîn e! Hat çing û li ser tirba babê peya bî. Dest avêt tevir û bêrek ji xorcezîna hespê xwe deranî û ket ser tirba babê û kola û li bera wê dibêjit: Hey min gora babê te kola û ma bi saxî min ne karî te, ma bi mirî jî ez nikarim te? Wê li bera tirbê jî dikolit guhê kurî ma li ser heta zanî xirîna ferşê li ser gorê hat, hema da xwe rabî ew şor li kezîya stiwe wî da serê lê pil kir û cilên wî ji ber êxistin û tekbera wî û hespê wî anî bir mala aqildarê babê xwe. Şeva paşî çû siwarek li hespê spî û tekbera wî spî kuşt û tekbera wî û hespê wî bir mala aqildarê babê xwe. Şeva paşî çû siwarek li hespek reş û tekbera wî jî reş kuşt û taxima wî jî bir mala aqildarê babê xwe got: Mam ev qewlê min xilas bî. Aqildarî got: Belê qewlê te xilas, belê newebit to bêjî birayên xwe heta ez nebêjim te.. Got belê ez ji gotina te der-nakevim û çû mala xwe û xwe kerr kir. Rûniştin li ser keda xwe, dibêjin carekê mirovek hat wî bajarî sê keçên vêra wekî sê peryan in mirov dixwazit ne bixwût û ne vexût bes li bejn û bala wan binêrit. Qewlê mêrkî ewe wê çalekê bikolit, heçî siwarê bi siwarî bêt xwe li se ra bavêjit wê keçekê ji xwe ra bibit, ewê ne karibit wê sed mecîdîya bidit babê keça. Delal li nava bajêr ketin, roja paştir heçî kerek jî heyî kerê xwe bir û çû. Her du bira jî her êkê hespek ji tewilxanê deranî û her êk li hespê xwe siwar bî û qesta meydanê kirin, belê heçî çû nekarî xwe li ser ra bavêjit. Birayê biçûk çû li ba aqildarê babê xwe got mam: Çîrok eve ka to çî ferman dikî? Aqildarî got: Rabe li hespê spî siwar be û tekbera wî wergire û here ez welê ber hîvî me tê bikarî xwe li ser ra bavêjî. Kurik rabî li hespê spî siwar bî tekbera wî kire ber xwe çû ji serê meydanê ve hat. Gava çavê mirova vêket hindeka got ji bin axê derketin! Hindeka got eve meleke ji esmana hat xarê! Hemî şaqis man, kes ji cihê xwe ne livî çavê tevan ma lê, ka wê bikaribit xwe li sera bavêjit yan ne? Ew hat hema yekser bê hespê xwe germ bikit xwe li ser çalê ra avêt û temet devê çalê jî da ser û li xwe zivirî, dest avêt çeplê kaça mezin li pişt xwe siwar kir. To çavê xwe hîlnî û danî xwe rakir kesê nizanî bi kûve çû! Ewî yekser

keçik bir mala aqıldarê babê xwe. Aqıldarî got: Rabe li hespê sor siwar bibe tekbera wî wergire û here ya dî jî bîne. Ew rabî li hespê sor siwar bî û tekbera wî wergirt û qesta meydanê kir. Xelkê li hizir û mitala li hespê spî da ne hind berê xwe danê siwarek li hespek sor siwar e û tekbera wî hemî sor e! Jor da xwe ji serê meydanê ve berda û hat hema dîsa yekser hat û xwe li ser çalê ra havêt û li xwe zivirî û dest avêt çeplê keça nîvê li pişt xwe siwar kir, to çavê xwe rakî û danî xwe hilanî kesê nezanî ka ji kûve hat û bi kûve çû! Ew jî bir mala aqıldarê babê xwe. Wî got: Rabe li hespê reş siwar bibe xwe bigûre bi tekbera wî û here ya dî jî bîne; hêj kes ji meydanê ne zivirî da kes te nebînit to têy vêdê! Ew rabî li ser hespê reş siwar bî û qesta meydanê kir. Mirov hindek mendehoş in û hindek wê karê xwe dikin da bizivirin malê. Hind berê xwe danê siwarek li hespek reş siwar wekî bayê birûskê wê tê meydanê. Hat û bê rawestan xwe li ser çalê ra avêt û li xwe zivirî û dest avêt çeplê keça biçûk jî rakir li pişt xwe siwar kir, bê kû êk bizanit bi kûve bir! Her kes zivirî hat mala xwe û her du bira jî hatin malê dil bi kul û keser ji ber wan perîya û wan hespa. Birayê biçûk hat mal piştî xwe guhirî û xwe bi ser tiştêkî ve lînedana. Çend roj man welê mat û gêj, belê roj bi roj her du bira li kême dan! Birayê biçûk got aqıldarê babê xwe: Birayên min gelek xemê dixûn û dilê min gelek bi wan ve ye. Ez ditirsim derdek wan bigrit piştî wan min dinya bo çî ye! Aqıldarî got: Baş e, xwe bi wan bihesîne. Birayê biçûk rabî hat malê got her du birayên xwe: Erê bira hûn çima hinde bi xem in û xema hewe çî ye? Birayê mezin got: Kuro to jî kerek wekî babê xwe yî, ewî gotî piştî mirna min werin sê şeva nobetê li gora min bigrin!! Ma te çî ha ji dinyayê heye ma te ew ew her sê perî ne dîtin û ew her sê siwar? Birayê biçûk got: Ewe xema hewe? Min got, ka xema hewe çî ye? Bira xemê nexûn, her sê perî li ba min in û li gel her sê hespa û siwar jî birayê hewe bî û kerem kin da biçin mala aqıldarê xwe da bibînin! Rabîn pêkve çûn mala aqıldarî û rêve çîroka xwe hemî ji wan ra got heta gihan mala wî. Rabî keça mezin li gel hespê spî da birayê mezin û keça nîvê li gel hespê sor da

birayê nivê û ya dî jî li gel hespê reş ma ji wî ra, man li ser keyf û xweşîya xwe.

Çend demek pêve çû her du bira kerb û kîn ji birayê biçûk vebîn, ji xwe ra gotin : Rojkê evê paşatîyê ji me bistînit! Baştir ewe em wî bikujin, belê emê çawa bikujin? Çunkî sing û sing em nikarîn bikujin, divê em wî bixapînin! Evarê her duka gotin: Bira xwe lêk bide sibehî emê biçin nêçîrê, ew rabî çû got aqildarê babê xwe: Birayên min ho dibêjin ka to çî dibêjî? Aqildarî got: Bawerke çavên wan birayên te xirab in, belê here û ageh ji xwe hebe. Çunkî heke to neçî wê neyarîya hewe eşkera bibit, paşî wê gelek nexweştir bibit; belê hişyar bî wa ne kujî û ageh ji xwe hebe ew jî te nekujin. Roja paşî her sê pêkve çûn nêçîrê her duka got birayê biçûk: Hey fêlbazê fenker te hespê baş û taze ji xwe ra hişt her dukên bêxêr dane me? Birayê biçûk got: bawerkin her sê hespên makekê ne û hespekê ne! Ew hizrên hûn dikin di dilê min da nînin! Her duka gotin: Pa heke to rast dibêjî bi çar gava pêşîya me here ka yên me bi yê te ra bighên? Wî hespê xwe rakir çargava û her duka rahiştinê, çaxekê zanîn nêzîk bîn berê xwe dayê her duka şûrên xwe tazî kirne û wê ji kerb û kîn radihêlinê! Ew kenî û got: Hewe xêr bit? Her duka gotin: Teres lawê teresa canê te bibit gîyayê biharê to îro ji destê me qurtal nabî! Hingî li ber dilê wa da: Gelî bira ava çavê hewe rijyaye! Xudê ji hewe standîye malwêranîno ez birayê hewe me hûnê çawa min bikujin? Xelkê çî ji hewe ra bêjî? Her duka gotin: Kûçik bab to bi van gotina xwe ji destê ne qurtal nakî! Berê xwe dayê wê wî bikujin. Got: madem hûnê min bikujin, ma çima ez hewe nakujim? Hema nemerdî nekir dest avêt şûrê xwe û ji cih kur vekir wan wekî gurgê sibatê dev bi xwîn her êk şûrek li stuwê wan da serî li wan hilfirand û zivirî qesta mala aqildarê xwe kir. Gava wî berê xwe dayê zanî ne dirust e gotê: Te birayên xwe kuşt? Got: Belê, heker min ew nekuştibîna dê ez bikuştima! Aqildarî got: Esil xêr e. Birayê biçûk bî paşa, belê çend roj pêve ne çû bêhrîya bira lêda, poşman bî li kuştina wan xemê girt, kul û derd û meraq li ser pir bîn! Lê bî wek jana zirav! Got aqildarê babê xwe

çarekê li min bike yan ezê bimirim! Aqildar mirovek hosta û şareza bî rabî jêra balefirek dar çêkir got: Hero siwar bibe ji xwe ra bigerhe heta êvarî û êvarî bizvire were mala xwe. Kur hero wê li balefira xwe siwar bibîya û çûbîya ji xwe ra gerhatîya û êvarê wê hatibîya mala xwe. Welê şareza bî li balafira xwe da, dikarî bi çav neqandî jêk bikit û têk bidit! Mîrê min rojekê karê xwe yê çend roja kir û got aqildarê babê xwe: To li şona min paşa be heta ez vegehim! Û li balafira xwe siwar bî û çû heta lê bî êvar, li semta bajarekê hat ne ser lê dîyare ne bin! Bajar jî li ber lêva behrê ye. Berê xwe dayê ûlîyek wa li behrê da ye! Ma hizrên xwe kirin ev çî bajar e û çî ûlî ye li behrê da? Bi Xudê divêt ez bizanim? Belê ewil ezê biçim li bajêr, piştî hingê ezê pîryara xwe lê bikim, rabî balefira xwe jêk kir û xiste li çeltikê xwe da û milê xwe û çû li nav bajarî de li vê malê ne li mala he heta bajar xilas kir! Li semta kolkê pîrejinekê hat : Pîrê to mêhvana nahewînî? Pîrê got: Pîrê qurban mala pîrê ne mala mêhvana ye, ez mirovekê bi tenê me û belengaz im, here mala beg û beglera, mal zengîn û kedxweda; pîrê qurban pa ma pîrê çî heye danit ber te? Got pîrê: Ez jî mirovek belengaz im wekî dibêjin" Her teyrekê li gel refa xwe." Min jî qesta te kirîye divêt to îşev min bihewînî. Ka destê te pîrê? Pîrê destê xwe deranî wî jî pencek zêr berda destê pîrê da! Pîrê destê xwe bir berê xwe dayê eve zêr in! Pîrê dergeh lê vekir: Wey to li ser serê pîrka xwe da hatî, de keremke were jor. Kurik çû jor dest avêt zêrekê û da pîrê û gotê de here destek nivînên pak ji min ra bîne û xwarnekê jî bi xwe ra bîne. Pîrê rabî wek keça çardeh salî bezî çû destek cihnivîn anîn û xwarnek xweş û hêja danî li ber: Wey to li ser serê pîrka xwe hatî ev to ji kûve tîyî û tê bi kûve biçî? Got: Pîrê ez falvekirim û fala vedikim, pîrê got ev bajare gelek hez li falvekera dikin. Heke bi te bihesin tê bi rojê gelek kar bikî! Got: Pîrê hindî ez li vêdê kar bikim karê min li min û te bi nivî! Rûniştin şîva xwe xwarin, vexwarina xwe vexwarin, şevbûrka xwe bûrandin kurik got: Pîrê. Pîrê got : Babê pîrê! Got : Pîrê ew ûlîya li behrê da ya kê ye? Pîrê bostek ji erdê bilind bî destê xwe danî ser devê kurik: Hişşş...hişşş.. kerr

be malbab weran te divêt to warê me korbikî? Kurik xwe kerr kir, belê tebata wî ne hat, dîsa got: pîrê li bextê te ew ûlivîya kê ye? Dîsa pîrê destê xwe danî li ser devê wî: Lawê min kerr be, nihû hindek li van dera ra bibûrin dengê te seh bikin, wê warê me korr bikin! Kurik bihnek dî ma, hew xwe girt hema dest avêt xencerê û got: Pîrê bêje ew ûliya kê ye, yan jî ez ê te bikujim, çîrok pê nevêt. Pîrê ne çar bî devê xwe kire dibin guhê wî û got: Lawê min ew ûliya keça qirêl e, ji tazehî û ciwanîya wê birîye wêdê da kes nebînit. Kurik got: Baş e malbab wêran eve me zanî ûliya kê ye? Ê ew xem ji ser dilê me rabî ma dinya xirabî? Ne kesê dengê me sehkir û ne em ji kesê ra dibêjin. Pîrikê got: Ne webit lawê min to wan behsa li derekê bikî wê di cih da te bikujin. Wê şevê nivistin, belê xew bi çavê kurkî neket heta sihare! Aya ev keç hind taze ye heta babê birî wê derê yan çunkî keça qirêl e! Li van hizir û gumana da ma heta tîyê sibê lê derket. Pîrê ji keyfa para da zû rabî qehwe jê ra çêkir û gazî kirê ma to qehwe navexûy? Got pîrê xewa vêdê gelek giran e çavê min jêk venabin ezê vexûm belê dîsa ezê xwe dirêjkim. Gazî min neke heta ez bi xwe rabim. Pîrê got: Ji xwe ra binve pîrê heyran. Kurik ma li xew da heta lê bî êvar, rabî zadê xwe xwar û got pîrê ka çeltê min bide min da ez rabim herim bajêr ka ez hindek fala venakim! Çeltê xwe da milê xwe derket heta çû rexê bajêr balefira xwe lêkda û lê siwar bî yekser bo ûliya keça qirêl... çîrp û danîm li ser banê ûliyê balefira xwe hişt li cih da û bi jor da xwe berda xarê bi pêstirkê da derê ûdekê vekir berê xwe dayê zanî ew ûda xadimê ye, zivirî çû ûda dî berê xwe dayê êka li ser textekê nivistî perdek wa avêtî li ser çavên xwe rûnahîya rûyê wê li perdê da didit zikê ûdê mirov dixwazit ne bixût û ne vexût, bes li bejn û bala wê û wî dêmê sorgulî mîna kulîlka hinarê bikit. Berê xwe dayê lalîyek - sênîyek - teji pirinc, qazek sorkirî jor da li sere şerbikek teji ave libek sora xelafî li devê wê da ye, li wî jî nemerdi nekir dest avêt kevçik û lalîya birincê xirand li ber xwe, ji birincê livên dora lalîkê hişt û ji guşt hestî, dest avêt sêva xwe xwar, şerbik danî li ser devê xwe ew jî niç kir! Rabî perde ji ser rûyê wê hilanî û maçek li

wî rûyê sorgulî da û dîsa perde pêda kir û hewa ket li ser banî li balefira xwe siwar bî yekser qesta mala pîrê kir û balefira xwe jêk kir û da milê xwe û çû di mal da, pencê xwe tijî mecîdî kir, got: Pîrê eve behra te! Roja paşî keça qirêl ji xew rabî bi ser xwe ve hat, berê xwe dayê xwarna wê hatîye xwarin! Bakir xadimê. Xadimê got: Belê xatûna min. Got xadimê: Ma xwrin ji ber destê te kêma e? Got nexêr, babê te ji me ra sax bit mirna Xudê ji me kêma e! Got pa nexwe te çima xwarna min bi destê xwe ji xwe ra çêkirî te ew xwarîye? Xadima xwelîser hindî bi sonda ve çû belê pare nekir. Xatûnê got xadimê ez vê carê jî çi nabêjim te, belê bi soz bit carek dî to çilekîyek holê bikî ezê we li te bikim navê xwe ji bîr bikî! Xadimê got: Belê xatûna min.

Şeva paşî dîsa kurik rabî li wî çaxî li balefira xwe siwar bî, yekser li ser banê ûlîyê keça qirêl danî! Pa ne rêka xwe naskir bî hema êkcar bo ûda keça qirêl. dîsa guşt û birinca xwe xwar, ava xwe vexwar, sêva xwe xwar dest avêt perdê ji ser rûyê wê hilanî maçek li rûyê wê da û perda wê pêda kir û rîya xwe girt û çû. Keçik siharê rabî berê xwe dayê dîsa xwarna wê hatîye xwarin! Hema dest avêt ber çitekê û ji cih kur vekir xadimê: Kera hoo li te kirîye we dîyar e to pakîyê ji min nakî duh min gote te carek dî to çilekîyên holê nekî hey ne ezê pozê - kepû - te li nav teşka dîya te bidim! Tim û hey tim li dor axretê xadimê ket kerê reş ka kûda te têşit we li xadimê kir ji wî eyarî kire li eyarek dî da! xadim hindî dikit qîr û hawar û bext min ageh jê nîne! Ew dibêjit tiryatok kî ye? Pa ne cin û efrît û perî ne hatine bixûn û ne xwarine, yan ez im yan to yî? Li demekê çavê xadimê li rûyê xatûnê ket berê xwe dayê reş û şîn biye! Got: Xatûnê raweste da ez ji te ra bêjim, başe min xwarna te xwarîye ma min rûyê te jî maçek kirîye? Pa ne ez jin im û to jin î! Xatûn çû li ber eynê sekinî berê xwe da lama xwe: Hey hoooo lamên wê bi girover wey mohra qirêl lê hatîye, ji şona devê kurkî! Xatûn xwe kerr kir li ûda xwe û xadim jî ma li ûda xwe, heta êvarî xatûn rabî ji dilê xwe ra birincek çêkir wek her car danî li cihê wê û xwe li ser textê xwe ra dirêj kir û guhê wê ma li dinyayê! Heta carekê berê xwe dayê tirpên ji ser

banî hat! Xwe kerr kir; berê xwe dayê xurtek hat jor ve mirov her dixwazit bejn û bala wî binêrit. Hat ket li ser birinca xwe heta têr xwar ava xwe vexwar, piştî sêva xwe xwar, dest avêt perdê ji ser rûyê wê hilanî û ramûsanek li rûyê wê da perde pêda kir û rîya xwe girt û çû. Xatûn li dûv derket layîtek evên dijwar xiste balefira wî û ewî ageh jê nîne heta çû, li derê mala pîrê. Keçkê zanî hijmara xanî çend e! hat xwe bê deng kir heta siharê li tîyê tavê ciwab rêkir ji babê xwe ra! Bab hat bi lez û bez û bihên bizdîhayî: Te xêr bit keça min? Ji te ra dinyayê xirab bikim yan ava bikim? Keçkê got: Ne xirab bike û ne ava bike, rêke kurê pîrê û li ber çavê min agrî berdê! Got : Ih keça min. Qiral rabî ferman da xelkê mal û barek dar bînit vê gavê, dar hatin êlçî çûn kurê pîrê anîn danîn li ser koma dara û agir berdanê! Bî dûkel û reş û tarî bilindahîya çîyakê. Mirov miroa nabînit! Kurik li nav wê dûkelê da balefira xwe lêk da û siwar bî li nav dûkelê da bilind bî û çû, kesê nedît! heta ew dar hemî şewitîn qirêl got keça xwe: De vêca pişt rast be de here bê dîlnexweşî binve. Keçik çû wê şêvê pişt rast nivist, ket xewka şîrîn, çunkî şeva ji berî wê ne nivistibî. Kurik jî serê çîyakî bilind guhdarîya wan dikir heta her kes çû mala xwe wî jî xwe kerr kir heta bî demê nivistina dereng rabî li balefira xwe siwar bî û yekser li ser banê keçkê danî û balefira xwe hişt wêdê û hat têr guşt û birinca xwe xwar û hêdîka destek kire li bin serê keçkê da û êk jî da li bin ranê wê û rakir bir danî li ser balefira xwe û siwar bî, here wekî to diçî! Li demekê bayek sar li keçkê da veciniqî! Kurkî got: Xwe ne livîne tê li ser pišta balefirê dê to bikevî, mirine û tişteke dî nîne! Keçkê got : Ev xewne ya ez hişyar im? Kurkî got: ne xewne, ez xweyê balefirê me, ewê te û babê te xwe agir berdayê! Keçkê xwe kerr kir. Ew jî nesekinî heta lê bî sihar li semta çîyayekê hat çû danî li nav serê çîyayî berê xwe dayê şikeftê xweş her wekî bi dest çêkirî û kehnîyek avê li ber derê wê got: Bawerke ji vêdê xweştir em nabînin! Her du rûniştin li şikeftê, kurik rabî çû bajarekê xwarin û hewcehiyên malê anîn.

Mane li wêdê mîrê min heta neh mihên keçkê dirost bîn,

kete li ser destê pîrka li piştî çaxê xewê! Keçik bi ser xwe ve hat got: Lawê qenc min sar e û ez nexweş im, gava we got kîrên ji kezeba kurik hat xwest hema ew bi xwe bibîya agir ne ew gotin ji wê sehkirbîya. Derket ji derve berê xwe dayê ji dûr ve agirek wê diteyîsit, hema rabî wek mende- hoşa li balefira xwe siwar bî û qesta wî agirî kir, çû li ber agirî berê xwe dayê agirek xweş e, teji pîrnîkin - pel in - hingê li dora xwe gerha tiştekan nedît pîringek agir danit li ser, hema dest avêt pîringekê danî li ser balefira xwe û siwar bî, bi rê ket, belê çawa bilind bî, bayê lêda agirî girt balefira wî çunkî pîring geş bî, zanî nema hêdî dighêt şikefta xwe, tiştê li desta ma hema balefira xwe danî erdê bi zorî xwe bi erdê ra gihand, balefira wî bi êk carî şewitî! Ma li wêde heta lê bî siher li dinyayê da nizanit ka ji kûve hatîye û wê bi kûve biçit! Hingî berê xwe diditê berûyek bê dê û bab e hingî çavê wî difirin bi xwe girkek dîyar nakit! Ew jî ket li wa çol û beyara, wekî hova rojekê li vêde û êkê li dera he. Bila ew li wêde bit mîrê min da biçîn qesta şikeftê bikin. Keçik ma li wî halî da heta lê bî sihar! Xudê lê hat rahmê kurek dayê. Hingî ma û ma... Hevalê wê dîyar nebî, wê rojê ma û ya paşî ma nehat! Rabî kurê xwe pêça da li ber milê xwe û jor da xwe ji çiyayî berda û hat xarê, berê xwe dayê ket li ser rîyekê, ew jî demekê li wê sekinî berê xwe dayê karwanek ji wêve hat ne ser dîyarê û ne bin, karwan hat li semtê serkarwançî berê xwe dayê jinek li wêde rûniştîye, zarokek li ber singa ye dixwazit ne bixût ne vexût, bes berê xwe bidit her duka! Gotê: Keça min to ji kûyî û ji kûve tîyî û tê kûve biçî, ho bi tenê? Keçkê gotê: Mam hema min li vêde bibîne. Gotê: To niho nayê bibî keça min û ez bibim babê te? Min li ser darê dinyayê kes nîne, hema her ez û pîrejina min e. Keçkê gotê: Ez ê bibim bi qewlekê. Got: Qewlê te çî ye, keça min? Got: Qewlê min to pisyara ji min nekî ez kî me û ez ji kûve dihatim û ezê bi kûve çûbîyama! Serkarwanî got: Min qewlê te qebûl e. Rabî li mehînekê siwar kir û ket ber tîniştê wê heta bire mal.. Heft sala keçik ma li wêde ew dibêjit "babo" û ew dibêjit "keça min." Heta pirsyara navê wê jî nekîr. Heft salê wê tamam bîn, rojekê serkarwançî got:

Erê eve heft sale ev malbabwêran li ba min e heta min pirsyara navê wê jî nekirîye! Bawerke ez ê rabim pirsyara esil û fislê wê bikim. Nihû wê ew qewlê xwe ji bîrkirîye! Rabî çû ûda keçkê got: "Keça min," got, "belê bab." Eve çend e to li vêdê? got: Eve heft sal e. Got: Te carekê nexweşîyek ji destê min dîtîye? Got: nexêr, manê ez keça te me, ma keç nexweşîya ji destê babê xwe dibînin? Got: Keça min, ez hîvî ji te dikim navê te çî ye û ji kûve dihatî? Keçkê got: Bab bi xatrê te eve ez çûm, çunkî qewlê me ev bî! Rabî gazî kurê xwe kir û xatrê xwe ji babê xwe xwest derket û çû! Hîngî bab ma pêve: Keça min bibûre bi soz û peyman ez hêdî pirsyarek ho nakim, belê keçik ne sekinî û ne zivirî û her got "babo ez hîvî dikim to ji min begerî dilê xwe ji min ne girî, nema ez vegerim û gerdana min aza bike, Xudê kerîm e."

Mîrê min keçik çû hey rojekê pêtir, carekê li semta birkek avê hat rabî got kurê xwe: Lawê min bêhnekê xwe varî bike ezê noqekê li xwe bidim li vê birkê da çunkî ez gelek qirêj bîme! Kurkî xwe varî kir, jinkê xwe tazî kir û berda li birkê da wa li birkê da eşmet tazî ye hind berê xwe dayê Romîyek li ser serê wê sekinîye! Romî çîng peyabî! Jinkê lê kir qîr: Teres lawê kûçka xwe bide alîkî ma to nabînî ez jin û hirmetim bê sitar im! Romî got: Ez van çîroka nizamim, to bibî teyr to îro ji destê min dernakevî! Hema derkeve da xwe bi te tena bikim. Jinkê berê xwe dayê Romî bela xwe jê venakit. Li ba xwe hizir kir heke kurê min bêt belkî Romî jê şerm bikit, biçit bela xwe ji min vekit! Rabî gazî kurê xwe kir, çaxê kurik hat ho berê xwe dayê ew Romî wê raserî dîya wî sekinîye! Hema nemerddî nekir dest avêt berekê li Romî veweşand serê wî şikand! Romî wekî gurgê dev bi xwîn dest avêt şûrê xwe û ji cih kûr vekir kurkî ew şûr li kezîya sitwê wî da serê wî pilkir. Li jinkê zivirî: Hey dê derkeve! Jinkê gotê: Kûçik lawê teresa eve te kurkê min jî kuşt, heke to parçên laşê min wekî guhê min lê bikî ezê derkevîm? Belê pa Xudê kerîm e. Ev sêrîyan e te hind dît kurê babak li vêdê ra derket! Romî ma hizrên xwe kir: Rast e eve sêrîyan e û min kurê wê kuşt û ez doza namosa wê dikim. heke vê

gavê êk li vê ra bêt bê guman vê koka min bibit, hema baştir ewe ez biçim, hêj kesê ez nedîtîm! Romî hema li hespê xwe siwar bî, li keçê zivirand: " Ellah bîn bela versin" yanî Xudê hezar bela bidit te û bi rê ket û çû. Keçik derket çalek ji kurê xwe ra kola û têda veşart. Dest avêt destek cilên mêrên xwe kirne ber xwe û bi zelumî xwe pêça û ket li ser rê û çû, heta nêzîkî êvarî li semta bajarekê hat, berê xwe dayê xelkên bajarî hûr û gir, keç û kur, jin u mêr tev wê derketine li rexê bajêr! Hema wê jî qesta wan kir û bê êk bizanî ku jin e! Çaxê giha li nav komê berê xwe dayê teyrek hat li ser serê wê sekinî! Pirsyar kir: Ev çi teyr e? Hindeka got: Ew teyrê dewletê ye. Paşayê me îro sê roj e mirî û bê dûndeye vêca xelkê bajêr vî teyrî hiltavêjin, ka li ser serê kê sekinî ew paşa ye! Li wan gotina da girgirên bajêr hemî bezîn desta û bi paşatî gazî kirmê! Û birin li ser textê paşatîyê danîn û bî paşa!

Roja paşî rabî ser xwe li nav bajêr gerha ka çî kê m û kas hene! Ferman da hemî bên dirost kirin. Û zanî sê dergeh tên bajêr rabî sê şiklên xwe girtin bi jinanî û her şikleke xwe bi dergehêkê vekir û her dergehek denek avê danî tê da û çend nobedar danîn û ferman da heçî ji vê avê vexwar û berê xwe da vî şiklî û keser hatinê wî bigrin ji min ra bînîn.

Ew ma li ser paşatîya xwe, pa ne keça qirala ne, dizanî ka paşatî çawan e? Ser û berê wê çî ne? Xelkên bajêr jê behitîn! Zanî eve ji binemala paşa ne. Rojek ji rojên Xudê serkarwancîyê xwe kirî babê wê rî ya wî li wêdê ket. Dinya havîne! Germa rojê ye, qic qica bi hinavê wî ketî! Hind berê xwe dayê denek avê li wêdê ye! hema dest avêt pîyana - tirara - avê û danî li ser devê xwe, serê wî ser evraz ket çavê wî bi şiklî ket keserek hatê ava xwe xilas nekir hêstira - rundika - da çava! hema êlçîya rahişt milê wî û birin li ba paşê, gava paşê dît li cihda naskir, belê xwe pê nanî der.. Piştî hingê Romî li wêdê ra dibûrit ho berê xwe diditê ew denê avê li wêdê ye hema ji cih kur vediket denî, çaxê avê vedixût, serê wî bilind dibit, çavê wî bi şiklî dikevit keser têne û serê xwe lê dihejînit. Nobedar dest avêjin milê wî wî jî dibin li dev paşê, paşa serê xwe lê hejand û dibêjit: Wî dakin

li ûdekê dî ne li ba yê dî.

Piştî hingê çendekê mêrê wê riya wî li wêdê ket, çaxê avê vedixût ho çavên wî bi şiklî dikevin! Av li gewriya wî da dimînit asê axîn û nalîn lê dikevin qor û qor digrî û dibêjit,: Xwezî wê rojê em her du mirbîna em ne ketibîna li vî halî! Nobedar ew jî girtin û birin û birin li ba paşê, paşê got: gelek baş e. Roja paşî paşê girgirên dîwana xwe hemî komkirin û her sê gazî kirin. Berê xwe da serkarwançî û got: Serkarwançî te çi bî çavên te bi wî şiklî ketin te keser xwarin? Ma xudana wî şiklî çî ya te ye? Serkarwançî got: Bawerke paşayê mezin ne tiştek ya min e, belê çîroka min û wê eve bî û çîroka xwe bi dirustî jê ra got û mêrê wê jî hema hêstira ji çavên xwe dibarînit! Paşa got: Baş e serkarwançî ew keça hinde ter û tol, nazik û nazdar, taze û ciwan heft sala ma li mala te da! Malwêrano ma carekê te maçek lê ne da, xwelî bi sero! Yan mêranî bi te ra nebî? Serkarwançî got: Ya paşayê ker dibêjim te keça min bî? Li dinyayê heye êk berê xwe bi xirabî bidit keça xwe? Belê hûn mirovên mezin dilpîs û xirab in, hewe ne bext e û ne bawer e! Ji lewma to van gotina dibêji! heke min pê çêbîya minê to zîvar zîvar kirbîya! Paşê berê xwe da Romî got: Baş e, te çi bî te keser li ser wî şiklî kêşand? Me zanî ev serkarwançiyê he xwe kirbî babê wê û heft sala mabî li mala wî da? belê te çî ye? Romî jî çîroka xwe bi dirostî jê ra got, Paşê got: Romî malbabwêran ev xifşexezala he te çawa ji destê xwe kir? Ma hema te ramosanek lê ne dida? Romî got: Paşa xweş bit, bawerke ez tirsam ji mirova çunkî sêrîyan bî, nexasim piştî min kurê wê kuştî..

Piştî hingê paşê xwe da mêrê xwe: ha lawê koçer te çi bî li gel wî şiklî te keser hilkişa? Wî jî çîroka xwe hemî bi dirostî jê ra got: Paşê berê xwe da girgirên dîwana xwe: Hûn çi dibêjin gelî girgirên dîwanê? Hemîya pêkve gotin: Ma emê çi bêjin xoştivî madem jinik bi xwe ne hazir e! Hema paşa serpoşa xwe ji ser xwe rakir û xwe da dîyar kirin ku jin e ne mêre! Û got: Eve mêrê min e û destê xwe bi nik serkarwançî ve kir evî heft sal ez bi keçî û babîtu xweyî kirme! Û evî Romîyê he kurê min kuştûye û doza min kirîye! Vêca

ka fermana hewe çî ye? hemîya pêkve destên xwe li singa xwe dan û gotin: Em biryar didin to keçe babî û ev serkerwancî ye. merdemêr e! Û ev Romî ye he jî divêt bighêt heqê xwe. Rabîn du hesp anîn êk têhn û êk birsî, Romî li ser pišta her duka siwar kirin hişk û hişk girêdan, her hespek berê wî dan daxwaza Romî welê kirin du qet. Piştê hingê serkarwancî xelat kirin wek wan bivêt, giregire li şûna xwe kir paşa û çûn mala xwe - bajarê mêrê wê. -

Vêca mîrê min ne ew e, ku hemî jin xirabin û hemî mêr baş in; belkî baş û xirab li nav her du cûna da henê. Çunkî wekî dibêjin: "Şêr şêr e, çî jin e, çî mêr e!" Xwezî mîrê min hema te pirsyar ji nivîsvanî bi xwe kirbîya wî ew serhatiya kes ne bihîstî ji te ra gotibîya, da te jin dîtibîna û mêrkok jî dîtibîna! Mîrê teyra berê xwe da nivîsvanî û got: Ew çî serhatiye nivîsvanê hêja? Ez berê xwe didimê vê kevoka he gelek tuxmê jina bi buha kir! Nivîsvanî got: Mîrê min êkê ji min ra got - û ez baş jê bawer dikim - got ez carekê li mala xwe bîm min berê xwe dayê sê zelum û du jin hatin jorê. Min jî got wan: Keremkin, belê êkê got : Ezbenî ev birayê min dixwazit jina xwe berdit, min jî gotê: Law tê çima jina xwe berdî? berdan karekî giran e û ne baş e.? Yanî ji van şîreta, belê tîyê - birayê mêrê jinkê - got ezbenî bela xwe ji vî bênamûsî veke pare nakit. Bi rastî ez tibabekê guhşîm - ev çî ye, bira dixwazit bira jina xwe berdit? Dîyar e tiştêk li binda heye? Birayê jinkê dibêjit : Pismam bela xwe jê veke xema nexwe dinya ho namînit, wekî dibêjin: "Dinya dihejit belê xirab nabit!" Û mêrê jinkê çorrê xwe pehin kirîye, ne didit ne distînit. Min jî got: Erê hûn nabêjin ka ev çî ye? Jinka biçûk got: Belê ez xadim ez ê bêjim. Tîyê wê got. Pismam xilam bela xwe ji vî bênamûsî veke bila te berdit Xudê kerîm e! Jinka pîr got: Bi Xudê bila bêjit. Mêrê jinka biçûk got: De hema bila bêjit... Birayê wî tif kirê, berê xwe da birayê jinkê - pismamê jinkê - û got: Bila bêjit dinya ye û heyha ye carekê keysê min ji vî pismamî bêt ez bikujim da kes ne bêjit bê bextî birayê xwe kuşt.

Birayê jinkê got: Ezbenî, ev bênamûsê he pismamê min û birayê vî zelumî ye. Mirovek şelatî û zigurt bî, min got bi-

rayê wî yê mezin - evê he - da birayê te bi jin bikîn belkî bi-
 bit mirov! Got pismam bela xwe ji birayê min veke, wekî
 dibêjim: "Xweyê xanî ji hemî kes pêtir dizanit ka çî di
 xanîyê wî da heye! Birayê min şelatî ye keça çi camêra neke
 li dereka wî da. Min got pismam : Ev e, dotmama wî ye,
 wek sêvek sora xelatî ye! Heke em bi jin bikin belkî bibit
 mirov. Ez mam pêve heta min ew li berra kir. Vêca ez mam
 bi vê xûşka xwe ve heta min ew jî li berra kir ku şû pê blkit.
 Min xûşka xwe dayê bi yadîgar heta çekên wî jî min ji ba
 xwe çêkir û xanî min dayê û min têda kir zava ne li ser xêrê
 bit. Ji vêdê pêve bila xûşka min çîroka xwe tamam bikit.
 Got ez xadim: Ez birim sê mih pêve ne çûn min carekê deng
 û pêjnek li devê derî sehkir, min we zanî dengê wî ye - mêrê
 min - paşî min dît zelamekê derê hewşê vekir û hate jor!
 Min pirsyar jê kir: Te xêr bit bira? Pa ne malxwê min ne li
 mal e! Mêrik got: Malxwê te ez anîme li derê hewşê û zivîrî,
 ma min çi ji malxwê te ye? Min pênc dînar dane malxwê te
 li şûna ez îşev li dev te bim. Çaxê min ev xeber sehkir, din-
 ya li çavên min tarî bî min rahişte xebera - çekên jina -
 hema here wî bigê. Bi çî kul û hala min bela wî ji xwe vekir.
 Ez mam min hizrên xwe kir, ez pê baxivim şerm e û ne axi-
 vim kesê ev bênamûsî ne kirîye û sehnekirîye, were were
 mêr qewadîyê li ser jina xwe bikit! Êvarî mêrê min hat min
 gotê, law ma te hizir kirbî ku min li mala babê xwe da pîsatî
 fikir heta to li vêdê zelama rêkî ûda min? Min tibabekê pûr
 û gazind kirin û paşî min got careka dî tiştê holê ji te
 çênebit ez ê bêjim birayê te û pismamê te da te bikujin! Wî jî
 got : Min tobeye. belê wekî dibêjin: "Qûna hîbî tira û devê
 hîbî vira çênabit heta kurê kura." Ez mam welê dil bi tirs û
 dil bi xem! Heta duhî, min berê xwe dayê dîsa zelamek hate
 jorê, wî jî wek yê dî (5) dînar dane mêrê min ku mala min
 nîşe bikit. Tiştê li destê min da ma hema ez revîm mala tîyê
 xwe. Eve, çîroka min û wî ez xidam . Ê bi Xudê min parçe
 parçe bikin hêdî ez û ew pêkve nabin malek!

Hema min jî tif kirê û siktir kirê û deranî min got jinkê:
 Hema to bi xwe berdayî keça min here mala xwe.

çaxê mîrê teyra ev çîrok hemî zanîn berê xwe da qirê: Ez

we hizir dikim te bê bextî li gel vê kevokê kirîye here kevo-
ka min hingî to li ser fexên xwe bî yên te ne ne yên kesî ne.

(430) Jina bê heya wek girara bê xwê ye.

Bi rastî em gelek li ser jinê axivtin, bi kurtî tê peyva jinê
yan kurt kirîye ji peyva jînê ye, eger baş û ji xwe şerm bit,
yan kurt kirîye ji peyva janê ye, eger xirab û bê fihêt bit.

(431) Ji bivê nevê mirov guştê kewa jî dixût.

Bi rastî çaxê min ev gotin sehkirî ez tibabekê li ser rawes-
tam, min ne zanî ka daxwaz ji vê gotinê çî ye? Min pir
hizrên xwe kirin, ez we têgeham ev gotin hatîye guhartin.
Yanî binyata wê "ji bivê nevê mirov guştê kera jî dixût" û
ez mam li ser wa hizra heta min bi çavê xwe dît, min zanî ez
bi daxwaza vê gotinê ne ketime û tê negihame! Belkî ew go-
tin dirost e, çaxê dibêjin; "bivê nevê mirov guştê kewa jî
dixût." Yanî mirov gelek cara hindê kar û pêngava tavêjit ji
xwe zêdetir û hemî kes jî dizanin ew kar ji mirov zêde ye,
belê pa mirov ne çare bikit. Vêca hindê bêjin ev çî ye vî
karê ji xwe zêde dikî? Ew nizanî ka halê mirov çî ye? Mi-
rov bêjit: de babo bi Xudê "ji bivê nevê mirov guştê kewa jî
dixût."

(432) Ji bangurê girantir bi ser çûka da nayêt!

Here li gotina (659) temaşe bike!

K

(433) Kaxeza gurî ye ne kes dixwînit û ne kes
guhê xwe diditê!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê gurgek li semta rûvîyekê hat û rûvî ageh ji xwe nebî! Hind dît difna wî ma bi ya gurî ve! Gurî kenî û got: Bi xudê to xweş firavînî, ev e du roj in min xwarin tam nekirî. Rûvî got: - Ho bi cers û bê pakî wek pûte pê nekit - lê vegerand dê were min bixwe loooo! Min ji vê zoqaratê qurtal bike. Ez ne hêja me bû jîyanê û ez bo kê dikim û wê bibit çî! De were, were min bixwe, da ez tena bibim; bila her se bi dûv qûna hewe ve bin! Hûn carekê xwarinekê bi tenahî nexûn. Gurî ho ji xwe şerm kir, got te çî ye Xudê kujtîyo? Rûvî got: hezar cara Xudê min bikujit û jiyê min nemînit û ew karê ez bi dûv ketim! Ka were min bixwe bila bi xêra te bit da ez tena bibim, vê çend qencîyê to li min bike, were min bixwe! Gurî got: Baş e ma to nabêjî te çî ye? Rûvî got: Eve, sê meh in ez bi rêka Stembûl ve li ba Sultên guftûgo me bi hev ra kir, min gotê; to sultanî û xelîfeyî ne bes yê mirovanî! Belkî her welê yê heywana jî. Wijdan qebûlnakit hinde neyartî û dubendî û berberî, xwînrêtin li ser axa te bêt kirin û te li Stembûl xwe li pişt heft dergeha da veşartîye, ne xwînxwer bit nagehêt te! Bo çî gurî wê neyarê pezî bit û se dijminê gurî bit, yanî milletê te hemî bi hevra neyarbin, sê pişkên wê bi zordariyê û ne wek hevîyê ye! Çima to edaletê li nav wan da nakî û qûtê teva misoger nakî? Heta tev wekî bira pêkve bijîn, bê lêdan û ceng û sotin û kujtin û talankirin. Li şûna wî qasî ku her yek bigerhit da keysê xwe ji hevalê xwe bînit da derbekê lê bidit, ya tişteke jê biçelqînit, bo çî to wenakî vêkra êk bin û bira û avakirinê bigerhin? Heta xweşî û tenahî li hemî rex û rûyê welêt belav bibit û hindek hindeka biparêzin! Ma to ji Xudê natirsî? Tê sibê bimrî û to berpîrsîyarê vî milletî, bersiva te li ba Xudayê te wî çî bibit? To çima wenakî, gurî jî bi-

bit parêzkerê mihê li şûna dijminahîya wê bikit? Eger gurî pişt rast bit ji êmê xwe wê çima hinde çavbirsî bit? Heta eger keysê wî jê bêt wê hezar miha li ser êk bikujit û bi xwe jî êkê xilas nakit! Êk mirov wê hezar du hezar pez bêxit li gova xwe da û çend sa wê lê bikit nobedar bi çar parîyên nanî bi xwe carekê hestîyek bi çar tilya ji derê mala wî dur nakevit! Wê guşt xwar û hestîyên rût avêt li ber sa! Û gurî li çolê bila êşka bikit zikê xwe! Gava ji ji neçarî û bivê-nevê bêt li dora mala belkî merarekê yan tiştekekê bibînit debara xwe pê bikit. Hemîya pêkve - mirov û se - wê ketin li dûv: Hey gurî ye û hey hey gurî ye... Wernê nehêlin qurtal bibit. Heke ne çeleng û jîr û jêhatî bit wê bibit lêvokê sa. Pa ew jî ji (tengîya xwe û ji kul û mereq û keser û derdên xwe çî tişta bikevit ber jê nabûrit. Se bit yan mirov bit yan pez bit. heta heke sê hezar pez jî bikevit li ber singê wî êkê bi sax nahêlit! Çunkî dizanit her jê bê behr e. Ev e, bo çî? Çunkî to wek heyva meha zivistanê li bin ewrê da nayê dîtin, te xwe li pişt heft dergeh û perda da asê kirîye û pişta xwe daye êl û miletê xwe û te ageh ji wan nîne ka halê wan çî ye û çawa dijîn û çawa bi hev ra derbas dikin? Eger Sultanê holê bit ez rûvîyek im. Ez nikarim sultanîyê li dinyayê hemîyê bikim, ne bes li ser misulmana bi tenê! Gurî got: Bi Xudê te gêre jê çêkir! Belê pa bersiva Sultanî çî bî? Rûvî got: Min li bera kir ka biryarek Sultanî deranî ku hêdî kes neyartîyê bi kesî ra nekit û qûtê her kesê bêt misoger kirin û tev wekî bira bin da bikarin welatê xwe ava bikin û biparêzin ji destê bîyanîya. Heywanên guştxwer her biznek bo deh kesa û mihek bo pazdek kesa û gîskek bo pênc, ev e, kaxezek jî min ji bawerîya anîye da ez vê fermana wî li nav heywana hemîya belav bikim. Û Sultan jî wê ji layê xwe ve vê fermanê li nav mirova da belav bikit. Gurî got: De Xudê ev e, pênc roj in min tiştekek ne xwarîye! De ka rabe çarekê bike nîzîke ez ji birsa bimrim! Rûvî got: Wê he kerîyek pez here vê kaxezê bide şivên bêje "babo em du ne ka gîskekê bide mebila hûr bit ji sê roja ra. Belê kaxezê ne hêlî li ba wî! Heke to çûyî çêdibit hêj fermana Sultanî ji wan ra ne hatibit! belê xwe ne tirsînî û guhê xwe nedî sa êkser here li ba şivên. Gurî kax-

ez bir û çû qesta şivên kir! Çaxê şivên ho berê xwe dayê şiv şivek gurya wê ji wê ve têt û bê pakî! Nav li sa da: Wişt Qero û Hirço!.... û sa ji cih kurvekirin gurî û girtin û vegij-giandin. Gurî li xwe zivirî berê xwe da rûvî! Rûvî gotê: here qesta şivên bike guhê xwe nede sa. Kaxez bide şivên. Gurî got: Mala babê te wêran bibit; "kaxeza gurî ye, ne kes dixwînit û ne kes guhê xwe diditê!"

Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek bixwazit bi êş û derd û birînên xwe bidit dîyar kirin û kes pûtê pê nekit wê bê go-tin "kaxeza gurî ye, ne kes dixwînit û ne kes guhê xwe diditê."

(434) Kesê ji testa xwe têt ne bit ji mala xelkê têt nabit.

Axaftin li vê babetê hatîye kirin li gelek ciha da û here li gotina (91) ê binêre!

(435) Ker jî dibit qurban.

(436) Ker îblîs e, derman werîs e.

(437) Kes nabêjit dewê min tirş e.

(438) Kew kûder xweş e? Got; erdê ez lê bîm ferx!

here li gotina (387) temaşe bike!

(439) Kengî bibarî hingê zivistan e!

(440) Kê tir kir? Xerîbî gund kir!

(441) Kenê bê ara tê ji qulên dîwara!

(442) Keça qereç nabit xatûn.

Binyata vê gotina dibêjin carekê paşayek li nav bajarê xwe digerha berê xwe dayê qîzek belengaz û geda wa ji xwe ra parsîyê dikit. Gava çavê paşayî lê ket ji dilekî heyne ji hezar dila dilê wî ketê! Rabî gazî kirê û bire malê û li xwe mehir kir. Bê ku bizanit ev e, keça kê ye û ji kû ye! Demekê dirêj pêkve bûrandin daxwaza paşayî bî ew ku carekê her du bi hev ra xwarnê bixûn, belê her jinkê hêcet digirtin û ne dihat. Paşayî ji xwe ra got dîyar e egerek ya vê jinkê heye ji lewma xwarnê bi min ra naxût! Divêt ez hişyarîyê lê bikim ka ez wê egerê dîyar nakim. Rabî siharîyekê derket ji dizî ve xwe kire nobedar ka jinik wê çî bikit! Berê xwe dayê jinik rabî ser xwe çû hindek nan anî kire parî parî û her parîyek êxiste li pencerekê da û tûrê xwe da milê xwe û çû li ber wan pencera û li gel pencerê axift û got: Xatûna min mala ava bit bi xanadan bit zadekê bide şaqolî ev çende em birçîne begzade li hundur da maye ji nêza nikarit derkevit; bila sedeqa serê paşê bit parîyek nan bit, piçek rûn bit, hinek sabûn bit, mecîdîyek pere bit, kevne cilek bit, hema çî bit? Ev gotin got û destê xwe bire pencerê parîyek nanî deranî, kire tûrê xwe û çû li ber pencera dî heta ew xwarina li pencera da hemî kom kir û rûnişt xarê û xwar. Paşa wê ji derve guhdarî dikit. Serê xwe hejand û got: "Rast e, keça qereç nabit xatûn."

Vêca ev gotina he tê gotin çaxê mirovek xwe bi êkê ve xemxwer bikit û xwe pêve bi êşinit da wî ji kêmahî û pûçatîya qurtal bikit, belê ew dilvirjiyê wan kêmahîya bit! Wê jê ra bê gotin : " Keça qereç nabit xatûn."

(443) Kesê dî û bab çenekit çaxê wî çêkit.

(444) Kewên lîsandinî wekî kelandinî.

(445) Kurê ji nêza mirî! Got ma hebî ne keriff!

(446) Kerî kurtan jê dimînit û zelumî nav jê dimînit.

(447) Kerê pîrpêja gurga xwar.

(448) Keyfa me bi Xunavê xweş bî Xunavê jî kurek mirî anî.

Ev gotina he tê gotin gava li malê da yan li gundî da mirov hemî hizir û guman û hîvîyên xwe bavêjin li ser mirovekê û çavên wan ji wî teji bibin û piştta xwe bi wî girêdin û germ bikin, paşî ew jî derkevit pûçek bêxêr dê bê gotin: "Keyfa me bi Xunavê xweş bî, Xunavê jî kurek mirî anî."

(449) Keçelo mû bi serê te ve nîn in! Got kezîyên xaleta min li qûnê dikevin!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek fort û pesnê xwe bi hindek dî bidit û ew bi xwe bê xêr û bê kêr bit û wê bê gotin: "Keçelo mû bi serê te ve nîn in! Got; kezîyên xaleta min li qûnê dikevin!"

Wekî vê gotinê ye, çaxê dibêjin: "Hêstirê navê babê te çi ye? Got navê dîya min mehîn e."

(450) Ka ya te ye, ma kadîn jî ya te ye?

Ev gotina he tê gotin gava mirovek tiştê bidit êkê, vêca ew rabbit wî tiştî bê xweyî bikit wê bê gotin; "kaya te ye ma kadîn jî ya te ye?"

(451) Kurmê darê ne ji darê bit, zewala darê nîn e!

Ev gotina hê her ji wî qasî rûhintire ku axiftin li ser bêt kirin.

(452) Kolkê pîrê xweştir e ji burca mîrê Cizîrê.

Temaşa bike li gotina (772) ê, em tibabekê li vî babetê axiftine.

(453) Kesê mino destê mino.

Bê guman e, ku divêt mirov li hemî îş û karê xwe da xwe ne hêlit bi xema xelkê ve çunkî xelik ne wek mirov xemxwerrê karê mirovî ye dibêjin carekê çûkek ji çêrê zivirî berê xwe dayê çêlkên wê gelek bê ser û ber in. Dil bitirsin, bihên bizdane! Makê got: hewe xêr e dayê qurban? Gotin: Dayê îro xweyê vî dexlî û kurê xwe hatibîn li nav dexlê gerhan, babê got kurê xwe: Lawê min genmê me wê zerbî ye, divêt em bidrûn. Subehî here li ba xizmên xwe bila bên arî me da em bikin danek rojê. Vêca em tirsan me got neku bên bidûrin hêj to ne hatî wê me bi desta bigrin. Makê got: Xwe netirsînin hingî wî xwe bi xema xizma û dosta hişt ve hîç pûte pê nekin. Roja paşî bab û kur hatin, belê hingî man li jivana xizim û dosta kes dîyar nebî! Babê got: Lawê min kes ne hat! To sibehî here ba pismamên xwe bila ew bên arî me. Mak zivirî li ser hêlûnê berê xwe dayê çêlkên wê ji tirsî dîsa wê dilerizin! Makê got: Dîsa hewe çî ye? Gotin bab û

kur hatibîn belê kes ji xizma ne hatin. Babê got kurê xwe: Here li ba pismamê xwe ew bên arî me. Vêca me got: Misoger e wê bên û to ne li vêdêyî me ji destê wan qurtal bikî! Makê got: Ne tirsin, belê sibehî guhê hewe lê bit ka wê çî bêjin hev. Roja paşî bab û kur her du hatin belê hindî mam kes dîyar nebî! Babê got kurî: Ji xwe ye lawê min wekî dibêjin; "li hîvîya yarê dimînit bê dûndan." Rabe da biçîn malê, her mane em her du. Sibehî zû dasa xwe hilgire da bên kenmokê xwe bidrûn hêj pûç nebîyî! Mak hat li ser hêlûnê pirsyar kir: Guftogoya babê û kurî bî çî? Çêlikan gotin: Ho got... Makê got: Rabin da hewe birevînim hêj heyîv neçûyî ava, dinya tarî nebîyî. Çêlikan gotin: Baş e, to çima duhî û pêr ne tirsayî wekî îro? Makê got: Hingî duhî û pêr bî babê xwe bi xema xelkê ve hêlabî min zanî ji xwe ye karê wî dê bimînit li cihda, belê madem zanî kesê wî destê wî ye, bî cihê tirsê û divîya ez îsev hewe rizgar bikim çunkî bi rastî ji kevinda hatîye gotin; "kesê mino destê mino." Û ji ber vê êkê hatîye gotin: "melevan û basik û milên xwe." çunkî gelek di cihê xwe da ye çaxê dibêjim:

(454) Girêka xwe bi destê xwe venekî kes ji te ra venakit.

Û bê guman e, wekî me burandî ku dilç kesê wek yê te ne bi te ve ye, belkî divêt to bi xwe zîrek û çeleng bî çunkî wekî dibêjin:

(455) Ker dikevit birih bi xweyî dikevit!

Heke xweyî bi xwe xwe li berda ne êşînit kes ne bivênevê ye xwe bi êşînit.

(456) Kehrê guhî berxê girt û kehrê kir qarîn!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek teşqelek û nexweşî û

bela ji hindeka ra çêkit û ew gazinda bikit wê bê gotin:
"Kehrê guhî berxê girt û kehrê kir qarîn." Wekî vê gotinê ye
çaxê dibêjin: " Wî li min da ye û ew digrî!"

(457) Ker bêhna buha sehnakit!

Li gotina (54) ê temaşe bike!

(458) Keçel Hesên yan Hesên keçel!

(459) Kêrvoşka nêr û mê xurtek ji êk başqe dik
it!

(460) Ker ve best xem verest.

(461) Kutilka min jî ji Berfo ra.

Binyata vê gotinê, dibêjin carekê jina mirovek geda çû
mala zengînekê bi xadimî kar bikit. demek kê m pêve ne çû
zivirî, belê dilteng û keyf nexweş, mêrê wê pirsyar jê kir: Te
çî ye? Jinkê got: Min çî ye? Bila filan kes - behsê zengîni -
ho li te bikit, heke to kiryarekê li gel nekî? Mêrik got: Baş e,
da ez bizanim ka çî kirîye? Heta ez bizanim ka ez ê çawa
biçim? Jinkê got: Bi Xudê doza şerma min kirîye ez bi rev
revîme heta ez qurtal bîme! Mêrik got: Baş e, ev e ez çûm bi
xatrê te û zûka pirsyara min neke. Mêrik rabî xwe bi jinani
xemiland çû qesta mala wî zengîni kir. malxwê malê pirsyar
jê kir: To li çî digerrî? Jinkê got: Ez ji xwe ra li xadmîkî
digerhim. Mêrik got: gelek baş e, hema were li nav mala
min da kar bike û bixwe û vexwe. navê te çî ye? Got: Xadi-
ma te navê wê Berfo ye. Malxwê got: To gelek bi xêr hatî
Berfîn. Çend rojeka ma jinaxa berfo got: Berfo rabe malê
lêk bide em ê biçin balavê. Got: Belê xatûna min. Rabî bi lez
û bez mal lêkda û teşt û sîtla - mencela balavê - xwe da pişt

xwe ew û xatûn û her sê keçên xatûnê li dûv hev ketin çûn li ser avê. Berfo agir xweş kir û sîtla xwe siwar kir û teji av kir. xatûn rûnişt li ber balavê û keça girte heneka - yariya - Berfo bi hêceta pejînka keça mezin varî kir û ketin gotin û çîroka. Berfo got: De ji Xudê bixwaze belkî te bikit zelam. Keçkê got: Ez zanim daxwaza min bi cih nayêt, belê to jar û belengaz î, to ji Xudê bixwaze te bikit zelam. Her duka pêkve destên xwe ervazî kirin û ji Xudê xwestin Berfo bibit zelam. Berfo carekê destê xwe bire li nav teşka xwe, xwe giriyand û lorand: Weyla kezî kurê Berfo pa bi Xudê ez bîm zelam! Keçkê got: To rast dibêji? Berfo got: Çawa ez rast nabêjim, destê xwe bidê rebenê? Keçkê destê xwe bir li nav teşka Berfo berê xwe dayê ew singê li nav teşka da wekî darkê wê lê hatû! Berfo li wêdê neh û dehên keçkê dirost kirin û her duka sond xwarin ku kes pê ne axivit. Zivirî li ba xatunê. Berfo keça nivê varî kir bi wî awayî ew jî kire hevala xûşka mezin, zivirî Berfo keça biçûk bir ew jî wek her du xûşka... Heta hatin dayê balav xilas kir û serê her sê keça şoşt û her sê ka xwe varî kirin, her êk çû bêzaneke xwe da tavê. Man Berfo û xatûn. Berfo û xatûn jî bi riya keça ve rêkir! Xatûnê got: Here cijên axayê xwe bîne nihû hatîye malê! Berfo rabî çû mal gote axayî: Ez xadim ka cilên xwe bide xadima xwe da ez bibim. Belê Berfo dilê axê mizmi-zand! Axê got: Berfo were jorê. Berfo çû jorê axa rabî dergeh girt û rahêla Berfo. Berfo hindî xwe ji ber axê revand. Axê got: Ne reve to qurtal nabî! Berfo got: Ez xadim, ez ditirsim niho jinaxa min yan mirovek dî bêt! Axê got: Kes vê gavê nayêt! Berfo got: Cilên xwe bêxe û xwe pêkbîne. Axê xwe rût kir. Berfo got: De ka serê xwe li wê kulekê ra derxe kes nayê? Axê serê xwe li kulekê ra deranî! Hema Berfo şonve axa girt û singê xwe li kuleka axê ra kir heta ew jî kir hevalê xatûnê û her sê keça. Êvarê tev rûniştin, li ser şivê bê ku êk li gel êkê baxivit - şiva malê kutilkin - keça biçûk got: Ez bi xwe têr im, kutilka min ji Berfo ra bit, ya nivê got: Min jî navêt bila ya min jî ji Berfo ra bit. Keça mezin got: Ez jî naxûm ya min jî bila ji Berfo ra bit, wê jî xwe da paş û dayê got: Bi Xudê ez jî westa me û ne rehetim. Ya min jî bi-

din Berfo. Babê got: Bi Xudê ji xwe yê westayî ez im, kutilka min jî ji Berfo ra!

(462) Kero ne mire heta qîvar hişîn bibit.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek li rêbarekê diçû kerê wî li pêşiyê bî bi rêva alîka kerê wî nema û ne giha çî avahîya, ker qerimî ji birsa êdî nekarî gavê bavêjit, xweyî hat û çû nezanî ka çî bikit? Hema ji mereq û kul û derdên xwe çû nezanî ka çî bikit? hema ji mereq, kul û xem û derdên xwe da çû li ber serê kerê sekinî û got: "Kero ne mire heta qîvar hişîn bibit!" Belê didanê kerê qîç bibîn û ker mir. Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek êkê dilxweş bikit û ser girêdayî bikit bi tiştêkê ve û ew tişt dûr bit û ew êk li wê gavê li tengîyek mezin da bit û ne ber hîvîye jê qurtal bibit, wê bê gotin : "Kero ne mir heta qîvar hişîn bibit!"

(463) Koro te çî divêt? Got: Çavek rûhin û girarek rûn.

Ev gotina he tê gotin gava êk bo mirovek tiştêk xweş bêjit, ez ê ji te ra ho bokim yan dê ho çêbit! Ew mirov bawer nekit, belê ew li ser gotina xwe mukum e, wê bê gotin: "Koro te çî divêt? Got: Çavek rûhin û girarek rûn!" Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Xweş xeber e, belê min ne bawer e!"

(464) Got kitkê guyê te derman e dema rît ax da ser!

Ev gotina he tê gotin çaxê pesnê êkê bêt dan ji ber çakîyekê ya wî vêca ew ji ser xwe biçit û wê çakîyê bikit xirabî bilewûnit û berze bikit, wê bê gotin: "Got kitkê guyê te derman e, dema rît ax da ser!"

(465) Kike ne li mal e, navê mişk Ebdilrehman e.

Ev gotian he tê gotin gava malxwê malê yan meznê gond ne hazirbit vêca pûçek û bê xêrên wan ji ser xwe biçin wê bê gotin: "Kitik ne li mal e, navê mişk Ebdilrehman e." Nîzîkî vê gotinê ye, çaxê dibêjin: "Nêrî nemînit dibêjin gîska belo belo!"

(466) Kitkê hingî hilavêjî wê li ser lingê xwe bi seknit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ser hizrekê bit û jê ve nebit û neyêt xarê û hingî mirov rîya çakîyê nîşê bikit, her ew li ser hizra mukum û asê bibit wê bê gotin: "Kitke hingî hilavêjî wê li ser lingê xwe biseknit!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Meqewrê -kulindokê - der nevekirî ye hingî avê pêda bikî nav nakevit!" Yan çaxê dibêjin: "Hingî ez singekê biqutim to çeltekê pêva dikî!"

(467) Kitkên zemîn dîngên qelew dixûn!

Ev gotina he tê gotin bo wî kesê ku bi nermî û binvebinve û dev xweşîyê bikit heta ahên xwe bi cih bînit bê ku weçêbikit zêrevanî lê bêt kirin, wê bê gotin: "Kitkên zemîn dîngên qelew dixûn!"

(468) Kula Mendo kulor in.

(469) Kula aşvanî aş e.

Ev her du gotinên he tînin gotin gava li malê da yan li gundî da xem û xiyalên mezin hebin vêca bê xêrên wa me-req mezin ji tiştêk bê biha bixûn, we bê gotin: "Kula Mendo

ulor in.Kula aşvanî aş e:" Here li gotina (119 û 120) an binêre!

(470) Karite ji kifra ranabin!

Kifir darek e li ber avên boş hişîn dibin - nexasim li ber ava Kabûr li Zaxo - û bê bejnê û têr ta ye (çiq e).

Vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek ji êkê ber hîvî bit bi îstekê û ne adetê wê bit wec - hew - cehî - girtina mirovan û ew hîvî bi cih neyêt wê bê gotin:"Karîte ji kifra ranabin!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(471) Ka kevin dan jê nakevin.

Yanî ewê ne yê çakîyê bit bawer neke qencî jê çêbit, çunkî wekî dibêjin:"Dihlên tirek jê çênabin seyên bezek."

(472) Kulka qonê ye ne zer e û ne dere!

Her temaşake li gotina (788) ê bike em tibabekê li vî babetê axvîne.

(473) Kes wek destê te nizanit kûda te dixwerit!

(474) Kûçkatîya sa ne biçûkatîya bira!

(475) Karê demekê çêtir e ji axivtinê salekê.

(47 6) Kêvjâl nikarin bifrin.

Ev gotina he tê gotin gava êk lingê xwe ji berka xwe dirêjtir bit û xwe li pêngavên mezin û xwe mezintir bidit, wê jê ra bê goin:"Kêvjâl nikarin bifrin."

(477) Kurmanc kere hingî rûnit ew rê li ber e!

Ev gotina he tê gotin gava mirov karek li nav desta de bit û ew xwe sist bikit û hîn û mîn bikit wê jê ra bê gotin: "Kurmanc kere hingî rûnit ew rê li ber e." Nîzîkî vê gotinê ye, çaxê dibêjin: "Hingî kêrvoşk bimelsit gavek zêde wê lê bikevit!"

(478) Kodka teji li ya vala ne de!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek heyî û kedxwar bit, rabit bela xwe li rûtekekê bidit, wê jê ra bê gotin: "Kodka teji li ya vala ne de." Çunkî rûtek bi xwe kodka wî tiştek têda nîne, hema li erdê jê bikevit tiştek jê narijit, belê ya teji hema bilivî wê bi ser da biçin.

(479) Kes bê sela nabit mela.

Bi rastî ez daxwaza vê gotinê bi dirostî nizanim, çunkî ewe ê min ev gotin jê sekiirî min pirsyar ji wî jî kir wî jî nezani. Belê ez welê hizir dikim daxwaz ji vê gotinê ew e, yanî kes bi tenahî û sanahî nakevit, belkî wekî me bûrandî; "heta kefa destî reş nebit tama devî xweş nabit." û "Heçî nebînit zehmet naxût ne`met."

(480) Kevjalê to çima xwehir rêva diçî? Got keysê min hew jê têt.

Ev gotina he tê gotin gava mirov bibînit êk pêngavên ne dirost tavêjit mirov çî ji halê wî nizanit, vêca gazinda jê bikit. To çima ho dikî û ho nakî? Ew bersiva wî bidit bêjit: De mal ava got: "Kevjalê to çima xwehir rêva diçî? Got: Keysê min hew jê têt." Nîzîkî vê gotinê ye gava dibêjin: "Kurê ji nêza mirî! Got ma hebî û ne kerifî!"

(481) Kero mêvanê hero.

(482) Kî yê bixût û kî yê li xwe bidit!

(483) Keçê gan nîşa dayê didan!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek zana bit li tişteke da û êk nezan bê her wî tiştî nîşe bidit û jê venebit û bela xwe jê venekit wê bê gotin : "Keçê gan nîşa dayê didan!"

(484) Ker bi karwana qelew nabin!

(485) Kera ne bin li ba kera, heyne wê ji hev du bigrin fis û tira.

(486) Komê Xiço li serê Piço heçî hat û heçî çû!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li karekê da hingî hizir û tevgêra xwe bikit, belê tişteke jê nebit der û her bivê-nevê ye wî karî bikit, wê bêjit de bi Xudê ez ê rabim bikim "Kumê Xiço li serê Piço heçî hat û heçî çû!"

(487) Kî wefa ye, ew bira ye!

(488) Kew ezmanê kewî dizanit.

(489) Kûder xwar e, ew der war e.

Yanî ka jîna mirov kûda ye û li ser kîj erdê ye? Ew der cih û warê mirovî ye. Divîya mirov hemî hêz u karîna xwe li wêrê xerc bikit. Ne welê bit wekî dibêjin: "Nanê Îsa dixût

û selawata li ser Mosa didit."

(490) Kelemerê cihê te li kûdê ye? Got: Ba di zanit!

kelemer kerenga hişk e. Wekî ez daxwaza vê gotinê tê digihêm, yanî mirovê hatin û çûna wî ne bi wî bit, belkî bi êk ji wî xurtirbit, ew wî bibit û bînit, gava pirsyar bê kirin: Filan kes li kûdê ye? Wê bê gotin: De mal ava gotin;"kelemer cihê te li kûdê ye? Got: Ba dizanit!"

(491) Kujîyê têrê dirha destîyê pûş xiste di qûna kerê da.

here li gotina (113) ê binêre!

(492) Kiştên bê fiştên nîne!

(493) Gêre bi gulka nabit

Here li gotinên (18-19) an temaşe bike!

(494) Karê îro ne hêle ji bo sube ra.

Bi rastî ev gotina he ji wî qasî ruhintir e, ku axivtin li ser bê kirin, çunkî wekî dibêjin: Her tiştêkê belayek heye, belê baş êxistinê gelek bela hene."

(495) Kêlka xwe - sêlka xwe tû jê xilas nakit ne saxim çar liv tû jî bêxit têda.

Li gotiana (244) ê temaşe bike!

(496) Kes nabêjit ka babê te, her kes dibêjit ka

dîya te...

Ev gotina he tê gotin gava êk li dûr êkê bêt û biçit û her berê wî li daxwaza xwe bit! Carekê berê xwe nedit daxwaza hevalê xwe, wî çaxê wê bê gotin : "Kes nabêjit ka babê te, her kes dibêjit ka diya te!" Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Her kes berê tefşo didin xwe!"

(497) Koro li vir be ez ê bigerim heke min ji
kurê xwe çêtir dît baş e, heyne ez ê li kurê
xwe vegerim.

L

(498) Li rîya here bila dûr bit, li borîya here bila kûr bit, keça bîne bila pîr bit.

Bê guman e gava mirov, kete li ser rîyekê û gava rê berda û kete li ser kore rêka ew mirov ji nexweşî û tirsê qurtal nabit, çunkî windabîn, asêbîn li pêşîya wî da heye, vêca ev gotina he bi mirova didit zanîn berdana rêya rast û dirost û girtina kore rêka ne baş e û xirab e. Her wekî rêbarîya borîyê avê, divêt mirov li borîya derbas bibit, ne qesta cihê kûr û bê qam bikit. Her welê ew ê jinê bînit, bila keç bit bila mezin bit! Çunkî hingî keça fêlbaz û davdoz nebîye. Belê heke bî jinûbî wekî rûvîyê feltûnok lê tê. Dibêjin carekê êkê pirsyar ji êkê serhatî kir û got : Mam jina min mirîye û ez xweyî zarok im, divê ez jinkê ji xwe ra bînim ka ez êk çawa bînim? Got: Hey keçe ez û to dizanim, heke bîjine û bê zarok e to dizanî heke bi zarok e ne ez dizanim ne to! De vêca here, yanî heke keç e te çawa divêt tê welê rakî? heke bîjine bê zarok e to dizanî ma li ser zanîna te ku to bikarî mêrê wê yê berê ji bîrê bibî! heke bi zarok e, to nikarî bi çi miqama gel derbas bikî.

(499) Li jina xwe hêcete dibêjit: To çima qûna xwe li ber bêjingêra dihejinî!

Li gotina (252) ê binêre!

(500) Lawê derewîn dixût carek firavîn.

(501) Lêhatin ji jêhatinê çêtir e.

Bê guman lêhatin ji jêhatinê çêtir e bo mirovan. Dibêjin carekê belengazek li gundekê hebî gelek jar û geda bî, çaxê jina wî çûbîya balavê ew ê ma bîya li hundurê xanîyê xwe heta jin ji balavê dizivirî! Çunkî ji destek cil pêve nebî! Carekê jina wî çû balavê ew dîsa ma li jûrve, jinka li ber kuçka balavê, berê xwe dayê xatûnek hat ser avê û xadimek wa li dûv û cilên xatûnê hilgirtine. Zîq zîqa şimka xatûnê ji dur ve mirov sehdkir! Çekê xatûnê jinekê tînit! Xatûn rûnişt û xadimê serê wê şuşt û destê xwe hejand û zivirî mala xwe. Xadim ket li ber balavê. Jinka belengaz pirsyar ji xadimê kir: Erê ev jina kî axayî bî? Xadimê got: Ev e, jina seydayê gund e. Jinkê got: Ev e, jinka mele bî? Xadimê got "belê." Got: To çî ya wê yî? Xadimê got: Ez xadima wê me. Jinka belengaz hema serê xwe hejand... û rabî cilên xwe şil lêkdan û testik û sîtla xwe da piştta xwe û çû mal. Cilkên mêrê xwe avêtin ber hêj şil! Mêrik got: keçe ev cilik şil û pilîn! Çima te zuha ne kirin? Jinkê got: Ez nizanim, rabe ser xwe here bibe mela heke bi Xudê ez û to pêkve narûnîn xarê û ez ê rabim ji xwe ra biçim! Mêrik got: Malbab wêranê jîyê min bîye 70 ê hêj ez nizanim destnivîj bişom ez ê çawa bibim mela? jinkê got: Ez van çîroka nizanim yan tê rabî biçî bibî mela yan jî ez ê rabim ji xwe bi erdêkêve biçim. Mêrik berê xwe dayê jinik li ser gotina xwe binecih e. Hizrên xwe kirin, ji xwe ra gotin: Ez ê rabim bêhnekê xwe varî bikim heta piçkê bêhna wê fireh bibit! Rabî çû ji gund varî bî, qesta şikeftêkir da agrekê ji xwe ra bikit belkî cilkên xwe zuha bikit. Rûnişte xarê û agrê xwe xweş kir û cilên xwe zuha kirin ho berê xwe dayê ferşikek tenik wê li wê erdê ye. Wî jî dest avêt piçek rejû û bi ser wî berî ve bir û anî hing xîçik lê kirin berê xwe dayî ji xwe ra got: Ez gunehê Xudê ez ê çawa bibim mela? Ne ez dizanim bixwînim û ne ez dizanim binvîsim, li wan hizran da berê xwe dayê çar zelama da li serê şikeftê û her çara xwe avêtin lingê wî û gotin: Seyda li bextê te û bextê Xudê ev e hefteyeke (12) hêstirên me winda bîne ka to ji me ra berê xwe nadî kitêbê ka dewarên me li kûdê ne, em te ji bîr nakin. Wî jî bela wan ji xwe vekir û

got: herin hêstirên hewe li wê newala he da ne. Her çar bi bez qesta newalê hemîya kir êk giha newalekê berê xwe dayê her (12) hêstir li wê newalê da diçêrin! Hêstirên xwe anîn û gazî hevalên xwe kir û hemî çûn li derê şikeftê gotin: Seyda heta em saxîn em qencîya te ji bîr nakin û destên xwe birin berûka xwe heşt zêr deranîn raberî melê kirin û gotin: Seyda bi Xudê ev e, hindik e, belê pa çi bikîn tiştek dî bi me ra nîne! Melê zêrên xwe wergirtin. Ew çûn û hêstirên xwe birin. Mela jî hat mal zêr raberî jina xwe Gulê kir. Gulê got: Ma min ne got te: Here bibe mela! de rabe here destek cilên mela ji xwe ra bikre û xwe taze lêkbide, bila xelk bizanin to mela yî! Melayê Gulê bî mela û bi nav û deng ket û berê xelkê ketê heçî tiştek ya wî ji berî deh sala winda bî qesta melê kir û wî çi gotibîya wesa derdiket! Carekê gustîlka jina paşê winda bî û dilê wê gelek ma pêve çunkî gustîlka wê hêja bî. Rabî xadima xwe rêkir mala melê ka gustîlka wê li kûdê ye? Melê jî hema got: Herin wê li kunê dayê! Xadim zivirî xatûnê pirsyar jê kir: Melê çi got? Xadimê got: Mele got wê li kunê daye! Xadim rabî bi wan kuna ket. Carekê ho berê xwe dayê wê bi kuna derpîyê wê ve asê biye! Bakir xadima xwe kezîkurê te şerma me bir pa bi Xudê melê dizanî bi kuna derpê min ve ye. Ji lewma hema got wê li kunê dayê. Wî jî şerm kirîye bêjit wê di kuna derpê wê daye. Rabî şîvek xweş beranek qelew ji qelya wî ra û sê çar zêr bo melê rêkirin. Nav û dengê melê êkcar belav bî. Carekê sê diz ketin xezîna paşê û vala kirin. Paşa melûl bî, çunkî çî malê heyî diza hemî bir. hindeka got: Paşa to çima mereqê dixuyî rêke dûv melê - meleyê Gulê - heke diz di binê behrê da bin wê derxit! Paşê rêkir dûv melê got: Seyda şevê dî diza xezna min vala kirîye, divêt to van diza dîyar bikî. Mela jî ma hizrên xwe kir...Got: Paşa sax bit, divê to muhletê bidî min heta sê şev dî. Paşê got bila û ev e, ji te ra sê qaz bo sê şîva. Qazên mela rêkirin mal piştî hingê mela jî çû. Got jina xwe: Divêt em piştî sê şev dî ji xwe ra birevin! Çunkî ez nizamim diz kî ne! Gulê got: gelek baş e, de ka rabe qazekê serjêbike da şîva xwe çêkin... Şîva xwe xwarin ji xwe ra rûniştin xwarê. Her sê diza yek û duwa xwe kirin

gotin êkê de ka rabe here li ber derê pencera melê ka çi dikit û çi dibêjit! Dizek hat li ber deriyê pencerç guhê xwe da li ser li melê... Berê xwe dayê melê got Gulê: Gulê got: Belê ez xadim. Melê got ev e êk mane du, mela li ba xwe behsa qaza dikit yanî va me êk xwar mane didu, belê yê diz lêva xwe gez girt û xwe ne girt ho bilez qesta hevalên xwe kir û gote wan : Da ji hewe ra bêjim, bi Xudê me her sêka nasdikit! belê hema me dîyar nakit, her du hevala bawer nekir. Şeva paşî melê qaza dî jî serjêkir û xwarin, du diz wê bîne zêrevan guhê xwe dane ser melê ka wê çi bêjit! berê xwe danê melê got: Gulê. Gulê got: Belê ez xadim. Got: Ev e du ma êk mane we ye? Gulê got: We ye, ez xadim. melê dîsa behsa qaza kir, belê her du diza li êk du nêrin, hema hêdîka zivirîn qunaxa xwe hevalê wa pirsyar kir: mela li mal bî? Her duka gotin: Erê bi Xudê li mal bî û dizanit ku em in. hema de rabin zêra bibîn mala wî belkî paşa jî me nebînit! Belê hevalê wan got: Maxan e, mela xêfzaneke heta bizanit ka em kî ne? Man şeva paşî. Her sê pêkve li ber pencera melê û zêrevanî li melê kirin, ka mela wê çi bikit û çi bêjit! Mele şîva xwe xwar û destê xwe şûşt. Bakir: Gulê! Gulê got: belê melê. Got ev e sê - hizra wî ew e bêjit : Ev e her sê qaz me xwarin rabe da xwe lêk bidîn birevin - belê diza xwe negirt, her sêka hev nêrin û gotin bi Xudê camêrî me nasdikit! Hema her sêka ji cih kurvekirin jûre xwe avêtin li ser destê û linga û bezîn lingê melê maç kirin: Seyda em ketûn li ser bextê Xudê û yê te. To me eşkera nekî! Melê got: Babo ma ne min ewil dizanî belê min digot bila ew bi xwe bên da riswa nebin. De rabin herin zêra bi dirostî bînin. Rabîn çûn zêr hemî anîn mala melê û çûn mala xwe. Roja paşî mela bi dilê xwe ji xew rabî, qasidê paşê ew du sê care hatî ber derê mala melê, belê bi xwe ra nedîtin gazî biknê. Melê rabî bi dilê xwe çû dîwanê, paşê û girgirên xwe jipêş ve rabîn, mela çû serê dîwanê rûnişt. Çavên teva ma lê ka dê kengê gotinkê bêjit. melê berê xwe da paşayî û xwe kenand û got: Ez welê hizir dikim hûn gelek tengav in? Paşayî got: Seyda bawerke ev her sê rojê bûrî li min bibîn sê sal, belê pa ez ji te berhîvî bîm to dîyar bikî! Vêca heke

Xudê hez bikit pa ne xêr e? melê got: Ji bilî xêrê tiştek dî nîne. Xulama rêke mala me da telîsên zêra bînin. gava melê we got, ji keyfa devê paşê ma beş. Xulam çûn zêr anîn. Paşê birek pencên zêra gurkirin ber melê: Seyda ev heq westihana te. Li bajêr da bî behsên melê tiştek dî ne. Çend mela xwe lêkdan çûn li ba paşê û gotinê: Ev çi fêlbaz e to hinde pesnê wî dikî? Me ev mirov heta niho navê wî sehnekirye û me ne bihîstîye li xwendingehêkê da xwendîye! Em qebûl nakin to hind birha xwe bidî ser vî nezanê fêlbaz. Paşê got : Ez hîvî dikim hûn behsa melayê min nekin, çunkî melayê min dizanit ka çî li erd û esman heye! Belê wan mela bela xwe ji paşê venekirin. Paşê got: Ma îro gul li van cihû wara peyda dibin? hemîyan gotin: Nexêr peydanabin. Paşê rabî çû alîyê malê gulek anî û xiste di bin lîva doşka xwe û got melakê: To rabe here bêje meleyê min bila bêt vêdê. heke zanî ev e gulê di bin doşeka min da hûn bizanin melayê min ne vala ye! Û heke nezanî ji xwe rast e mirovek fêlbaz e. Ez ê serê wî lê bidim. Melayek rabî çû gote meleyê Gulê: Were dîwanê paşa te dixwazit. Mela rabî qesta dîwanê kir. Hêj taze ne gihayî ber derê dîwanê, paşê got: Seyda ev çî ye di bin lêva doşeka min da? Mele berê xwe da dîwanê çend mela dîtî zanî ev e, wê hatine wî bicerbînin! Melayê Gulê serê xwe hejand û got: Ax Gulê, belê ji berî gotina xwe temam bikit, bêjit ax Gulê te çi anî serê min, te got min here bibe mela! Ji berî vê gotina xwe bêjit hema paşê dest avêt gulê ji bin lêva doşeka xwe deranî û got: Ma min ne got hewe melayê min dizanit, ka li erd û esmana çî heye? Nav û dengê melê hêj pêtir belav bî! Du sê melayên zana xwe lêkdan çûn li ba paşê da melayê wî bicerbînin, meleyê Gulê jî wê li dîwanê ye, êkê ji wan mela got: Paşa em hez dikin em û meleyê te behnekê ji xwe ra baxivin. Paşê got: Keremkin. Êkê ji wan tilya xwe bi nik melayê Gulê ve kir, hesabê melayê Gulê da ew e, dibêjit: Ez ê çavê te derxim hema melayê Gulê jî nemerdî nekir du tilyên xwe kirin cot û destê xwe bi nik wî meleyî ve dirêj kir, yanî ez ê her du çavên te derxim. Xweyê tilyê got: Bi Xudê rast e, mêrik mela ye! melayek dî destê xwe avêt yê dî

û destên xwe giruver kir, hesabê melayê Gulê da ew e, dibêjit nanek holê giruver, melayê Gulê jî nemerdî nekir, destekê xwe pencên wî vekirin li semta destên wî melayî girt. Meleyî got: Babo bi Xudê mêrik zana ye, bi dirostî ne hewce ye! Berê xwe dan paşê û gotin : Paşa Hevalê meleyê te zana gelek kêr in! Paşê got: Baş e, pa ne me çi ji hewe û civata hewe nezanî de ka ji me ra jî bêjin ka ew çi îşaret bî? Xweyê tilyê got: Min gote Xudê êke, ewî gote min ; pêxember qasdê wê ye. Melayê dî got: Min gotê dinya holê giruver e! Wî gote min roj holê li semta wê ye! Vêca rast dibêjit û camêrê mela ye. Bî çaxê nimêjê hemî wê li ser banê ûlya paşê ne û xwe dirost kirin bo nivêjê, belê teva gotin meleyê Gulê: Seyda keremke here li beraberiya me, xwelî serî hingî xwe vegirt û xwe da paş belê her dan li pêş, divênevê bî çû berahîyê! Belê nezanî ka wê çi bêjit, çunkî ne mela ye. Her hizrên xwe kirin: Li dilê xwe da got: Hema ya baş ewe ez xwe û paşê ji vê ûliyê da bavêjim, hema li xwe zivirî dest avêt bin çengê paşê û xwe bi paşê ve li wê uliyê bilind da avêt! Li ser lingên xwe sekinîn! Paşê kar kir da bêjit: Mele eve çi bî? belê hind dît ûliya wî helweşa ber li ser berî nema hingî êk li ser banî bîn tev mirin, hema paşa li ser çelepka xwe avêt lingê melayê Gulê "wey seyda te ez ji mirinê xelas kirim. Hingî malê min heyî li min û te bi nivî ." Mela zivirî malê, Gulê got: Mela malbab wêrano, te çawa zanî ûliya paşê wê bi herifit heta te xwe û paşa xelas kir? Mele got: Keça qenc wekî dibêjin:"Lê hat ji jêhatinê çêtir e!"

(502) Liva xwazî liva reş divêt!

(503) Leyistin li gayê pîr nayê.

(504) Li ser xwe û van riha ra.

(505) Lomên xelkê ji ezabê gorê nexweştir e.

(506) Li behna kebaba çû li ser daxdana kera

vebî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi hizrek mezin û xweşiyê qesta cihkê bikit, paşî derdikevit ne welê, belkî bi-bit nexweşî û pîsatî wê çaxî wê bê gotin: "Li bêhna kebaba çû bi ser daxdana kera ve bî!"

Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Me got emê herin li ber siha kîrê wî paşî ew hat li ber siha quzê me!" Eve jî dibêjin carekê malek qereç çûn gundekê da xwe bidin xweyî kirin, belê çawa gihan gund hej çadirka xwe nevedayîn axayê gund nevyê xwe rêkir mala qereçê got: Here bêje ka du sê hêka ji bapîrê min ra, kurik çû wekî papîrê wî gotê: Jinka qereç got: Ez bi qurban bi xwedê me hêk nînin. Kurik zivirî papîrê wî got: Here bêje ka hindêk birinc heke go "nîne" bêje: Biçek rûn, heke got "nîne": Ka lihek sabûn. Ji wêdê ne ye heta to tiştêkê ji wan çenekî! Kurik çû û daxwazên papîrê xwe kit kit xwestin. Her jinkê got: Nîne belê dûmahîkê hew debar kir got mêrê xwe: Rabe da barbikin; " me got em ê herin li ber siha kîrê axê paşî axa hat li ber siha quzê me!"

(507) Li xwîna babê xwe gerha qûna xwe jî li ser danî!

· Ev gotina he tê gotin gava êk li toleka xwe bigerhit, belê tola xwe ne vekit û zîyanek mezintir bi ser da bêt wê bêt gotin : Li xwîna babê xwe gerha qûna xwe jî li ser danî! Wekî vê gotinê ye ev malka şîrê ya nivîsvanî çaxê dibêjit:

*Me go emê bistînin deşt û çîya bi carek
Ala kurdî bihejînin paşê me zozan li der dan!*

(508) Li şûna şêra rûvî dikin gêre!

Ev gotina he tê gotin gava li malekê da yan li gundekî da zana û têpir û şehreza nemînin! Bçxêr û nekêrhatî û (xirpo)

bikevin li şûna wan wê bê gotin: Li şûna şêra rûvî dikin gêra! Her wê daxwazê didit ew gotina tê gotin: "Nêrê nemînin dibêjin gîska belo belo!"

(509) Li ber mirmê radikit, da li ber tayê ra biçit!

(510) Layiqê nîskê nanê ce ye.

(511) Li her sûkekê bazarek e.

(512) Li nalê jî didit û li bizmarê jî didit!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek durû bit û dilê kesê ji xwe nehêlit heçî li nik bit bidit dîyarkirin hevalê wî ye! Ewê welê wê jê ra bê gotin : Li nalê jî didit 1 li bizmarê jî didit!

(513) Lêva devê - hêştirê - kule nikarit bidit avê!

Ev gotina he tê gotin gava êk karekê li êkê hay bidit ew hindek hêcetên bê ser û ber nebî serve bigrit! Wê bê gotin: Eve ye lêva devê kule nikarit bidit avê! Wekî vê gotinê çaxê dibêjin; " mitirbo bistire, got tilya min kul e!"

(514) Lawkê qureyşî kes nîne pişt ne êşî belê xîret namûsê dikêşî.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe ji çakîyê û qencîyê bidit paş ji tirsên xwe da yan ji ber hindek daxwazên xwe, yan ji ber xusareta mala xwe, bê guman ew ê welê bit ew ne li rêza mirova ne wê jê ra bê gotin : "lawkê qureşî kes nîne pişt ne êşî xîret namûse dikêşî!"

(515) Li nav me da Bîlal sax e, ew jî dir bit

xwîn!

(516) Li xwe da dibînît û nasedqînît!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê rûvîyek hîbî kuna hirçekê hingî hirç derketbîya; rûvî wê çûbîya li ber derê kunê, wê gotibîya têjkên hirçê: Hînî mînî hûn ji serê kîrê minî... Ne carek û ne du car... Herû ev karê rûvî bî. Têjkên hirçê gotin maka xwe; "erê to nabêjî ev çî ye herû vê gotinê dibêjit me. Hirçê xwe li rûvî kire zêrevan, berê xwe dayê rûvî hat li ber derê kuna wê dîsa ew gotin got. Hirç lê derket: Rûvî eve to yî? Pa ne canê te bibit gîyayê biharê to ji destê min xilas nabî.... Rûvî bazda û rûvî rahêlayê rûvî bi filtê xwe bi kuna xwe ra gihand! Hirç çû ber derê kuna wî belê ne karî biçit jûrve! Tibabekê ma! Belê rûvî derneket hirç rabî miqewirek anî û çend maşên hingivî kirin têda û bi derê kuna rûvî ve kir. Pa ne ez ji vêrê naçim heta to dernekevî! Û rîya xwe girt û çû. Û bî bive biva mêşa rûvî welê hizir kir ku hirçê li ber derê kuna wî rawestayê. Rûvî her xwe girt... Bivêna mêşa ne birha! Dûmahîk tengav bî hew tebaba wî hat rabî bi tirs û hişyarî derket berê xwe dayê hirç ne li wêdê ye û ew biv biva ya mêşa ye ne ya hirçê ye. Rabî dîsa çû ber kuna hirçê û gottina xwe Got. Têjkên hirçê dîsa gotin dîya xwe! Li zivrandinê çavê hirçê pê ket: Hey serserî ev dîsa to hatî vêdê sozbit to vêcarê xelas nabî û kete pey rûvî. Rûvî bazda. Ne li vêdê li dera he çaxekê du darên nîzîkî êk rûvî li semtê hat, rûvî got: Fişt xwe li nav herdu dara da û derbas bî. Hirçê jî hema xwe li cihê rûvî ra kir. belê ser û her du ling man. Hirç ma asê, nekarî ne bêt û ne biçit! Rûvî hema lê zivirî û da li ber paşîya hirçê û ewa asê. Piştî xwe bi hirçê tena kir, gotê: "Di xwe da dibînît û nasediqînît!" Vêca bî pê gotin çî gava mirovek kêmetin û nexweşîya xwe li ser xwe qebûl nekit, wê jê ra bê gotin: "Di xwe da dibînît û nasediqînît!"

(517) Li navbeyna mêranî û qelsemêranîyê da

mûyek e.

(518) Lêv ji didana pêştir in.

Tamaşa bike li gotina (774) ê!

(519) Li cem bê ara her bihar e!

(520) Li qunca germ didit xeberdanên nerm.

(521) Li te xweş e, li min bîstûşeş e!

(522) Li te xweş tê û li min xweş tê ev çî ade li teştê!

Binyata vê gotinê dibêjin jinkekê hindek ar ji zelamekê xwest, mêrkî got: Heke to bihêlî ew mêr - behsa xwe kir - xwe bi te tena bikit, ez ê teji teştê ar bidim te. Jinik li ber hat, belê gotê." De ka arê min bêxe li teştê paşî karê xwe bike. Mêrik rabî hingî ar biçit teştê wî êxistê. Piştî hingê rahişt jinkê, nehên xwe kirin deh. Axayê Miksê wê êxistin hefsê û

tîq tîq û şep şepa herdu xulamane ji derê hefsê pêdatir! Mêrik gotê: Li te xweş tê? Jinkê got: Ma ji vê xweştir heye! Mêrik got: "Li te xweş tê û li min xweş tê ev çî are li teştê?"

Pa bi Xudê to yek pila ar nabî. Vêca ev bî pê gotin, çî gava êk sozekê bi êkê ra bidit heta daxwaza xwe bi cih bînit paşî lê bikit fêl û teşqe.

(523) Li zikê wî dida digot: Ay pišta min.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê êk rabî êkê û her darê xwe li zikê wî ra dikir. Yê dî her digot: Ay pišta min.

Xweyî darî got, "ez dara li zikê te ra dikim to dibêjî ay pišta mino... ev çî ye?" Got: Heke li pišta min hebîna te nedikarî darê xwe li zikê min bidî!"

(524) Lalîka - sênika - şikestî çêtir e ji ya xuw estî.

Bê guman ku parsekî karekê gelek kê m û bê xêrî ye, ji lewma hinde behsê wê bi xirabî û pîsî hatîye kirin li ser ezmanê pêxembera - selat û silavên Xudê li ser wan bit - û li ser ezmanê hemî zana û hozanvanên mileta ji gotina pêxemberê Xudê - selat û silavên Xudê li ser bit - ferman dikit. «ياتى السائل يوم القيامة وما على شقيقه مزعة لعم»

Yanî parsek wê li roja qîyametê bêt û piçek goşt li ser hî-narkên rûyê wî nîne! Çunkî mirovê parsek hemî dema çav li der û destê xelkê ye. Ka wê kengê êk qencîyekê vêra bikit! Bê guman e "çavê li derîya xwelî li serîya," wekî dibêjin her welê hatîye gotin: "Serê li ber mineta bila biçit zîyareta." Çunkî wek dibêjin "dixwin nan û avê min mineta kesê navê." Vêca bê guman ewê mirov bit xwe li ber mineta kesê nakit, dê debara xwe bi heyîna xwe bikit. Çêtir û zêdetir û her ji lewra hatîye gotin "lalîka şikestî çêtir e ji ya xwestî."

M

(525) Min hesab kir to hişyarî ez nivistim!

Binyata vê gotinê dibêjin li çaxê Xesro Şah da diz ketin mala pîrejinekê tiştekan jê ra nehiştin! Pîrê rabî berê xwe da mala xwe wa welê hatîye gotin:

(526) Ma ji mişka rû reş e.

Pîrê deling hilgirtin yekser qesta " sera Xesro kir û bêhin bizdayî gotê: Xesro to şah bî û diz bikevin mala min? Xesro got: Pîrê we dîyar e to ketibî xeweka giran heta diz hatin ketin mala te û tiştekan ji te ra nehiştin û to bê agahdar nebîyî? Pîrê got: Rast e ez pişt rast nivistim çunkî min hesab kir to hişyarî ez nivistim!"

Vêca ev bî pê gotin çî gava meznê gund yan meznê êlê xemsarî û tembelyê bikit heta kêmahî li nav êla wî da peyda bibit! Mirov wê kêmahîyê bêxit li ser sitowê wî, çunkî hişyarî li êlê behra wî ye.

(527) melevan û bask û milên xwe.

Temaşa bike li gotina (453) ê em ber fireh li ser axivtine.

(528) Melevane dixeniqit.

(529) Mirî ne mel`ûn bit gor lê teng nabit.

(530) Mirî bi xêr bit mirîşo bi xwe tê!

(531) Mih bîn kavirr kavirr jî bîn virr!

Ev gotina he tê gotin gava êk bo mirovekê gerim bikit û xweş bikit û nefelê bînit li çokê û teklîfên giran û mezin bikit û paşî hin hin ji sozên xwe bêt xwarê û kêmbikit heta yê dî bê hîvî bibit. Çaxê pirsyar jê bêt kirin: Sozên filan kesê bîn çî? Wê bêjit: "Mih bîn kavirr û kavirr jî bîn virr!"

(532) meymûn li çavê dîya xwe da xifş e!

(533) Mar bê jehrî nîn e.

(534) Mirtibo bistire got: Tilya min kul e.

Li gotina (513) ê temaşa bike!

(535) Mar nabit yar!

(536) Mar gestî ji werîsî ditirsit!

(537) Malka mefûna ji ber a zordara wêran dibit.

Ev gotina he tê gotin çaxê êk xwe hîn û mîn bikit li karê xwe da û xwe sist û xav bikit, wê jê ra bê gotin : "Xal benî xwe bişîdîne, malka mefûna ji ber a zordara wêran dibit!"

(538) Mîro heliz firî!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mîrê Botan êk girte zindanê li kanûna du wê girt, got: Mîrê min ez hîvî dikim min berde terşê min ma bê alaf! Mîr got: Malwêran ev ji nû kanûna du wê ye! Dinya berf e. Got: Mîrê min karê min li sala min lêkve kirîye, eger ez li kanûnê ne yêm berdan, wê karê wê biçit bo sibatê û karê sibatê bo adarê, holê heta bibit çaxê heliz dirûnê ez ê bi karek dive bim û helza min wê bifrit û pûç bibit û terşê min wê bimînit bê alav! Belê mîr

guhê xwe nedayê heta sê meha ma li zîndanê da, piştî hingê mîrî got: Kuro ma to nabêjî ka min berde? Got: "Mîro heliz firî" biha hêdî ji berdana min ra nîne.

(539) Me bûk anî bi lez û bez, me lêda rez û bez,
sivka malê her bîm ez.

(540) Me bûk anî ji Êşkilê, me got: Libê, dema
hat rît mezelê.

(541) Makerê mizgînî li te, te cemşek bî! Got:
Barê min her li min e.

(542) Mêvano to têrî yan to birçîyî!

(543) Mêra mêr dikuştin Cibo ûr dişûştin.

Temaşa bike li gotina (120) ê.

(544) Min got fis e bî gû.

Ev gotina he tê gotin gava êk xemsarî û bê pûte kirinê bikit heta hind pê agehdar bibit xirabî û kêmahî ya hindik û piçek. Gelek û mezin bibit li nav lepa da wek wî yê hizir bikit fis e li derê paşiya wî sekinî hind ageh ji xwe bibit derpê xwe pîs bikit.

(546) Manî hemdan me çêl û gul li der dan,
mane em û ev xeberdan!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek tiştekan li desta da

nemînit ji bilî axivtinê.

(547) Mirîşkê to kedî kûvîyî, got: Ez hevala xwe bi serê bistikê ve dibînim!

Ev gotina he tê gotin li çaxê mirovek xwe ji cihekê vedit û biparêzit û hişyarîyê li xwe bikit! Çunkî dibînit desteka wî hemî li nexweşîyê û tengavîyê danîn. Vêca jê bêt pirskirin çima to xwe vedidî? Pane halê hevalê min gelek xweş e! Ez jî wekî pisyar ji mirîşkê hat kirin " mirîşkê to kadî kûvîyî?" Got: " Ez hevala xwe bi serê bistikê ve dibînim!"

(548) Mîlek serê sed newala dibirit!

Ev gotina he tê gotin gava li civatekê axivtin li ser tiştêkî hêja bêt kirin û her êk hizra xwe û ya dilê xwe bidit dîyarkirin û êk li dûv êkê neçit, jê ji hewîya xurtir bêjit: Wê ho bit, kes ne karbit ji gotina wî derkevit wê bê gotin: "Mîlek serê sed newala dibirit!"

(549) Mal li Hemka Banehî li Çemka!

(550) Mertalê wî rûyê wî ye.

(551) Mastê se bileqînin her ji sa ra baş e.

Ev gotina he tê gotin li demê mirovek pîs xwe tevil tiştêkî bikit û wî tiştî wek xwe pîs bikit - nexasim di biwara jînê da çaxê têt revandin - dê bê gotin: "Mastê se bileqînin her ji sa ra baş e.

(552) Me çi got û tembûra çi got!

Temaşa bike li gotina (214) ê.

(553) Ma heta sitrowê - şaxê - ker neyên her
cehşek e.

Ev gotina he tê gotin gava êk ne başî û kêmahîyê bikit bi
heceta zarokîyê û xeşimîyê ew bi xwe ne zarok û nezan e!
Wê bê gotin: "Ma heta sitrowê kerê neyên her ceşîk e!"

(554) Mala Şêref bi xwe hindik bîn! Ew jî hin
kuro hin şilo hin seqet bîn!

(555) Me şem kirne mane şembelûlk!

Temaşa bike li gotina (299) ê.

(556) Mêvan ji berî rûnit mîr e, gava rûnişt êsîr
e. demê rabî begzade ye!

Yanî mêvan ji berî biçit malekê mîrê bi dilê xwe ye biçit
kîj malê. Heke çû malekê dîlê - êsîrê - malxwê malê ye!
Gava rabî, an wê pesindarê malê bit : Malê to avabî û xane-
dan bî, te rû spî bit malxwê malê mirov dizanit ji binemala
ye û dergehê wan her vekirîye ji mêvanan ra û an jî wê bêjit
êk (1) binekamî malê to setemî û li ser mala belav bibî te rû
ne spî bit malxwê malê ji bav û kalên xwe da û kunujin,
garis ji destê wan dernakevit û narjêt. Gava çacê wan bi
mêvana dikevt mêvan li ber wan dibit; "melkemut" wê bilez
gotin jin û zarowên xwe rabin bimîzin bi agrî ve.

(557) Marî ji pîjanê nexweş bî, li ber derê kuna
wî şîn bî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovekê ji tiştê yan jî miro-
vekê nexweş bit û ew tişt yan ew mirov pêve binûsit û

bimînit û jê ve nebit wê bê gotin : Marî ji pîjanê nexweş bî li ber derê kuna wî şîn bî.

(558) Mitirbê zir e ne li devîyê ye û ne li zîmê ye.

Temaşa bike li gotina (721) ê!

(559) Mominê were to ye şîmî!

(560) Malxwê malê bî pelo û xwarna eyal bî sor çilo.

Temaşa bike li gotina (253) ê!

(A) Mitrib û cot û lakot

Ev gotina he tê gotin gava êk xwe li karekê bidit bizanîn û ew kar ne karê wî bit wê bê gotin: Mitirb û cot..... û lakot. Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin; "hirç û govend, rûvî û seyran te û van kara."

(561) Mêvanî ji mêvanî nexweş e, malxwê malê ji her duka nexweş e!

(562) Mih û pêyê xwe û bizin û pêyê xwe her êk mêvanê emelê xwe.

Binyata vê gotinê dibêjin mirovek ji Xudê tirs birayê êk zordar bî. Vêca hemî gava ji ber

gunehekê birayê xwe dil bi tirs bî û çî cara ne dikenî û kêfxweş ne dibî! Ditirsa ku ew jî ji gunehê birayê xwe bi agirê dojhê bişewitit. Rojekê çû dikana goştfroşa berê xwe dayê her pezek wa hatî hilawîstin bi pê xwe hizrên xwe kirin û got Xudê mirov jî hone êk wê bi gunehê xwe bişewitit. Kenî.. Belê kenî! Êk çû got birayê wî: Mizgînîya

min li te birayê te îro kenî! Rêkir li dûv anî, pirsyar jê kir: Çawa to kenî? Pa ne hingî min to dîtî to digiryayî! Got: Bira ez ditirsam gunehên te li ser min bar bibin belê îro min dît li ba koştfroş her pezek hatî hilawîstin bi pê xwe, min zanî Xudê jî - pak û paqij bit - wê her mirovekê bi gunehê wî biêşînit çunkî wekî dibêjin : " Kes naçit di gora kesê."

(563) Mela gû tê işa zo tê!

Yanî mirovên karbidest kengî bixwazit wê bêjit eve çaxê wî kariye?

(564) Mihtacê elbê li elbê digerhit.

Yanî ewê pêtivî karekê bit, ew neçare li dûv wî karî bigerhit.

(565) Ma ga dikit û ga dixût!

(566) Mirîşk hêka dikit û birih bi dîk dikevit!

Ev gotina he tê gotin gava êk karekê bikit û pêve bifelişit êk li dera han ew xwe tengav bikit, dê bê gotin: Mirîşk hêka dikit û birih bi dîk dikevit!

(567) Malê nexwarî behra zordaran e.

(568) Malxwêtî ket di destê kurî kîskê salê sê car birî.

Temaş bike li gotina (6 û 7) ê.

(569) Malxwêtî ket di dest jinê da kehrik birî û

berxik hîşt li bin livayê da!

Temaşe bike li gotina (224) ê.

(570) Malê bi tirê bit, wê bi fisê biçit!

(571) Metê du gun pêva hebîna wê bigotanê
mamo!

Ev gotina he tê gotin gava êk karê xwe bavijit li ser hêceta: Heker ho bîya ho nedibî! Û heker ho bîya holê çenedibî! Wê ji ra bê gotin: Heke metê du gun pêva hebîna wê bigotanê mamo!

(572) Mirov hingî mûyekê ji beraz hilînit xêr e.

(573) Mela her gotîye (elîf û bê)

(574) Miqewrê - kulindê avê - demevekirîye
hingî avê pêda bikî bi nav nakevit!

Temaşa bike li gotina (466) ê.

(575) Mişkê kor hingê axê bikolit bi serê xwe da dikit.

(576) Mirovê poşman ji nîva rê jî bizivrît ne xir ab e.

(577) Mirîşkê çav li betê kir bostekê qûna wê
kişa.

Ev gotina he tê gotinin gava êk çav li êkê ji xwe mezintir bikit û pêngavek ji xwe bilintir bavêjit û nebit serî û îzayek giran lê bikevit, wê bê gotin: "Mirîşkê çav li betê kir bos-tekê qûna wê kişa."

(578) Malê neke ne ji ji kurê qenc ra û ne jî kurê xirab ra.

(579) Me ev pez serjêkirîye bo wê mêlakê.

(580) Mir kerê qazî xelk çûn tazî. Qazî bi xwe mir kesê pirsyar nekir!

(581) Merdê ji kîs malê xelîfe ye.

Ev gotina he tê gotin gava êk çakîyê û qencîyê bikit, belê ne ji malê xwe û zehmetê xwe. Belkî ji malê xelkê wê bê gotin; "merdê ji kîs malê xelîfe ye."

(582) Ma ez her nanê xwe bixwim û şîreta li te bikim.

(583) Mêrûyê ecel tê çeng û perretê.

Temaşa bike li gotina (244) ê.

(584) Mer`eka bê lixab serê xweyê xwe lê didit.

(585) Mirov bi xurtî distînit, bi xurtî nadit.

(586) Mehwerê mehîrê - dewînê - ji nav bike

derê evê dî heçî bê erê.

Ev gotina he tê gotin gava êk karekî bi êkê hay bidad, û wî ew kar pê çênebit ewê dî tim gazinda jê bikit.: Te ji min ra çi nekir? Ka bo min karekî bike, û her bahsa karê ewil dikit wê lê vegêrit: "Mehwerê mehîrê ji nav bike derê evê dî heçî bê erê." Nêzikî vê gotinê ye dibêjin salek giranî bi ser milet da hat, kurkek û xwişka xwe bîn, hingî xwarnek bi kurkî ket da xwişka xwe. Duway kurkî xwe li ser lingan negirt. Û ket, xwişk çû li ber serî wî sekinî û gotê: "Hemedko lawo malbab wêrano de ka çavê xwe veke, xwarinkê bixwe. Kurkî çavê xwe vekir û got: Çi heye? Xwişkê got: berûyek qeşartî, êk kelandî, êk qelandî, de bi Xudê tu bimirî, tu ne ji nêza - birsa - dimrî! Kurkî got: Keziya te kurt bit, de ka ji berûyê derkeve wek dî heçî tu bînê bîne!

(587) Masî li golan da nabin hût.

(588) Mêro bi xwe kêro.

(589) Mêr heft sala çû seferê zivirî her kerê berê.

Temaşa bike li gotina (149) ê. Em tibabekê li vî babetî axivtine.

(590) Mitirb birçî - birsî - dibin bîra wan dawet tên.

(591) Mehîna çînê min xezal e dev li çîrêye û guh li hawarê ye!

(592) Mîr dimrit evdal dijît.

- (593) mezin bibit ker, gerek mirov nedit ser!
- (594) Mirov bimrit û deyîn namirit.
- (595) Mirovek hîz bit jî gerek ne bi dîya xwe û xuha ra!
- (596) Mal têr e, kevanî Şêr e.
- (597) Mêrkê kurmanc gava têr xwar wê mêrkê bikujit yan jinkê birevînit!
- (598) Mîro borî!

Binyata vê gotinê dibêjin paşayê Behdîna nivistîbî û nobedarê wî hişyarî lê dikir. Berê xwe dayê dûpişkek ji kunê derket û qesta mîr kir wî got: Heke ez şekalekê tê werkim mîrê hişyar bibit hema baştir ewe ez serê xencera xwe li dûpişkê bidim û bavêjim. Belê çawa dest avêt xencerê ji kalên kêşa, bi zîqêna xencerê mîr çavê xwe vekir û dûpişk çû di kuna xwe da! Mîr got: Kuro ew tê çî bikî? Got: Mîro borî! Yanî dûpişk borî çû di kunê da, ez çend bêjim dilê te xiş xiş ket.

Vêca ev pê gotin çî gava karek ji destê êkê derkevit kes pê nezaniyê û welê hizir bikin ji bê xêrîya wî ye yan ne ji dil paqijîya wî ye! Ewê bêjit; "mîro borî!"

- (599) Mast sed cara mast.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek li ber sê kesa ra borî silav kire wan û çû her sê mane pêkve her êkê got silav kirîye min. Her sê ka gazî kîrnê "herê zêlam te silav kire

kê?" Ew li xwe zivirî her wekî tiştek ji wan zanî; got: Heçî pêtir ji jina xwe bitirsit min silav kirîye wî! Yê ewil got: Baş e, pa guh bigre li ser pêhatîya min û jina min. Hingî ez bîm min çend pezek hebîn û birek mirîşka, xelkê digot: Hêkrûn gelek xweş e, belê min ne dizanî ka tawa wê çama ne? Çunkî jina min ne dihişt ez bixûm, rojekê jina min çû bi gundî ve, kirmê serê min liv livî! Min got: Çima ez ranabim hêkrûnekê çênakim û naxwûm, hêj jina min nehatî. Ez rabîm tepek rûn min ji hîz deranî û ez çûm kadînê çar hêk jî min anî û min tawik - exlewîk - anî û min kar kir da ez agrî xweş bikim min hind dît dengê jina min li derê malê hat! Ya ji min hatî min rûnê xwe kir li pizya - paxila - xwe û hêkên xwe min kirne li komê - kulavê - xwe û danî li ser serê xwe. Jina min hat jorva "to çi dikiî?" Min got: Êinne ez li ber malê me! Çû berê xwe da hevîrê xwe, got: Wê tirş biye here agirî xweşke da nanî bipêjim. Ez rûniştim li ber tîfkê - kuçkê - û min agir xweş kir. Wê nan beht, hind pê agahdar bî lehîya rûn da bin teştaya wê, hizir kir û jorda li nava serê min da : hey nema ev ne te mîzt bi xwe ve? Belê gava destê wê li serê min ket her çar hêk şikestin û pêlên hêkê bi serê min da hatin! Got: Kuro ev çi ye? Ez rabîm revîm û ji hingê were min ne wêraye ez herim mal.

Yê duyem got: De ka guh bide min. Min ji xelkê dibihîst digotin kutilkên qelîyê xweş in. Ji min ra bî daxwaz ez carekê tam bikim. Belê pa jina min nedihişt ez bixwûm û min jê nediwêra. Wê bi xwe her gav ji xwe ra kutilkên qelîyê çêdikirin û ji min ra jî yên arxafkê çêdikirin! Rojekê jina min çû ser avê ez li kolanê bîm, min ji xwe ra got: Pa bi Xudê ez ê rabîm biçim hindek kutilkên wê bixwûm! Ez bi lez rabîm çûm mal û rûniştim li ser legena kutilka û min avêtin devê xwe û cara dumahîkê min sê kirin li devê xwe da! Êk li vî rexî êk li rexê dî û êk li navbeyna her duka da û ez rabîm da derkevîm. Belê hêj min devê xwe lêknadayî, min hind dît jina min ji wêva hat jorva! Ya li destê min da mayî hema min devê xwe miçand û her sê kutilk li devê da... Lama min pif bî! Berê xwe dayê got : Kuro te çi ye? Pa ne ez newêrim devê xwe vekim... Min got: Immm... Hat

destê xwe da lama min hişk e wek berî ye. "Kuro kengî ho li devê te hatîye?" Her min got: Immm... Bi destê min girt û ez birme li ba hekîmê gund. Hekîm got: Te çî ye? Her min got: Immm.... Destê xwe da lama min ji berê hişkîr e! Hekîm got : Baş e, ez çî jê bikim xuşka min? Jina min got: Ez xadim pê neşterê derbike. hekîm çû neşterek bînit û destê min di destê jina min da, ez nikarim birevim û ne dest hîlanîn ji min têt! Hekîm neştera xwe anî û li lama min da, gava neşter gîha lama min qetên kutilka li gel piçên qelîyê hatin xarê! Min destê xwe ji destê jina xwe anî der û min bazda heta ez li vêdê ra derketim. Û heke hûn bawer nekin şona neşterê ye hêj saxnebîye.

Yê sisîya got: Babo ez bi xwe ne wekî hewe bê zirav im! Hingî ez bîm min kerîk pez hebî; kul û meraq û keser û kedera li ser dilê min ew bî ez firek mast bixwûm! Vê keça neçî kesa nedihîşt ez nanekê bi firek mast bixwûm! Min ji xwe ra got: Niha to bi Xudê jiyana min bo çî ye? Ev jîna jêr destî û serşorî û çav behnî! De qedav û sêsed bela li vê jîna holê bikevit. "Bila mirov dîkê rojekê bit ne mirîşka sê sala bit." Bi Xudê ji koletîyê nexweştir û pîstir nîne. Her wekî hatîye gotin : " Tîfî li jîna di bin desta: Meger Qaron û Hamam bit."

Min bes e ji vê jînê û ji vê koletîyê. Were pezê min û mala min û ez bi tengavî û ne xweş; jarî û jûrî, bi sîrr û serma xweyî bikim û ez jê bê behir bim! Peşkek mast li min heş û hezret bit, Wek xwîna Sîyahoç lê bêt! Yanî jîna min bo çî ye? Bila kutîyê wek min bimrin hêj caw erzan! Mirdalên wekî min jî xwe hisab dikin zelum! Ev jîna holê bindestî bi hezar cara ji mirnê nexweştir e. Her wekî kurê Xanê Dimdim gotî babê xwe: "Da biçînê, Da biêînê : Misrîya şil bikin ji xwîne: Mirin xweştir e ji vê jînê." Eva hizra li min da û hêrsên min rabîn! Kerba min vebî, ez rabîm serxwe, seharê zû min kalik û gorên xwe kirin lingê xwe û min xwe kok lêkda û pêk anî! Jina min berê xwe da min û got, "ew tê çî bikî?" Min ne xwest ez ya dilê xwe bi êk carê derînim, çunkî ne rast e mirov wek kela nîskê bit zû bifûrit û zû danit. Divîya mirov xwe girbit, wekî dibêjin: " Yan bike û ne-

lerize, eger bilerizî neke. Ez ê dîsa bi tenahî li gel baxivim ka xweya çî ye?

Jina min dîsa wekî her roj çû tûk ji ser mastî rakir danî li ser nanekê û xwar û bi kevçika ket wî mastê serve firkir. Çû meşka xwe anî gurru û mastê xwe berda têda û meşka xwe da li ber keya û keyand. Min jî hêdîka li bin lêva xwe da got: Ka firek mast... Dengê min sehkir belê bi dengê bilind û bi cers got: Çû? Min got: Çi ne min deng nekiriye! Ez bêhnek dî mam, min dîsa got: Firek mast... Berê xwe da min bi çavekê sor û bi awirek dijwar û bi dengê cers û bilind û serê xwe li min hejand û got: Ew niho to çî dibêjî gin gina te ye? Min jê ra son xwar û got: Pêjin ji ne hatîye û min deng nekiriye, malbab wêran, ba li ber guhê te ketîye vê seharê. Ez mam min hizrên xwe kirin, min ji xwe ra got: De rabe bes e evê kêr gihand hestî ma ne bes e! Mêranî ji kij rojê ra ye! Ez hêdîka rabîm ser xwe, min kopalê xwe kir zendê xwe lingegê xwe avêt ji derve û êk ma di jorva! Ez lê zivirîm min berê xwe dayê û min got: Da ji te ra bêjim. - Ew sekinî ka ez ê çî bêjim? - Min bi dengê bilind got: Mast û sed cara mast û bi Xudê her du carên dî jî min gotibî : Mast. De here vêca bila ji te ra bit û min nevêt û guyê sey bila li ser vê mala ez jê bê behirbim. Ev jîna bi koletî min ne hevêt û min bazda û ez li vêderê derketim.

vêca ev bî pê gotin gava mirovek ya dilê xwe derxit piştî gelek li dila bimînit û nekaribit bidit der û eşkera bikit û li bera bi mirî pûte pê nekit ew deq û deq gotina xwe bêjit. Vêca hingê wê bêjit: "Mast û sed cara mast!"

N

(600) nankê bide nanpêja bila nanek zêde bit.

Yanî bila karkerê te zana bit bila to heqek zêde lê bidî, ne mirovek nezan bit hemîyê pîç bikit!

(601) Ne li newalê kûr binve û ne xewnê xirab bibîne!

(602) Nikarit kerê dikarit kurtanê!

Ev gotina he tê gotin li çaxê êk zordarîyê li êkê bikit û ew ne karibit tola xwe li wî vekit, vêca rabit biçit bi nav guhê belengazekê da bêt wê bê gotin: "Nikarit kerê dikarit kurtanê!"

(603) Ne xwarî bi simbêla ve mayî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovekê ageh ji tişteke nebit, bela û nexweşî bi serda bîn bi gunehê hindêk dî wê bê gotin: "Ne xwarî bi simbêla ve mayî!" Wekî vê gotinê ye dibêjin carekê du keş pêkve çûn aşî. Bi roj dor ne giha wan. Bi şev mane li aşî. Êkê ji her duka guhê xwe dayê aşvan dibêjit jina xwe: Îşev xwe ji min ra pêkbîne. Ez îşev mêvanê te me. Ew jî piştê xwe diditê heta dibit derengî şev aşvan û hevalê wî dinivin. Ew diçit qesta jiukê dikit. Xwe pê tena dikit û dizivirit xwe dirêj dikit. Aşvan hişyar dibit qesta jin-ka xwe dikit. Radhêltê jinik pê dikenit: Ma to têr nebî? Aşvan lêva xwe gez dikit û dibêjit: Ne, zû dizivirit qesta her duka dikit. Her du dirêj kirîne! Aşvan çû destê xwe danî li

ser dilê êkê, zanî nivistîye çû yê dî destê xwe danî li ser dilê wî berê xwe dayê rep repa dilê wî ye. Hema dest avêt kita pêlava xwe danî li ser singê wî û çû da darekê ji xwe ra bînit. Xweyê dil hema dest avêt pêlavê danî li ser singê hevalê xwe û xwe kerr kir! Aşvan hat darê wî li desta da ye! Destê xwe peland xweyê pêlavê - ewê ageh ji tiştêkê nebî - ew dar jorda li nav guhê wî da : Kerê min di jina bab û kalên te gaw! Mêrik ji cih hilbeliqî: Kuro te çî ye teres babo? Belê aşvanî muhlet ne dayê tepe û rep hevalê wî xwe hişyar kir. "kuro hewe xêr e?" Aşvanî got: Ez dizanim û ew dizanit! Teres lawê teresa tep û rep... Wî çû xwe êxist li navbeyna navcîti kir jêkve kirin. Piştî her du çûn yê qutan lêketî, her wê ji xwe ra dibêjît: "Ez nizamim vî sebebê aşvanî çî bû? Hevalî wî kenî û got: Ez jî nizamim û got : Xudê to pîçî rast bêje ka ev çî bî? Got: Çîrok eve bî û çîrok hemî jê ra got. Wî lê vegêra û got: Eve ye dibêjin: "Ne xwarî bi simbêla ve mayî!" Bî Xudê hema dirust e wekî dibêjin: "Gan li gewro û curim li Îshaq."

(604) Nezanê ne guhdar derdê wî ye derdek bê derman!

(605) Nezanî binêre cîranî!

Ev gotina he tê gotin demê mirovek li karê xwe da bişexitit û bi ser êkve neyêt, wê jê ra bête gotin: "Law nezani binêre cîranî." Vêca bivê-nevê ye li ser her kesê ji berî dest bavêjît karê xwe pirsyar kerbit da karê wî li nav lepa da ne şextit.

(606) Nîv mela dîn winda kir, nîv hekîma can winda kir.

(607) Nanê êkê bi avê da çû, got: Bila xêra babê min bit.

Temaşa bike li gotina (A piştî gotina 808) ê.

(608) Nalbenda kihêl nal dikirin, kêvjalê got: Eve lingê min jî!

Ev gotina he tê gotin çaxê li koç û civata da behs û gotina kiryarên giranbiha bêne kirin êk pependê tiştek kêk û ne berketî bînit li nav behs û gotina da! Wê bê gotin: "Nalbenda kihêl nal dikir, kêvjalê got: Eve lingê min jî!"

(609) Nan bi xuwê xuwê bi mene!

Temaşa bike li gotina (720) ê!

(610) Ne hoye lê bila ho bit!

(611) Nîşanê baranê bane û nîşanê mirinê tane.

(613) Nîşanê mirinê bi xwe ve rîtine!

(614) Nerimkê li bin kayê daye!

Temaşa bike li gotina (717) ê!

(615) Neyîn ji berî hiştir e

(616) Nanê Îsa dixût selawata li ser Mosa didit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek çakî û qencîyê bi êkê ra bikit ew rabit pesnê êk dî bikit! Wê jê ra bê gotin: "Nanê Îsa dixût û selaweta li ser Mosa didit!"

(617) Nanê Romîya li ser çukê ye.

(618) Ne bêje xweş şitte, bêje xweş xweyî ye.

(619) Ne nêre rengê tutinê û ne nêre rengê zela
ma!

(620) Nezanî rehetîya canî.

(621) Ne feqîr bi tîr ne ked xudayî bi hîr.

(622) Ne kerê min e û ne gayê te ye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek pesnê mirovekê xwe yan tiştekê xwe bikit û yê hevalê xwe bişkînit û her du cûn ji êkudu kembaxtir bin wê jê ra bê gotin: Bi serê te "ne kerê min e û ne gayê te ye!"

(623) neha nedî deha naxûy.

(624) Nêrî bi sekwata ji tehta nakevin.

(625) Nêrî nemînin dibêjin gîska belo belo...

Temaşa bike li gotina (508) ê!

(626) Ne şeytanî bibîne û ne lenetê lê bîbarîne.

Yanî ew wechê te nevê bit, yan ew mirovê te ne nevêt, gesta wî cihî neke heta to pê tengav bibî.

(627) Nekero dil kesero.

(628) Nanê nekera nîne.

Li gotina (305,306,307,308) ê binêre. Em tibabekê li vê babetî axivtine.

(629) Nanê genim li Feqîra nayê.

(630) Nemîne li hêviya firwê gayê.

(631) Nikarit êkê dibêjit du werin min!

(632) Ne li wê hêkê û ne li wê qedqidê!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek qope qencîyekê bikit û xwe bi wê qencyê gelek difre - kibar - bikit û pesnê xwe pê bidit û hêdî nevebirit! Wê bê gotin: Wey babo "ne li wê hêkê û ne li wê qidqidê!"

(633) Navek giran û gundek wêran!

(634) Ne bîst bişewitê û kebab.

(635) Neçî wî erdê te kesê xwe lê nebit.

(636) Nav pale ye û das lê şikestî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe li karekê bidit bê pergâl, wê jê ra bê gotin: "Nav pale ye û das lê şikestî!"

(637) Ne kif kifa nefsî û ne çip çipa dolabê.

(638) Nû hatin kevin çûn.

(639) Ne`let li wî tiştî ewa ne bi ser xweyê xwe
ve bit.

(640) Ne feqîrê bi tîrr, ne zengînê diz, ne maqûlê
derewîn.

(641) Nanê cehî dixût, tirên pûlayî dikit!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li halê xwe da gelek
kêmbit, pêngavên ne bi ser xwe ve û ji xwe mezintir bavêjit,
wê bê gotin: "Nanê cehî dixût, tirên pûlayî dikit!"

(642) Ne dostê file û ne hespê qule.

(643) Ne ker li garanê û ne pirsyar li gavanê!

(644) Ne bi golkînî têt gîya xwar û ne bi gayînî
têt kizin xwar!

(645) Ne ji man`a bîya rûvî wê li sûka gerh
abîya!

(646) Ne bera gêrke û ne berana xêrke!

Ev gotina he tê gotin gava êk bi destê xwe, xwe bavêjit
cihê tivsê û bela û nexweşîya, piştî hingê bibit lav lav û dax-
waz û keser ku ji bela qurtal bibit û bêt der wê jê ra bê go-
tin: "Ne bera gêrke û ne berana xêrke!"

(647) Nebêje Ereba merheba, heyne wê birrîn li ser kurk û eba!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek rû zêde bidit êkê bê tûte, vêca ew ji ser xwe biçit hêdî pûte bi wî nekit! Wê bê gotin: "Nebêje Ereba merheba, heyne wê birrîn li ser kurk û eba!"

(648) Ne pîrê qenc kir bi agirê ve mîzt û ne agirî qenc kir pîr sot.

Ev gotina he tê gotin, gava du mirov li gel êk û du ne başîya bikin, ne ji rengê wan bit ew nebaşî, wê bê gotin: "Ne pîrê qenc kir bi agirî ve mîzt û ne agirî qenc kir pîr sot."

P

(649) Pîr bike û jibîr neke.

Yanî ahên xwe bila to kevin bikî, belê to jibîr nekî, çunkî eger hemî gava ahên te li bîra te bin, heye ku carekê firset ji te ra hilkevit; hema to lê nabûrî wek nêçîrvanê tifenga wî fişek têda bit û li ber nêçîra xwe venandinî bit.

(650) Piştî tirê nûka kezî kurê!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xemsariyê û bê pûtekirinê li karê xwe da bikit heta belayek mezin, şermkariyek bête serî, ji nûla xemxwer bikit dilbêş bikit wê bê gotin; "piştî tirê nûka kezî kurê!" Wekî vê gotinê ye, çaxê dibêjin:

(651) Piştî tirê qûnmiçandin pê nevêt.

Belkî divîya qûnmiçandin hebit ji berî tirkirinê çunkî wekî dibêjin :

(652) Piştî baranê kerê cil neke!

Çunkî heke baran hat û ker şil bî û qerisî, qeselî bî, bî yê mirinê cilkirin bê pare ye. Vêca divîya mirov ageh ji xwe hebit hêj şermezarî û tengavî nehatin li pêşîya mirovî, mirov pêkhatina xwe bikit. Çunkî piştî nexweşî hat, rê û rêbar li mirov hatin girtin, dinya li mirovî bî kuna gurî ji nûka wê çî bikit, wekî pîra subatê çaxê dibêjin:

(653) Pîra subatê wê ji nû biçit liqatê!

Binyata vê gotinê jî pîrejinek bê kes û kar bî li çaxê havînê, pîrê li bin sîberê dera li ser avên sar û tezî serêlî digotin, heta lê bî zivistan û çille û kanûn bi ser da hatin û pîrê ma xirînî li mal da. Nan bi dest neket û çav lê tarî bîn ji nêza pîrê berê xwe dayê cotyarekê dewarên xwe berdan da biçit cotê xwe girê bidit li ser pirêza xwe. Pîrê jî ket li dûv çû li nav pirazê gerha! Cotyarî gotê: Pîrê ew to li çi digerhî? Pîrê got: Pîrê qurban pîra te hatîye ji xwe ra liqatê. Cotyarî got: "Pîra subatê wê ji nû biçit liqatê:" Tirekê hingî dinya havîn bî çaxê liqatê bî te serêlî li ser avên sar digotin bî zivistan tê ji nû biçî liqatê! Wekî dibêjin: "Çaxê maza pivo raza:"

(654) Pîra Şamê tibayî amê.

Ev gotina hê tê gotin gava mirovek xwe ji kes û karên xwe bikit û li ser xwe biçit û hevalîya wan bihêlit wê jê ra bê gotin: "Pîra Şamê tibayî amê."

(655) Pîrê tîrr kirîye û pîr ne razî ye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xirabîyekê bikit, yan bi qebahetekê rabit û ew xwe ne razî bikit, wê jê ra bê gotin: "Pîrê tîrr kirîye û pîr ne razî ye."

(656) Pelendarê feqîra li binê guh e.

Ev gotina he jî wek wê gotina ku tê gotin: "Feqîr li şovê çû dar tutin li qûnê çû!"

(657) Pûla ji pûla nagirit.

(658) Pale pûş e.

Yan jî çaxê dibêjin: "Asin qutê bê heqe."

(659) Piştî mirnê çav kulî nîne.

Ev gotina he tê gotin gava ku belayek mezin bi ser êkê da bêt hindek dî wî bitirsîn ji baleyek kêmtir û nebereketî wê bê gotin: Piştî mirnê çav kulî nîne." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjit: "Ji bangerî mezintir bi ser çûkê da nayê." Çunkî wekî dibêjin: "Heke avê da bi ser mirovî ra bostek û çar tilî ferq nîne."

(660) Pare para dikin xweş mêr geza li bera di din.

(661) Pare hebin helaw mişe ye.

(662) Parîyek xweş hêja ye gayek reş.

Bê guman e, ku xweşî xweş e çend kê m û hindik bit û nexweşê nexweş e heskê bila behra mirov temet gayek reş bit. Yek parî li xweşîyê hêja ye gayek li reşîyê.

(663) Paşî to bo min sera bi simota vedikî!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek rahêlit êkê bi axivtina û kê m bikit û ew bi xwe jî çi nebit wê bê gotin: "Paşî to bo min sera bi simota dikî." Nêzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(664) Paşî to kûşê bi ser Moşê da tînî xarê.

(665) Par mirdî pêrar mirdî kifin zerdî ji nû îsal dibêjî şîrdî birdî!

Binyata vê gotinê dibêjin pîrejinek hebî gelek ji ezabê gurê ditirsa. Rabî ji berî bimrit çend gaz çapon - cang - bi ser tifka agirê xwe ve kir heta ew çapon li dûkêlê da zer bî. Kir qewyatî çî gava ez mirim vî çaponî bikin kifnê min. Dema mir, kifin kirin bi wî çaponê dûkêl girtî veşartin. Li gurê da (munkir û nekîr) hatin pirsyar ji pîrê kirin:

(Men Rebek) pîrê bersiva wan da û got: Pîrê heyran par mirdî pêrar mirdî kifin zerdî to ji nû îsal hatîyî dibêjî "şirdî birdî!" Vêca ev gotina tê gotin gava êk pirsyara tişteke kevin û bûrî bikit!

(666) Parîyê mezin gewrî dirîne.

Bê guman e, ku divêt mirov gava xwe li gor qumet û karîna xwe bavêjit çunkî ewê gava xwe ji qumeta xwe bavêjit, wê pîs bikevit! Ka çawa eger êk parîyê xwe ji gewrîya xwe mezintir çêkit, parîyê wî wê gewrîya wî bidirînit! Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Hindik bide li ber dasê da to nemînî asê."

(667) Pehlewan bi rojekê naçit li ser şelîtê.

(668) Pîranî mêranîyê winda dikit.

(669) Pale qels e, hêcet das e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi xwe bê xêr û bê kêr bit, vêca hêcetên sist û xav ji xwe ra peyda bikit. Wê jê ra bê gotin: "Pale qels e, hêcet das e." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Hêceta ne nivêjkerî pêxas bîne!"

(670) Pîrê bawer ne dikir şû bikit dema şû kir de`wa mehir û heşteka kir.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek, ji mirovekê yan ji cihekê teberhîvî bit, bi daxwazekê pîştî ew daxwaz jê ra pêk hat rabit doza daxwazek mezintir bikit, wê jê ra bê gotin:" Eve ye pîrê bawer ne dikir şû bikit, de`ma şû kir dewa mehir û heşteka kir."

(671) Pîr bi ganekê qehib nabit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek kêmahîyek jê peyda bibit û ji berî hingê kêmahîyên wî nebin, vêca mirov her kêmanîya wî bikin, wê bê gotin:"Pîr bi ganekê qehib nabit."

(672) Pîr xêrker bit êvarên îna zehfin.

Yanî eger mirov yê çakîyê û qenciyê bit, çaxê qenciyê mişe ne. Deverek bi ser da bûrî, deh deverên dî wê li pêşiyê ne.

Q

(673) Qencîya ne li cihê xwe da bela ye!

Bê guman e, ku mirov hemî ne destekin û nîjadê wan ne êk e û başqe ne ji êk û du. Hindek dermanê wan başî û qencî û çakî ye. Hindek ji başî û çakî li gel wan dibit derdu elem û jan û xem û meraq. Ewê nîjadê wî ne pak û firişkê wî ji ne başîyê bit gava te çakî li gel kir wê lê bigerhit li şona çakî û qencîyê xirabîyê li te bikit. Ewê welê divîya to xwe jê biparêzî çunkî ew ne hêja ye çakîyê ye.

Daxwaz ji vê gotinê ne ew e, ku mirov xwe ji çakîyê bidit paş û hêdî qencîyê li gel kesê nekit. Her wekî hatî gotin

« اتق شر من احسنت اليه » yanî xwe ji wî

biparêze ewê to çakîyê li gel bikî! Çunkî li gor vê gotinê divê mirov xwe bi êkcarê ji qencîyê bidit paş bi xwe hêdî çakîyê bi kesê ra nekit. Ev awayê he paşî wê bibit egera windabîna terazuya çak û xirab jêknayên başqe kirin. Eve ji layekî ve û ji layekî dî ve ji ne hemî çakî xirab e, belkî gelek cara çakî dibit egera mumkunkirina hevalînê û dostahîyê; mirovatîyê binecih dibit. Her wekî Xudê - pak û paqij bit - ferman dikit:

« ادفع بالتي هي احسن فاذا الذي بينك وبينه عداوة كانه ولي حميم »

Yanî to li şona xirabîya baştir bike tê bibînî neyarê te wê bibit destek dilovan. Belkî ew çakî xirab e ewa ne li cihê xwe da heke mirovê çak gava te çakî li gel kir te ew jêr destê xwe kir wekî şairê erebî dibêjit

« اذا انت اكرمت الكريم ملكته وان انت اكرمت اللئيم تمردا »

(674) Qûna reş û spî wê li ber borr jêk dîyarbin.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek he pesn û fortên xwe

bidit û yê li beramberî wî xwe kerr bikit, çunkî taze wî nasnakit. Wê jê ra bê gotin: "De malava qûna reş û spî wê li ber borî jêk dîyarbin."

(675) Qûna tazî temburê dixwazî.

(676) Quwet iletê dibrit.

(677) Qûna hîbî tira û devê hîbî virra çênabit
heta kurê kura.

Temaşa bike li gotina (49) ê!

(678) Qazî bi xwe çû xizmeta xwe pêk neanî,
rabî mûyek ji riha xwe rêkir!

(679) Qûna xwe nîşa zaroka bike belê devê xwe
nîşa zaroka neke.

Bê guman e, gava mirov devê xwe nîşa zaroka kir û hîbîne mirovî bi zehmet hêdî mirov bikarit we çêkit ku sehma mirov li ser wan bimînit, vêca divîya mirov xwe gelek biparêzit ji wî qasî li nav mirovên bêxêr xwe bê sîyanet nekit da sema mirov li ser wan bimînit.

(680) Qûn bî qûn jî çû.

Binyata vê gotinê dibêjin, carekê qijakê û tivilkê yeka xwe kirin gotin emê herin li pêşîya koçera çaxê ji zozana da tîn em ê ji xwe ra ezmana ji wan bigirin û pê baxivin. Rabîn çûn li rîya wan da sekinîn, demekê man tivêlkê got: Xewa min tê. Qijakê got: Raze gava koçer hatin ez ê te hişyar bikim. Tivêlk nivist û qijak ma hişyar. Koçer hatin belê qijakê tivêlk hişyar nekir!

Piştî tivêlk hişyar bî, pirsyar ji qijakê kir: Ma hêj mal ne hatine? Qijakê got: Hatin û çûûn... to ji xew ranebî. Çaxê tivêlkê zanî qijakê teşqele û fêlbazî vê ra kirîye, têkçû... Dilê wê ne xweş bî, melûl û damayî bî ageh ji xwe nema! Hind dît qijakê xwe avêt li ser piştê û fisand hema bi desta nema ji bilî wî qasî bêjit: "Qo..qo.. qo..." Yanî qûn bî qûn jî çû." Vêca ev gotina he bî pê gotin çî gava mirovek xebatê û kefte-leftê bikit da zêde bibit, vêca paşî xusaretî ji ba xwe danit li ser. Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Rih jî danîn li ser simbêla."

(681) Qer qede û minet li ser e.

(682) Qalibê mêşa ye û dengê şeşa ye!

(683) Qelî ji serê çûka çênabit!

(684) Qehbê to çima ber nagirî? Got: Heta êk çêdikit dek xirab dikit.

R

(685) Rehmet li gora kifindiz.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovekê kifin didizî, yanî jîyana xwe êxistbî li wî qasî. Piştî kifindiz mir, heçî rabî û rûnişt got: Nelet li gora kifindiz. Kifindiz kurek hebî, perweste bî got dîya xwe: Erê dayê karê babê min çi bî? Dê got: Lawê min babê te cotyar bî, Kurik rabî çû cot heta nîvro zivirî hat mal got: Dayê babê min ne cotyar bî? Ka bêje karê wî çi bî? Dê got: Lawê min rast e, ne cotyar bî, belê min xwest to ji xwe ra bibî cotyar, heke babê te pale bî. Roja paşî çû bî palê. Camêrekê bi kotekî kire êvar piştî hat mal; got dîya xwe: Bes min bixapîne, rast bêje min ka karê babê min çi bî? Hey ne bi Xudê ji êk kopalî pêve ez li kezuya stewê te nadim! Dê hema lê vegerand û got: Dayê qurban hema guhê xwe bide xelkê tê bizanî ka karê babê te çi bî! Baş bizane ev mirovên hinde neleta dibarînin ew li babê te dibarînin! Kurê serê xwe hejand û got: Dêmek babê min kifindiz bî? Dê got: Erê, bi serê te lawê min... Kurê got: De soz bit li ser min ez ji îro pêve welê çêkim, heçî rabit û rûnit bêjit: "Rehme li gora kifindiz." Ew çend demek bî xelik ji dizîna kifnê mirîya tena bibîn, kesê êdî nobedarî li miryên xwe ne digirtin. Kurê kifindiz jî hişyarî kir heta êk mir rabî çû mirî deranî û kifin jêvekir û mirî sernişov dahewand li gorê da û darek kir qûna wî da û hat.

Sibehî xweyî mirî çûn ser gorê berê xwe danê mirîyê wan wê biye teşabet! Êkê ji wan got: "Babo rehme li gora kifindiz." Kifindizê belengaz bes kifin didizîya! Belê ev koçik qulipîyê he mirî dikit teşabet! Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek xirabîyek mezintir ji yê berîya xwe bikit wê bê gotin: "Rehmet li kifindiz!"

(686) Rih dibin bost belê neyar nabin dost.

Temaşa bike li gotina (131,132,133) ê! Tê baş bizanî ka me`na wê çî ye.

(687) Rasto dirusto xwehro şikesto.

(688) Rûn li cem Ereba zehif dibit li dora kîr û gunê xwe didin.

(689) Rûvî ne diçû di kunê ve hejk bi serê dûvê xwe ve kir!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek ne karibit karekê bikit, rabit xwe li karek ji wî mezintir bidit û li nav desta da bimînit asê wê bê gotin:"Rûvî ne diçû di kunê ve hejk bi serê dûvê xwe ve kir!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:"Nikarit êkê dibêjit didu werin min!"

(690) Rim li tûr da nayê veşartin.

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek hizrekê yan gotinekê li ba xwe veşêrit belê hew rê biçit veşartinê, wê bê gotin:"Rim li tûr da nayê veşartin."

(691) Rêka ezmên berwar e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek pir bêjbit û bê kiryar bit û çî karê giran û asê bit bi dev sanahî bikit, belê bê kiryar bit. Ewê welê wê jê ra bê gotin:"Rêka ezmên berwar e." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:"Dibêjit belê napêjit."

(692) Rûyê reş ne hewce ye tenîyê lê bidî!

Ev gotina he ji wî qasî rûhintire ku axivtin li ser bê kirin.
Çunkî mirovê şerm û fihêt nekit çî bê serê wî ageh jê nîne.

(693) Rûyê qayîm ji berê cotê ga çêtir e.

(694) Rûvî têr e, tirî tirş e.

(695) Rû ji lew pêşin da bi êşin.

(696) Rizqê hara li dîna ye.

(697) Roj diçit bela naçit.

(698) Rûvîyê feltînok nakevit çî telha.

(699) Rûto xeber pûto.

(700) Rûvîyê gerok çêtir e, ji şêrê xewûk.

Temaşa bike li gotina (305,306,307,308) ê. Em birekê li vî babetê axivtine.

(701) Rêncberê xwe be, axayê mala xelkê be.

(702) Rezê melkê nav yê min e,, ber yê xelkê.

Here temaşa bike li gotina (16) ê.

(703) Rûvî got: Mîn nebin li nav mirîşka, wek

dî hûn çî ji min bikin bi dilê hewe ye!

(704) Rih jî danîn ser simbêla.

(705) Rizqê gurî bi xema şivanê bêxêr e.

(706) Rûvî to çîma xwe dihejînî? Got: Li min tê
û ji min tê.

(708) Rastî serî şikêne.

(709) Rencberê xwe be xweştivîyê cîrana be.

S

(710) Serê du berana li dîzekê nayê kelandin!

Temaşa bike li gotina (210) ê.

(711) Sax dibit şona xencera belê sax nabit şona xebera!

Bê guman e, tişka ezman dikit tiştek dî nikarî wan kirya-
ra bikî û ew birîna ezman li dil dikit, xencer wê birînê li laşî
nakî çunkî birîna xencerê heye goşt bigrit û sax bibit belê
birîna ezmên li dil sax nabit. Dibêjin carekê meznê got
kurê xwe "here ji min ra baştir goşt bikre." Kur rabî çû ez-
man kirî, babê got : Eve ye baştir parçe ye? Kurî got: Belê..
Roja paşî babê got: here pîstir parçe bikre. Kurê çû her dîsa
ezman kirî. Babê bot: Baş e min duhî got: Here baştir parçe
bikre to çûyî te ezman ji min ra anî û îro min got here pîstir
parçe goşt bikre to çûyî te her ezman anî, ev çî ye? Kurî
got: Babo ji ezmanî baştir nîne gava li başîyê da bit û çakîyê
bêjit belê gava karê wî bî ne başî û xirabî ji wî pîstir nîne.
Dibêjin carekê mirovekê sê jin hebîn û her sê jinên wî êk
hîz û ya dî diz bî û ya dî ezman pîs bî. Ji lewma hemî çaxa
mêrê wa mirûto bî rû gevz bî û dilnexweş bî, carekê dostekê
wî pirsyar jê kir: Erê destebira çima to hinde bi xem û
derdî? Got: Destbira halê min û her sê jinên min eve ye.
Dostê wî got: Baş e, bira to bi xwe dizanî jinka min gelek
baş û xweşerm e, belê pa to jî gelek dostê min î vêca heke te
bivêt her sê jinên xwe bide min ez ê ya xwe bidime te?
Xweyê her sê jina got: Xwezî bela her sê jina ji min vebîya
heke bimirna min jî bîya min pê xweş bî; her duka bi êk gu-
hurîn wî her sêkên xwe danê ewî jî jina xwe dayê. Xweyê
her sêka rabî mala xwe ji gundî barkir û hersê jinên xwe

dan li dûv xwe û çû, li çaxekê li semta avek boş hat, rabî jina xwe ya diz da pišta xwe derbazkir û zivirî hat ya hîz jî derbazkir û zivirî ya ezmandirêj jî da pišta xwe çû nîva avê her du lingên xwe ji ber xwe kirin û destên wê ji destê xwe vekirin û berda li avê da. Ji qestîka bi dûv da bezî belê pa xwe ne gihandê heta xeniqî û çû. Piştî hingê rabî ya diz kir kevanîya malê û ya hîz kir li ûdak du dergeh da! Ya diz dest avêt dizîya xwe ji vê qurnetê dizî bir bo qurneta dî ji vê hebanê bo hebana dî! Dûmahîkê ji xwe ra got: Pa bi Xudê dîn jî ne wek min in, baş e ez ji kê didizim? Heta niho min dizî ji hewya xwe ya kevana malê dikir, vê gavê ez bi xwe kevanî me. Pa soz bit ez êdî dizîyê nekim. Ya hîz got: Baş e, min hîzî dikir ji kerbê mêrê xwe da çunkî hinde nobedarî û hişyarî li min dikir min jî ji kerbê wî da hîzî dikir da bizanît ew bi min ra serder nabit. Baş e, vê gavê vî camêrê he ez ê kirme li ûdek du dergeh da, da gava ew hat heke yarê min li jor ve bit li dergeh dî ra derdikevit, yanî ez hîştîme li ser bextê min pa soz bit ez hêdî hîzîyê nekim. Her duka tobe kir, tobeka ji dil û bîn jinên bijare û dil daxwaz. Piştî hingê zivirî gundê xwe yê berê, çaxê dostê wî yê - mêra jina yê berê - her du jinên wî dîtin û zanî ka bîne çî şengejin! ma guhişî û pirsyar jê kir: Baş e, te çawa ev jin ho rastkirin? Ew çîroka xwe jê ra got. Got: Pa ka ya dî? Got: Min bi avê da berda bela wê ji xwe vekir. Got Bo çî te ew jî rast nekir wek hewyên wê? Got: Min nekarî û ez ê nekaribim, çunkî hîz hîzayetîya xwe dihêlit, diz dizîya xwe dihêlit, belê ezmanê pîs pîsîtîya xwe nahêlit. Wekî vê gotina em li ser taxi-
vin şîra şairê erebî çaxê dibêjit:

«جراحات السنان لها القيام

ولا يلتام ما جرحه اللسان»

(712) Sivorî û ber û minê xwe!

Binyata vê gotinê dibêjin sivorîyek ji darekê ket got bawer bikin "minek," bez ji min helîya! Jê ra hat gotin: Malbabwêrano to hemî weqîyek tênîni! Got: Malava "sivorî û

ber û minê xwe!"

(713) Serê xwe her bide dîwarên kevin!

Yanî pirsyar kerbe ji mirovên kalemêr û serhatî...
Temaşa bike li gotina (6) û (7) ê!

(714) Serê li ber mineta bila biçit li nav zîyareta.

Dibêjin carekê maqûlek û xulamê xwe hatin girtin fermana axê bi xenqandinê hat û gotinê qewîtiyê xwe bike piştî sê roj dî em ê te bixeniqînin. Ji ber vê êkê hemî dema dilê wî nexweş bî ne dikarî ne bixût û ne vexût. Xulamê wî got: Erê axa çima to hinde dil nexweşî û me îdê te kirîye? Axê got: Malbabwêrano wê min bixeniqînin piştî du roj dî! Xulamî got: Ma te divêt ez te birevînim û qurtal bikim? Axê got: Xwezî min dîtî vê carê jî ez ji destê mirnê verestîm, ji vê zîndanê qurtal bîm, lingên min jî ketin li ser çîya û axa Kurdistanê delal... Xulamî got: Qurtalbîn gelek bi sanahîye. Berê te îşev li min bit, xulamê te dê çi bikit! Xulam bi hêz û quwet bî heke xwe li dîwara dabîya wê felişandibîya. Piştî nîva şevê xulam rabî destên xwe avêtin şîşîkên pencera zîndanê hemî hilkkirin axayê xwe têra qurtal kir û ew jî kete dûv û revîn û bi êk katê xwe bi çîya ra gihandin. Piştî hingê gava axa û xulam rûniştîbîyana li civatekê xulam wê gotibîya: Te dît heke ne ji min bîya niho to xeniqandibîn! Belê min hêsînên zîndanê hilkkirin û min to revandin. Ne carekê û ne deha û ne bîsta.. Hema hingê li civatê rûniştîbîna xulam wê behsa qurtalbîna axê û mineta xwe kirbîya. Dûmahîkê hew debar kir, got: Kuro de qedav li vî canê te qurtal kirî bîkevit bi Xudê rastê çaxê dibêjin : "Serê li ber mineta bila herit zîyareta" û temaşa bike li gotina (91) ê.

(715) Siqa li gora heke.

(716) Serî hingî bimînit qûnê ecêba bibînit.

(717) Serve Ellah û binve ne ûzû billah.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ber çav xwe bînit li pêş ku mirovek baş û ji Xudê tirse û ji xwe şerm e. Belê gava nepenî bî wan kiryara bikit erd û esman ji ber bilerizin. Wê bê gotin:" Serve Ellah Ellah li binve ne ûzû billah." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin;"gorgê li kevnê mihê daye!" Yan jî çaxê dibêjin;"nermikê li bin kayê da ye!"

(718) Serê ne êşit ne hewce ye girê bidî.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi destê xwe bela û nexweşîya ji xwe ra çêkit wê jê ra bê gotin:"Serê ne êşit ne hewce ye girê bidî!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:"Girêka bi desta vebit hewcey didana neke!"

(719) Silav li sifra hazir e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bixwazit bi karek baş rabit, belê ew kar gelek cara li destê gelek mirova da şepilî bit. Vêca ew mirov hindek bixwazîn wî sist û xav bikin bêjnê ji berî te gelek xwe li vî karî da ye , belê nebîye çî. Ew ê bêjit" malava heçî çûyî çû silav li sifra hazir e." Hozanvanê Kurd bi nav û deng Cigerxwîn dibêjit li vî babetî:

*Ey suxteyê bê nav û deng dijmin li ser balefir e
Pir leşker û top û tifeng seyda ew e ew mahire
Sed sal e, ev zêde û emir ceng e di gel rîya melê
mortal di dest wan da bihuşit gurzê di dest wan agire
Ew şêxê tac û teylesan wergirtîye rengê Xidir
Rûniştîye li burca belek şahê Ecem şah Nadir e
Ew sofîyê dîl û reben serqot û xas û tazî ye
Digrî bi hawar û fîgan şêxê min ebid û li qadir e*

*Carek li şêx ew nabêjît da zanibit rast û derew e
 Kincê li şêx şal û qumaş kincê li sofî çadir e!
 Axa bi deh gundê xwe ve bawer dikit Keyxusrew e
 Talanker û diz û keleş wî daye ser pêça gur e
 Halê me Kurmanca ev e em dê çawa serbest bibîn!
 Her çî ku çûye guh medê "silav li sifra hazir e."
 Seydayê rast û ronîye lewra "çigerxwîn" namîdar e
 Zana dîzanin ew kî ye, yên ker dibêjin "kafir e."*

(720) Sunet sunet e, lê ne li qurm ra!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe bi karek ne bi ser ve girê bidit û hêdî ne hêlit û dev jê bernedit û tam sar bikit wê jê ra bê gotin: "Sunet sunet e, lê ne li qurm ra!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Nan bi xuwê û xuwê bi me`ina!

(721) Siha pelkê ye ne li xwe ye û ne li xelkê ye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek ne kêr xwe û ne jî kêr kes û karên xwe bêt, ew ê welê jê ra bê gotin: "Siha pelkê ye ne li xwe ye û ne li xelkê ye." Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Mîtirbê zer ne li devê ye û ne li zirnê ye!" Dibêjin carekê mirovek mir xelik çûn azahîya kurê wî, hemî welî wê rûniştine, kurê mirî got: Bavê min -Xudê jê xweş bit - mirovek gelek baş bî (70) salî bî borandî dilê mirovekî jê nema! Êkî ji dîwanê got: Kuro de ez li gora wî babî da birîm ew ê li saxîya wî da kesê gazindek jê nekirbit û dilê êkê jê nemabit! Yanî ew hinde ne çî tişt bî ne kêr xwe dihat û ne jî kêr kesê dihat; ji lewma kesê gazindek carekê jê nekir heta mir û çû.

(722) Serê keçel li bin kum da qenc e.

Ev gotina he tê gotin gava êkê hindek kêmahî hebin belê li xwe bileyzît heta kêmahîyên wî dîyar bibin û rûsar bibit wê

jê ra bêt gotin "xalbenî serê keçel li bin kum da qenc e!"

(723) Ser av dizanî bin av çî kirîye!

(724) Serên ne bi ser êkve naçin dev êkve.

Bê guman e, ku her mirovek qesta yê wekî xwe dicit. Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : " Her teyrek li gel refa xwe."

(725) Sibha li qerpala xeber - pir gotin - li xirab mala.

(726) Sibhan ji heyînê ye!

Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin : "Mal têr e kevanî şêr e."

(727) Sibhan ji wî xalqî didu li hevdu aliqîn êk kor û êk çav şeliqî.

(728) Serê sing du çiqe ji lewma li axê naçit!

(729) Serve têt û mît e û binve qûna rût e!

(730) Sed gez werîs esil heçk e.

Heçik: Ew darê du taye bi serê werîsî ve girêdidin, da bar pê bêt şidandin. Vêca çî tiştê hebit mal bit, yan gund bit yan êl bit çend boş û têr û mîrxas bit, eger sergîr ne bit buha jê ra nîne û başî jê çênabit; ka çawa werîs çend dirêj bit, heke heçk pêva nebit bar nayê girêdan asê nabit.

(731) Sed tirr li ba tirkera bi êkê hesabin.

Bê guman e, mirovê hîbî pîsaîyê û nebaşîyê hêdî wî ageh ji xirabîya xwe nîne, her wekî hîç tiştek nekirî; ka çawa mirovê tirkker li ba wî tirr ne bi tiştekê ye! Eger sed tirra bikit her wekî tirrek kirî, ji lewma hatîye gotin: "Qûna hîbî tirra û devê hîbî virra çêbit heta kurê kura."

(732) Sed çakûç û êk sindan!

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek ser hişk û nezan bit hingî miorv bên wî zana bikin û bînin li ser rêka rast û dirust, belê ew ji ya xwe neyêt xarê. wê jê ra bê gotin: "Sed çakûç û êk sindan." Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Miqewrê - kilindokê avê - dernevekirî ye hingî avê pêda bikî bi nav nakevit."

(733) Seyî mirov didit bi xatrê xweyî.

(734) Sor kir û zer kir her da bi heqê xwe.

(735) Sed sal û seetek, seetek û sed sal got rast e, got piştî du kur û keçekê!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek ji çakên Xudê li civatekê got: Sed sal seetek û seetek û sed sal li ba Xudê wek êk in, meznê civatê got: Malwêrano ev çî derewek mezin e, çawa seetek û sed sal wekî êkin! Piştî hingê mezin hewcey avê bî ew û kolê xwe çûn li ser avê, cilên xwe danîn û xwe noqî kir. Berê xwe dayê wê li bajarekê ye ne li ser dîyar e ne binî! Ew bi xwe jî jin e û bê star e. Hema rûnişte xarê zelamek li semtê hat kurkê - ebeyê - xwe lê pêça û da li dûv xwe bir malê û li xwe mehir kir. Ma li nik heta du kur û keçek jê çêbîn. Rojekê dîsa çû li ser avê da xwe bêxit av, xwe noqî kir û serê xwe deranî berê xwe da

xwe zelam e ne jin e!Kirasê xwe kir ber xwe û got kolê xwe: ma ez gelek li avê da mijûl bîm? Kole got: Nexêr vê gavê te xwe noqî kir û derketî. Wî jî xwe kerrkir û çû ne mal. Piştî hingê dîsa ew çakîyê Xudê hat dîwanê û li wê civatê got: Sed û seetek, seetek û sed sal li ba Xudê wekî êkin." Meznî got: Rast e.. Çakî got: "Piştî du kur û keçekê." Vêca bî pê gotin, çî gava mirovek zana û şehreza şîret li êkê bikit û ew pûtê pê nekit û bawer jê nekit heta bi serda bê wê jê ra bê gotin Eve ye got " sed sal û seetek, seetek û sed sal, got rast e... Got piştî du kur û keçekê!"

(736) Singê bêxit li xwe da nikarit ji xwe derxit.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek bi destê xwe bela û nexweşîya bi ser xwe da bînit û hêdî ne karbit xwe ji wan bela û tengîya xelas bikit wê bê gotin: "Singê bêxit li xwe da nikarit ji xwe derxit."

(737) Sing ji ber mêqut diçit.

(738) Sofîyê remezanê wey kerê li garanê!

Bê guman e ew mirovê ji salê hemîye carekê çakîyek jê çêbit wekî dî her û her karê wî xirabî bit, ew ne li rêza mirovan ne belkî ew li rêza keran e. Çunkî ker jî salê carekê lê dibit buhar serê xwe dixût. Wekî dî heke to guhê wî bikêşî xwe naqeliqînit!

(739) Siwarê hespê hevala her peya ye.

Ez welê hizir dikim ev gotina he ji wî qasî ruhintir e, ku mirov li ser baxivit.

(740) Sed gulî zîwan mirov gorî ûşîyek genim dikit.

(741) Se se ye hestîya dikojit, hesabê qûna xwe dikit

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek rabit bi karekê û hesaba dûmahîka xwe nekit û paşî hingê bêt ne karbit xwe xelas bikit wê bê gotin:" Se se ye hestîya dikojit, hesabê qûna xwe dikit!"

(742) Se direvit û karwan dibûrit.

Ev gotina he tê gotin li demê ku li malê da yan gundî da mirovek baş û bi kiryar bit û xwe li kiryarên hêja û baş bînit pêş, belê hindekên xirab û pîs jê ve nebin û her behsê wî bi xirabî bikin. Vêca ew ji ber wan xavîtiyê û sistahîyê bikit û dilsar bibit wê bê gotin : "Se direvit karwan dibûrit." Yanî pûte bi axivtinên xiraba neke û li ser başîya xwe be.

(743) Se be ji qewmê xwe be!

Bê guman ev gotina he gelek ji wî qasî ruhintir e, ku axivtin li ser bêt kirin çunkî li vî babetî me gelek axivtin kirîye li gotina (837, 835) ê da.

(744) Seû ne bîne û ne rewe!

(745) Stirwê - şaxê - poşmana hatibya yên wî dê gihabîya esmana!

(746) Seyê xwe xweyî nekî wê bi qetek nan biçit li ber derê malek dî!

Bê guman e, eger malxwê malê bit yan koxê gundî bit

yan rêberê êlê bit, xwe li miorvên xwe nekit xweyî û kes û karên xwe li der dora xwe kom nekit neçare dê wî bihêlin û biçin qesta dujminê wî bikin çunkî wekî dibêjin:

(747) Seyê xweyî çixrandî xelkê ber tê firandî.

Vêca bivê-nevê ye, rêber û meznên mal û gunda mirovên xwe wekî mirîşka kurk xwe li mirovên xwe bikin xweyê da pêkve bi rûmet bibin.

(748) Siwaro Xudê rikêba te dirêj bikit. Got : Bi destê min e!

(749) Stirwê gayî li mihê bîya wê dinya xirab kirbîya.

§

(750) Şîreta kîrê kerê ye!

Binyata vê gotinê dibêjin xesuyek li ber bûka xwe da rûnişt û şîret lê kirin heta ezmanê wê req bî, li wî demî da kerekê li derê malê kîrê xwe deranî, bûkê ho bi lez got: Jinmamê... jinmamê.. berê xwe bide kîrê kerê me çend pêşîya da yî yê? Jinmamê - xexuyê - serê xwe hejand û got: "Şîreta kîrê kerê ye!" Vêca bî pê gotin gava mirovek şîreta li êkê bikit ew ê dî pûte pê nekit û xwe bi tiştêk bêxer ve mijûl bikit wê bê gotin: "Şîreta kîrê kerê ye!"

(751) Şam dûr e ma mişar jî dûr e?

Binyata vê gotinê dibêjin carekê êkê li civatekî her fort û pest û zirtên kerê xwe kirin. Kerê min ho zîrek e, li Şamê xwe li ser heft mişra ra tavêt. Mirovekî ji civatê got: Malava "Şam dûr e ma mişar jî dûr e?" Vêca bî pê gotin li ser her kkesê pesn û zirtên xwe bi borîyê xwe bidit wê bê gotin: "Şam dûr e, ma mişar jî dûr e!"

(752) Şêr şêr e, çi jin e û çi mêr e!

Bê guman e, Xudê - pak û paqijbit - jîyan daye mirova û ew jîyan gerandîye li navbeyna mêr û jinê da bi regekî welê yek bê yê dî nijît û her êk ji wan rekek yê jîyanê ye û her êk ji wan hindêk kar bi destê bên xas hene. Mêr bi hizir û hêza xwe û jin bi dilnêrmî û dîlfirjandina xwe û her du pêkve didin, bîngêhê malê û êlê û mîlet. Çi gava kî ji wan her duka kar û barên xwe bihêlit û dest bavêjit kar û barên hevalê xwe û tebiyetê xwe bigurit, bê guman e ew ê bîngêhê malê têk bidit û dûmahîkê mîletê pê sist û xav bibit. Vêca ji ber ku jîngelek dilnêrm û dilpaqij e û ji berî mêrî tê xapan-

din bi gotina mêrî, eve ji layekê ve û ji layek dî ve derketina wê ji ûl û bext û rêka xwe zerara wê ji ya mêrî pêtir e. Çunkî hingî jinê bi rastî - neku ez dilê wê xweş dikim belkî biryara bi rastîyê ye - zîtirê piştê ye bo malê - Nexasim li fêrkirin û xweyakirina zarokan da - vêca xirabîya wê xirabîya zarokan e; çunkî wekî dibêjin: "Dayê bibîne û dotê bistîne:" Her welê hatîye gotin; "keç teşîya dayê badidit." Yanî ka rêzka dayê çî ye, ya keçê jî ew e. Ji ber van tiştan hemîya kêmasîya mezintir tê li ber çavên wê û bihayê wê kêr dibit. Belê wekî dî" şêr şêr e çî jin e, û çî mêr e!"

(753) Şêr got rûvî: Te ev zanîna he ji kûve anîye? Got: Bi xwîna li teşka gurî da.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê şêr û gur û rûvî pêkve çûn nêçîrê. Xezalek û kêvroşkek û kerek girtin. Şêr got gurî: Nêçîra me li me lêkve bike, gurî got. Sahanîye mîrê min. Şêr got: Çawa? Gurî got: ker ji te ra û xezal ji min ra û kêvroşk jî ji rûvî ra. Şêr destê xwe rakir û veweşand nav çavê gurî wî xwe ji ber da rexeke penca şêr ji kemaxa wî girt, çermê kemaxê li teşkê sekinand û berê xwe da rûvî û got: Hevalê te çîqa nezan e! Rûvî got: Mîrê min ehmeqê hevalê wî nîne! Tiştêkê ji dinyayê nizanit. Şêr got: Baş e pa tê çawa lêkve bikî? Rûvî got: Ji wê sanahîtir nîne, şêr got: Çawa? Rûvî got: ker ji tiştan te ra û xezal ji şîva te ra û kêvroşk jî li bera xwe pê mijûl bikî. Şêr got: Hay hay kuro te ev zanîna he ji kûve anîye? Rûvî got: Mîrê min, min bi xwîna li teşka gurî va. Vêca bî pê gotin çaxê mirovek xwe melaq û dev nerm û ziman xweş bikit li dûv dilê xurtî baxivî çunkî hevalê xwe dibînit ka halê wî çî ye! Nîzîkî vê gotine ye çaxê dibêjin: "Çavên zil li bin kayê da dîtin!"

(754) Şov reş kir dilê xweyî xweş kir

Ev gotina he tê gotin çaxê êk karekê ji êkê ra bikit, belê ne bi dil bêşî û xemxwerî û taze. Belkî hema xwe jê xilax

bikit wê jê ra bê gotin: "Şov reş kir dilê xweyî xweş kir."

(755) Şûrê hêsin to heft sala bi pesn wê her
biçit li ser guhê gêsin!

Bê guman e, ku mirovê bê tûte û bê binyat bit çare nîne ne wê her bizivirit li ser bê tûteyîya xwe çend xem xwarin jê bê xwarin çunkî wekî dibêjin: "Keça qereç nabit xatûn." Temaşa bike li gotina (149) ê tê baştir daxwaza vê gotinê bizanî.

(756) Şaqolî ne peya bit bila li çêlekê siwar bit!

(757) Şuxla bike bi esas da dilê te nekit waswas.

(758) Şer û niv şer hevalên êkin.

(759) Şuxul şêr e belê gava mirov dest avêtê
dibit rûvî.

(760) Şûrê qetlê li destê te belê rehma Xudê li
dilê te.

Bivê-nevê ye, li ser her mirovekî çend xurt û pêve hafî bit, bizanî ji wî xurtir hene. Vêca gerek mirov navbeyna xwe û Xudê yekcar xirab nekit. Vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek dest bavêjit zordariyê, ter û hişka bidit êk wê bê gotin; "şûrê qetlê li destê te belê rehma Xudê li dilê te!"

(761) Şêx ne batine belê şuxul bi ser hatine.

(762) Şerê li şovê ne qerqêşa bênderê.

(763) Şilêr şilêr e, ma dê serê xwe bixût.

(764) Şana hingivî ye belê ne şîrîn kirîye!

(765) Şîrîn e dil nahêlim bavêjim û reçe ez nika
rim bikojim.

(766) Şûrşam xencer amjin dotmam.

(767) Şert ne hilê hilê ye şert gêre gêre ye.

(768) Şert ne toz e, şert li bin ber gûz e.

Ev her du gotinên he tên gotin gava mirovek xwe bidit
dîyarkirin bi awakê û ew bi xwe ne bi wî awayî bit, belkî
xirabtir û kêmtir bit.

(769) Şêx şaf bit û xilwe ava bit û keçik û kurik
aza bin pa eve nabit.

(770) Şêr ji pêşîya xilas nabin.

Temaşa bike li gotina (51) ê!

(771) Şuxla biçûk mezin neke.

(772) Şam şeker e welat şîrîn e.

Tiştêkî bê guman e, ku welatê mirov li nik mirovî xweştir
ji dinyayê hemî yê wek (Cigerxwîn) li şîra xwe da dibêjit:

*Welatê me ye xweş Kurdistan
Zozan û deşt e tev bax û bîstan
Qence xirab e welatê me ye
Li me xweş e wek biloyê Êrdim.*

Welatê mirovê hind bi mirovî şîrîn e heta hindeka derew li ser devê pêxemberê Xudê - selat û silavên Xudê li ser bit - kirîne gotine: «حب الوطن من الايمان» Yanî evîndarîya welêt ji bawerîya bi Xudê ye.

Li ser vî babetî dibêjin carekê êk ji mîrên Botan keçek li kolanên Cizîrê dît ji dilkê heyîne ji hezar dila dilê wî ketê! Rabî ji xwe ra anî û li xwe mehir kir. Hingî ew û mîr rûniştibîya xarê pêkve keçkê wê gotibîya " Ax şêrbînê neynika dinê şîrîna li ber dilê min ê." Ne rojekê û ne deha û ne bîsta... Carekê mîr got: Erê keça qenc to nabêjî şêrbîn çî ye? Hingî em pêkve rûnin tê bêjî " şêrbînê neynika dinê şîrîna li ber dilê min ê." Ev çî şêrbîn e? Keçikê got: Mîrê min şêrbîn gundê babê min e û ez têda rabîme û mezin bîme. Mîr got: Baş e. Şêrbîn dûr e? Got: Mîrê min ne dûr e wa li nav batûya ye, li navbeyna Şîrnex û Dêrgulê da. Mîr got: Bi tac û textê xwe kim, divêt em biçin wê Şêrbînê bibînin, ewa hinde ji te ra bîye daxwaz. Keçkê got: Xwezî mîrê min carekê dî li saxîya xwe da min Şêrbîn dîtibîya paşî bila ez li wêde bimram. Mîr got: Îşev xwe lêk bide sibehî em ê biçin Şêrbînê. Roja paşî her du siwar bîn û jêlil berê xwe dan li nav Batûya li qesirka gelîyê Cizîrê ra çûn. Ji dûrva ulîyên Dêrgulê dîtîn, mîr got: Eve Şêrbîn? Keçkê got: Mîrê min eve Dêrgul e, mîr berê xwe da dûtir hindek ulîyên spî dîtîn got: Ewa heye Şêrbîn ? Keçkê got: Mîrê min ew Şîrnex e... Mîr got: pa ka Şêrbîn keça qenc? Got: Mîrê min em nîzîk bîne. Çûn serê milekê. keçkê got: Mîrê min eve ye Şêrbîn. Mîr berê xwe da dûr... Tiştêk ne dît; keçkê got: Mîro berê xwe bide nîzîk, li bin xwe ra. Mîrê berê xwe da binê newalê çî berê xwe bidetê! Çar kolk in taqê singî ji bejna zelama ne bilintir e û li ser stûna û taqê piştê li axê ra ye. Ava wan bi qonaxa du seeta dûr heke ne li ser piştê kera bit wê ji

tehna bimrin. Çilê zivistanê ji ber pêşûya mirov nadebirit heta dor bighêt havînê!

Mîr got: Eve ye Şêrbîn? Keçkê got: Belê mîrê min. Got: Eve ye Şêrbîn, eve ye neynika dinê, eve ye şîrîna li ber dilê min ê? Her keçkê got: Belê mîrê min! Got: Bawerke heke mirov xweyê vî gundî bit mirov nabêjit mirov xweyî cihûwar e. Keçkê got: Mîro xwezî te bi çavê min berê xwe dabîya pê û bi hizra min te temaşa kirbîya. Her wekî te sehnekirî çaxê dibêjin: "Kew kûde xweş e? Got: Erdê ez lê bîm ferx." Mîrê min ji berê da hatîye gotin: "Şam şekir e, welat şîrîntir e." Bîra te xadîma mala babê te nayê? Mîr got: Kîj xadîm? Got: Mîrê min pîrejînek hebî li nav mala - Xudê jê xweş bit - babê te xizmeta wan dikir. Herû êvarî da bêjnê pîrê heyran "kolkê pîrê xweştir e ji burca mîrê Cizîrê!" Ne rojekê û ne deha carekê babê te got: Erê hûn naçin - ji dizîve - çaxê pîrê diçit mala xwe ka çî dikit?

Carekê pîrê çû mal û nobedar çûne xwe li ber veşarîne pîrê cihê xwe danî û xwe li ser vezeland lingê xwe rakir û bayê li hinavê xwe da hemî berda û têna bî. Bi ser xwe ve hat û got: Xwelî li serê mîrê Cizîrê û burca wî kengê ez dikarim li wêdê ho bikim!

Vêca mîrê min welatê mirovî bi mirov diparêzit ji kêm û kasa, belê heke mirov yê welatê xwe bit welatê mirov yê mirov bit, mirov têda ne rênçberê xelkê bit. Mîr got; Bawerke to rast dibêjî keça pak. Ez bi xwe jî berek ji Cizîra Botan nadim bi Misir û Hind û Şamê. belê min welê hizir dikir ku ez bi tinê welê me.

keçkê got: Mîrê min ne to bi tinê welêyî belkî heçî kesê hej welatê xwe bikit welê ye!

(773) Şeva tarî li êvarî dîyar e!

T

(774) To benkê sor û zerbîyayî tê bi derê hebana
xwe ve bîyayî.

Ev gotina he tê gotin gava mirov bibînit êk kêr mala xwe û gundê xwe nayê û diçit xwe li xizmeta hindêk dî bînit pêş û mala wî bi xwe pêtivîyê karkeran e. Bê guman e ew ê kêr kes û karên xwe neyê ew kêr tişteki nayê û ji yên welê ra dibêjin: "Dara sihê li binê xwe nekit buha jê ra nîne." Vêca heke rast ew mirovek jîr û jêhatî ye bila xizmeta mala xwe bikit; çunkî wekî dibêjin; "lêv ji didana pêştirîn." Û her welê gotinek ya pêxemberê Xudê jî heye - selat û silavên Xudê li ser bit - çaxê ferman dikit: «وابدأ بمن تعول» yanî li danê da ewil dest bi zarokên xwe bike. Vêca bila ew berahîyê zarokên xwe têr bikit û paşî pirsyara zarokên cîranan bikit.

(775) Te derbek danî û êk mezintir hilanî te kar
nanî.

776) Te hêj gunik reş li ser xwe ra nedîne!

Binyata vê gotinê dibêjin, carekê miorvek bî hingî çûbîya aşî zû vedigerîya mal, qet rojekê mijûl nedibî, carekê babê wî pirsyar jê kir: Erê kurê min to nabêjî min ev çî ye hingî to diçî aşî to mijûl nabî û to zûka vedigerî. Ev ma carekê mirovek li pêşîya te naçit aşî? Kurê got: Çima? Heçî gava ez çûm min ê arvanê xwe hêra û ez ê hatim, heta hindêk cara gava ez diçim arvan li mizaxa aşî da hebit jî aşvanî wê ew arvan deranî wê yê min lêkir. Babê got: Ji ber çî? To hind camêr î, tev qedrê te digrin yan jî çî ye? Kurî got: Ne tev gizê xwe ji min dikin. Babê serê xwe hejand û got: "Te hêj

gunik reş li ser xwe ra nedîne." Belê kur gotina babê xwe teneğiha û pûtê pê nekir û pê kenî. Bab ma heta carekê kurî arvanê xwe dagirt û çû aşî. Babê rabî bilez û bez biluvek ji xwe ra dagirt û da milê xwe û li rê bir ku qesta aşî kir. Welê çû ku ji berî kurê xwe, xwe gihand aşî. Çû ji der ve û berê xwe dayê aş valaye kes têve nîne ji bilî aşvanî, wî jî xwe mijûl kir heta zanî nêzikî kurê wî wê bigehit aşî. Rabî derê biluvê xwe vekir da li aşî bikit berê xwe dayê kurê wî li derê aşî got: Şoş û hêestira xwe anî di jor ve, aşvanî got: Piştî dengî kurî naskir - mam raweste bila ev camêrê he arvanê xwe bihêrit paşî bi dilê xwe to biluvê xwe bihêre. Babê got: Bo çî? Ma ne dora min e? Kurê dengê êkê sehkir behsa dorê dikit - nezanî dengê babê wî ye - çunkî babê karê xwe bi dirostî guhurîbî - got: Dor çî ye? babê got: Mam benî dor ew e ez ji berî te hatime aşî; ez ê ji berî te bihêrim. Kurî got: De biqêşte heke ez ê dev û lêvên te tijî xwîn bikim. Dor... dor çî ye? Ez nizanim dor çî ye? heydê ji ber çavên min, here hêj min to bê kepî û lêv nekirî! Babê lê veğerand û got: Yên diqêştin wek te û babê te ne! Teres lawê teres û ji cih kûr vekirê - çunkî bi hêcet bî - çaxê kurî pîremêr bi wî miqamî dît çav li serî sor bî hema wî jî ji cih kûr vekir babê! Wa her duka wek du gayên boxe êk û du birin anî. Babê nemerdi nekir kurê xwe ji erdê bilindkir û jûrda li axê da û rûnişt li ser singê wî, destê xwe kirne li xenaqa wî da heta bê ser û ber kir, da xwe rabî ji qesta dawa kirasê xwe bilind kir û her du gunên xwe birin li semta çavên kurê xwe vehejandin - çunkî xwe bê derpê kirbî ji wî qasî ra - çavên kurî bi her du gunên wî ketin, bîra gotina babê wî hat bîrê "te hêj gunik reş li ser xwe ra nedîne." Hema çavên wî pêlbîn û destê wî sistbîn û got: To bi Xudê mam li min bibûre ez xeletbîm rast e " heçî nekit bi xeberê mezina wê pêva bên du şaxên bizina." Mam hêdî rabî li ser xwe çû biluvê xwe hêra û da milê xwe û çû mal. Xwe guhurî û rûnişt mal heta kurê wî hat. Çaxê kurê wî hat, sernizim çavpêl, rûgevez, kêfnexweş, babê got: Te xêr e kurê min, to bo çî zûka ne hatî? Çima kêfa te nexweş e ? Kurî got: Babo min dît. Babê got: - Her wekî tişteq nezanî - te çî dît lawê min? Kurî got: Min gunik

reş li ser xwe ra dît û çîroka xwe hemî bi dirostî ji babê xwe ra got û got: Babo min tobe ye. Babê got: Te tobe kir? Kurê got: Belê. Babê got: De baş e, belê bizane ew gunik reş babê te bî, çunkî dilê min ma bi te ve; min got: Heke ez welê nekim yek dê wî welê bikit. Paşê wê şêrma wî gelek biçit vêca ev bî pê gotin çî gava êk xwe di zirtekê bînit pêş û kesê bi tişteke hesab nekit wê bê gotin: "Te hêj gunik reş li ser xwe ra nedîne."

Vêca divêt mirov xwe ji zirtekê, cirnexweşîyê dûr bigrit, çunkî divê mirov baş bizanît ka mirov çend mêr e! Ji mirov mêtir hene, mirov çend zanaye ji mirov zanatir hene, mirov çend fêlbaz e, ji miorv fêlbaztir hene. Miorv çend bi quwete, ji mirov quwetir hene; Xudê - pak û paqij bit - gelek rast dibêjît çaxê ferman dikit: «وفوق كل ذي علم عليم»

Yanî li ser her zanayekê ra, zanayektir heye. Gotinek Kurdan heye dibêjin: "Dest li ser desta heta esmanê hefta."

Vêca divîya mirov bi quweta xwe yan bi malê xwe germ nabit û li ser xwe neçit. Wekî dibêjin carekê mirovek hebî navê wî "Mihamed Tahir" bî. Pehlewanek gelek bi hêz û quwet bî belê - mixabin - mirovek cirnexweş bî, ji ber zîreka xwe hemî gava li zîndana Mîsil da bî li ser tişteên kêr û bêxêr. Carekê rêberê - xelkê Sulêmanîyê - hat bo zîndana Mîsil nobedarên zîndanê xwestin bidin kirêt kirin bi destê Mihamed Tahir. Rabîn çûn li ba rêberî gotin: Girtîyek heye xwe li zîrekîyê diînit pêş û cirnexweş e - ne gotin pehlewana e li zorxanê rabîye - rêberî jî got: Herin bêjinê biêa bêt vêrê, Çaxê Mihamed Tahir çû ba rêberî wî jî gotê bi nermî : Bo çî to xwe cirnexweş dikî xizmeta zîndanê nakî, wek hevalên xwe? Mihamed tahir got: Ez nakim çunkî ez girtîyê bi dilê xwe me! Rêber got: Girtîyê bi dilê xwe nînin divîya to jî xizmeta zîndanê jî bikî. Mihamed Tahir got: Ez nakim û ezmanê xwe bes dirêj bike û bizane ez kî me! Rêberî hêdî bi ser xwe hat bi nermî li gel axivt heta çû nêzik Mihamed Tahir hind xwe dît û haj ji xwe nema rêberî destek yê xwe avêt xavka zikê wî wek berx vîrnîyekî ji erdê bilinkir û got: Ez te bipeqînim! Hey teres heke to bi quwetî

ji te bi quwetir hene. Mihamed Tahir li nav lepên wî da bî por tirek jê hat.

Eha holê miorv dibînit dûmahîka zîrekîyê û zordarîyê serşorî û sernizmîyê. Gotinek erebî jî heye; çaxê dibêjin: «الظلم لا ييوم وان دام دمر» yanî zordarî ne domkêş e, eger kêşa wê xweyê têbibbit.

(777) To çî biçînî to wê hilînî.

Bê guman e, ku her miorvek li rêka jîna xwe da wekî cotyarê li ser zevîyê ye ka çawa cotyar çî biçînit dê wê bidrû û hilînit; her welê mirov jî li jîna xwe da welê ye. Çakîyê bikit wê çak bit û pîsîyê bikit wê pîs bit de vêca hey nîzîk û hey dûr. Dibêjin carekê zelamek û jîna xwe û dîya xwe bîn, dîya wî kor bî. Karê wî rênçberî bî herû siharê gava derketibîya wê gotibîya jîna xwe "to bi Xudê kî du sê pîşkên goşt ji dîya min ra bide bistikê, belê jinik pêtûtebî ew goşt diçû ji xeswa xwe ra tiştên pîs didan bistikê - wek beqa û tiştên welê - gava mêr digot jîna xwe : Te ew goşt bo dîya min çêkir? Jinkê digot: Belê diçû pirsyar ji dîya xwe dikir: Çawa ne li gel te? Dê pesnê wê dikir û digot: Gelek baş e li gel min Xudê jê razîbit herû têr goştê bistikê didin min ew goştê terr û nazik... Jin pîr bî û kor bî wekî xesya xwe lê hat. Ew jî bî xesû halê kurê wê xweş bî. herû bûka wê dê gotibîya mêrê xwe to bi Xudêkî hindek goştê taze û nazik bîne ez ê ji dîya te ra bidim bisikç. Gava ew goştê ter dida bistikê û dibir datanî li ber xesûya xwe ew goşt li lalêkê da dibî beq û ew tiştên xesûyê didan xesûya xwe. Bûk ma heybet girtî ev çî ye? Ev çî ecêb e? Bûk ji xwe tîrsiha û şerm dikir ji mêrê xwe, nekû hizir bikit ew wa tišta datînit li ber xesûya xwe rabî çû bi dizî ve got mêrê xwe: Ka were li ber xwarna dîya xwe bisekine. gava mêr hat wê jî wek adetê xwe goştê xwe taze şoşt û da bistikê heta taze sorbî; bir danî li ber xesûya xwe. Çawa xesû dest avêt pista goşt li desta bî beq, beqa xwe kire li nav parîyê xwe da û got: De were "hey çandîye min, min to bi destê xwe ji xwe ra çandî. Kurê

û bûkê her duka pêkve gotin: Ev çî ye? Xesûyê got: Dayê heyran ev ahên pîra te ne, tên li pêşîya min û çîroka xwe û xesûya xwe hemî ji wan ra got.

Vêca bivê. nevê ye, ku her mirovek çakîyê û başîyê ji xwe ra hilbijêrit çunkî wekî dibêjin: "Çî bikî kuwarê ew ê bê xwarê."

(778) Tîrka nanî bide li ber karîtî xanî.

Bê guman e, ku xwehrî tişteke pîs û bêxêr û xwe negire, mirovên xwehir ne kêr mala xwe û ne kêr mala kes û karên xwe tê, wê her ser û ser li tehtekê bikevit, çend xurt û bi quwet bit; her welê mirovên rast û dirost wê her rû spî bit. çend bê pişt û mirov bit û her welê miorvên rast wê bikarbin xwe li ber barê mala xwe bigrin heskî bila barê risas bit; ka çawa tîrka nanî to bikî rik li karîtê xanî wê xwe li ber bigrit, çunkî rast e ji berê da hatîye gotin: Rasto dirusto xwehro şikesto: "Vêca gerek miorv hemî gava rastîyê hilbijêrit bo rêka xwe da dilê miorv tena bit û hemî gava serbilind û serfiraz bit çunkî wekî dibêjin: "Heta mar xwe rast nekit naçit di kunê ve" û ez welê hizir dikim gotina pêxemberê Xudê ye - selat û silavên Xudê li ser bit - çaxê ferman dikit: *«النجاه في الصدق»* Yanî serketin û xelasbîn li rastîyê da ye.

(779) To ji hirve çûyî gizim û ji wêve hatî nizam!

Ev gotina he tê gotin gava miorvek bi germ û gur qesta cihkê bikit, belê gava giha wêde berê xwe dayê ne ew tas û ne ew hemam e. Ew tişteke pê çûyî bi cih nekir û aloztir kir dê bê gotin: "To ji hirve çûyî gizim û ji wêve hatî nizam!"

(780) Te li sera û sosina û li desta û bazina Xudê ji hindeka distînit didit hina.

(781) Toba darkutînekê ye!

Darkutîkek ew teyirke ku dara dikutînit ji siharê heta rojava dema lê bî êvar wê çû li ser cihê xwe dibêjin lê dibit serjan, heta siharê xew bi çava nakevit. Wê her şev tobekir ku êdî nîklê xwe li dara nedit, belê gava dinya lê bî roj wê bezî li ser karê xwe yê heroj.

Vêca ev gotin tê gotin li ser wan mirovên ku ji karekê tobe bikit ji ber zerarên wî karî, paşî xwe li ser gotina xwe negirt zû li wî karî bizivirit wê jê ra bê gotin: "Toba dara kutînekê ye!"

(782) Têr ne dixwar nan û jajî radikirin tole û taji.

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek gava xwe ji xwe mezintir bavêjit û ew bi xwe çinebit û xwe li karê ji xwe mezintir bînit li pêş. Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Nanê cehî dixût û tirên pûlayî dikit!"

(783) Tilyên desta ne wek êkin.

(784) Tifa li ser evraz e.

Ev gotina he tê gotin gava li malekê da yan li gundekê da mirovek ne baş û xirab hebit hingî ew behsa nebaşîya wî bîkin wê pêtir pê kirêt bibin û bihetîkin. Wê bê gotin: "Tifa li ser evraz e." Yanî ka çawa gava mirovek devê xwe li ser evraz bikit û tif bikit wî li wî vegerit. Her welê heke mirov kêmahîya mirovê xwe bidit dîyarkirin mirov bi xwe jî bi nekamîya wî kûtî û kirêt dibit..

(785) Tunedîtîya çi nedît dema dît bi xwe ve rit!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ber çav camêr bit û xoşmirov û baş û dilovan e bo mala xwe û kes û karên xwe, çunkî ew bi xwe belengaz û perîşan e, belê gava têr xwar wê har hêç bî êdî babê xwe nasnakit. Wê bê gotin:" Tu nedîtîya çi nedît dema dît bi xwe va rît!" Ew mirovê welê divîya mirov rê nedinê, çunkî wekî dibêjin:" Divîya mirov nebêjin Ereba merheba heyne wê birîn li ser kurk û eba!"

(786) Tunedîtîya danhêrk lê îd e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek tiştêkê bê xêr û kêr bi dest bikevit vêca ew xwe gelek qebe û mezin bikit, li nik wî ewe hema wî bi tinê ew tişt heye! Nîzîkî vê gotinê vê ye çaxê dibêjin:" Ji kerê we ye maker horî ye!"

(787) Te got mirî tira nakin!

Here temaşa bike li gotina (14) ê.

(788) Tê sotin û nayê gotin.

Ev gotina he tê gotin gava li ser dilê êkê ah û keser û ked-er û derd û jan û êş û kovan hebin; heke pê baxivî belayek mezintir wê bê serê wî û yan jî wê pê şermezar bibit. Ji ber wê êkê xwe kerr dikit li ser wan kul û derda, belê li rûyê wî dîyar dikit, vêca heke êk jê bipirsit, te çî ye to hinde dawîyî bersiva wî: " Tê sotin nayê gotin." Li vî babetî kurte çîrokek ya pîrejina heye dibêjin : " Eskenderê Zîlqerneyîn du stirwê wî hebîn hingî serteraşek tanî serê xwe dida kurkirin serê serteraşî dibirî - da behsa stirwên wî nekirbîya - heta ji sertiraşekê pêve nema li desta da . çunkî rêkir li dûv wî ra jî anî, gotê " ka serê min kurke. Serê wî kurkir. Eskender gotê:" Îm... yan hîm" yanî destê xwe danî li ser devê xwe û gotê : Him... yanî tê xwe kerkî ew tiştê te dîtî to pê ne axivî yan him... Bi destê xwe jê ra kir îşaret ez ê serê te jêkim. Sertiraş

got: Im Sertiraş çû malê belê dilkul û dil bitirs pûmkirî, tirmûz nexweş, zarokên wî û kes û karên wî pirsyar jê kirin: Te xêr e? Bersiva wî - تنها bi dev - Im... yan him..... Sertiraş lê bî jana zirav roj bi roj li kêmê da hingî qesta hekîma dikit belê kesê çî ji derdê wî nezanî.

Rojekê çû li ba hekîmek zana û şehreza û têbîr. Hekîmî pirsyar jê kir: Te çî ye û to ji kûda xwe tengavî û kûda te diêşit? Bersiva wî bî "im..."yan "him.."

Ne.Ihim hekîm got: Hindî ke ez im ûda bê kilîlim bo axivtinên xelkê, "bêje û pişt rast ka te çî ye?" Gotina te bereke te avêt li binê serhincê da! Sertiraş got: "Mala te wêran bibit ez bêjim ez ê bimrim., ez ne bêjim ez ê bimrim! Tê sotin nayê gotin." Ez çî bêjim? Hey hekîmê delal wekî dibêjin:" Heçî ne li malekê nizane hewalekê!" Hekîm got: madem welê ye here li ser avek boş li erdekê ku kes li wada nebit devê xwe dane li ser avê û hingî ji te bêt bi dengê bilind bike qîr ew tiştê li dilê te da bike der. hey ne bi Xudê tê bimrî. Rabî çû wek hekîm gotê welê çêkir û hate malê tena û rehet. Dibêjin li şona devê wî du levên - çîq - yan - çît - hişîn bî. Rojekê şivanek li wêderê ra borî ew her du leven kirin û anîn mal û kire bilûl - bilûla şivanan - çawa pif kirê deng jê hat: Eskender du stirwên wî hene... Eskender du stirwên wî hene.. Wekî vê gotinê ye deq û deq - belê ji layê şermê ve - çaxê dibêjin:" Heçî dizanit ji xwe dizanit heçî nizanit dibêjin baqa nîska ye!" Binyata vê gotinê jî dibêjin carekê êkê êk li ser jina xwe da dît, hema ji cih kurvekirê û yê dî bazda. De li vêrê û li dera he demekê yê pîs li ber parçek nîsk ra borî û di rîya xwe da paqek nîsk hilgirt û bi dest xwe girt. Mêrê jinkê wê li dûvê heta gihand gund, mirov hatin ketin li navbeyna wan da kuro hewe xêr e? Mêrê pîs got: Min ev baqa nîska ji nîskên wî kirne û dixwazit min li ser vê baqa nîska bikujit! Teva pêkve gotin: Malwêrano ma te dinya ne dîtîye? Te çawa zelamekê bikujî li ser baqek nîska? Mêrê jinkê ma sekinî nezanî êdî çêbikit? Bi dirostî bêjit wê şermezartir bibit, ne bêjit hinav lê sotin! Hema ji tengavîya halê xwe got: " Heçî dizanit ji xwe dizanit heçî nizanit dibêjin baqa nîska ye!" Eve ye wekî dibêjin:" Tê sotin

nayê gotin!" Nîzîkî vê gotinê ye çaxê dibêjin " kulka qûnê ye ne zer e û ne dere!"

(789) Tirba siwara her kola ye.

Bê guman e, ku mirovên daxwaza tiştên taze û hêja û spehî û berketî bikit û xwe bi kêştê, bivê-nevê ye wê asêtî û tengavî û nexweşî bêne pêşîyê, çunkî wekî dibêjin: " Heçî dîtina Taws bivêt, divêt germa Hindê qebûl bikit." Her wekî mirovê siwar ka çawa hemî gava ketina wî li ber çavên wî ye û çaxê ket jî ka wê stiwê wî bişkêt, yan piştta wî! Belê madem keşxê û taze hî divêt divîya xwe li ber bigrit. Çunkî tiştên taze bi tenahî û sanahî nîne, vêca bila baş bizanît "ter-ba siwara her kola ye!"

(790) Tu nemaye pêşîya negotî.

(791) Tiştta ne bi serve wey qûna jiderve.

(792) To bibî Gerdî to nabînî wî erdî.

(793) Te silk jî divêt û te kutilk jî divêt!

(794) Têrî çî haj bîrsî heye!

Wekî vê gotinê ye ew gotina şairê kurdî Cigerxwîn dibêjît:

*Her kes nîzanît hal çî ye
Têr î çî haj yê bîrsî ye
Pîrsê bikin jî yê dîfîye
hawar jî destê dûrîyê...*

(795) Tiştta aqil qebûl nekit bawer neke.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê êkê çûkek girt, çûkê got: Tê çî ji min bikî? Wî got: Ez ê te serjê bikim û bixwûm. Çûkê got: malava ez parîyek tênînim! Wî got: Bila, çawa bit parîyek xweş xweş e û pê gotîye: "Parîyek xweş hêja ye gayek reş." Çûkê got: Hek to min berdî ez ê sê şîreta li te bikim hingî to wan şîreta bi cih bînî xem ji te ra çênabin, wî jî ji xwe ra got: Bi Xudê ez wek "xemgirê kankame." - xemgirê kanka mirovek bî xem ji bê xemî dixwarin rojekê mirovên wî gotinê xemgîr mala babê te wêrano ma ev to bi tinê li dinê dayî? Ev çî ye de bes e te xwe bi van xem û meraqa û kul û derda kuşt! Bela xwe ji xwe veke, ma heta kengî! Bela xwe ji xemgîr venekirin heta xemgîr tobekir ji xema û xwarinê rabî çû malê gazî kevanîya xwe kir. Rabe ji min ra firavîne çêke belê firavînek xweş çêke; çunkî min ji xema tobe kirîye ku ez êdî xem nexwûm. Jinkê got babo şukur ji Xuda ra; bes to ji van xema xelas bibe te çî divêt ez ê ji te ra çêkim. Xemgîr got: Ji min ra hêk û rûnê çêke, jînik rabî bi lez û bez hêk û rûn çêkir û danî li ber xemgîr parîyê xwe bir li ber devê xwe êkê li ser devê bixêlîyê, bakir.. Xemgîr got te çî ye? Got: Xemgîr pa to dizanî çî qewimîye? Xemgîr got: Çî qewimîye? Got: Pa ne makera filankesê ceşkek qut bîye! Xemgîr hema parî avêt - ji desta ket - bi hizir û mitala çû ji kul û meraqa ageh ji xwe nema. Parîyê wî şep û ket li tawka hêk û rûnê da. dûmahîkê got: Derew e , xemgîr malbabwêrano xema nexwe! Pa ma ceşîkê belengazê pa tê salek dî yan du salê dî tê çîbikî? Balîva te wê xwe bi çî bigrit? Yan kermoza û mêşa pê çî ji xwe birevînî? Were keçê xwarna xwe rake, ez nikarim bixwûm. Mêrkê çûk girtî holê hizrên xwe di xemgîr da kirin û paşî got bi Xudê ez jî wek wî me, heyne xemgîr ne ji min xemgîrtir û têr xemtîr, bila ev çûka he wan her sê şîreta li min bikit, ez bes van xema bixwûm, ev ji min ra ji hemîyê çêtir e! Rabî got çûkê: Baş e ez ê te berdim to jî her sê şîreta li min bike. Çîkê got: Ez ê êkê bêjim ez li destê te da û ya du wê ez ê bêjim piştî ez biçim li ser wê devîya - teraşa - he ya sisê ez ê bêjim. Piştî ez biçim li ser wê dara... Mêrik got: Baş e

dibêje, çûkê got: Belê bi soz tê min berdî? Got: Bi soz ez ê te berdim. Çûkê got: "Tiştê aqil qebûl nekit bawer neke." Mêrik berda çûk çû li ser devîyê û got: "Hey te girt bernede û hey te berda pê nekeve" û çûk çû li ser dara dûr û got: Xwelî li te werkir, heke te ez serjêkirbîma livek - dur - eve li ber çûka min da hing hêka beta tê heye têra te û kurê te hebî. Çaxê we got mêrik gezek - leqek - li tilya xwe da li ser hestî sekinan û gotê pa şîreta sê ka? Çûkê got; "hey nezan vê gavê min didu ji te ra gotin te êk ji her duka pêk nanî. Pa bi Xudê to bimirî ya sisîya min negot.

Vêca gerek mirov ne hinde mejî xixilok bit kî çî bêjît mi-
 orv bawer bikit û li dûv gotina her kesê bibezit, bê mirov
 aqilê xwe têda bi kar bînit ka ev gotin rast e yan ne. Her
 welê mirov ne xemsar bit heta ji destê mirov derkevit ji nû
 mirov xwe xemxer bikit û ah kovana bikêşit. Divîya mirov
 li karê xwe da fîrsetê ji destê xwe nekit heke fîrseta mirov
 hat û mirov berda jî êdî pê nekevit çunkî mirov bi xwe ew
 fîrset ji destê xwe berdaye wek wî mirovê xwe kerr û mit
 bikit heta bar bêt li ser şaxê gayî ji nû xwe biciq ciqînit da
 barî rast bikit.

(796) Têjkên şêra şêr in.

(797) Talanê mêrûyê liva cehî ye.

(798) Teyrikê wît wîtanî te mala xwe xirab kir te
 ya min jî li ser danî!

Binyata vê gotina he dibêjin carekê mirovek xweyî terş û
 sawal bî her sal alifê terşê xwe li havînê kom dikir. Salekê
 zivistan bi zûwayî hefa çile jî li ber xilasbîn bî hêj alifê wî
 gelek mayî. Rojekê çû li serê avê berê xwe dayê çûkek
 hêlîna xwe çêdikit. Wî jî got we dîyare zivistan xilas bî ji
 lewma çûçik hêlûna çêdikin! Wî jî êdî pûte bi alifê kewalê
 xwe nekir û destê xwe li ber negirt... Hînd bi xwe hesa ku

alif xilaşbî! Şevêkê ji berî çaxê nivistinê berfê dayê belê dayê!.. Û venekir heta roja paşî piştî nîvro. Erd û çîya dar û ber pêkve bîn êk. Çar tilî reşatî nema û sewal ma bê alif li jorve agir bi dilê xweyî ket! Rabî çû ser avê berê xwe dayê çûçka li ser hêlûnê hişk bîye. Dest avêt lingê wê û got : "Teyrikê wit witanî te mala xwe xirab kir, te ya min jî li ser danî!"

Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek çav li êkê bikit li karekê da û her du pêkve tê biçin wê bê gotin:" Teyrikê wit witanî te mala xwe xirab kir te ya min jî li ser danî!"

(799) Tirs mergê rûvî ye!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe ji karekê bidit paş çunkî eger ew wî karî bikit nexweşî û belayên mezintir wê bîn serê wî ku ew ji pakî û başîya xwe, xwe ji wî karî didit paş û nakit, belkî ji tirsê bela. Vêca wê hingê jê ra bê gotin:" Tirs mergê rûvî ye."

Dibêjin carekê kerek ji zordariya xweyê xwe revî bi çolê ket û çû. Li rexê gund berê xwe dayê seyêkî wê xwe kirî li nav teraşekî da kerî got seyî: To çî dikî li vêdê bi tinê? seyî got: Bawerke ez ji ber zordariya xweyê xwe revîme! Kerî got: Pa ne hema ez jî ji ber zordariyê revîme, hingî kar bi min dida kirin û têr ne dida min ez ji xwe ra revîm. Vêca em çî bikin, em ê xwe ji vê zordariyê xelas bikin? Seyî got: Rabe da xwe bi asê gehîkêra bigihînin, kerê got: Malava em ê bi kûve biçin, çî mala em li ber derê wê bin yan divêt em jê ra bibin dest û pê yan jî bi Xudê me nahewînit, dê me bêxit li destê xwey me yê ewil da. Seyî got: Em ê xwe bi çîya ra bigihîniin hemî mêrg û çîmen in, tê ji xwe ra biçêrî li ser wî giyayî xweş û wê ava sar ez jî ji xwe ra li wada nêçîrê bikim. Her du ketin ber teniştê êk û çûn li nav sera çiyê, li derê şikeftê, seyî got: Eve xweş bingehe ji me ra, av nêzîke û çêre pir e. To ji xwe ra li wêrê biçêre û ez jî ji xwe ra li vî çiyayî li nêçîrê bigerim û carna biçim li perê gund belkî zarok marok qet û metên nanî bidin min, belê agahdar bî û hişyar bî ne zirî çunkî gurî dê dengê te sehbikin wê ka-

vola te berdin erdê. Çend demekê man ker li ser wê nefela xweş û ter û ava sar qelew bî pişta wî holî bî! Rojekê se ne li wêdê wî jî têr xwar û vexwar, ji binê linga got: Zir û zirî, berê xwe dayê guhê gurî li pê milê ra derketin! Wî bazda çû paşîya şikeftê da, gurî got: Kuro to çima hatî li ser koz û pawanê min bê pirsyar? Ma to nizanî ev koza he ne bê xweyî ye? Kerê got: Ma kengî ev koza te ye û te çî pê heye? Gurî got: Koza min e û min qaqañiyên reş pê hene û xelkê vî cihê tev dizanin ji bab û kala da ev koza he ya me ye, me demana li ser standî! Kerê got: Qaqañiya ez qebûlnakim, çunkî te qaqañî bi fêl û fena çêkirne, belê heke te şahid hene here şahidê xwe bîne. Gurî got: Li ser çava xelkê vî welatî dizanin eve koza me ye... Gurî zivirî çû da şahidkê ji xwe ra bînit. Ker ma li jorve ne wêra hêdî derkevit welê ma mit û gêj guh şor, berê xwe dayê se hat. Gava se hat jor berê xwe da kerê û got: Te çî ye, to hinde damayî? kerê got: Ma çî ji te veşêrim; bi Xudê zira wî mêrî hat û zirî! Seyî got: Yanî gurî li te peyda bî? Got: Belê û çêroka xwe û gurî jê ra got. Se got: Rabe zû da çalekê bikolîn û ez ê xwe tê da veşêrim, çaxê gurî hat bêje: Ez şahida qebûl nakim, çunkî dinya gelek bê bext bîye to wê çuyî te êk bertûl kirîye, heta ji te şehdekîyê bidit. Vêca were ji min ra bi vî zîyaretê he sond bixwe, çî gava hat li jorve da sond bixut ez ê rabim xwe li qirkê- hefkê - bidim û to bide ber pehîna heta ez wî bikujim. Rabîn çala xwe kolan û seyî xwe têda veşart û teji li ser gelgele - belgên çilo - kir û ker ma li şikeftê da. Gurî çû da gurîyek dî ka nabînit da bînit arî xwe. Ho çû û ho hat gurgê nedît, çavê wî bi rûvî ket. Bakirê "ka were eve xenîmetek wa ji me ra ketî were ji min ra bibe şadîh ku li ser koza min e. Em ê bikujin, were goştê qelew!" Rûvî ket li dûv gurî û qesta derê şikeftê kirin, çaxê gihan derê şikeftê rûvî bêhna seyî kir! Hingê berê xwe dayê tiştê nedît. Çunkî li ber derî gurî got kerî: Eve şahidê min ku ev koza he ji bab û kalda ya me ye. Kerî got: Mam rûvî ka were to şahidê çî yî û çawa şahidî? Rûvî zanî se wê li wa duru pişta, paş paşkî çû û got: Bawerke ez pîr bîme û çavê min tarî bîne ez baş nizamim ka tûxubê gurî ev pêmil e yan ewa.. he! Nik-

arim xwe ji Xudê bikim îro ronahîye û sibê tarî ye. Zarokên min hûr in, ez nikarim şehdekîyê bidim û ji wêdê zivirî. Kerê got gurî: Dinya sond e yan şahidê eve te şahid nîne, were ji min ra sond bixwe ku ev koza te ye. Gurî got: Ez ji te ra bi çî sond bixwûm? Kerê got: Were bi vê zîyaretê bin gelgele sond bi xwe. Gurî hema pişt rast bezî çû li ser çalê û got" bi vê zîyaretê bin gelgelek eve ku.... û tamam nekir seyî jêlîl xwe li nîqra wî da û kerî da ber pehîna heta gurîyê xwe kuştin û xwe jê tena kirin.

(800) Tajî dibêjit ya Ellah û kêrvoşk jî dibêjit ya Ellah.

(801) Teyîr bi çenga difrin û mêr bi mêra dixurin.

Temaşa bike li gotina (73) ê.

(802) Timahî fenahî ye.

Temaşa bike li gotina (136) ê.

(803) Tirr li hemama û direw li xerîbiya.

(804) Trên xelkê neke di şalê xwe da.

(805) Teyîr biçit erş wê her danit li ser axa reş.

(806) Tirr li kû û das li kû.

Binyata vê gotinê dibêjin carekê jinkekê li ber hevîrê xwe ra tirek kir! Mêrê wê gotê: Bê fihêtê to şerm nakî tira dikî? Jinkê got: Te çima wê salê li çîyayî dasa xwe şikand? mêrik

got: Bê tûta bê binyat; " tirr li kû û das li kû!"

Vêca ev bî pê gotin çî gava êk kêmanîyek bikit hindek mirov gazinda jê bikin: Te çima ew kêmahî kir? Ew belayek yan wan bidit li ber rûyê xwe û bêjit: Çima ew nexweşî li filan salê hat li serê hewe? Wê bê gotin "eve ye dibêjin tirr li kû û das li kû!"

(807) Tovê xwezîyê çandin lahewle wela li şonê hişîn bî!

Li gotina (45) ê binêre!

(808) Tajî bi kotekî nêçîrê nakit.

Temaşa bike li gotina (335) ê.

(A) Tujêne hatin şukur ji Xudê ra.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek xwe bidit dîyarkirin, ku bêhin fireye, belê ew bi xwe hew jê tê û ne bêhna wî fire ye, belkî çî jê nayê vêca hema nerm û tena dîyar dikit... Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Nanê êkê bi avê da çû got:" De bila bi xêra babê min bit."

(809) Tebîetê bi şîrî li şîwarê tê hêlan.

Temaşa bike li gotina (149) ê!

(810) Tava sibeha pare nekit tava êvara pare nakit.

Ev gotina he tê gotin çaxê mirovek li ewilê karê xwe çijê çenekit û dûmahîkê ji nûka xwe bêxit li kêferatê da wê jê ra bê gotin: "Tava sibeha pare nekit, tava êvara pare nakit!"

V

(811) Vîna dila bi dana desta dîyar e.

(812) Vê navê vê gavê mehemed givê ganek
divê.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li xemeka mezin da bit yan belayek mezin bi ser da bêt; vêca êk dî bêt û bê muhlet daxwaza tiştek bêxêr bikit û jê ve nebit wê bê gotin: " Vê navê vê gavê mehemed givê ganek divê!"

W

(813) Wey li qûnê, wey li meşka doşavê

Binyata vê gotinê dibêjin carekê êkê hindek doşav kire li du meşka da da bibit bifroşit. Miorvek li semtê hat, pirsyar jê kir: Barê dewara te çî ye? Got: Doşav e. Got: De ka dane da tam bikimê hek xweş û taze bit ez ê hemîyê bikrim. Wî jî doşava xwe danî erdê û derê meşkekê vekir mêrik firek lê da vexwar got: Eve baş e! De ka ya dî veke da tam bikim wê. Xweyê doşavê derê meşka dî jî vekir! Her du meşk dervekirî her êk ma li destekê da! Mêrkê dî hema lê zivirî û da li ber hinga! Xweyê doşavê ma sekinî û tirek jê hat! Destê xwe ji meşka berdit doşeva wî wê birijit! Destê xwe ne berdit, qûn li nav lepada tir û virto bibê! Hema ji tengavîya halê xwe da got: "Wey li qûnê wey li meşka doşavê.

Vêca ev bî pê gotin çî gava mirovek bikevit li navbeyna du tengavîyên mezin da her êk ji ya dî neçaretir bit; wê bê gotin: " Wey li qûnê, wey li meşka doşavê!"

(814) Wî li min daye û ew digrî.

Temaşa bike li gotina (456) ê.

(815) Wek êtîmê hêka sor dîtî!

(816) Wî jî tam li tiştekekê heye!

Temaşa bike li gotina (119) ê!

(817) Werîs kurt bî ne giha te!

(818) Wey liva nîskê ye, ne bere û ne pişt e!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li semta êk bêbext û bê war û durû bit , gava li nik mirov bit bi renekî bit û gava pişta mirov ketê bi renekî dî bit. Ev ê welê wê jê ra bê gotin: "Wek liva nîskê ye û ne bere û ne pişt e!"

X

(819) Xezalê ji ber şikêvlatokê zozan li xwe heram kir!

Binyata vê gotinê dibêjin; xezal li zozana dijîya, rojekê nêçîrvanekê rahêla xezalekê heta xezal ji nav lepên nêçîrvanî xelas bî bostekê ezmanê wê hilkişa. Çû xwe li nav devîkê veşart berê xwe dayî şikêvlatokek - kûselek - wa li nav wê devîyê da ye, şikêvlatokê got: Te xêr bit to hinde westayî? Û hinde hilk hilk bi ser te ketîye! Xezalê got: Deyneke şikêvlatok nêçîrvanek ewe ji tîyê tavê wê radihêlit min, heta min xwe xelas kir nîva canê min derket. Şikêvlatokê got: Hey babo me kûvîya çî tira reş kirîye dinya hemî neyarê me ye? Xezalê got: De bi Xudê madem to jî ji kûvîyanî hêdî min ev şon navê û ev cihê he li min heram bit heke ez hêdî lê bimînim.

Vêca ev pê gotin çî gava mirovek karek hêja yan tiştek berketî bi şon da bihêlit û jê bigerit, ji ber hindek mirovên bêxêr; wê bê gotin "Xezalê ji ber şikêvlatokê zozan li xwe heram kir!"

(820) Xwe mezin neke da to ne şikê!

Bê guman e, ku mezenahîya bê me`na . nexasim li ser kes û karên xwe - êk ji egerên xupankirin û wêrankirina mal û miletan e. Vêca bivê-nevê ye li ser rêberên şon û wara xwe li ser êl û eşîrên xwe mezin nekin çunkî paşî wê wî bihêlin û pûte pê nekin. Û dûmahîk wê bê rûmet bibit çunkî wekî dibêjin: " Beg yeman êl yeman: " Yan ne begê bê êl û ne êla bê beg."

(821) Xwelî li wî serî ew ê ga da bi kerî.

(822) Xwezîya bi aqlê paşî.

(823) Xwestin xîret e, te hey neda me`ro ne xu saret e.

(824) Xala xuharzî rakirin, mama birazî winda kirin.

(825) Xwe bi miqewrçekê - kulendekê avê - melevan neke.

Bê guman e, ku divê mirov li rêka jîna xwe da zana û tê birbit, hişyar û şehreza bit. Îş û karê xwe bi bine cih bigrit û bi miçdahî temaşa lê bikit. Ne hema çi bêjit bawer bikit, hey ne wê hemî gava şepilî û bê ser û ber bit.

Vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek bi gotinek bê bi-nyat bivêt rabbit li ser hêl û pepana û xwe li karek giran bidit û dûmahîkê jî têda bikevit şeh û gorên xwe û bi her du dest û linga ne karibit xwe xelas bikit wê jê ra bê gotin : "Xwe bi miqewrekê melevan neke!"

(826) Xweyê sebrê dibit melkê Misrê.

Temaşe bike (649) û gotina (A) li tîpa "B" da .

(827) Xweyê hîvîya her rûvî ye.

Bê guman e, ku Xudê - pak û paqij bit - mirov dane dinê da bijîn bi jîyanek serfiraz û serbestî û rêka dayê ku serbestîya xwe biparêzit. Neku dev xwehrî û lavlavê ji beram-

berî xwe bikit. Belkî divêt rizgar bit da ew bi rast û dirust li gel hemî mirova pêşve herit. Çunkî mirovên kole û bindest hemî gava karê wan bi çep û çûrin li gel mirova. Vêca ev gotina he tê gotin gava mirovek her çav li dere û dev xwestok û çav zil û dil bi fêl bit. Wê bê gotin: "Xweyê hîvîya her rûyî ye!"

(828) Xewa bab kuştîya tê xewa zikbirçîya neyê.

(829) Xemên me ne besî me ne yên tireka yarê serbar in, jorda li ser in.

830) Xweyê pendê dikevit kendê.

Bê guman e, ku Xudê - pak û paqij bit - mirov çêkirme da weku pêkve bijîn bi jîyanek taze û ciwan. Û êk ji rêkên jîyana wan ew e ku li gel êk rast û dirust bin, bi hev ra xêrxwaz bin, ne her êk teşo wê berê xwe bit û ji xwe pêve kes dî nevê bit. Çi gava bibînit mirovek wê nanekê dixût her wekî wî nanî ji goştê laşê wî bixût. Vêca ji zikreşîya xwe rabit li dor bigerhit tevin û tepek û dava li rîya wî da vedit heta bêxit şeh û gorên wî, belkî wê xweşîya wî lê bikit reşî û ne xweşî. Ev mirovê holê ne xêrxwaz bê guman ew çî cara berê xwe nadit rêkeka jîyanê. Belkî hemî gava berê wî li rêka mirna hevalê wî ye. Ji lewma her û her karê wî tevin û tepik û davin. Bê guman e wê ew bi xwe bikevit êk ji wan tepka çunkî pêxemberê Xudê - selat û selavên Xudê li ser bit - ferman dikit: «من حفر بئراً لآخيه وقع فيه»

Yanî ew ê çalekê ji birayê xwe ra bikolit ew ê bikevit têda.

Vêca ev gotin tê gotin gava mirovek nexweşî û bela bi ser da bèn çunkî ew lê digerha ku wê nexweşîyê bi ser hevalê xwe da bînit; wê bê gotin: "Xweyê pendê dikevit kendê!"

(831) Xudê fêla marî dizanit ji lewma dest û pê

kirne di zik da.

Bê guman e, ku mar heywanek dijminahî û neyartîya wî gelek pir e. Heta dujminahîyê bi tuxmê xwe ra dikit. Vêca ev gotina he tê gotin bo wî kesê kîn û kerba wî ji dijminahîya wî pêtir bit û mezintir bit wê jê ra bê gotin: "Xudê fêla marî dizanit ji lewma dest û pê kirne di zik da!" Wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin: "Stirwên - şaxên - gayî li mihê bîyan wê dinya xirab kirbîya!"

(832) Xweyê mirya kor e.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek karê wî pûç bibit û şonwar jî bo nemînit, belê ew li ser hizir û xwezîya dilê xwe xweş bikit wê bê gotin: "Xweyê mirya kor e."

(833) Xudê goşt didit mirovê bê didan!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek jê ra firset hilkevit belê ew mirov qîmet û bihayê wê firsetê nezanit û pûte pê nekit. Wê jê ra bê gotin: "Xudê goşt didit mirovê bê didan!"

(834) Xwelî li wî bit ew ê mirovên xwe bidit bi xelkê bîyanî.

Bi rastî ev gotina he ji wî qasî rûntir e ku mirov li ser baxivî, çunkî mirovê mirov çend bo mirovî xirab bit. Her wê ji xelkê bîyanî çêtir bit û dilovantir bit. Ji lewma hatîye gotin: Mirovên te heke te bikujin jî hestîyên te naşkênin û wê te veşêrin û wê xwe li zarokên te bikin xweyî.

Vêca ew ê mirovên xwe bidit bi xelkên bîyanî bê guman e, ew mirov gelek nezan e! Wê her rojekê danit bi ranê xwe tepa wê baş bizanit ku ne ji xwe da hatîye gotin: "Bîyanî bidê goştê ranî wê her bi ser te da bêt poşmanî!" Çunkî

wekî dibêjin:

(835) Xwîn nabit av.

yanî mirovê mirov çend mirov nevêt jî, belê xwîna mirov li ba wî wek avê biha nabit, ku hema ji xwe da bêt rijandin.

(836) Xwelî li axê çaxê pişkul bî malxwê.

Temaşa bike li gotina (253) ê.

(837) Xeta xwehir ji bin gayê pîr e!

Ev gotina he tê gotin gava ku li malê da, yan li gundî da mirovek neqolî û ne ser rastîya bit û hingî bènê ne karbin wî dirust bikin; çunkî wî yek dî heye wan rêka nîşê dikit; wê jê ra bê gotin: "Xeta xwer ji bin gayê pîr e!" Wekî vê gotinê ye bi dirustî çaxê dibêjin: "Dewsê kerê ne û fiêlên yê perê ne!" Binyata vê gotinê jî dibêjin bûkek xesûya wê li gel nebaş bî. Tiştên xwarnê dibrin paşîya xanî û li ber derê xanî herî fikir da bûk neçit jorve nehînit. Belê bûk rabî çû kerek anî û lê siwar bî, çû ji xwe ra tişt ji paşîya xanî deranî gava xesû hat malê berê xwe dayê dewsen kerê li xanî hatine û çûne. Çû berê xwe da tişt ku hindek tişt wê çûne serê xwe hejand û got: "Dewsen kerê ne û fiêlên Perê ne!"

(838) Xweş xeber e, belê min ne bawer e.

(839) Xudê hind baranê didit hindî erd ragirit.

Ev gotina he tê gotin gava ser malekê da yan gundekê da tengavîyek mezin bêt û ew hêj ji wî qasî ditirsin ku tengavîyek mezintir wa maye; vêca hêdî ji wî tirsê da tebatî bi wan nekevit wê bê gotin: "De malava Xudê hind baranê didit hingî erd ragirit."

(840) Xaniyê xwe xirab neke heta to êk dî çênêkî!

(841) Xîret zêr e ji bilî namûsa vêre.

(842) Xwestî birîne û hatî çûne.

(843) Xemgirê kanika ye!

Temaşa bike li gotina (795) ê, me tibabekê axivtine.

(844) Xwelî li wî bit ew ê pişta xwe bi mirovê maqûl girê bidit.

Bê guman e, ku mirovên maqûl û mezin - de vêca çî desteka heyî bit û kîj tuxmê heyî bit - bi rastî û dirustî ne dostên kesê ne; ji bilî rêvebirina karên xwe, ji lewma to dibînî wê zûka dostên xwe berdan yan guhartin bi hindêk dî û gelek cara jî wê dostên xwe yên kevin, kirin reşê xwe wê nexweşî gihandin wan. Ji ber vê êkê hatîye gotin: "Borîyê maqûla zor bor e! To bidî wê te li ber xwe bibit û lê nedî tê bimînî! Vêca ew kesê bawerîya xwe bi mirovên maqûl bînit dê poşman bibit."

(845) Xudê serî dibînit, paşî şaşê tê dialînit!

Ev gotina he tê gotin gava mirovek li ber çav dîyarbit ku hêja ye gelekê belê bi xwe jî her û her li paş e, çunkî bêxêr e; wê bê gotin: "Xudê serî dibînit, paşî şaşê tê dialînit!"

(846) Xewna gayî li kerê ye!

Ev gotina he tê gotin gava ku êk nepakîyekê bikit û paşî wê nepakîyê bihêlit bi êk ji xwe kêmtir ve wê bê gotin:" Xewna gayî li kerê ye!"

(847) Xeletî ji kiçka-biçûka-efo kirin ji mezina

Bê guman e, ku Xudê - pak û paqij bit - mirov kirne gund û babik û eşîr da arîkarîya êk bikin û li xêra hev da bin, mezin destê xwe bi serê biçûka da bînit û biçûk qedrê mezin bigrit, ne li ber êk û du wekî gurg û mîha bin. belkî divêt bi êk du ra dilpak û paqij bin. Vêca eger biçûkekê xeletîyek kir û mezinî xwest ji wê xeletîyê pêtir biêşînit. Wê bê gotin:"Xeletî ji kiçka û Efo kirin ji mezina!"

(848) Xweyê xanî ji hemî kesî pêtir dizanit ka çî di xanîyê wî da heye.

(849) Xew û kew her du nagihên êk.

Bê guman e her karek heyî bit çend kê m û hur bit divêt xweyî xwe pêve biêşînit û ne xweşîyê bibûrînit heta ber xwe ra wî karî bixût ka çawa kewgîr divêt xewa sibeha li xwe bibûrihit belkî goştê kewa bixût. Çunkî kewvedan li çaxê siharîyê ye. Wekî vê gotinê ye deq û deq wekî gotina (305,306,307,308) ê here temaşa bike tê baş bizanî!

(850) Xweyê şerefa kîr û xeleka qûnê ye.

Ev gotina he tê gotin gava mirovek rûtek bibit egerê belayek mezin bi ser malekê da yan gundekê da û ew bi xwe bi tiştêkê xusaret nebit, çunkî wî tiştêk nîne û nexwazit ew mal yan ew gund tena bibit. Wê jê ra bê gotin: Ma wî çî jê ye? Ew bi xwe "xweyê şerefa kîr û xeleka qûnê ye!"

(850) Xweyê doxînê ye!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek li ber du jinka ra borî wê pereçonkê - bin çenganê - dikin. Êkê ji ya dî ra got: Kîj me her duka bikevit wê gankê bidit vî zelumê he. Mêrik hema doxîna xwe vekir. Jinka gotin: Hêdî raweste me ne hêj kes ji me neketîye to ho bezî doxînê? Mêrik got : Mane her wê êk ji hewe bikevit. ya min ez her xweyê doxînê me!

Vêca ev bî pê gotin çî gava du çûn tev danekê bikin û her kar ne ji êkê ji her duka rabit; belkî kar bighêt yek dî wê jê ra bê gotin:" Xweyê doxînê ye!"

Y

(851) Ya mêra lê hatine.

(852) Ya zêr dizanit yan zor!

Bê guman e gava mirovekê xwe li kiryarek mezin da yan divêt xurtî û quwet hebit; yan jî malek mişe û pir hebit, heyne kiryar jê çênabit.

(853) Ya mela bangdan e!

(854) Yarî bê micdahî nabin!

(855) Yan eşhedo yan nan û tû!

Binyata vê gotinê dibêjin kurê pîrejinek file hero hêcet li dîya xwe digirtin; "yan tê tokê - sertûka mastî - hemîyê bidî min yan jî ez ê şehde bidim!"

Vêca bî pê gotin: Çî gava mirovek bi hêcet bit li gel miorvekê; "yan tê filan karî bo min bikî yan jî ez ê kiryarek mezintir bikim." Deq û deq wekî vê gotinê ye çaxê dibêjin:

(856) Yan naçim aşî yan ez ê aşvanî bikujim!

(857) Yan nanê te genim yan zarê te genim!

Bê guman e divîya her miorvek li rêka xwe da li gel mirova yan bi zarekê xweş û ezman şîrîn derbas bikit, heta dilê wan ji mirov bit yan jî daneka taze li gel kes û karên xwe û

gundî û cîranê xwe bikit heta dilê wan ji mirov xweş bit.

(858) Yê ne ji hinava nayê pêş çava!

(859) Ya rûvî kevl e.

(860) Yê baştir Behdîn e ew jî hîz e û diz e û derewîn e!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovek çû gundekî, êk ji wî gundî pirsyar jê kir " to xelkê kûdê yî?" Got: Ez ji filan gundî me. - navê gundê xwe got - Ewî gotê : Wey to gelek bi xêr hatî xudêkî dostê min filan kes çawa ye? Got: Serê te xweş nemaye, jîyê wî jî ji te ra bit. Ew çûye ber rehma Xudê... Got: Hey mala min ê Xudêkî çi dunde bi şon xwe ve hiştine? Got: Sê kurên zelum hene. Got Xudêkî kî ji hemya çetir e? Got: Ma ez çi bêjim! "Yê baştir behdîn e, ew jî hîz û diz û derewîn e!"

Vêca ev bî pê gotin çi gava malek yan gundek hemî bêxêr û ne baş û kêrhatî bin wê bê gotin: "Eve ye malava wekî dibêjin; yê baştir Behdîn e, ew jî hîz û diz û derewîn e!"

Z

(861) Zehmetê Aqo mane pêlên Meraqo!

Binyata vê gotinê dibêjin, li rexê Bota ava Bota nîzîkî Sêrtê ye li ber Batmanê ra dibûrit - du bajarên li Kurdistana Tirkîyê - cihê avê hemî çîya û dar in. Erdê wê nêr e û gelî ye, pêl dikevinê li bejna xanîya bilind dibin - nexasim cihek tê da heye dibêjin pêlên Meraqo - ev pêlên he heke derfên bîqdayî bikevin tê da wê bipeqin; çunkî av li wêdê dibit şîp û jor da tê xarê. Li bejna spîndara bilind dibin û jor da li nav guhê tehta dikevit, bi xwe heke kelemper bit wê hûr bibit!

Vêca carekê miorvek li ser wan pêla ra ket li avê da û miorv li berda bîn rêz li her du rexa, belê kes newêrit û nikarit xwe bavêjit avê, çunkî av wa rabîye fûrek dikevinê pêl li êk û du siwar dibin. hemya dest rahêlan û temaşay wî kirin ew ê ketî li avê da û ew bi xwe wê ji nav guhê vê tehtê vedirest li nav guhê tehta dî dikevit. Îro mirîyê hey ne ev e, deh roj mirî! Li wê navbeynê da pîrejîk got: "Zehmetê Aqo mane pêlên Meraqo!"

Vêca ev bî pê gotin çî gava tengavîyek bi ser êkê da bêt û seda sed jê xelas nabit û li berahîya wî tengavîyek mezintir heye wê bê gotin: "Zehmetê Aqo mane pêlên Meraqo!"

(862) Zana ji Bexda tê malxwê malê ya xwe çêtir dizanit.

(863) Zik têr bit hezkî bila ji tovlê dêr bit!

Çunkî wek dibêjin: "Şaqolî bila ne peya bit heskî bila li cêlekê siwar bit!"

(864) Zik birçî têt dibin, belê çavbirçî têtabin.

Çunkî wekî dibêjin; "kesê ji testa xwe têt nebit ji mala xelkê têt nabit" û here li gotina (91) ê binêre, tê baş mena vê gotinê bizanî!

(865) Zikê xwe bi berî ve bîne heke çavên te ne bi hîle ne!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê zelamekê gotê jinkekê: Filan kes zikê min gelek tarhêt ka zikê xwe rût bike da zikê xwe bi yê te ve bînim, belkî tena bibit? Jinkê lê veğerand û got: "Zikê xwe bi berî ve bîne heke çavên te ne bi hîle ne!"

Vêca ev gotin tê gotin gava miorvek xizmetek sivik li êkê hay bidit belê li dilê wî da xizmetek mezintir heye û yê dî tê bighêt wê jê ra bêjit: "Zikê xwe bi berî ve bîne heke çavên te ne bi hîle ne!"

(866) Zêrî bide zêringera.

Here li gotina (182) ê temaşa bike!

(867) Zad zadê mirîyan e û goşt goştê san e; got xêvzank bi xwe jî ji kîrê filan e!

Binyata vê gotinê dibêjin carekê mirovekê sê kur hebîn û navê wan her sêka Elî bîn. Li ber mirnê babê got: Elî mîratxwer, Elî mîratxwer, Elî û ne mîratxwer û bab mir. Her sê Elîya her êkê got yê dî: To ne mîratxwer î! Bivê-nevê bîn her sêka gotin: Em ê herin li ba xêfzankî, ka kî ji me ne mîratxwer e û her sê rabîn çûn qesta xêfzanekê bi nav û deng kirin. Bi rêve birayê mezin got: Ev dewsa hêstêrekê ye! Birayê navê got: Ev hêstira he bi çavekê ye, birayê biçûk got: Ev hêstra he barê wê cemek rûne û êk şîranî ye! Û çûn. Zelamek ji pişt ve hat giha wan pirsyar ji wan kir:

Hewe çi dewar nedîtine? Birayê mezin got: Dewara te ne hêstir e? Got: Belê ezbenî. Birayê nîvê got: Hêstira te ne bi çavekê kor e? Got Belê, bi Xudê her ew bi xwe ye. Birayê biçûk got: Hêstira te barê wê ne cemek rûn e û êk şîranî ye? Xweyî xwe avêt destê wan: Li bextê hewe û yê Xudê ka hêstra min? Her sêka pêkve gotin: Bawerke me ne dîtîye! Xweyê hêstrê serê xwe hejand û got: Ez van gotina nizamim ev salûqdanên hûn didin yên hêsrira min in! Yan hêstira min yan jî ez ê hewe bibim li ba xêvzankî. Wan got: Bi xwe em ê herin li ba zêvzankî. Her çar ketin li ser rê û çûn. Demekê çûn birayê mezin got: Eve dewsa jinekê ye! Yê nîvê got: Ev jinka he zîz bîye! Yê biçûk got: Ev jinka bi zaro we. Çûn êk ji pişt ve hat giha wan: Erê hewe kes nedîtîye li vê rê bûrî? Birayê Mezin got: Ne jinek e, to lê pisyar dikî? Got: Belê ezbenî. Yê nîvê got: Ew jinik ne zîz bîye? Mêrik got : Bi Xudê hema ew e. Yê biçûk got: Ew jinik ne bi zaro we? Mêrik got: Pa kanê? Her sêka gotin: Bawerke me nedîtîye. Mêrik xwe girt û li erdê da: Yan jina min, yan ez ê hewe bibim li cem xêvzanî? her pênc pêkve çûn li ba xêvezankî, xêvezankî pirsyar ji wan kir: Doza hewe çî ye? Çunkî doza hewe her pênc ne êk e. Birayê mezin got: Belê doza me hemîya ne êk e, ka to carê bela van her duka ji me veke. Xweyê hêstirê mesela wan û salûqdanê hêstirê xwe got. Xêvezankê berê xwe da birayê mazin û got: Te çawa zanî dewsa hêstirê ye? Birayê mezin got: Dewsa hêstirê dîyar e, ji dewsa kerê mezintir e û ji ya hespa biçûktir e. Gote birayê navê: Pa te çawa zanî hêstir bi çavekê kor e? Birayê nîvê got: Çunkî li rexekê rê çêrî bî, min zanî ev hêstira he bi çavekê ye, çunkî li rexê dî çêrî nabînit heta bixût! Got birayê biçûk: Pa te çawa zanî barê wê cemek rûn e û êk şîranî ye? Got: çunkî her du rexa rîjhabî, li rexê rûn mêrûya dabîyê û li rexê dî şîranî bî mêşa dabîyê. Xêvzankê got xweyê hêstirê: Here li hêstira xwe bigerhe.

Xweyê jinkê rabî mesela xwe û wan û salûqdanê jinkê got: Xêvzankî berê xwe da birayê mezin û got: Te çawa zanî dewsên jinkê ne? Birayê mezin got: Çunkî jinik pêxas bî û lingê jina nerm e gava ket li erdê valehî li navbeyna pêhnîyê

û sertilîya da namînî. Got birayê nîvê: Pa te çawa zanî jinik zîz bî ye? Got: Çunkî her du sê gava çûbî û li xwe zivirî bî, ka kes li dûv nekefîye! Got birayê biçûk: Pa te çawa zanî jinik bi zaro we? Got: Çunkî her demekê çûbî û rûniştîbî; çaxê rabîye nekarbîye yekser rabet, her du destên xwe dabîn li pêşîya xwe li erdê heta rabîye. Xêvzankî gote xweyê jinkê jî: Rabe here li jinka xwe bipirse!

Bî êvar çaxê şivê, şiv anîn ji wan ra, xêvzankî li ber kolekekê ye, sehkir birayê mezin got: "Zad zadê mirîya ne" yê dî got: "Goşt goştê sa ne," Û yê biçûk got "xêvzank bi xwe jî ji kêrê filan e." Xêvzank hema ji wêrê zivirî çû mal got cotyarê xwe: Filan genimê me yê kîj zevî ye? Got: Bawerke evarekê erdê me xilas bî û roj hêj zû bî û tavo min mabî ez li ber zîyaretê ra bûrîm min berê xwe dayê latek baş bê gor heye, hema min dewarên xwe li ser girêdan û ew çend genim min avêt wê latê; xêvzankî ew hêla û çû li ba şivên, gote şivên: Ew berxê me îsev serjêkirî ye kîj mihê û kîj beranî ye û te çawa xweyî kirîye? Şivên got: Bawerke berx yê filan mihê û filan beranî ye; belê bi şîrê maka xwe firîşk nebîye! Çunkî li ser zayîne maka wî mir, dêhlek ya me zabî hema min berxik avêt ber dêhlê û min bi şîrî wê xweyî kir. Xêvzankî serê xwe hejand û got: Eve didu.

Bê guman e ya sisîya jî wek wan e. Bes ez ê biçim wê jî pirsyar bikim. Rabî çû mal şûrê xwe hilgirt û qesta dîya xwe kir: Dayê dayê... Rast bêje ez kurê kê me û babê min kî ye? hey ne bi Xudê ji êk şûrê pêve ez li gezîya stuwê te nadin. Dayik berê xwe dayê dît ji dil e û bi çi rêka nikarî xwe ji lepa xilas bikî; got: Dayê qurban çi ji Xudê, çi ji benya, babê te carekê çû karwan û gelek ma. Û dîya te çaxê guhnêla wê hat û tebata wê nehat. hema rabî xulamê babê te ew ê file avêt ser xwe û to yê wê şevêyî... Xêvzank hat li ba her sê mêvanên xwe, pirsyar ji birayê mezin kir: Te çawa zanî zad zadê mirîyan e? Got: Ev savara hinde têr rûn û qelî tam gilîz bî min zanî wê li nav mirîya hişîn bîye. Got birayê navê: Pa te çawa zanî goşt goştê sa ne? Got: Min zanî çunkî rûnê wî xwe berda bî ser hestî. Got birayê biçûk: Te çawa

zanî xêvzank ji kêrê filan e? Got: Min to dîtî patka te gelek pehne û serê te şor e, min zanî ev dirovê filan e.

Vêca ev gotina he sêka bî gotin çî gava mirovek hindêk kêrê û kasên êkê bizanî û wan kêrê û kasa pê baxivî û êk dî hindêk kêrê û kasên mezintir bizanî wê bêjî: Malava digot" zad zadê mirîyan e, goşt goştê san e, xêvzank bi xwe ji kêrê filan e!"

FERHENGOK

Wergêr

A

Arxafk: Xwarinek e; ji rûn û ardê qelandî tê çêkirin.
Aqo: Navê filan e.

B

Berçît: Şiv, darê zirav
Bê tûte: Bê hesab
Bêsûre: Talika tîrî
Biqeşte: Biteqize, siktir be
Bixêrî: Qula dûkelê
Berahî: Pêşî
Birha: Qeda, qirbî
Binûsît: Pêve mayî, leziqî
Berra kir: Anî rê, razî kir
Bêrzan: Meydan, cihê vala
bazeber: Karê giran
Bînê: Behn
Berze bî: Winda bî
Behdîn: Navê mêran e
Behir: Pare
Bor: Avek şirkê ya xurt, çemekê teng

C

Cers: Bê minet, ji xwe razî.
Cûn: Tuxmê jin û mêran re tê gotin.

Ç

Çepil: Çeplê desta
Çilekî: Bê nefsi
Çêrê: Çerandin
Çeqok: şilfik, kêra biçûk

D

Debar: Tehemul, îdare
Doşav: Dims,divs,dibis
Dûnde: Xelifandin, zaroyên malê
Dergûş: Landik,bêşig
Daxit: Bînit xwarê
Dev te: Cem te, ba te
Dûv: Pey, du, paş
Datewand: Niviskir
Dexil: Genim
Deve: Hêştir
Dojeh: Cehenem
Dujûn: Sixêf, xeber
Dexesî: Hesîdî
Deq û deq: Bizzat, eynî bi xwe
Diwêr: Jêhatî, netirsonek
Derak: Bela
Daxumt: Nixavt
Durre : Elmas

E

Ewan: Fenek, fesađ,çira

F

Fûrek: Gerînek,zivranoka avê

Furt: Fort,pesn

Firtir: Hêjatir,baştir, çêtir

G

Guhişî: Mat mayî,heyret mayî

Guhnêl: Çaxê jin lê tengavbit û bixwazit

Garsî: Garis

Guhşî: Hîzir, mitale

Geda: Parsek

Gundik: Gundekî li bajarê Şirmaxê

Giz: Nefret

Gerew: Rehîm

H

Hay: Agahdarî

Hervîşme: Tayê neqşê

Hone: Weha ye, wesa ye

heyil: Quwet, taqet

Havroşk: Tawaş,hevrişk,nan û rûnê helandî

Hemka: Eşîretek li hêla Hekarî

Hing: Qasî

Heçik: Noçik, qurînek, gurmik
Hîbî: Hînî, fêrbî
Hîz: Qûnek, qehpe

J

Jajî: torak, penîrê hûr
Jêlîl: Arvazî
Jinûbî: Jinebî, jina ji mêrê xwe berdayî
Jana zirav: Nexweşîyek
Jî : Jîyan (li gelek ciha hatîye bi karanîn)

K

Kermoz: Kermêş, Stêng
Kulek: Qula pencere ûdê
Kalan: Qabê şûr û xencerê
Keşol: Keşkol, turkê parsê yê derwêşan
Kewand: Şarand
Kelehî: Taxek li bajarê Cizîrê
Kelpûç: Bilûk, taboq
Karîte: Kêran, meşt
Keser: Hesret, kovan

L

Lehî : Laser, av rabîn
Liqat: Avaz, teqlîd
Leven: Qamîşk
Libek: Hebek, tene
Lexim: Qenal
Lalîlk: Teyfik, tebeq
Livlivî: Hereket kir

Layît: Elektrîka patrîya
Lîloz: Navê gulek

M

Mişext: Derbider
Misk: Gulav, qolonya
Misase: Emiskê zaroka
Miqewir: Kuhara mêşa, cihê mişa
Maxane: Cizîrî di şûna Malxirab de bikartînin.
Miqam: Hal, serûber
Mukum: Bi bawer, tund
Mirût: Melûl
Maşik: Xwarinekê (mîna nîskê ye)
Mereke: Şer, ceng (erebî ye)
Mehder: Mefer, mufe
Munker û neker: Ezrail, ewlîyayên Xudê
Mismit: Bê deng
Mezrîbe: Şirka baranê
mayê xwe: Eleqedera xwe
Melaqî: Nermîfî, nazdarî
Mirîşo: Yê mirya dişot
Mişe: Gelek, pir
Men Rebuke: Xudayê ye kî ye
Meraqo: Navê filan e.

N

Neşter: Kêrka dokroran
Nependî: Veşartî, îlegal
Neqolî: Dedîqodû, fesadî
Newq: Hefk, qirik
Nivist: Raza, raket, vezelîya
Neker: Ne îşker
Nijadker : Yê şelandinê dikin
Nekamî : Gilî, fesadî

P

Petî: Saf, zelal
Perweste: Zarokê gihayî, mezin
Pêlbîn: Berbîn, zîqbîn
Pîjan: Ping (zebzeyek)
Pûte: Qîmet, rûmet
Peşkek: Hebek
Patek: paçek, kincikek
Pêstirk: Pêlik, nerdewan, silim
Pêtiv e: Pêwist e
Pepan: Gotinek ji bo zarokan (ji pêr ve)
Pencek: Kulmek, lepek
Porpor: Gevezetî
Piring: Pêlê agirî

Q

Qutan: Kutan, lêdan, lêxistin
Qeselî: Qesirî, qufilî
Qelhan: Qirkirin
Qam: Bejin, dirêjahî
Qurebergêr: Kerê begzade
Qaqanî: Tapû, qalçûl
Qureder: Zeqnebût, quzilqurt
Qoran û Haman: Ev wekî Nemrod
û Fîrewn in, ku xwe bi Xudê dan naskirin
Qurnet : Koşekê malê an ûdê
Qewyatî : Wesîyet

R

Rijî: Poş, bêrûn
Rêhdên rihên mirovî

S

Sehim: Tirş,sêw
Sîyanet: Qedir
Serêlî: Şewekê stranan e
Sekwet: hereketên pezî
Sera: Serayî, koşk
Sotin: Şewtandin
Seharê: Berbangê, sibê zû
Suxte :Feqê mela

Ş

Şiware: Ava mirîya pê dişûn
Şimik: Terlik
Şol: Kar, îş,şixul
Şepilî: Şepirze (şerpeze) bû
Şêvbûrk: Şevgêrik, mêvanîya şevê
Şelatî: Serserî
Şaqis:Şeqiz, ecêbmayî
Şû kir: Zewicî (tenê ji bo jinan tê bikaranîn)
Şon: Şûn, cih
Şekî : Qebdayî
Şikêvlatok: Kûsî,kûsele, kîso
Şax û Hebler: Du gundên li bajarê Cizîrê ne

T

Terd kirin: Ji sinifê avêtin
Teşabet: Bê serûber

Tezî: Cemidî
Tekber: Qîyafet
Tozek: Hebek
Tena: Hêsa, rehetî
Tibil: Tilî
Tû: To, qeymaxa mast
Tiyê tavê: Tîrê tavê
Tehre: Germatîya havînê
Tehin: Gazind, gotinên şifre

Û

Ûlî: Koşk, qesir

V

Varî: Alîkî

X

Xavik: Kemkê sera, tulbend
Xirinî: Xwirînî, (xwarina sibê nexwarîye)
Xurîn: Lêhaytin, dengê bilind
Xuh: Xwişk
Xal: Nîşan, deq
Xirên: dengê tiştan
Xunkar : Mezinê dewletê.
Xavek: Hîlek

Z

Zîz: Xeyîdî, enirî, dilmayî
Zîvar zîvar: Qet qet, parçe parçe
Zigurt: Bêkar, ezeb
Zaxe: Bêmoral

"Miştaxa Çîya Ji Gotinên Pêşîya" yekemîn car di sala 1979-an da pirtûkeka ji gotinên pêşîya bi şirovekirin hatiye çapkirin. Herweha eve yekem car e ku bi latîni bêt çapkirin .

Ev pirtûk e, ne tenê berevokeka nimûneyên folklor (zargotina) kurdî ya rengîn e, lê herweha xezîneyek dewlemend ya peyv û deranîyên (idiom) kurdî ye. Ev jî bi saya pêşîyên neteweyên me ne, ku çi nemaye jî me ra negotin e! Hemû gotinên wan serhatî û nimûneyên jîyana wan bûne. Ev nimûne wekî kurtegotin û çîrok mane û di hemû kar û jîyana gelê me da bûne şîret. Ev şîret di warê welatperwerî, miletparêzî, civakî, aborî, ziman, çand, têkilî û helbijartinê, dîni û hekîmîyê ve jî derbaz dibe. Wek gotine:

"Ez çîya û to çîya kî ji golik ra herit gîya."

"Se be ji qewmê xwe be!"

"Bila şêr piştta mirov bişkênit, ne rûvî devê mirov balîsit."

"Serê xwe her bide dîwarên kevin!"

"Bila mirov dîkê rojkê bit, ne mirîşka sê sala bit!"

"Dorê bide dornasa!"

"Şûrê qetlê li destê te, rehma Xudê li dilê te"

Seydayê mezin Mele Mehmûd Dêrşewî di vê pirtûka xwe da piranîya gotinan şirovekirine û gelek ji wan bi çîroktî û nimûne efrandine.

Yahê Seydayê Dêrşewî Yahê

Wergêr